


# Ecebiyata Modern a Kureli

Cihan Roj



◀♦▶

**Edebîyata Modern a Kurdî**

Cîhan Roj

◀♦▶

**Wêneyê Bergê**

Man Ray

The Enigma of Isidore Ducasse

1920

◀♦▶

**Dema Belavkirinê**

22.04.2019

◀♦▶

**Rûpelsazî**

Ridwan Xelîl

ridwanxelil@gmail.com

+90 505 638 6133

◀♦▶

© Hemî maf parastî ne.

Bêyî destûra nivîskêr bi tu awayî nayê weşandin.



*Xwezî, aniha, ne weke hêviyekê,  
weke fotografê edebîyata Kurdî a roja me,  
mi karibûya gotîneke wisa lêkîra:*

*Mîna ruhê Gilgamêş bêhizûr,  
weke Siyabend li pey kuştina felekê...*

*Destpêka sala du hezar û nozdehan*



## Cîhan Roj

Di sala 1965 an de, (di qeyda fermî de 1964) li gundê Înaqa Gim-gimê tê dunyayê. Dibistana seretayî li gund, ya navîn û lîse li Gim-gimê xwendiyê. Despêka bi kurmancî nivîsîna wî 1993 ye. Di heman salê de helbest û çîrokên wî, têne weşandin. Di salên du hezarî de ew hinek termên matamatîgê diafirîne û ji Enstituyê re bi rê dîke. Ew xebat di sala du hezar û şeşan de di Azadiya Welat de tê weşandin.

Nivîskar ji sala 1993 yan heya sala 1997 an li Mêrdînê, li sendîkaya kedkarên qada perwerdehiyê, wekî sekreterê perwerdehiyê rêveberî dîke. Di sala du hezar û yekî de, bi pêşniyara wî, li Îzmîrê, ‘Konferansa Nivîskaran’ tê lidarxisitin. Li dû konferansê, ew qerar digire û bi tenê bi edebîyatê re mijûl dibe. Dîwana wî a ewil “Ratîka” di sala 2002 an de çap dibe.

Di gellek malper, rojname û kovaran de, nivîsên wî têne weşandin. Demeke dirêj di malpera “diyarname” yê de qunciknivîskarî dîke.

Heya niha sisê jê helbest, sisê jê çîrok, heft jê roman ev bûn çardeh berhemên wî têne weşandin. Romana wî “Perde” bi navê “Mahrum” bi Tirkî derçû. Bi tevî kitêvek derheq Cîgerxwîn de hatî weşandin, di kitêva bi navê “Kawayê Min” de û di kitêva kurteçîrokan a ji hêla Şaredariya Amedê ve hatî çapkirin de ew jî yek ji nivîskaran bû.



## NAVEROK

Edebîyata ku li Demsala Xwe a Pêncemîn Dîgere .....	9
Bahol û Sandoqa Cihêzan.....	14
Wênesaziya Bi Qirşûnqelemê .....	17
Ronahiya Bi Qasî Serê Misqalê .....	19
Dengê Vala .....	21
Zimanê Yaşar Kemal, Ferhenga Yaşar Kemal û Ferhenga Yaşar Kemal A Kurdî .....	22
Encam .....	27
Têkiliya Hin Peyvên Kurdî û Akadî .....	29
Koleksiyo.....	33
Edebîyat Hezkirin e Hezkirin Jî Hêzeke Rexneyî Ye .....	38
Destpêk .....	38
1. Trawma û dengbêjî.....	39
2. Trawma û takekes .....	42
3. Trawma û ziman .....	44
4. Trawma û edebîyat.....	46
<b>Mala Matê.....</b>	<b>50</b>
Şerma giran, eyba mezin. ....	51
Feodalî .....	52
Encam .....	53
<b>Oryantalîzm û Felek, Temsîliyet û Metnên Saf .....</b>	<b>55</b>
Rewşa metnên Kurdî .....	65
Jêder:.....	71
<b>Karnavalên Leylî û Şevbuhêrkên Nivîskî.....</b>	<b>72</b>
Destpêk: .....	72
1. Kovar, karnavalên leylî û atolye.....	72

Kovar .....	72
Atolye û nirx: .....	73
2. Bi dîmen mihteşem, bi jiyana xwe varoş û ji alî ziman ve cîyek jicurdeketî .....	74
3. Ên piştî wan diêşiya .....	75
4. Nîyet.....	75
5. Kula Helebê û heqên kitimkirî .....	75
<b>Avakirina Kurmancî .....</b>	<b>77</b>
<b>Avakirin û Afirandin.....</b>	<b>80</b>
<b>Ji Fûara Mishefan a Amedê Ber Bi Fûara Mezopotamyayê Ve .....</b>	<b>83</b>
<b>Edebîyat, Azadî û Serxwebûn.....</b>	<b>85</b>
<b>Filortên Edebî û Şîrove .....</b>	<b>88</b>
<b>Perde.....</b>	<b>90</b>
<b>Di Destana Memê Alan De Bi Dilan Tê Sond Kirin .....</b>	<b>92</b>
<b>Pirên Şkestî û Îzolasyona Gew .....</b>	<b>96</b>
<b>Konferansa Nivîskaran a Li Îzmîrê.....</b>	<b>101</b>
<b>Şeroyê Biro, Kandisky û Foucault .....</b>	<b>106</b>
<b>Çend Parvekirinên Di Medya Civakî De .....</b>	<b>108</b>
<b>Fezayên Piçûk û Xalîçeyên Nû Ên Romanê.....</b>	<b>111</b>
<b>Edebîyata Kurmancî a Kom û Lîsteyan .....</b>	<b>113</b>
<b>Çend Hevpeyvîn.....</b>	<b>116</b>
Xwendevanên Kurdî Di Heman Demê De Xwendevanên Edebîyata Tirkî Ne.....	116
Me bi Cîhan Roj re “perde” da alî.....	119
Hevpeyvîn Bi Helbestvan Cîhan Roj re .....	124
‘Her hunermend, nivîskar divê berheman li ser Heskîfê biafirîne’ .....	129
Heskîf Wekî Sîngeke Efsûnî Ye .....	130
<b>Hewcedariya Edebîyata Kurdî Bi Manîfestoyan Nîn E.....</b>	<b>135</b>
<b>Siyabend û Xecê.....</b>	<b>140</b>
<b>Dara Hejîrê a Li Dîwêr Şînhatî .....</b>	<b>143</b>

Zimanê Ku Di Navbera Sîyaset û Zanîngehê De Dihejiqe .....	144
Nîşeyên Di Deftera Mi De .....	148
Rewşen û Rastiyên Nîfşê Nodî .....	151
Deşîfrekirina Ziman û Têkiliya Bi Objeyan Re .....	157
Xwendina Lêvên Ekolojiyê .....	159
Çend Dûrikên Kurmancî Yên Derdora Gimgimê .....	161
Mala Baz, Edebîyata Li Bakur û Govenda Cinan .....	169
Şer Peyvan Gemarî Dike .....	172
Azadiya xwendevaniyê 'Tirsa taxê' û mercên rexneyê .....	174
Mehmed Uzun: Çîrokeke Dirêj a Nivîskariyê* .....	177
Beşa 1'em: Tarî mîna nivîsê nivîs mîna roniyê .....	177
Beşa 2'yem: Mehmed Uzun û Siya Qelemê .....	181
Rêza Dîroka Nivîsîna Nivîs û Hevpeyvînan .....	194

◀▶

Nifirek heye, “Emrê te bibe mîna emrê pepûkê. “,  
meriv dibêje qey hin qelem bi ber nifiran ketine;  
Sed, sed û pêncî salên dawî, xwendina dîrokê,  
a kultur û edebîyatê li ser devê gellek kesan  
şibiyaye xwendina pepûkê;  
çîroka pepûkê û xwendina êşê li alîkî  
li alî din jî ezber û dengekî bişewat û bi newa!

◀▶



## EDEBÎYATA KU LI DEMSALA XWE A PÛNCÊMÎN DIGERE

Bi serpehatiyeke kurd (dişibe çîroka nivîskariya gellek nivîskarên kurd) a bi seyr, hewqas jî sotîner, ez ê hewl bidim tabloyekê rê bidim ku têkiliya me û zimanê me jî tîne ber çavên mirov; sal 1993. Li Mêrdînê, ez di sendikayekê de rêveber bûm. Bîst û heşt salî bûm. Mixalîf bûm. Mi mamostetî dikir lê rojekê, bi tesadîf, ez haydarî alfabeza zimanê xwe bûm! Metneke bi Kurdî a ku beşek jê ji bo min hatibû xwendin dihat aqlê min û ez haydar dibûm bê heya wî wextî ez ji çî mehrûm hatibûm hiştin! Wê şevê xew bi çavên min neket. Li Tirkîyê, hema bêje bîranînên her takekesa/ê kurd ên derbarê ziman de hêja ye ku bibe babeta romanekê.

Piştî vê destpêkê, ger nivîs ji alî min ve li ser bîrxistinan were sazîkirin û geş bibe, ez ê wê hêviyê bikim ku nivîs fersendê bide dest xwendevan da xwe li xwendinên cuda bigirin.

Edebîyatê her bi bîra me xistiye xwendinên herî zor û bêfeyde ew xwendin in ku li ser “qebûlan” têne kirin. Yek jê jî bi tevî qebûlan, cazîbeya xwendinên sîyasî mesela xwendinê heya diruşmeyan bibe wê dubarebûn û hin ezber wekî neçarî bibin encama çalakiya xwendinê. Bi ser de ger hest jî reng bidê heft dibe heştê helandî.

Li coxrafya me, ti rê û rêbaz nemaye ku “merhemetê” reng nedabê. Ev nêzîktêdayîn carna dikeve halek wisa ku mijar gengêşiya edebîyatekê, danasîna zimanekî an gengêşiya derbarê zimanekî de be jî ew nêzîkahî îhtimal e ku bibe ‘destpêka rê û dawîya rê’. Bi qîlafetên modern be jî, bi ‘ton’ên cuda be jî, merhemeta me, pîrî caran, dibe sebeb em xwe li diruşme, lîste û klîşeyan bigirin. Helbet sebeba bo vê rewşê bi qasî rewşa kurdan, rewşa Kurdî û edebîyata Kurdî rola “qebûlan” jî dikare were destnîşankirin.

Ku merhemet ciyê xwe dide nêzîkahiyên humanîst, di dewsa hewlên parastin û hemetkirinê de helwest û seknên nîrxandin û rexnekirinê xwe didin der, hêdî hêdî metn bi tevî xwendevanên xwe dertên pêşberî nivîskarên xwe, xwesteka têkiliyên demokratîk tê rojevê û bendewariyên wisa li meydanê ne.

Li hêlekê, em rastiyeke bi bîr dixin merhemet, bi awayekê, mirovan hînî neçarîyê dike, li alî din jî êşa rastiye ya sotîner zor e ku were jî bîrkirin. Bi vê mehnaya xwe, pîrî wextan, çî îroniyeke yeman e, hê jî hukmê aqlê me li dilê me nabe! Vêya, ji niha de, weke hinceta hin

rabêjên bihest û romantîk pêşkêş nakim. Wextê 'Kurdî' tê gotin, ez wan zarok an jî dergûşên ku, di çîrçîrokan de, ji bo ji mirinê werin parastin, dixistin hundurê sandoqan û ew diavêtin deryayan, wan zarok û dergûşan bi bîr tînim! Çîroka Kurdî di eslê xwe de hinek jî çîroka wan zarokên di çîrçîrokan de ye. Beriya ku bi Kurdî çîrok were nivîsîn, hînbûna çîroka Kurdî bêhtir muhîm e.

Qada azadiyê were fikirîn, ger Kurdî dergûşek çîrçîrokan be, mûzîk, ya rasttir dengbêjî, bûye sandoqa zimên, li ku ye, ji boz iman bûye derya!

Ciwaniya ziman û edebîyata ku, di sandoqan de, ji mirinê filitîye jî dişibe ciwaniya lehengên sêwî ên di çîrçîrokan de; Kurdî ku di medreseyan de (dibe ku beriya medereseyan be jî lewre di hin lêkolînan de hatiye destnîşan kirin ku gelek berhemên nivîskî ên bi Kurdî wenda bûne, hatine wendakirin) bi edebîyata nivîskî re hevnas bûye, bi beşên din ên zanistê re bes hevnas nebûye.

Bi tevî zemîn hewqas berteng bûye jî edebîyatake klasîk a dikare bibe çavkanî a Kurdî hatiye pê û geş bûye.

Ger em li sed û pêncî salên vê dawiyê bifikirin emê gelek pirsan jî binin rojevê. Hewlên navendparêziyê ên Dewleta Osmanî û gavên ku ji alî wan ve hatine avêtin kurd xistine nav xem û fikarê, îtirazên kurdan bêbersiv mane, encamên serhildanên kurdan jî bûye sebebên berdêlên giran.

Rewşenbîriya kurd (ku bi awayek dewleta Osmanî wek dewleta xwe hesabandibûn) piştî destdayîna xweseriya qismî û bi bandora geşedanên neteweperî ên wê qonaxê re, bi bêqerarî, seknên weke, ka hela wê çi biqewime, halê hêvîkirinê jiya ne. Bi taybetî ew rewşenbîrên ku pevgirêdanên wan bi Stembolê re xurtbûye û bûne şahidê hewl û tevgerên modernbûna Osmanîyan, wan rewşenbîran meyla xwe dane xebatên çand, ziman û edebîyatê.

Rojnameya Kurdistan (1898) û hin xebatên kovargeriyê û xebatên cuda ên edebî zemînekê pêşkêş kirine. Lêbelê piştî salên 1920'î hêdî hêdî rastiyên baldar mijara gotinê ne. Mafên siyasî li dera ha, kurd ji mafê çand, ziman jî mehrûm hatine hiştin. Di sala 1925 an de Hemzeyê Muksî ji berku ji bo Mem û Zîn pêşgotin nivîsiye deh sal ceza li ahtiyê birîn.

Wekî ku hin nivîskaran jî bi awayek derbirine, piştî her serhildanê, êş û wêranî, û encamên dîtir ên serhildanan rewşenbîriya kurd xwe li karê ziman û edebîyatê girtiye; têkçûyîna Bedirxaniyan û xebatên ziman û edebî ên destpêka sedsala bîstemîn, pêkutî û qetlîmên

li ser êzidiyan, koç û sirgûna wan û li Kafkasê geşedanên derheq ziman û edebîyatê de, 1925 Serhildana Hereketa Azadî, Serhildana Agirî û li pey wan xebatên Hawarê, di salên 1970 de xebatên siyasî û li pey geşedanên derbeya 12 Îlonê û koçberiya ber bi Ewropayê ve û li wir gera ji bo xebatên edebî...

Di vê mehneyê de ferqek geşedanên siyasî ên salên 1990'î heye; bi awayek angajeyî siyasî be jî xebatên edebî muhîm hatin dîtin. Xebatên di derheqê ziman û edebîyatê de li ser xaka xwe kirin. Zeman ew zeman bû, li bajarên kurdan, xebatên li ser ziman û xebatên edebî derqanûnî dihatin dîtin.

Kovara Hawar bi tenê gavên modern bi pêş nexistine, piştî klasîkan ji nû ve zemînekê pêşkêş kiriye. Edebîyata ku jê re 'edebîyata sirgûnê' tê gotin ku di eslê xwe de edebîyata dîasporayê ye, ji ber ku ji çavkaniyên xwe dûr bûne, ji alî xebatên edebî ve her ku ji hin îmkanan bêpar mabin jî, wek nêzikahî, takekes esas girtine, ji alî akademîk ve dest avêtine ziman xebatên wan ên bi vî rengî bûne sebeb ku şibakeyên cuda vebibin.

Di salên 1970'de hin gav hatine avêtin lê gavên bingehîn di salên 1990'î de hatine avêtin. Bi gelemperî, li Tirkîyeyê edebîyata Kurdî li ser edebîyata sirgûnê û li ser şexsan tê gengêşin, ev gengêş li cî ne lê gengêşiyên kêmin. Heger ku hûn edebîyata 1990'î neynin rojevê û negengêşin hûn ê bigihijin encamên wisa ku wan encaman xwe ji manîpûleyan dabe der, ew encam kêmin bin, li ser vehesînan hatibin pê, hûn ê pêrgî encamên wisa werin ku li ser sira nezanîn û qebûlan xwe dabîn der.

Lazim e ku gengêş li ser rewşa ziman, bi awayek bi îsrar, were pêşxistin. Lewre heger em, dibêjin edebîyata Kurdî, ev tê wê mehnê ku ew edebîyat bi Kurdî tê kirin. Zimanekî wisa zimanê ku mijara gotinê ye, di edebîyata devkî de gelek berfireh bûye, hew qas jî ji alî erdnîgarî ve rengîn bûye, têkiliya wî û çand û zimanên din xurtbûye. Li alî din hevnasîna Kurdî û çanda nivîskî heya sedsala dawî bi sînor bûye, di sedsala dawî de jî em dikarin bêjin wek zimanekî fîrarî bûye.

Hê jî em behsa edebîyata zimanekî wisa dikin ku ew ziman bêy dibistan e, hewl dide modernîzasyona xwe temam bike. Bi awayek hewlên tomarkirinê, neqilkirinê, parastinê berdewam bin jî di roja îroyîn de edebîyat Kurdî hem edebîyata zaravayan di nav xwe de bi hev nas dibin û bi awayek tabloyek yekgirtî tê pê, em li sêreke li xetên wisa temaşe dikin.

Hêdî hêdî hewlên hestiyariyê cî didin nêzikahî û seknên modern.

Kurd êdî wê rastiyê ferq dikin ku xwendin û qebûlên ji mexdûriyetê pêktên ji bo pêşxistina ziman û edebîyatê ne bes in. Êdî metn têne şîrovekirin. Danasîn û nirxandinên li ser çalakîyên xwendinê têne kirin, rexnegiriya tê pêşxistin û pêşniyarên têne kirin dibin sebab rexnegirî bikemile.

Di salên dawî de serbestiya qismî jî qadek serbestiyê bo Kurmancî û Zazakî derxist meydanê, bi herdu zaravayan ‘tez’ hatin nivîsîn, bi bandora lêkolîn û dahûrînan re pevgirêdanek di navbera edebîyat û warên nû re çêbû. Ev jî bûn sebab xwendin û zemînên cuda derên meydanê.

Hê jî em behsa qadeke wisa dikin ku bi tenê “kurdên xwende” dînasin û bi vê mehneya xwe qadeke gelek elît e ku em behsa wê dikin. (Mijar Kurdî be qismek mezin ji kurdan ne xwende ne û nikairn bi zimanê xwe binivîsînin, weselam, ên bûne parêzer, doktor, mamoste, karmend gelek ji wan jî nizanin)

Em êdî behsa zimanekî wisa dikin ku derbar de gengêşî têne kirin, lêgerînên hêzdar xuya dikin, ziman û edebîyateke wisa ku amade ne da bi hemî qadên jiyane re hevnas bin.

Wekî encam, kêma û kêmbêr be jî lêkolînên derbarê tarîxa edebîyata Kurdî de têne kirin dibin sebab agahiyên nû werin bidestxistin ev jî dibe bingeh da ziman derfetên nû bide xwe û pê re jî hukum li hilberînên edebî dike. Tarîx û çîroka edebîyata Kurdî bi awayek tarîx û çîroka zimanê Kurd e.

Heya niha ew hewlên ku ji bo îspat, qanîhkirin, danasîn, parastin, hemetkîrin, tomarkîrin, neqîlkîrin û vegotinê dihatin dayîn îro mêt dide xwe ku bersiv bide pirsên cuda, ew zemîn e ku ji alî me ve wek zemîna modernbûn û geşedanan e ku em jê re edebîyata dunyayê dibêjin, hewl ji bo têkiliya bi wê edebîyatê re ye. Pirsgirêkên wergerê hebin jî, berhemên edebî ên bi zaravayan têne kirin gera di navbera wan de dibe sebab ku hîmê edebîyata Kurdî qewî be, çavkaniyên wê zêde bin.

Ew zewqa hunerî û estetîkî a di çanda devkî de (dengbêjî) ji ber ku êdî hêdî hêdî ji edebîyata nivîskî jî tê girtin meriv dikare bêje rengê geşedanan jî pê re diguhere.

Xebatên nivîskî bi piranî bi wê nîyetê dihatin nivîsîn daku bîr were nûkirin. Bi wî awayî rabirdû dihate bi bîrxistin da ku hîmek bête danîn. Êdî pêvajoyeke wisa di edebîyata Kurdî de tê jiyîn ku tiştên têne jiyîn û ê werin jiyîn jî dibin rojev, pirs zêde dibin. Bi qasî civak û pirsgirêkên civakî takekes û sêwirînên derbarê takekes de jî

muhîm têne dîtin. Bi qasî tiştê tê nivîsîn, awayê nivîsînê û mehereta nivîskî jî esas tê girtin.

Miletêkî ku bi têkoşîn û bitevger, hewlên wî mîletî ên di warên ziman, hunerê de hin kert û kolan li dû xwe dihêle; heke ku edebîyat û huner reng tevî jiyane dikin, tehmê didinê, wek bayekî hênîk li ser her zevt û zorê dilîlîne û bi lîlandinê re zorê dipişirîne û azadiya xwe, ya ku serbest e, dunya xwe bi bîra me tîne, dikarim bi kêfxweşî derbibim ku di edebîyata Kurdî de bîrxistin û lêgerînên wisa, ceribên wisa mijara gotinê ne. (Helbet ji bîr nakim ku li Tirkiyê salê bi tenê 200-250 mishefên bi kurdî têne çapkirin û rastiyeke me ya wisa jî heye) meriv dikare vê bêje; edebîyata me li demsala xwe ya pêncemîn digere.

Heger mijar ziman be erdnîgariya ziman, qadên jiyana zimên, modernîzasyona wî muhîm e. Wisa tê payîn hilberînên herî bedew li erdnîgariya ziman tê hêvîkirin. Di roja me de, gelek nivîskar êdî li ser wê qadê hildiberin ku ziman li wir heyata xwe dijî. Kurd koçberî her devera dunyayê bûne. Edebîyata dîasporayê bi wê hewlê ye ku têkilî bi edebîyata dunyayê re lidarbixe û qadên cuda ên gengêşiyê derîne meydanê. Bi taybetî hewldanên derbarê wergerê de ehemîyet lê têne girtin. Hin kes li ciyê lê dijîn li wan deveran çavdêrî û analîzên xwe êdî bi Kurdî dinivîsîn, ev gawek hêja ye lewre dibe sebeb ku ziman jiyane cuda binase.

Me bi bîranînekê dest pê kiribû, em dewam bikin; min û xwediyê bûfeyekê me li hev kiribû, rojnameya hefteyî ya bi Kurdî ji bo min dixist nava pêvekek magazînî, wextê ez diçûm cem, bi wî awayî rojnameya bi Kurdî dida min! Ew salên erjeng jî weke sîmbol dihatin dîtîn û mirov dihatin kuştin ne belî bû bê rojnameya ku we dixwend bibûya sebebê çî û çî bihata serê we! Çima ev muhîm e? Lewre di merc û şertên wisa de, ên ku rahêstibûn qelemê, peyv û berên folklorîk berhev dikirin. Bi taybetî kesên li bajarên Kurdan rûdiniştin, ên ku qelem di destê wan de bûn berhevkarîyê muhîm didîtîn. Kedekê bêhempa didan ji bo tomarkirin, nivîsîn û arşîvê.

Nivîskariya me, tiştên ku wê wextê hatibûn berhevkirin û tiştên aniha berhev dikin, ji wan berhevdeyan madetir, berhevdeyan ji qefesan dikin, dixin nava risteyan û berdidin nav bexçeyên xêzan. Piştî vê hevokê, texmîn dikim ê hestê min bes binepîxe, ez ê xwe li “aqlê nivîsê” bigirim û dawî lê bînim, ev xweştir e.

## BAHOL Û SANDOQA CIHÊZAN

Wexta mi axaftina Orhan Pamuk a Nobelê dixwend, wisa fikir hatibûn mi; biherhal Pamuk nivîskarê edebîyata Kurdî bûya ê di dewsa metafora baholê de, wîyê bi sandoqa cihêzan dest pê bikira, helbet hin destnîşanek, bîrxistin weke xwe bimana, mixabin, gellek jê jî ê cudabûna!

Ji bo bi rihetî ji nava meselê derêm, li pey jêgirtinê, bê mi axaftina wî çawa vehesandiye par ve bikim, bi awayek, hewl bidim li ber çavan rabixim bê baholê bo çi sandoqa cihêzan bîra mi xistiye û çi ferq heye di navbera wan de.

*“Du sal beriya mirina xwe, bavê min baholeke piçûk da mink ku nivîsên xwe, destnivîsên xwe û defterên xwe tê de bi cîkiribûn... Ka lê binihêre, got, hinekî bi şermînî, ” Di nav wan de ên kêrî tiştêkî werin hene an na. Belkî li pey min tuyê hîlbijêrî, biweşînî..*

*Li nivîsgeha min, em di nav mishefande bûn. Bavê min mîna kesek ku hêz bike xwe ji barekî giran û bi êş bike, bêyî bizanibe bahola xwe têxe ku derê, di nivîsgeha min de çavbigerî çû û hat...*

*Bavê min wextê dibû rêwiyanê rê û zemanê ne di rê de û carna jê jî ji malê bar dibir çiyê kar ew bahol pê re bû. Tê bîra min, wextê zarok bûm, bavê min ji rêwitiyê dihat, min ew bahol vedikir, alavên bavê xwe yê ji rêwitiyê hatî li nav hev dixistin, bêhna kolonyayê û bêhna welatên biyanî kêf didan min.*

*Ev bahol, ji bo min, alavek dîlkêş bû ku ji rabirdû û bîranînên zarokaniya min gellek tişt bi xwe re hemet dikirin, lê aniha min nekarî dest jî bidimê êdî. Çima? Helbet ji ber giraniya barê bi raz yê tê de veşarî...”*

### **Edebîyat, barekî bi sirûraz!**

“Bahol” bo Pamuk li hêlekê weke mîrateyeke nivîskî be li hêla din darblêdan û destnîşankirina bajêr û bajarîbûnê ye. Xuya ye, weke “alav”, bi taybetî baholê bîr xistiye. Weke rastiyeke li dera ha, Mûzeyaya Masûmîyetê jî were bîra me. Têkiliya Pamuk a bi objeyan re weke rasteqiniyek teknîkî xwe dide der. Herwekî Walter Benjamîn, girangiya wê destnîşankirinê ye ku sîdwegirtina ji çavkaniyên cuda çiqas muhîm e.

“Benjamîn têkiliya xwe a bi jiyane re û jiyana di cîhana xwe a rexneyî, bi taybetî bi tefekura li ser objeyan re saz dike.” (Walter

Benjamin Okumak, Yrd. Doç Dr. Meral Özbek)

Orhan Pamuk (bi rastî axaftineke weke pembû) weke di serûberê axaftina xwe de, wextê derdibe bê edebîyat ji bo wî çî ye derdarî nekiriye, di nêzikahî û şewaza xwe de demokratîk tevgeriya ye û xwendevên di atmosfereke bi razber de serbes hiştiye.

Di axaftina xwe de, bi awayek ku edebîyatê, barek veşarî yê bi giraniyeke bi razûsir bi bîranîna wî, bîrxistina wî ku zorbûna destêwerdana wî barî, rê dide bê edebîyat bo wî çî ye.

”Kêfxweşiya ji bêhna welatên biyanî...” darblêdaneke muthîş a edebîyata dunyayê ye. Di heman demê de balê dide ciyê ‘eleqeya metnan’ (intertextuality) a di edebîyata xwe de.

### **Fikirîna li sandoqa cihêzan...**

Sandoqa cihêzan wê beriya her tiştî ne mîrateyeke nivîskî, hemanên çanda devkî derbibira. Dîsa ji metaforeke bajarî bêhtir ê bîba metafora jiyaneke gundewar. A ku melankolîk be kes navêje dilê xwe, mîna ava çem û kaniya bi şilekî bi êş, huzn û hêsiyan re ê betane şil bikira.

Bi ihtimalekê ê kariba behsa bêhna çandên cuda a heman xakê bikira lê bêhna welatên biyanî ê ne mevzûbahîs ba, di çarçoveya mehneyeke wisa de ji ber ku wê teng û niştecihî ba, pevgirêdana bi edebîyata dunyayê re lawaz ba.

Di roja me de ji bo kesekî kurd bi rasteqîniya sandoqa cihêzan a diya xwe ger dest bi nivîsê bike wê bêhna welatên biyanî hiç nebe mijar? Helbet meriv dikare behs bike, sandoqên cihêzan weke bîranîn, bo destpêka têkiliya bi objeyan re gerek cidî bête dîtin. Ew azî li pêşiya tefekurê ne asteng e. Di heman demê de mere ji vegotîneke “weke pembû” nake.

Bo fehmkirina zarokaniya xwe, dêya xwe -weke jin di jiyane de-, bi gewdekirina rexneya derbar rabirduyê de meriv têkilî bi sandoqên cihêzan re, bi objeyên wekî tirsweyên bostanan û bi gelek objeyan re deyne, bi dubareyî li wan bifikire çawa ku hin ramangeran, mîna koleksiyonerek, têkilî bi objeyan re saz kirine û gellek tişt tevli edebîyat, ramangerî û hunerê kirine. (Bi taybetî me divê em şiklên tirsweyên bostanan û gellek alav û şiklên dîtin û figûrên din bînin bîra xwe, pê re tîrsa ku “fermîyetê” belav dikir jî ger pê re bête fikirîn, hin neçariyên takekes bi mehne dibin)

Bahol û sandoqa cihêzan; bahol weke derbirîneke kesek bajarî ê çanda “bavikti” yê di axaftina Orhan Pamuk de cî daye xwe. Heke

bajarî be jî yê ku geriya ye, bêhna welatên cuda di bahola xwe de biriye û aniyê, mîrateyêke nivîskî hiştiye dawîya dawî “bav” e. Weke tespîteke Pamuk a muhîm û darblêdana wî, hêjayê binxêzkinê ye.

Herçî sandoqa cihêzan e, dê, jiyana jinê mijar e. Bo wê ku meriv li edebîyata me kûr bibe, bo objeyan re, weke fragman be jî (her boxçe bi rengê xwe û bi bêhnên xwe cuda ye) pêşkêşkirina jiyânê cuda, bo bidestxistina şêwazên kemilî muhîm e. Ger bêhnên cuda ên dîtir û biyanî ku werin hîskirin pê re ew xebat werin kirin mehne dibe mijar.

### **Çante... alav... bêhn**

Di edebîyata me de, bi hawê îndîrekt be jî, em pêrgî, “sandoqa cihêzan” tîn, lê weke takekese, ji nêzikahiya li dayikê bêhtir, weke metaforek êşên civakî, durîşmeyî û bi zimanê hîsker sandoq bûye qêrîn. Sandoqan ne melankolî, merezê derbiriye. Rabêj Exlebe di qonaxên şer de, weke gulle hatiye bi şikilkirin ku kurd werin fikirîn pêvajoyên pevçûn û şer gellek dirêj in.

Bi destêwerdana sandoqên cihêzan re em ê gunehên xwe jî teşhîr bikin; bi taybetî, derbeyên ku mêranîyê li edebîyatê dane, em ê birînên ji wan derbeyan jî bibînin!

Bi baholê re çawa derî li me vedibe ger mere bêhna welatên cuda hîs bike, dunyayê bi cudahiyan re têbigihije, sandoqên cihêzan jî, bi mehneyêke dîtir, bi boxçeyên cuda re derî li mere vedibe ku mere parçên cuda ên jiyânê bibîne.

Mesela ku sandoqên cihêzan di destan de bibin bahol mesela zeman e, a ku mimkun e were kirin ev e; gav bi leztir bin, (ka em asta teknolojî tîde ye, xal û geşedanên mirovahî lê ye jî binin ber çavan), bi rîtmekê bazdan jî bo hin kesan îhtimal e, hewqas e, dawîya dawî mere însan e, firîn hê ne mimkun e!

Li gellek bajarên dunyayê, çantê navpî yê hin kurdan jî hene weke mirovên din ên dunyayê. Lê meriv li Kurmancî û edebîyata Kurdî difikire, bê çiqas li objeyên di çanteyan de, li bêhna ku ji çante û objeyan belav dibe tê fikirîn hêjayê lêkolînan e.



## WÊNESAZIYA BI QIRŞÛNGELEMÊ

“Xwendina ji bo xwe” yek ji derbirînên herî xweş e di edebîyatê de, pê re mexsed, armancên mezin, hêviya îstifade û berjewendiya a ji metnên din bi meriv re namîne, ev jî dibe sebab xwendinek ri-het, serbest, bi kêf û bi têtikiliyeke normal biqewime.

Di xebatên edebîyata honakî de, mi her hewl da ez xwendinê “ji bo xwe” bikim çimkî çî ji çanda devkî be, çî jî ji rewşa me û rewşa zimanê me yê qedexê be, ji jiyana me be, em hîn bûbûn, di her tiştî de, li tiştêkî bigerin; xeyalên me, hêviyên me, neçarî û serpêhatiyên me... em dikirin lêgerîner û bendewarên “tiştêkî”. A muhîm, ew tişt ne şert e ku fînal be, ne şert e ku bi leheng an jî fikrên mezin re eleqedar be, tişt carna rasthatinek e, an jî qewimîneke ji rêzê û “gotineke di cî de ye”! Muhîmtir, reng û dîmen in, tişt li ciyekê dibe hez bo merivan. Ji lewre di şevbuhêrkan de ev jî dihate gotin, “Tu çî dibêjî bêje, bila hinekî kêfa me re.” Heger xweş nehatiba vegotin, “Ka me çî zewq ji te û ji çîroka te girt!” Heger sohbet û şevbuhêrk derheq jiyane de bana û meseleyên fikrî hebana, rewş diguherî ku biwêja, “dengê vîkîvala” dihat bikaranîn, we çî bigota gerek bi mehne bûya, te dubare û ji rêzê bana, “ji sibê heya êvarê qise bikî çî fêde ye, dengêkî vîkîvala” Ji derî edebîyata honakî, bi pexşanan re, ew cidîyet û berpîrsiyarî dibe mijar, meriv hem ew zarok in bi mahr re dilîzin, hem jî ew kes in gerek “vîkîvala nebêjin”!

Bo kêfê, bo zewqê jî hêviyên dîtir ne lazim bûn, sade û saf... Di zarokaniyê de, digotin mahr bi dergûşan venadin, dergûş dikarin bi mahran re bilîzin! Jiyana rojane a mirovan, bi awayek, weke mahr bû, wisa ku gerek we mahr netirsandiba, hûn bêy tevdir nemana! Di çalakiya xwendinê de, heke meriv karibin bibin dergûş, ew pêvajoya xwendinê weke pêvajoyeke surîştî diqewime, mahr bi merivan venade.

Çima xwedninê weke mahr bi bîra we dixim, Kurdên Êzidî nivîsê dirust nedîtine û heya çil sal beriya niha jî wisa bûye. Bi tevî çandê devkî a hew qas dewlemend, bi tevî têtikiliyên zimên ên bi zimanên dîtir ên li şaristaniyên weke Mezopotamyayê, Kurdî ji nivîsê dûr maye ku hew sebebeke ku îro tê zanîn ew e, bêdewletî, rewşa bêy statu ye...

Ew û gellek rastiyên din li pey hev nebûne sebab da ku têtikiliya Kurdan a bi hunerê re qels bimîne; dengbêjî, di her pêvajoyê de, dilê mirovan zevt kiriye, çî ji alî lîrîzmê be çî jî romantîkbûyîna miro-

van be di her şertî de ew xwedî kirine.

Mi hêza estetîkê di xebatên qelesa qirşûnî a mamê xwe de dîtibû. Wî, wisa bi qelemê digirt, qelem di destê wî de, qey firçeya arkeologekê bû hewl dida toz û xibara li ser mayîndeyekê paqij bike. Pêşî çav çêdikirin. Çavên saz dikirin gellek bandor li mi dikir, di xoratniyê de mi bi heweskarî ji çavên mezin hez dikir. Mi dikir nedikir ez bi ser wê sir û sêhrê nediketim!

Her ku mi êş, derd û arîşeyên jiyanê dibihîstin an jî dijiyam, weke alternatîf, wêneyên mamê mi çêdikirin dihatin ber çavên mi, sira wêneyên sazkerî gellek bi ser sira çîrçîrok û destanan ketibû, li gorî hişê xwe lê difikirim, bi qelemê meriv, dikare biguherîne lê çîrçîrokan her kesî vedigot û mi nedikarî biguheranda! Wêneyên mamê mi û wêneyê şahmaran yê li ser etamîn, rojnameyên reşûspî ên bi hevîr bi dîwêr ve hatî zeliqandin, odeya textinî ji bo mi kiribûn sir, dunyayek xeyalan, êvaran lampeya gazê dixistin xizneyê (araviya wê kêr dikirin) dem êdî dema xeyalan bû, li ser dîwêr, ji siyên mirî mi çi çêdikir û çi çênedikir!

## RONAHIYA BI QASÎ SERÊ MISQALÊ

“Bi qasî serê misqalê be jî ronî bi min ve xuya nake.” Di çanda devkî a kurdan de, hem ji alî edebî ve hem jî ji alî zor û zehmetiyan ve, ew biwêj dikare me bi ser gellek rêyan bixe. Bêhêvîbûn sînorê herî teng ê jiyane bû; êş, azar, çîrokên erjeng û serpêhatiyên di dilan de mayî, ên nehatî vegotin tên bîra merivan.

Di salên nodî de, li Bakur, carek din, têkiliya bi edebîyatê re bû sebeb mirov li hêviyê bifikirin. Her kes amade bû bibe helbestvan, nivîskar çimkî çîrokên jiyana wan ên ‘bêdawî’ hebûn, ew melzeme heta hetayê besî wan bû!

Din nav van sî salên dawî de, gellek kesan roman, welew helbestên “melzemeyên xwe ên bêdawî” nivîsîn, mixabin, şahidî jê re kirin “ew melzeme” bi tenê têra romanekê welew çend helbestan dikin, alyê hunerî jî li dera ha; kesin têkçûn, kesin trajediyên nivîskariyê jiyandijîn û helbet ên ketin nav lêgerînan, ên serê xwe bi edebîyatê re êşandin. Ew çîrok bi naverok û şiklê xwe gellek guherîbe jî bi awayek dewam dike; melzeme, mexsed, mexdûriyet sê têgeh in ê çarçoveyê bînin meydanê.

Tîbûn, valahî û hewcedariyeke wisa mijar bû di pexşanivîsê de, kesên li ser lêzimên xwe (fîgurên dîrokî, edebî)lêkolîn dikin, kesên xwebixwe erkê digirin û ‘weke şexs’ ji wergerên Tirkî têgehê diafirînin, her kesa/kesê ku dest bi nivîsîna Kurdî dike di heman demê de xwe weke parêzvana/parêzvanê ziman dibîne; her tişt, pergala fikirinê, li gorî sîyasetê, gav û nêzikahiyên sîyasî tê pê, ew jî dibe sebeb jixwebaweribûnek ecêb bibêje, “Min kir, bû û çû! Sîyaseta ku gellek derî û dezgeh pêşkêş kirin di heman demê de “xeydokên xwe” afirandin. Qada edebî kulturî ji bo xeydokan defetek bû ku ew di demeke nêz de meşhûr bin, vegerin li hemberî ‘sîyaseta xwe’ heyîbûna xwe îspat bikin heta sîyaseta xwe dawetî meydanê bikin.

Ev di warên îdeolojîk de wisa ye, ji şoreşgeriyê ketibe di warê dîndarî, mihefezekarî de jî wisa ye, arîşe ew e di qada sîyasî de Kurd bi tenê bi dîroka sîyasî re eleqedar in.

Ew coş, îtiraz, hewla îsbatkirinê, aloziyên nivîsê, têkiliya bi melzemeyan re, parastina ziman ya bi durîşmeyî, lêgerînen ilmî û edebî ên hindik (ji mercên wan wextan), texlîdkirina şewaza serdestan ya weke, ‘binihêrin em kî ne, çiyê me hene û çi nîn in’ û aloziyên dîtir di roja me de bûne pirsgirkek nû, acizî û dîtina tengasiyên li pêşî

îtirazên nû tîne pê êdî di medyayê de weşandina dirûşme û qalibên romantîk ji bo girseya edebî nabe bersiv çimkî xwendekarên zanîngehê bi zeman re, kemilîn, bûn xwendevanên edebîyata Kurdî, gellek jê jî êdî bi temkîn tevdigerin, hema dest navêjin qelemê, hewl didin bixwînin. Çalakiya xwendinê merheleyeke herî nêz û bi mehne ye li Bakur. Ew çalakî di demên pêş de ê bibin sebeb gellek gav û rabêjên hatî însa kirin hilweşin. Bi kurtî, dengê gavên nixandîna tîna...

## DENGÊ VALA

Biwêjeke weke, “dengê vala” heye di Kurdî de, bo wan kesan tê gotin ku di axaftina wan de tu mehne nîn e, “Ji sibê heya êvarê qise dike, dengê vîkîvala.” Ev biwêj, bi awayek jiyana civakî ya Kurdan dida der ku ew ji pêşkeftinan, ji sînayî û modernîzmê, ji bajarvanîyê dûr mabû, di jiyana gundewar de jî exlebe mirovan heman tiştî digot, weke jiyane gotin jî dubare bûn... Têgeha Michel Foucault, “girtîbûna mezin” heke li welatan an jî li miletan bê girtin herhal Kurd jî ciyê xwe li rêzên pêş digirin.

Li vir, ji derî analîz û bîrxistinên rewşên sîyasî, ez ê dest biavêjim peyva “jiyîn” ê, ji bo Kurmancî xwedî çîrokeke bi mehne ye; asîmîlevanên vî zimanî jî bi awayek heyirî mabûn, mane bê çawa Kurdî jiya, têk neçû! Çîroka jiyîna Kurdî çîrokeke bi seyr e, ew qas jî ji bo kurdek ciyê şanazyê ye; pirî caran hin kurd rexne li xwe û li rabirduya xwe digirin bê ji bo çi ketibûn halek perîşan. Lê ku însan bi çavekî dîtir binihêre, însan dikare bêje ku bi tevî ew qas mercên xirab, parastina Kurmancî bi tenê diyardeyeke muhîm e.

Li Bakur, ji bo bîst salên dawî, qewimînên di qada ziman û edebîyatê de, serpehatiyên nivîskaran hêjayê lêkolîn û analîzan in.

Li gorî dîtina xwe, me, zimanê xwe diparast bi wî awayî; edebî bûya ne edebî bûya me ji xwe re nedikir xem. Piştî salan, me yê bidîta ku me jî ne bi qasî serdestên xwe be jî xisarekê dida zimanê xwe ji lew nivîsên me, ji hunerê madetir belavok, diruşme bûn! Rastiyeke heye ew jî ev e ku ji qelîteya edebî bêhtir her nivîsek bi awayek berhevkirineke folklorîk bû jî; tê de peyvên herêm û qadan, biwêj, gotinên pêşyan... hebûn.

Me ji zimanê xwe hez dikir, me hewl dida em zimanê xwe biparêzin lê mixabin zimanê me, bi awayek din, bi me jî ‘nenas’ bû!

Çîrçîrok û efsaneyên vî zimanî hebûne, dengbêj û mûzîkjenên vî zimanî... Zîn, Edûl bi vî zimanî axivîne... Kurdî bûbû delav, gol, bîr... Avek bû, ava di golan de genîbûyî... Îro zimanê me çemekî ye, çemek ku şilo diherike...

Çîroka zimanê me yê “nas” berdewam e.

## **ZIMANÊ YAŞAR KEMAL, FERHENG A YAŞAR KEMAL Û FERHENG A YAŞAR KEMAL A KURDÎ**

Nivîskarê edebîyata Tirkî, Yaşar Kemal ji alî qismek Kurdan ve, ji ber nêzikahiyên ji hestiyariyê, bi xeyd tê pêşwazî kirin; bi gazin in bê çima Kemal bi Kurdî nenivîsiye. Bersiva pirsên wisa ne mijara vê nivîsê ye. Nêzikahiyên wisa dibin sebeb ku edebîyata Yaşar Kemal, çavkaniyên edebîyata wî, zimanê wî, ferhenga wî, terz û teknîka nivîsevaniya wî neyê gengêşin. Pirsên weke, çima Yaşar Kemal bi Kurdî nenivîsi ye pirsên teng û ji rêzê ne. Qebûlên wek, Yaşar Kemal nivîskarekî edebîyata Tirkî ye, ne hewceyê tiştêk din e jî, bi heman awayî, nêzikahiyeke teng e...

Gelo çavkaniyên şêwaz, teknîk û zimanê wî çi ne? Pirsên wisa bi qasî Edebîyata Tirkî ji bo Edebîyata Kurdî jî pirsên hêja ne. Di Edebîyata Tirkî de behsa “Zimanê Yaşar Kemal” tê kirin, Ferhenga Yaşar Kemal hatiye amade kirin. Di vê nivîsê de di beşa yekem de, em ê hewl bidin balê bidin zimanê Yaşar Kemal, di beşa duyem de jî em ê ji nav “Ferhenga Yaşar Kemal” “Ferhenga Yaşar Kemal a Kurdî” pêşkêş bikin!

1

Çi ji alî naverokê be çi jî ji alî mekan û sêwirînê ve be, heya niha edebîyat û berhemên Yaşar Kemal bes hatine analîzkirin; Yaşar Kemal di edebîyatê de ziman gelek muhîm dîtiye. Ew li Çukurovayê hatiye dunyayê, Çukurovayê wekî welatê nivîskariya xwe dîtiye lê ji alî bîrê ve, bîra ziman û derbirînê ve Wan, dengbêjî û destanbêjîyê şikil daye zimanê wî. Ew weke referansên edebîyata xwe Dadaloglu, Karacaoglan... Bi bîr tîne.

Yaşar Kemal, di hevpeyîvîna ku Alain Bosquet pê re kiriye (1990) di wê hevpeyîvînê de gotiye, “ tiştê min dixwest ew bû ku ez awayek nû yê vegotinê bi dest bixim, zimanek nû bi dest bixim. Edebîyata devkî a ku min xweş pê dizanî bi zimanê nivîskî re baş li hev nedikir... Taliha min ew bû bi qasî ku min feyde ji zimanê Tirkî, derfetên vegotinên Tirkî feyde wergirt ew derfetên min hebûn ku ez ji Kurdî jî derfet bigirim... Di helbestan de, di nivîsan de min hewl dida Tirkiya candar ya dewlemend a Çukurovayê û zimanê nivîskî pev girê bidim... Di ziman de ez gelek di bin bandora Karacaoglan de mam...”

Bo çavkanî û rastiya edebîyata xwe ji derî wan têkiliyan têkiliyên xurt ên bi jiyane re jî bi bîr xistine, behsa torta şaristaniyan kiriye. Lê zimanê wî, şewaz û teknîka romanên wî bo me xem e ku heger “Zimanê Yaşar kemal” mijar be ev serkeftina herdu zimanan e; ger Kurdî bi awayê vegotinê, bi reng û deng, bi teknîkên taybet di nivîsevaniya wî de xweş bi bandor be, Tirkî jî bi derfetên xwe ên vegotinê, bi têkiliya bi jiyane re ya aktîv û bi têkiliya bi çandinî û bajarvaniyê re bûye taqeta zimanê wî. Hêja ye meriv van gotinên Kemal bi bîr bixe:

“Tirkiya di zarokaniya min de û Tirkiya nivîskî gelek ji hev cuda bûn. Tirkiya nivîskî Tirkiyek feqîr bû.” (Yaşar Kemal kendini anlatıyor, Yky, 4. baskı, 1990, rp, 95)

Her Kurd bi wê halê zor dizane bê wextê meriv bi Kurdî difikire û bi Tirkî diaxive çi tevlîhevî tê jiyîn. Wextê ew dibêje, Tirkiya di zarokaniya min de, bê ka meriv çawa şîrove bike, bi tenê weke Tirkî were hişê merivan an têkiliya Kurdî-Tirkî ya ecêb û ne serast ku bi serê xwe detay û diyardeyên wisa hêjayê lêkolînê ne.

Gotinên wî ên di derbarê dêya wî de ji bo ziman û şewazê ne, ew gotin in ku meriv bi bîranînen zarokaniyê ve lê bifikire û bide hêlekê:

“Bîra diya min gelek xurt bû... Gelk xweş jî diaxivî. Mixabin Tirkiya wê pir pir hindik bû. Belkî ji destanbêjekê xweştir diaxivî. Wextê wê destanekê, çirçirokekê, bûyerekê vedigot her kes lal û mat dima neçar diman li devê wê binihêrin. Ez jî heyranê vegotina wê bûm. Vegotinên wê ez xweşraz dikirim.”

Di zarokaniyê de, qehremanên malbatê, kesên malbat hurmet lê digire ew kes şop li ruhê merivan dihêlin. Evdalê Zeynikê ew kes bûye weke nîşana şanaziya malbatê bûye. Wextê koçî Çukurovayê bûne, hinan xwestiye alîkariya malê dinê bidin wan. Malbatê gotiye, em ew malbat in Evdalê Zeynikê li diwana malbatê çong daye û kilam gotine, em alîkariyê qebûl nakin.” Kesek di jiyana malbatî de bûbe nîşana şanaziyê ka ji bo zarokekî tê çi mehneyê, heger ew kes dengbêjekî wek Evdalê Zeynikê be bi dengbêjî û destanbêjiya xwe çî bandora xwe heye hûn texmîn bikin. Teknîk û şikilgirtina vegotin û nivîsevaniya wî mijar be, danehev û hevzeya ji rastiyan wisa teşgirtî hêjayê bîranîne ye.

Ev tespît û destpêka bo pirsekê ya Alain Bosquet balkêş e:

“Di gelek romanên we de, di heman pîleya bi raz de, em pêrgî kesek din tîn; ew tê û dikeve navbera herikîna bûyerê û bi deng û

derûniyek guherî ya ji nişka ve, pêşkêşvaniya romanek dîtir ya di romanê de an jî pêşkêşvaniya lîskek tiyatroyê ya di nav trajedyayekê de dike. Ev parsekek e; an jî hozanek gerok, kor, zana, hozan. Bi kurtî, ne bi aqil û hêzek derbasder (geçici) li ser hişan bi hukum e, bi taqeta xweşraziya gotinê li ser hiş hukum dike...” hb, rûpel, 175)

Bi xwendina van gotinan re, aniha, slûetê Evdalê Zeynikê tê ber çavê me. Yaşar kemal, di bersivê de wisa dibêje:

“Ev adetek kevn e. Di çirokên me ên kevn ên gel de, di destanên kevn de awayê vegotinek kevn e.” (hb, heman rûpel”

Bi gelemperî, Yaşar Kemal ji bo nivîsê çî derfet, çavkanî û têkilî hene yek bi yek, bi ked û nêzikaheyek kûr, ji bo cîhana xwe ya edebî kirine derfet û serkeftin.

## 2

Alli Püsküllüoğlu bi navê “Ferhenga Yaşar kemal” di sala 1973 an de ferhengê amade kiriye. Gotiye, “Peyv, biwêj û gotinên pêşiya ên di ferhenga Yaşar Kemal de di ferhengên gelemperî ên ziman de (Türkçe Sözlük, Büyük Türk Sözlüğü, Meydan Larousse, Büyük Lügat ve ansiklopedi vb) nîn in. An jî bi şiklên dîtir gelek jê kêmtêne dîtin. Beşek ji vana di nav ferhengên berhevdeyî de jî nîn in. Ji vê hêlê ve ev ferheng ferhengeke gelek taybet e.”

Ali Püsküllüoğlu di ferhenga xwe de mehneya peyv, biwêj û gotinên pêşiya der biriye. Ên ku ez jê bawer im ku bi Kurdî ne û li devera Serhedê têne bikaranîn min bi tenê ew li vir lê kirin, ji ber ku mehneya wan ya Kurmancî ji alî her Kurdî ve xweş tê zanîn, ji bo nivîs dirêj nebe, min mehneyên wan ên Kurdî û mehneyên bi Tirkî ên Ali Püsküllüoğlu lêkirine nenivîsîn.

“AĞZI AŞAĞI”

“deverû”

“AĞZI AYRIK KALMAK”

“dev vekirî”

“AKLINA TIP ETTİ”

Got, tip, û ket aqil

“ALAF”

Alav, arav



“ATLAR TEPİŞİR ARADA EŞEKLER ÖLÜR.”

Şer şerê hespan e di navê de ker dimirin.

Ker dikin hesp dixwin.

“AYRI BAŞ ÇEKMEK”

serî dikişîne,

“BAĞIR DÖĞECEKLER”

Ê rojekê li sîngê xwe bixe, ez niznaim ew roj kîjan roj e

“BAŞ ETMEK”

Serî kişandin

“BİN YILIN BAŞI”

Ji hezar salan carê

“PEL PEL BAKMAK”

Pêl pêl nihêrîn

“BİR İPLİK ÇEKSEN KIRK YAMA DÖKÜLÜR.”

Takî jê were kişandin hezar pîne jê diweşin.

BİR SÖZÜNÜ İKİ ETMEMEK”.

Yeka wî/wê nake dudu.

“CANI CESEDİNDEN ÜZÜLMEK”

Wer westiya me ji can û cesedê xwe da ketim e.

“DEPİK”

tepişk

“EKMEĞİNE SEBEB OLMAK”

Tu bû sebebê nanê min

“ELİN AĞZI TORBA DEĞİL Kİ ÇEKE BAĞLAYASIN”

Devê xelkê ne çewal e merû bidirû

“GERNEŞMEK”

girnewkî

“GİTGEL AKILLI”

Aqlê wê/wî tereûtê

“GÜNDÜZ GÖZÜ”

Bi çavê royê

“HATIRINDAN GEÇEMEMEK”

Ji xatirê yekê/î derneketin

“HERKESİN BİR DERDİ OLUR, DEĞİRMENİNKİ DE SU”

Aş aş e dîsa bi derd e, derdê aş jî av e

“KAN TERE BATMAK”

Di nav xwîn û xwêdanê de mayîn

“KAN UYKU”

Ketina xewa xwînê

“KENDİR”

Kendîr, kindir

“KERME”

kerme

“KESSEN BİR DAMLA KANI AKMAMAK”

Tu kêrê lêxî xwîn jê nayê

“KIRAK”

qerax

“KIRP, DİYE”

xirp

“KÖTEN”

kotan

“KULUNÇ”

qolinc

“KURDUN AĞZINA KAN DEĞMEK”

Gurê dev bi xwîn

“KÜNCÜ”

kuncî

“KÜRNEK”

kurn

“OMUZU KOPMAK”

Nav piyên min qetya

“ÖLÜDE SES VAR, (ONDA) SES YOK”

Deng ji miriyan tê ji wê/wî nayê.

“SAP”

sap

“SARAT”

serad

“SARAT GİBİ ETMEK.”

Kir mîna seradê

“ŞELEK”

şalag

“ŞIVGA”

şiv

“TELİS”

telîs

“TRİNK”

trîng

“ZAR AĞLAMAK”

Zarezar

### **Encam**

Bi taybetî ger Edebîyata Kurdî meram be, detay û gelek hêlên edebîyata Yaşar Kêmal hêjayê têgihîştinê ne. Bo edebîyata Kurdî Evdalê Zeynikê, qelemên destpêka sed sala bîstan, qelemên Hawarê çiqas hêjayê lêkolîn û têgihîştinê ne, Yaşar Kemal jî ew kes e ji gelek hêlan ve were lêkolînkirin û têgihîştin, heta taybetiyeke Yaşar Kemal jî ew e ku di edebîyata wî de rasthatin û têkiliya Kurdî û zimanek dîtir mijar e, her ku ew têkilî ne têkiliyek bi hemd û serbest be jî... Ew têkilî bi her halê xwe di “Ferhenga Yaşar Kemal” de li ber çavan e.



## TÊKILIYA HIN PEYVÊN KURDÎ Û AKADÎ

Dostekî hêja gote mi, tu tenê di warekî de binivîsî ê çêtir be. Bi awayek normal, gotina wî li cî ye lê mi jê re go, ez ji bo “wî warî” bi her warî re, weke xendevanekî, mijûl im, belê ez hewl didim roman binivîsim lê zimanê pê karê nivîsê dikim, coxrafya wî zimanî, jiyana wî zimanî, tarîx, tarîxa edebî, têkiliyên zimên, welhasilî, çi war û zemînên kgerek di dibistanan de ez pê perwerde bibûma di wan waran de, aniha, neçar im yek bi yek bixwînim, bo romanûsiyê.

Wextê dixwînim bertekî têne pê; fikrên cuda, pêşniyar, tespît û xalên balkêş dibin mijar, ez hewl didim wan bi nivîsan re par ve bikim da ku ciwan û kesên eleqeder serê xwe pê re biêşînin. Derdê mi ne ew e ez bi nivîsên cuda re nasnameyên cuda bi dest bixim ku bi dubareyî dibêjim, hewl didim di warê edebîyata honakî de karê xwe bimeşînim, ger mebest nasname be karê mi romanûsî ye.

Rastiyek din jî ew e bo analîz, şîrove û nirxandina hin rastî û dîtinan, sînorek hişk yê “pisporî” jî xeletî ye, em bi gazin in ku dîroka me jî ji alî me ve nehatiye nivîsîn, baş e, dema xwendin, analîz û nirxandinan e ku danehevek were pê. Helbet haydar im ku îro ro gellek kesên delal, bi rê û rêbazên ilmî lêkolîn û xebatên hêja dikin. Tê gotin ku “çavên edebî” bi kitekit û bi detay in, xwendinên edebîyatvanan jî, weke çavên sêyem, belkî bibin sebebê pirsên dîtir.

Mijara vê nivîsê jî warekî pisporî dixwaze, jê re lêkolînên ilmî lazim in; gelo ji bo çi destêwerdana nivîseke wisa? Sebeb, pirs û bersivên dîtir jî hene, bi kurtî, bi bîr dixim sebeb û egera sereke hewla nasîn û têgihiştina Kurdî ye, em hewl didin bi wî zimanî berhemên edebî bisêwirin. Di pêvajoya nivîsînê de melzemeyên esasî peyv in.

Bîrxistin û bîranînên peyvan, rehên wan, mehneyên ew didin der, têkiliya peyvan a bi zimanên dî re, têkiliya peyvan ya bi jiyane re, rewşa wan a heyî, guherînên di peyvan de hatî pê, bo edebîyatvanekî muhîm in. Ji ber ku em bi zimanê xwe perwerde nebûn di gellek hêlan de valahî û meraq hene. Ew dibin sebeb em bibin xwendevana/ê gellek waran. Helbet di xwendinê de exlebe piştî xwendinê, di nivîsînê de temkîn, hed û baldarî muhîm e çimkî îhtimal e ku meriv wextê hewl dide “xan” bike, nîyet baş be jî, carna meriv xirab dike!

Bi vê baldariyê, mi “Büyük Sümerce Sözlük” a Nafiz Aydın (Türk Dil Kurumu Yayınları, Ankara, 2013)xwend. Aydın dibêje, ” Akadî

wextê hatine Mezopotamyayê kultura Someriyana qebûl kirine.” Hin peyvên bi Kurdî ên ku aniha dijîn û ji alî mehneyê ve ez jê bawerim mi xwest ez têkiliya wan peyvên û Akadî bi bîr bixim.

Di heman ferhengê de tê gotin piştî hilweşîna Împeratoriya Babîl û Asûriyan hukmê Akadî nemaye ku ew şesid sal beriya zayînê ji sehneya dîrokê dûrketine, ev jî tê wê mehnê ku peyvên li jêr ên bi Kurdî beriya 2630 salî têkiliya wan bi Akadî re hebûye ku heya roja me hatine. Tiştêk din a balkêş ew e ku Aydin destnîşan kiriye, di sala 1802 an de, zanyarê Almanî G:F:Grotfend, ji Farisiya kevin sûd wergirtiye bi wê sayê zimanê mixî ku zimanê nivîskî ê Someriyê jî nav hev derxistiye. Ev giş bo Kurdî jî bi mehne ne. Mixabin nivîsevaniya me hê nû tê ser hemdê xwe ku me hê BabaTahirê Hemedanî, Vîs û Ramîn û gellek berhemên din jî nenasî ye, têkilî pê re dananiye bi awayek vehewîner, analîtîk û edebî, di qada edebî de ew bi cî nekirine.

Beriya salan bi saya xebateke Selahaddin Mihotulî mi xwendibû, têkilî di navbera gellek peyvên bi Kurdî û zimanê Hititi de jî heye. Ka di zaravayên din ên Kurdî de çiqas peyvên ku têkiliya wan bi zimanên din ên qedîm re heye ew hêjayê lêkolînan e.

Warê mi, sînorê xwendina mi û rastiya mi hew peyva “têkiliyê” dide ber mi, jê pê ve ne tespît ne jî îdayên din li ser min dimînin ku bêjim.

Baş e, ev çima muhîm e; Kurd dibêjin “zimanê me dewlemend e”, “mirov diheyirin ku zimanekî ketibe halekî wisa çawa heya niha jiya ye”, di sa polemîkên derheq tarîxa Kurdî de jî carna tene rojevê. Kurd bi xwe hin bersivên êdî bûne qalib didin, “dengbêjî bû sebab zimanê me heya roja me were”, “dayikan zimanê me parast”, “rewşa coxrafîk” û “halê îzolekirî”... bûn sebab. Baş e, ev giş jî egerên derveyî zimên in.

Gelo, sebabên ji ziman xwe bidin der nîn in, bi gotineke din, ziman xwe bi xwe neparasti ye? Bersiva pirsên wisa erênî ye çimkî têkiliya Kurdî ya bi zimanên qedîm re, têkiliya Kurdî a bi şaristanî û bawerî û olên coxrafyayê re, têkiliya Kurdî ya bi destan û berên folklorîk û afirîneriyê re gerek were dîtin, dewlemendiya vî zimanî li ser wan têkiliyan were gengêşin û lêkolînkirin ê ciyê xwe biedilîne. Helbet bandora yasayên vî zimanî jî ne bandoreke ji rêzê ye.

Têkiliya peyvên li jêr bo pirs, gengêşî û analîzên cuda weke bîrxistinekê ye. Peyva bi Akadî, “tinûrum” bi Tirkî, “fırın” bi Kurdî, “tenûr” têra xwe zelal, safî û delîl e bo têkiliyê.

AKADÎ: sûrum TIRKÎ: saban izi KURDÎ: şopa ku weke cî pê tê kifşkirin; “heya wê surumê cot bike.

AKADÎ: assakum TIRKÎ: şeytan, cin KURDÎ: sukum, tu li sukumê wî/wê binihêre.

AKADÎ: darûm TIRKÎ: ebedî, sonsuz KURDÎ: “Li dara dunyayê”, qey dar li vir mehneya ebedî ye.

AKADÎ: pû petûm TIRKÎ; ağzını açmak, dudak bükmeK. KURDÎ; “Çi devûlêvê xwe dibî û tîni, pitepita te ye”, gelo eleqe heye!

AKADÎ: şabûm TIRKÎ: arzu etmek, istemek KURDÎ: şabûn

AKADÎ: şalûm TIRKÎ: tekstil, dokuma KURDÎ:şal

AKADÎ: hurum TIRKÎ: delik, oyuk, in KURDÎ: “Tu çi hurum î” kesê wehş, cahil, weke tu ji teze ji şikevtê derketî yî!

AKADÎ: tinûrum TIRKÎ: firin KURDÎ: tenûr

AKADÎ: zamarum TIRKÎ:şarkı, türkü, sevinç çığlığı KURDÎ: zêmar

AKADÎ: sursum TIRKÎ: bir ağaç türü, köknar KURDÎ: ew alavê darinî-textinî ye ku pê dew dihat kilandin.

AKADÎ: kaşum TIRKÎ: tarak KURDÎ: qeşawî, “Ga qeşawî bike.”

AKADÎ: şer TIRKÎ: üzerine KURDÎ: ser

SOMERÎ: gir TIRKÎ: öfke KURDÎ: gir, “Te çi girê xwe di mi daye.”

AKADÎ: inanna TIRKÎ: şimdi, hemen şimdi. KURDÎ: aniha, anha, ana

AKADÎ: sabatûm TIRKÎ ;şubat KURDÎ: sibat

AKADÎ: adarûm TIRKÎ: mart KURDÎ: adar

AKADÎ: nisannum TIRKÎ: nîsan KURDÎ: nîsan

AKADÎ: qutrum TIRKÎ: duman KURDÎ: qurum

AKADÎ: egerrum TIRKÎ: söz, beyanat, ifade, şan, şöhret KURDÎ: eger

AKADÎ: sarum TIRKÎ: rüzgar, fırtına KURDÎ: sar

AKADÎ: kirşum TIRKÎ: parça, eser, kırıntı, tüfek KURDÎ: qirçûm, ”wan qirçûmên li ber pez bigire”, parçe, qet.

AKADÎ: sarbum TIRKÎ: soğukluk, soğuk KURDÎ: sar, serma.

AKADÎ: dalalum TIRKÎ: övmek, şükretmek KURDÎ: delal

AKADÎ: adarum TIRKÎ: dikenli bir bitki, gül. KURDÎ: Ew mehne dibe ku bo Kurdî jî derbasdar be?

AKADÎ: zîqîqum TIRKÎ: bulaşma KURDÎ: zîqûm; wextê yek ji ber xwarina bêy fesal, bi lez û pir dikuxe, an jî ji zekemê dike pişkîni “zîqûm, zîqûm” tê gotin.

AKADÎ: banûm TIRKÎ: iyi, güzel, hayırlı, harika, tatlı, nefis KURDÎ: banû

AKADÎ: labasum TIRKÎ: giymek, giyinmek, sarmak, örtmek, kaplamak KURDÎ: libas

AKADÎ: sehrum TIRKÎ: tütsü, buhur KURDÎ: sêhr

AKADÎ: nirum TIRKÎ: boyunduruk KURDÎ: nîr

AKADÎ: susum TIRKÎ: meyan kökü KURDÎ: sûs

**Nîşe:** Îro 15 ê meha 2018 an e, vê nivîsê bo bîranîna Celadet Alî Bedirxan dinivîsim ku wextê navê wî dibihîzim, pê re, sê têgeh tene bîra mi; “ziman, hawar, ronahî”



### Pratîkên dikarin bibin koleksiyon...

Dîrokeke me ya nivîskî tune. Ji bo civakeke wisa, ji bîranînan bigirin heya berhemên devkî, şahidî, serpêhatî... dikarin bibin koleksiyonên hêja.

Rosalind Coward û John Ellis'ın di kitêba bi navê, "dil ve maddecilik" (ziman û kangerî)de wisagotine:

"Hemî pratîkên tevahiya civakî pêktînin ji ber ku di nav zimên de hene, gengaz e ziman weke ciyek wisa bête fikirîn takekes lê tê ava kirin. Bi gotineke din, însan, weke ziman, xala hevbirîna civakî, dîrokî û takekesî ye." (Weşanên Iletîşim)

Di vê nivîsê de em ê ne li ziman lê li parçeyên ji jiyana takekes bi-fikirin ew parçe di heman demê de bi awayek referans û bingeh in ji bo gelek hilberînan. Civakên wek civakên me bêhtir bi refleksên hefizeya civakî bertekî rê didin. Lê "hefizeya takekes" di edebîyatê de baş esas neyê girtin pratîkek ji pratîkên esasî ê li derve bimîne. Rewşa ziman ya di hefizeya takekes de, zimanê di parçeyên jiyana takekes de veşarî muhîm e. Ger ew derê meydanê wê vegere weke zimanekî nû yê bi ruhbûyî ê di avakirina takekes de rola xwe bi cî bîne.

Welatê me, weke welatê desthilatîyên piçûk dikare were dîtin; dîroka wê neynikeke parçebûyî ye. Însan her li parçeyan dinihêrin. Di dewsa wê de ger parçeyên ji hefizeya civakê, parçeyên ji hefizeya takekes û parçeyên ji zimên wek fikra avakirina koleksiyonê bête dîtin ê derfetên mezin ji bo dîroka nêz derên meydanê.

Min rewşê şiband neynikê, belkî jî ji xweşbîniya min e; di rastiyê de rewş weke delavên şîlo ye; dîrokeke dişibe delavên şîlo. Çend karwanîyên zimanekî di xwe de di hewînin:

### Kesên merqe...

1.

Di sala 1971 an de şeş salî bûm. Mala me li kaşê geliyekî bû. Bavê min bi ereba ga sap dikişand. Wextê ji kaş de erebe dadiket îhtimal bû ku erebe biqulibiya. Her sal hefteyekê em ditirsiyan, destê me diket dilê me. Em ditirsiyan ku bavê min bikeve binê erebê.

Rojekê tabloyek wisa diqewimî dîsa. Lê li tablo renekî reş xwe

da der; li baniyê gelfî leşkeran deng li bavê min kirin:

“Tu ezayê mixtêr î?”

-Belê, got, bavê min.

Ji wan yekî deng bilind kir:

-Were vir!

Bavê min nû erebe daxistibû, di nav xwêdanê de mabû. Got:

-Ez erebê ji bar bikim û werim.

Leşkerê din kir qêrîn:

-Derhal were, zû!

Bavê min li diya min nihêrî, go, bila erebe bi vî awayî bimîne, wê tiştekî xirab ji min re bêjin!

Heya wê rojê difikirîm ku ên herî bi heybet diz, serokeşîr, qey-meqam, mixtêr û eylo ne, Wê rojê min gote xwe qey leşker di ser gişan re ne! (Eylo bi min bi hêz bû lew her têtîkên mirîşkê dibirin.)

2. Sal 1980. Derbe qewimî bû. Dozger bi tevî leşkeran avêtibûn ser gundê me. Dozger kî didît bi mehne, ew dida ber şemaqan. Bangî xortekî dike, hewl dide li xort bide. Xort dibêje:

-Ji kerema xwe, bihêle ez berstûka xwe bidim hev!

Dozger ji ber hurmeta li hemberî xwe li wî xortî nade!

Wextê min ew çîrok bihîst, cîranekî me ji bo wî xortî digot, eferim, çi biazilî kiriye!

Belê, min fehm kiribû, diviya însan bi halê amade bûya, berstûka xwe li hemberî pergalê pevxista! Ev dibû biazilî!

3. Sal 1993. Li sendîkayê rêveber bûm. Li hundur dengê daktîloyê bi ser min ket. Min ji Jîr Dilovan pirsî:

-Tu çi dikî?

-Bi Kurdî dinivîsînim, got.

Ez şok bûbûm!

-Bi Kurdî?

-Belê.

Bûbûm bîst û heştalî. Min mamostetî dikir. Di sendîkayê de rêveber bûm lê min bi alfabeya zimanê xwe nizanîbû!

Wê rojê min fehm kir ku bê em ji çî hatine mehrûm kirin...

Carna Salên Nodî tê gengêşîn. Çî sal bûn! Carna ku hevalên me yê nivîskar ji Stembolê dihatin Mêrdînê, hatina xwe wekî serkeftînekê di nivîsên xwe de diyar dikirin; ew mafdar bûn jî. Em, kesên ku li wir dijîyan, em hîn bûbûn!

3. Di dibistana seretayî di pola çaremde bûm. Mamosteyê me rûniştibû bi tiştêkî re mijûl bû. Telîmat dabû me ku em kitêbê bixwînin.

Şagirtekî mizawir hebû, ji xwendinê hîç hez nedikir. Rabû ser piyan, gote mamoste:

-Bêhn tê, yekî fis kir.

Mamoste:

-Yê ku fis kir, tuyê wî kesî kifş bikî!

Şagirt metelmayî ma. Mamoste bi hêrs gotê:

-Binê wan bêhn bike!

Şagirt bi ya mamoste kir. Li polê nihêrî. Xuya bû bê qerar mabû, nizanibû navê kî bida; di polê de lêzimên wî hebûn. Ên din jî kesên xwedî qebîle bûn. Wî li şagirtekî nihêrî û navê wî şagirtî da ji lew ew şagirt di gund de malbatek bê qebîle bû!

Mamoste li wî lawikî da!

Bi salan ew bîranîn ji bîra min neçû, pergale û têkiliyên gunditiyê çî xweş dida der!

Mamoste ji şagirt dixwest ku fisa hatî kirin tespît bike! Lawikî jî yê herî lawaz teslîmê hêzê kiribû!

4. Di hîlbijartinên 1989 an de li Gundekî Kercewsê serokê sandoqê bûm. Bi tevî min herkesî dengê xwe dabû. Kalekî bi berçavka reş hat ku deng bide. Got, gere yek alîkarî bide min. Xort amade bûn, gotin, em ê alîkariya wî bikin.

Min got, na, ez ê alîkariya wî bikim. Bandora şer ya li herêmê xurt bû. Xort bi fort bûn lê ji ber ku ez kurd bûm dengê xwe nekirin.

Ez û kalo em di kabîna dengdayînê de bûn. Min pirsî, tuyê dengê xwe bidî kîjan partiyê?

Wî li min nihêrî, got, partiya .....

Gelek fikirîm, min mohr li kîjanê daba jî wîyê nizanibûya. Min

gote xwe, heger tu hurmet li azadiya ên li hemberî xwe negirî tuyê çawa azadîxwaz bî! Min bi ya kalo kir. Êvarê me deng safî kirin. Yek dengêkî cuda bû! Wê rojê weke min serkeftineke herî mezin bi dest xistibe tevdi geriyam, li hêlekê şad dibûm ku li wî gundî partiya ez alîgirê wê bûm bi serketibû li alî din min îradeya kesekî li hemberî partiya ez alîgirê wê bûm parastibû...

Çi bextewariyê ez zevt kiribûm! Wê rojê riyek din belkî rastiyekek din ya heyatê li min zelal bûbû.

5. “Lawê filankesê bûye doktor, yê filankesî abûqat e”, “wan xwe xilas kiriye”... di zarokatiya xwe de me gelek hevokên bi wî awayî dibihîstin. Heya em mezin bûn jî, “kesên marqe” ên di civaka me de ji bo min bûbûn mereq.

Di pêvajoya nivîskariyê de pirs li ser pirsê bi teşe bû:

“Gelo xwe xilas kiribûn?”

“Çi dijîyan?”

Ji romana min ya yekem Gîlara Bê Têl heya “Perde” yê, “Meşa Moriyân” heya “Serkêş” û “Ji Nû ve Gîlara Bê Têl”

Ez bi wan “jiyanên xilasbûyî û kesên merqe re” mijûl bûm... Helbet li gorî mercên konjunktorel însan pir zêde ne bi mereqa tiştên wisa ye lê edebîyat bi temamî tiştêkî wisa ye; nihêrînên cuda, nêzîkêdayînên cuda, rengên cuda...

### **Nîşe ji paneleke li Fûara Kitêban Ya Amedê**

Li Amedê di panela bi navê 3 nîş û 3 ziman de ji bo nîşê nodî yê axaftvan ez bûm. Ji wê panelê hin notên ku ji alî min ve hatin gotin parve dikim:

1. Ji ber gelek taybetiyan em dikarin bêjin Nîşê Nodî ji 1990 î heya du hezarî domdar e. Piştî du hezarî merc diguherin êdî ji nîşan bêhtir kom û ref dertên meydana.
2. Zimanê Nîşê Nodî politîk bû lê zimanek bi ruh û bi can bû. Ji ber ku çavkanî li ber dest tunebûn her kesî zarokatiya xwe, jiyana xwe ya li gund esas digirt ev jî dibû sebab kurmanciyek xweş bikeve meriyetê... Dixwazim Jîr Dilovan bi bîr binim; zimanê ku wî bikardianî bila were lêkolînkirin, ê bête dîtin bê kê çî xizmet ji bo Kurmancî kiriye!
3. Heger sîyasetmedarek lêkolînan bike îhtimal e ku bi tenê derdora Rewşenê wekî Nîşê Nodî binav bike lê ku em bi çavê edebî û kulturî lê binihêrin gerek em derdora Nûbiharê jî bikarbînin.

4. Nifşê Nodî di wan deh salan de her ji bo xwe dibû labaratûar di heman demê de.
5. Ji ber atmosfera şer hestiyariyek hebû. Têkiliya bi ziman re romantîk bû.
6. Tabloyekê bînin ber çavên xwe; zarokek, dengbêjek û quling; dixwazim bêjim ku ger metnên wekî şîrên Evdalê Zeynikê, Baba Tahirê Hemedanî... -ku her yek jê metna edebîyata dinyayê ye-ger li zimanên dî neyên wergerandin, nebin malê edebîyata dinyayê zor e ku metnên Ebdulla Peşêw werin nasîn ...

## EDEBÎYAT HEZKIRIN E HEZKIRIN JÎ HÊZEKE REXNEYÎ YE

1

“Bêewlehîti bi tenê ne ‘dîrokî’ ye, di heman demê de “psîkolojîk” e jî, di têkiliyên mirov ên bi surîşt û ên bi civakê re xwe didin der.”  
Umberto Eco

### Destpêk

Di zarokatîyê de, li derdora zarokaniyê “mezinahiyek” hebû/ heye; qerar û tercîh bi aîdî mezinan in. “Tecrube” heye di civakên rojhilatî de ji lew fikra zarokan tu car pere nake! Şîret hene. Rexne tuneye, hêrs heye. Ka em meharetên dibistanan lê zêde bikin; rencîde heye, şertên asîmilasyonê zor in. Ji ber ku zarok bi zimanê xwe perwerde nabe, her “bêdeng” e, nizane, ji bo çi bi ser nakeve, ji lew wekî neçarî, her tim hevalê/a xwe sûcdar dike, kêmaniyên hevala/ê xwe dibîne, bi wî awayî, dixwaze her kes bişibe wî, serkeftina yê din ti car qebûl nake!

Belê em xweş û baş dizanin bi hêrs kevin. Di kêliya bi hêrsketinê de, îhtimal e ku em her xirabiyê bikin! Lê gav ew gav e û deqe ew deqe ye; dû re nihêrînên bi lêborîn di çavan de xwe didin der, belkî çav şil dibin. Carna bi navê rexneyê, bêyî hay, em hêrsa xwe didin der, di dewsa rexneyê de li ku ye em ê her kesî rencîde bikin.

Gelo ev nayê vê mehneyê ku hê di zarokatîyê de, di salên dibistana seretayî de, bar û arîseyên wisa bi ser me de tèn, em bêyî hezkirin dimînin. Heger hezkirin hunerek be, mixabin em ji wê hunerê bêpar dimînin. Ji ber ku edebîyat hezkirin e û kesên karibin hez bikin bi rihetî dikarin rexne jî bikin. Em ê wekî penzehera trawmayê edebîyatê, xwendinê bi rik, bi bîr bixin, bigengêşin; di çanda devkî de, bêhtir binhişê meyê mîstîk û fantastîk aktîf bû; li hember êş û trawmayan me bi hişê xwe yê mîstîk xwe dikir leheng, carna balindeyek welew tişteki din lê em behsa edebîyata nivîskî dikin ji lew em wêjevan û xwendevanên vê demê, em bi îda ne ku wê metn bi tena serê xwe di jiyana me de êdî heyberek be.

Eleqeya têgeha trawmayê û profesyoneliyê hebe jî min xwest tişta her xwendevan pê ne biyan e bi bîr bixim. Ev nivîs, bi vî awayî, ê bi per û bask be. Ez ê hewl bidim di heman demê de bi xwendevan re hin diyardeyan bigengêşim jî. Ji lew ji rêyekê madetir em ê her li ser çaterêyan bin û çi rê derên pêş me, em ê tê de bimeşin

bê çi jê derê.

Ez ê di bin sernavên, “trawma û dengbêjî”, “trawma û takekes”, “trawma û ziman”, “trawma û edebîyata Kurmancî” de xwe li analîzan bigirim. Bi têgeha trawmayê re, her sê dîyarde (takekes, ziman, edebîyat) gere pev re bi bîra me bîn. Weke xwendevan jî haydar in, bi dilekî rihet, ji bo civaka kurd, ji aliyê erênî û teşegirtî ve em nikarin behsa ‘takekes’ bikin lê ji ber ku bi awayek behsa elîtan tê kirin, baş ciyê xwe negire jî em ê takekes bêjin. Ev bi xwe jî (şertên teşegirtina takekesê azad nîn e)ji bo rewş û asta trawmayê delîlek e; di civakekê de ger kes nebûbe takekes ev tê wê mehnê ku gelek arîşe hene.

### 1. Trawma û dengbêjî

Di Kurdî de hukmê deng, rengê deng muhîm e; deng di heman demê de bûye sebeb ziman estetîze bibe, helbest ji aliyê hunerî ve xurt bin. Di nav berên çanda devkî de dengbêjî rasterast bingeheke xurt ya edebîyata nivîskî ye jî, ji alî din ve dengbêjî neynika dem û qonaxan e. Di çand û folklorê kurd de aliyê hunerî yê helbestvaniya dengbêjan xurt e. Çi wextî trawmayan rengê xwe dane dengbêjiyê? Çimkî di dengbêjiyê de em bi tevî trawmayên şer û pevçûnan, em trawmayên di destan û eşqê de jî dibînin. Bi tevî vê pirsê hêjayê gelek pirsên din e.

Weke destpêk ger em di mijara trawmayê de jî ji dengbêjiyê de dest pê nekin em ê nivîsê jî hin wesleyan bikin. Sebebek li ber çav; em ji kitêba bi navê “dengbêjî” ya Hayrettin Ekinci dixwînin ku M. IZADYdi meqeleya xwe ya li ser mûzîka Kurdî de wisa gotiye:

*“Dengbêjî berî mîladê247-227 an de di dema Part an de dest pê kiriye. Lê dema dengbêjanê herî populer di nava sedsala 14 û19 de ye. Dema begên kurd belav bûn dengbêjî ji ber şertên nebaş bi carekê qelş bûn û populerbûna xwe wînda kirin. Dema komara tirkî ava bû ziman qedexê bû, bi qedexebûna zimên re dengbêjî jî hêdî hêdî vekîşiya.”\**

Bala me lê be ev di heman demê de helbest û helbestvaniya Kurdî jî dibe demeke kûr û dûr. Dîsa em careke din li serhildana Bedirxaniyan difikirin û belkî wê lêkolînerên kurd di demên pêş de baştir derxînin meydanê ku têkçûyîna Bedirxaniyan destpêka trajedî û trawmayên civakî, çandî û edebî ye!

Li dû serhildana Bedirxaniyan kurd li welatê xwe jî “xweseriya qismî” jî dibin, li ser xaka xwe dibin sirgûnî. Ji xwe beriya serhildanê jî mîrekî di nav xwe de bi arîşeyan re mijûl bûye, heta êş û trajedî

hatine jiyîn (rewşa nastûrî keldaniyan)

*“Piştî klasîkan, metnên Kurdî bi trawma ne” (Cîhan Roj, 08. 01. 2013 kovara peyv)* Ji derbirîna piştî klasîkan ji bo trawma û çanda devkî belkî em ê karibin dawîya sedsala 18 an û destpêka sedsala 19 nîşan bidin ji lew beriya serhildanê mîrekî di nav xwe de bi arîşeyên mezin re mijûl bûye û hem di nav mîrekiyê de trajedî û trawmayan dest pê kiriye.

Di hejmara 3 yem a “Wêje û Rexne” yê de hêja Îbrahîm Seydo Aydogan wisa dibêje:

*“Di kevneşopiya wêjeya Kurdî de, nivîskarên rojhilatî tim li devê deriyê beg û paşayan bûn. Wekî dengbêjên ku li gundan digeriyan û civat şên dikirin. Û paşê xelkê şekir an jî olçekek genim dida wan û diçûn... Evdalê Zeynikê dibêje ‘Ez dengbêjê mala Surmeli Mehmet Paşa bûm.’ Yanê her kes bi yekî ve girêdayî bû... M. Arîfê Cizîrî ku gund bi gund digeriya û pars dikir... Kesê ku xulam be nikare axa, beg û paşayan zû bi zû rexne jî bike...”*

Balkêş e, dibe ku rewşên wisa yek ji karigerên neyînî be ji bo rexneya me ya tune. Lê meriv qanî nabe bi wê tespîtê; em di kitêba Ahmet Aras ya bi navê Evdalê Zeynikê de li eslê meselê binihêrin:”- *Surmeli Memed Paşa dixwaze Evdal bibe dengbêjî wî. Evdal hinkî xwe digre, naxwaze. Lewra ewî zanibûye ku Memed Paşa merivekî bi hêrs û ters e, pê ra derbaskirin zor e. Dibê: ‘Paşa xweş be, ez merivekî serbixwe me û destûrdayî me, dengbêjiya te ji min re zehmet e, tu were ez nikaribim ji binê barê te derkevim.’*

*Lê Memed Paş israr dike. Dibê: ‘... tu ku bibiwi dengbêjê min bi we’da Xûdê be, ez têkilî te û karê te nabim, tuyê li cem min dîsa destûrdayî bî, dilê te çawa dixwaze wusa bike. Ezê te bikim rûsîyê xwe û gundekî bidime te.”*

Baş e, Îbrahîm Seydo ji ber ku bi gelemperî behsa rewşê kiriye em pê de biçin; heger mantiq ev be em ê li ser heman tiştî bêjin îro ro nivîskariya Kurmancî bi gelemperî an karmend in, an mamoste ne (ez bi xwe jî ji karê mamosteyê teqawit im), an ji dewletên ewropî maş distînin an jî di zanîngehan de kar dikin. Baş e, em ê karibin bêjin ji ber heman egerî nivîskarên kurd îro ro jî nikarin rexneyên xwe bi serbestî binin ziman? Ango parsekiya dema me ji mijara gotinê ye an na? Hêjayê lêkolînê ye ev mijar...

Ka em li karê fermî yê ku Celadet Alî Bedirxan, Pîremêrd, Hecî Qadirê Koyî û gelekên din binihêrin. Di lêkolînê de divê ev rastî jî bêne dîtin. Tam li vir “trawma” bi mehne dibe!



Em dikarin rastiyên dîtir jî bi bîr bixin; di civaka kurd de wextê mîrekiyan, li dû mîrekiyan jî, wekî pergal an jî adetekê kesên di xizmeta civakê de an bi alikariya mala beg û axayan an jî bi alikariya civakê debara wan hatiye kirin. Dengbêj, şêx, mela...

Wextê vê nivîsê lê dikim medyaya Tirkî duyem salvegera mirina Neşet Ertaş bi bîr tînin. Aniha ew wek hunermendekî mezin bi bîr tînin. Lê di heman wextî de em dizanin bê di saxiya xwe de Ertaş ji alî aborî ve zehmetî kişandine. Ango hinekî jî qedera hunermend û nivîskariyê ye rastiya aborî.

Bi aqil û nihêrînên îro ger em qewimînên rabirduyê şrove bikin emê xeletî bikin. Lê her pirsra ters, dijelîmînan, pirseke hêja ye.

Bi ya min heger pirsra çima rexne di civaka kurd de pêş ve neçûye em bidin der dû re li bersivê bigerin me divê em bala xwe bidin karakterê desthilatîyên kurd; şêxtî ji ber saziyeke olî bû ne mimkun bû bihata rexnekirin û herwiha melatî jî. Begên kurd 'ji xwe' pir razî bûne. Mîsal tê behskirin bê hukmê şêwir û aqilmendî yê Mola Goraniyê esilkurd ku mamosteyê Fatih Sultan Mehmet bûye li ser Fatihî gelek hebûye.

Belkî jî ez ne haydar im, me bi awayek simbolîk an jî zînetî nebihisti ye bê begek kurd an jî mîrek kurd ji şêwirmend û aqilmendek xwe îlham û fikir stendibe û mohra xwe li serkeftinekê xistibe. Di destana Dewrêşê Evdî de hunermend û kesên bi hunerê re eleqedar wekî "mitrib" têne nasandin.

Di destpêkê de me saziyên wekî malbat ku desthilatiya hundur, dibistan ku saziyeke mêtîngeriye ye û desthilatiya derve temsîl dike, çawa li kesayetiya zarokan bi awayek neyînî bandor dikin. Em jî civaka xwe dizanin paşgotinî (ne bi mehneya ewantiyê) pir zêde ye. Ev bi tena serê xwe nîşan e bê karakterên desthilatîyên hundur û ên derve çi sert bûne.

Ger em li meseleya eslî vegerin em ê bêjin hin kîrinên dengbêjiyê bi awayek îndîrekt be jî rê dane trajediyan, mîsal, pesnê şerên feodalî. Dîsa jî wextê em li dengbêjan difikirin em neçar in bi tenê ber û berhemên wan esas bigirin. Çi ji alî jiyandin û estetîzekirinê be û çi jî ji alî hunerî be dengbêjî rastiyek e. Heger em para xeyalê û afirîneriyê, hezkirinê ya di rexneyê de bifikirin em ê bi rihetî bêjin dengbêj rexnegirên mezin bûn. Evdalê ku dengbêjiya Surmeli Med Paşa kiribû di heman wextî de bi serbestî sînorên olî hilweşandine û eşqekê jiya ye li hemberî Gula Ermen.

Tê gotin ku tib û edebîyat di xala vegotinê de digihjin hev. Ger

bi vî çavî em lê binihêrin dengbêj di heman demê de bûne sebeb hezkirin xwe bide der, kûr be. Belkî hukmê trawmayan daxistine û belkî pêşî li hin trawmayan jî girtine.

Tê gotin ku feylesofek gotiye, kesên ku kilamên neteweyekê çêkirine, ji kesên qanûnan çêkirine bihêztir in...

*“Dema begên kurd belav bûn dengbêjî ji ber şertên nebaş bi carekê qeş bûn û populerbûna xwe winda kirin. Dema komara tirkan ava bû ziman qedexe bû, bi qedexebûna zimên re dengbêjî jî hêdî hêdî vekîşiya.”*

Ji bo dengbêjên bi navûdeng ev mijara gotinê be jî bi gelemperî em nikarin heman tiştî bêjin; dengbêjî bi qasî bi beg, mîrekî û desthilatîyan ve girêdayî bin jî dengbêjên di nav gel de xweser bûne. Dengbêjên jin mîsal.

Belê bi piştî avabûna komara tirk ziman hatiye qedexekirin, ev bûye sebeb li Bakur dengbêjî hêdî hêdî vekîşe lê em nikarin ji bo dengbêjîyê bi awayek gelemperî vê bêjin. Mîsal beriya avakirina komara tirk qetlîam û sirgûn dibin sebeb bêhtir kurdên Êzidî li kafkas bi cî bibin. Heger em li dengbêjiya li wir bifikirin tê dîtin ku dengbêjî bi pêş ve çûye, wan nehiştî ye ew çira vemire.

## **2. Trawma û takekes**

Di dîmeneke erjeng ya ku jineke Êzidî bi hawar bû, ew dîmen dibû sebeb ez bi trawmayan re hevrû bim, ji nişka ve, ez kirim xwedî vê helbestê:

“Bêyî demsal

Beriya dest û lîngan

Parçeyek ji cîgera min dicemide”

Xwedê me neke xwedî helbestên wisa!

Civakeke ew qas bi trawma êdî ji cîgerên xwe de dicemide! Civakeke ku êdî bûye aşîq û maşûqê êşê, di edebiyatê de nikare dev ji êşê berede! Kes û takekesên civakeke wisa mijar e. Beriya bikevim bin hukmê hestiyariyê em xwe li mijarê bigirin.

Li vê derê em ê serî li pênasê û tespîtên zanistê bidin. Piştî jêgirtinan em ê bi rihetî karibin bersiva hin pirsan jî bidin. Mîsal, em giş bi gazine in însan nikarin rexneyê ragirin. Zanist dibêje me; kesên bi trawma, bi hêrs in, zû bi hêrs dikevin... Kesên bi trawma tirsonek in...

“Trawma jiyânê trawmatîk in ku ji nişka ve dertên meydanê, bi awayeke tîr rê didin hestên neyînî.” (<http://www.psikolojiavrupa.com/travma>)

“Trawma bêhtir di psîkolojiyê de; ew jiyân in takekes ew derxistiye derî hiş. Di wexta wextê de takekes bes bertekî rêwan jiyanan neda ye. Bi tevî ku li ser rawestiyaye jî çareser nekiriye. Ji ber wê jî derxistiye derî hiş.” ([http://tr.wikipedia.org/wiki/Travma\\_\(t%C4%B1p\)](http://tr.wikipedia.org/wiki/Travma_(t%C4%B1p)))

Di navnîşana (<http://www.psikiyatri.org.tr/pagepublic.aspx?menu=24>) de em dixwînin ku trawmayên ruhî zêde tirsê didin mirov, neçariyê diafirînin.

Dîsa di heman malperê de ji bo nexweşiya stresê ya li dû trawmayê ev rewş diqewimin:

“Zû bihêsketin, ji bo pêşerojê neçêkirina pîlanan, zû bi zû bibîranîna bîranînên derbarê bûyerê de...”

Li vê derê ji ber ku têgeheke zanistî mijar e, profesyonelî û pisporî dixwaze em ê bêhtir hin rewş û tewran bi bîr bixin, bê çî tîkiliya wan bi trawmayê re bêyî bibe îda em ê bihêlin ji bo erbaban. Beriya wê, wekî her kurd bi rihetî dikare der bibe, em behsa mirovên welatekî bindest dikin.

Ji bo Kurdistanê însan dikare bêje welatê desthilatîyên piçûk. Bi asîmîlasyonê re, ji hukmê desthilatîyan, ji hukmê tore û saziyan di ruhê takekes de weke nişan li her deverî dehlîz peyda bûne. Li gundan ji bo kesên ne dewlemend, bêyî êl û eşîr, ‘çiqas efendîye’ dihate gotin. Zarokên dewlemendan, zarokên kesên xwedî hêz weke kesên “tebera” dihatin bi nav kirin ji lew ew li gundan serbest tevdigeriyan! Lê wextê kurd ji welatê xwe derdiketin, li bajar û metropolan, tirkan ji bo kesên kurd digotin, efendî ne, xwedî sozên xwe ne... Gelo bira bira maqûlî û efendî hebû an hewlên xwe bidin qebûlkirinê bûn? Çi ecêb bû kurd bi awayek normal nedihatî terîfîkirin, an efendî an jî mafya, cahilî, “lê-lo” bû...

Ev rewş li cem hin rewşenbîr, entelektuel û nivîskaran bi awayên cuda qewimî; di dewsa ku li ser arîşeyan bê rawestîn, arîşe bêne çareserkirin, her hate veşartin... Bi tevî rastiyên wisa henin jî takekesê/a kurd ji çareserîya pîrsgirêkê bêhtir xwe li veşartin û manîpûlasyonan digirin. Tîkiliya kompleksê û trajedî û trawmayan jî tîkiliyeke zexm e. Carna rewşên trajîk-komîk xwe didin der; em kurd hê ne di wê ferasetê de ne xelateke neteweyî (neteweyî dibêjim) ya cidî bikin adet em bi dû ketine bê ka wê kî ji nivîskarên Bakurî

hêjayî xelata Nobelê be! Ji kerema xwe hûn çima ji hemî nivîskar û rexnegirên vî milletî, ji sazî û hukumeta başûr... Hêvî nakin ku Baba Tahirê Hemedanî, Evdalê Zeynikê... Bi dunyayê bidin nasîn.

Dostekî min carê ev îdîa kir:” Di navbera nivîskarên Mêrdînî û Amedî de qayîşkêşandinek heye” Welew ne rast be jî, axaftina tiştên wisa rê me dide bê “meseleya heyînê” hê jî bi nêziktêdayînên gundiyanê, bi awayek veşarî hewl tê dayîn werin çareserkerin. Tam li vir, em behsa êşekê bikin em nizanin bê ka nexweşî ye an trawma ye; em naxwazin bi xwe re, bi arîşeyan re hevrû bin! Hê jî em bi hêz û feraseta takekesan ne ewle ne, belkî berevajî, bi wî awayî em dixwazin di bin baskên hinan de cî bidin xwe.

Di vê navberê de xîtabî xwendevan dikim, ji kerema xwe bi sebir be, ji alî azînê ve nîyet ev bû, ango dixwazim hûn bi min re li bejahiyekê welew gelîyekî bigerin û hew ku ez berê we bidim devîyan, zinarekî hûn li xwe werqîlin û bi ser min de jî deng bi xwe bixin, ev ne belawelî ye.

Baş e, me hinekî bêhn da xwe; romantîzma giran belkî ya kûr jî trawma ye. Heger ez di vê fikrê de werim piştrastkerin wey li halê me! Edebiyata ku li derekeciyan dihat kirin her ku hin qonaxan de nefes dabe edebiyata me jî di eslê xwe de, ji alî romantîzma kûr û nelicî ve ketibû halekî “trawmatîk”. Ew li derekeciyan dijîyan, rastiyên wan hebûn lê ew bi romantîzma tîr ya welatê xwe re bê nefes diman. Li vir bes nav û referans hene ku bê ji bo navekî gewre xwe li çi peyama û fişaliyan girtine.

Gelo ev jî ne trawma bû; nedixwestin, belkî nikaribûn têkilî li darxistina! Belkî di nav hev de dîsa gundekî dihat afirandin ev li welatên din jî heman rewş e. Heger însan nikaribe têtîkiliyan li dar bixe ev jî trawmatîk e.

### **3. Trawma û ziman**

Di vî beşê de heya ji dest bê ez ê bi parîde (anekdot)- (cara pêşîye di vê nivîsê de bikar tînim ji alî min ve hate afirandin-), mînak û referansan nivîsê lê bikim. Belkî ev ji bo xwendevan balkêştir be.

Ji ber ku hem ji bo takekes, hem jî ji bo edebîyatê, ziman di heman demê de navgînek e, me divê em behsa trawmaya ziman bikin. Bakurî ji alî “ziman” ve seqet in! Ev ji îdayek madetir rastiyek e; ne bi zimanê xwe dizanîn ne jî bi Tirkî; zimanê wan hatibû qedexekirin. Wekî bertekî ji Tirkî jî dûr disekinîn; têtîkiliya wan û Tirkî ne têtîkiliyeke saxlem û normal bû, hew ji bo karibin di dersan de biserbikevin, bibin xwedî pîşeyekê pêwistî bi Tirkî didîtin. Gelek jê ji

edebîyatê, ji lêgerîn û hobyên bi Tirkî dûr disekinîn. Takekesek ku tşkiliya wê/î ew qas bi zimanan re bi problem be helbet ji alî fikir û ramanê ve, derbirînê ve jî wê bi problem be. Herwisa tşkiliya bi edebîyatê re jî wê bi problem be weke çalakî hewla nivîsînê hebe avakirin, sêwirin, vegotin û sazkin jî wê bi kêmanî be.

Ji bo asîmilasyonê, rewşa zimanê tê de bû mînakên li jêr ên li navenda Mûşê dihatin/hatine bikaranîn bi seyr in. Fermîyet ji bo wî zimanî (ku nîzanim çî ziman e) “Yerel Agiz” (devoka herêmî) dibêjin eleqeya wê bi devokbûnê re nîn e, awayê xirabûyî yê Kurdî ye:

*“Acep sosrat ... Beradayi beradayi konuşma... Bizot oldi... Beteşe... Behemt düştüm...”*

*Çaroğ ağızlı... Dıral avrat ... Dol dol gezer... Gorbegor olesen ... Kijildeme... Rutçiksiz herif...*

*Sukumsuz Zırboge...”*

Baş e, em îda bikin ew halê ziman gelek dişibiya kesayetiya me ez ê ji hedê xwe derbas bikim? Bawer nakim; ji ber ku ziman jî candar e, ketibû/ketiye çî halî! Belkî ast ne yek be lê şexsîyeta me jî bi heman awayî teşe digirt! Kerem kin, trawma an jî halê trawmatîk.

Pêkenokêk:

Li metropolekî mamosteyekî esilkurd li taxekê, ku bi piranî kurd lê dijîn, qursa zimanê Tirkî dide jinên kurd ên navsere. Mamoste ji bo dengê “e” bi wan bide fêrkin qaşo dixwaze ji karwaniya jîyanê mînak bide. Ji jinan re dibêje, “Wexta hûn zarokên xwe dihejînin hûn çî dibêjin?”

Mamosteyê me kêliyekê ji bîr dike ku ew kurd in. Her wiha bixwe jî bîr nabe bê kurd çî dibêjin. Li bendê ye da jin bêjin, “E!E!E”.

Ji jinan jê yek bersiv dide:

- Xoce, em dibêjin A!A!A!Ê!Ê!Ê!

Hêja ye ku em ji Hewarîya Heciyê Cindî beşekê lê bikin û dû re pirsaxwe bikin:

*“Bêhna kewşenî xweş bû, di xemla xwe de bû.../wî silava min giran vegirt/rastî jî xebata hezkirî nahêle meriv zû kal bibe/esreke teng bû royê hê rîya xwe diqedand/erê lawo, ya ku me dîtiye, bila here, venegere/tariyê jî erd hilçinî. Hema wê gavê, te digot ji rikê tariyê heyva çardehşevî di nava ewran re xwe kişî ortê kir. Esmann bû ronahî, keşe xemla xwe, çawa ku tenûreke zimzimî/te digot, ew deng bi dilê te re xeber dide/porî reş mîna şevê/rebenê beşara xwe*

*xweş kir/bila bêhna te li min nemîne...*

Gelo kesên ku berhemên xwe an jî nivîsên xwe bi zimanên din saz kirin û lê kirin (an baş ked nedan, baş bi Kurmancî nizanin an jî ji bo bi rihetî xîtabî bin hişê xwendevan, xîtabî çêja edebîyatê ya bi zimanên din teşebûyî dikirin/dikin) çi dan ziman û edebîyata Kurdî? Behsa têkiliyên zimanan nakim, behsa guherînên di ziman de jî nakim, nafikirim ku ziman bi her halê xwe dewam bike ji lew difikirim ku ziman jî wekî însan ne ew qas mehsûm e!

Di destpêka nivîskariyê de weke ku ziman mehsûm be em tevgeriyan, me xeletî kir. Bindestî ne ew diyarde ye her tiştî mehsûm bihêle.

Heger ku lêkolîn werin kirin bê çiqas çîrokên trawmatîk ên derbarê ziman de derên meydanê ku kurd ji gelek çîrokên wisa meselên mîzahî afirandine. Di çareser kirina trawmayan de vegotin û îtiraf xwedî taybetiyên muhîm in. Îtirafên di pêvajoya nivîskariyê de ê bi demê re peyderpey werin nivîsîn, bi bîranînan re gellek gidûg û detayên balkêş ronahiyê bibînin.

Têkiliya takekes û têkiliya zimên bi temamî bi hestiyarî bû. Ne têkiliyeke durist û girgîn bû. Ew jî dibû sebeb her hevudû hewandin xwe bide der. Têkiliya serdanpê romantîk -bêyî hay- rê dida rebeniyê jî! Çi bihata nivîsîn jî qebûl bû!

Mînakeke ji Konferansa Nivîskarên a li Îzmîrê qewimî ku hêjayê bibîranîne ye. Berken Bereh yê ku ne bi me re, di sala 1978 ê de dest bi nivîsîna Kurmancî kiribû, got, " Cara pêşîye ku ez xwe wek nivîskar dibînim"!

Exlebe qeleman pirsgirêkên zimên û edebîyatê anîn rojevê, pirsgirêkên xwe, weke takekes an jî figûrek muhîm ê nivîskariyê neanîn rojevê, avêtin dilê xwe, ka kê çiqas karî pirsgirêkên takekesî helbikira em jê ne haydar in.

#### **4. Trawma û edebîyat**

A rast min dixwest ez vê beşê bi paragrafêk kurt biqedînim, min ê bigota, di dilê kurdan de her zarokek heye ku hîç mezin nabe! Zarok ku ji her cûre êşên bindestiyê peyda bûye mezin jî nabe! Trawmayek e ku her bandor li ruh dike. Li ser vî esasê têgeha "xeyd" ji bo edebîyata kurd dibe rastiya neyîniyan. Heger ku bala me lê be em ê ji bo her awa derbirîne toneke dengê karekteran bibînin ku ji kûr de xeyd tê de heye. Bi tevî sebebên din xeyd jî bûye awayek gotina "na"! Çi zor e ku însan "na" bêje! Îro ro hin ciwan û kesên bi rûmetê hewl didin "na" bêjin, dibêjin lê em di gelek gotinên wisa

de ji halê objektîf gotina “na” bêhtir, em peyamekê dibînin; weke ku bêjin, binihêrin, ez çi mêr im, çawa dikarim bêjim, “na”. Heger em li eslê wê derûniyê bifikirin emê bibînin ku di edebîyata Kurmancî de ji edebîyatê bêhtir hewl hatiye dayîn “begemkirin” biqewime. Mixabin, hinan jê her xwestine xwe bi dagirkerên xwe bidin begemkirin!

Em paragrafê li cî bihêlin, bi awayek gelemperî, bi edebîyatê re yekem têgeha ku tê hişê me “afirînerî” ye. Li beşên jor me halê takekes, rewşa ziman û wekî çanda devkî û çavkanî, rewşa dengbêjiyê bi bîr xist. Hewceyê pirsê ye em bipirsin; gelo hûn ê karibin bi awayek normal behsa takekesê azad, afirîner bikin? Ji wê madetir, bêyî em çav li hin diyarde û rastiyan bigirin em pê de biçin.

Gelo li Amed, Mêrdîn, Stembol, Parîs, London, Berlîn... ê entelektuel an jî nivîskarek kurd çiqas bi şano, sînema, pêşangehekê re eleqedar e? Wê bêyî gotin ku li Amed û Mêrdîn, ji ber mercan normal e ku eleqeyek wisa tunebe. Baş e. Bi ihtimalek wê ji bo kesên li derekeciyan dijîn jî were gotin, têkiliya bi hunerê re bi awayê mezinbûnê re, bi perwerdehiyê re, bi mercên sosyal, bi aboriyê ve girêdayî ye. Tu gotina me ji bo sedemên wisa û ên dîtir tune lê gelo emê karibin bêjin ku bi gelemperî kurd bi “xwe “ re mijûl e! Gelek tişt belkî trawma û adet û darizî pê re hene ku hê pê re hevrû nebûye? Çi eleqeya jiyana sosyalî, edebîyat û trawmayê heye? Di romana bi navê “Yüzleşme” ya Sandro Veronesi de em ê li bersiva vê pirsê bigerin:

*“... hişê min êdî min naporêze, qe nebe bes naporêze (...) û li xwaringehê me, ji miştêriyên li wir re bi jiberî Pasolini yê dixwînim û ev çîroka ku derbarê bavê min de min bi metirsî dike, acizî dide min, lêbelê qet ji wê çîrçîrokê ne bawer im û êdî ne bi metirsî me jî (...) hemî qonaxên ku bi peyvekê re dûr hatine hiştin, ciwantî, tolazî, zaroktî; ev e wisa, asoxî azad im, hê ji dayik nebûme û ji ber vê jî li her deverî me, li her sedsalê û li her deverî, ev xweşikbûneke wisa ye ku jê nayê bawerkirin, halek bi metelmayî...”*

Em bi bîra xwendevan bixin ku hevoka pêşî ya wê romanê wiha ye:

“-Hûn- rawestîn- mirovek bi keder in?”

Dinavnişana (<http://www.biltek.tubitak.gov.tr/gelisim/psikoloji/deneme.htm#psiedebiya>) de em van nêrînen li cî dixwînin:

*“Nivîskarên mezin ku înzeya wan li bin klasîkên muhteşem in, bi tenê bi şayesandinê nemane, xwe li tehlîlkirina karekteran jî girtine. Heya koka tewran çûne, derbarê sebebên de lêkolîn kirine. İhtimal*

*e ku ew tehlîl ji bo psîkologan bûne/bibin desîse."*

Hevrûbûn, rola edebîyatê ya di sivik kirina êş û trawamyê de bû sebeb em pirsên li jor bikin. Heger kitêbek bûbe sebeb ku însan bi-guherin, heger ku gelek kitêb karibin di kêliya xwendinê de xwendevanên xwe bi per û bask bike em mafdar in ku deng li xwendevanên Kurdî bikin, bêjin, ne ji bo parastina Kurdî, ne weke peywir, ji bo xwe, ji bo ruhê xwe û jiyana xwe bi Kurdî bixwînin! Pê re jî em li edebîyata Kurmancî vegerin.

Beriya wê jî em rastiyeke bi bîr bixin; di dema postmodern de, xwendevanên Kurmancî ku bi piranî xwendevanên Tirkî ne û çêja wan a xwendinê li ser berhemên populer in ê çawa karibin romanên bi Kurmancî ên bi tewr û lêkolînan re mijûl, ên bi psîkolojî û sosyolojiyê re eleqedar bixwînin? Edebîyata Kurmancî hem bi trawmayan re mijûl bûye hem jî bixwe trawma ye. Lê ku wextê em li rastiyeke vedigerin di Memê Alan de dibînin ku wisa hatiye gotin: "Çirke çirka serê qeleman e." Berhem û referansên bingehîn bes hebûne/hene ku -ger bênavber nema- îro belkî edebîyata kurd li dunyayê edebiyateke herî berhemdar û navneteweyî ba. Mixabin, dîsa em li Bakur dibînin ku piştî zevt û zorên li ser medreseyan, li ser zimanê Kurdî -ku ew qona xe ku li dunyayê pêşkeftinên mirov gêj dikirin diqewimîn- bûne sebeb ziman û edebîyat di nav xwe de bê nefes bimîne, ji têkiliyan bibe, pêş ve neçe, nikaribe problemên xwe hel bike, bi nav ceriban bikeve. Edebîyatê nikaribûye prolemên xwe hel bike ji lew weke trawma pê re maye.

Ew kesên ku ew qas bi jiyandê trawmatîk re rûbirû mane em behsa edebîyata wan kesan dikin ku trajediya herî mezin hatiye jiyîn tê jiyîn ku kes naxwazin ber wî warî ve binihêrin, bimeşin! Me behsa veşartinê kiribû. Her peyva modernîzmê tê bikaranîn lê ev hew bi dev e. Heger mesele çareserkirin û gavavêtin be diviya aqil û ya aqil esas bihata girtin. Qe nebe hev kêşeyek hebûya di navbera hest û aqil de.

Ên ku krîter ava kirin, nav li edebîyata Kurmancî kirin ji ber ilmê xwendine azî û teknîkê bikaranîn, jê haydar in lê ji zimanê Kurdî ji edebîyat û çanda Kurdî dûr in; nivîsên ku bi Tirkî hatin nivîsîn gîş li ser têkiliyên ji metnê dûr bûn.

Çawa tehakuma sîyaseta Bakur hebû/heyê, dixwest edebîyatê têxe bin emrê xwe, bi awayek, hin derdorên din yê sîyasî jî heman tiştî dikin. Hin derdor jî heman tiştî bi hetîketa zanîngehê dikin. Beşikçi, digot, Kurdistana her kesî heyê ya kurdan nîn e. Em îro dibin şahid ku tê xwestin, "edebîyata kurd ya her kesî" hebe lê edebîya-



teke kurd ya kurdan tunebe!

Trawma ji tûndî, kaos, êşan reng digire. Heger em metnan weke candarek qebûl bikin û her têtikiliyê li ser wî esasî saz bikin wê wextê wê hezkirin mijar be. Têtikiliyên demokratîk destpêk e; têtikiliyên edebîyatê û sîyasetê, têtikiliyên edebîyat û zanîngehê, têtikiliyên edebîyatê û nivîskar... divê ne di halek trawmatîk de bin ew têtikilî, demokratîk bin. Heger têtikilî demokratîk bin ê nivîskar nikaribe egoya xwe di ser metnê re bigire an jî li ser metnê bibe desthilat. Her bi têtigeha “desthilatî” re nivîs qediya em ê li bendê bin bê ew têtigehe bibe mijara dosyayekê, em karibin behsa nivîskariya Kurmancî bikin ku bê bi “mexdûriyê” re çawa dikarin bibin desthilatî!

## MALA MATÊ

Ji her kesî bêhtir, ez ji xebatên xwe ên şîrovevî zîvêr im; çî nivîsa min ya serkeftî ya şîrovevî hebe jî li ber çavên min, ew jî çîroka min ya herî lawaz bêqîmetir e! Lêbelê hûn kurd bin, hûn edebîyatê bikin, hûn neçar dimînin gelek hêmanên din jî bifikirin. Edebîyata ku em dikin cografyayek wê heye, zimanek wê heye, ruh û cîhanek jê re lazim e. Atmosferek xwe heye. Gava dawî, çalakiyek însanî ye. Lê bi behskirin û bîranînê re naxwazim mexdûrîyet ek din xwe bide der, naxwazim melankoliya heyî tîrtir bikim. Sebeb û encam, ev e hemî mesele. Pirsra çîma, heke bi şîrovevan demeke kurtir zelal be wê pirsên din jî bi rihetî werin bersivandin. Ev, wê bibe sebeb ku jenga li zimên jî vehele, biherike. Qalik û jenga li ziman, di vegotin û aktîvîteyên ziman ên edebî de asteng in. Mala matê, biwêja herî karîger û kêrhatî bû di Kurmancî de! Kurd di mala matê de bûn, di mala matê de ne, zimanê me di mala matê de ye, wekî takekes em di mala matê de ne... Her sêwirîn, her hewl, her gav ya yekem jî bo derketina ji mala matê ye.

Belê, kurd di mala matê de bûn. Ev tê wê mehnê lîsk hebû. Hal-bukî kurd qedrek mezin li setrencê digirin. Heke ne ji halê matbûnê bûya ew hezkirina lîskê, wê di teknîk û gavên sêwirîn ên modern de jî bi bandor bana.

Mixabin kurd di her hemleyê de ketibûn mala matê. Sebeb muhîm in, lê ku em lîske nû bisêwirin me divê em halê karnavalî yê kurdan bi bîr bînin, bîr û bawerî, reng û dengên cuda, şîfre û kodên ku ziman ew hemet kirine, lîsk, hemî “tîştên saf” yek bi yek deynin ser dezgehê ceribîn û pêpelûkên lîskan!

Têgeh, biwêj û qalib, li ser vî esasî, di vê nivîsê de dibin navend, em her yekê wek kod an jî sandoqekê qebûl dikin. Bi vî awayî em ê, rewşa mala matê, halê ber bi hemleyê ve bînin bîra xwe. Di karwanîya hiş de, qalib, reng û şaxên biwêj û têgehên wê derfetê didin me da em karibin xwe li şîrovevan bigirin.

Bêvî vir de û wir de biajom, çend têgeh an jî qalib bi tenê delîl in bê halê matbûyî, dibû kurm û bi ruh û hiş diket. Ew kurm ne ên darê bûn! Mîsal, têgehên weke şerm, guneh û feodalî... “Şerma kurdan” ‘bêdengî bû, qebûlkirin bû, îteat bû, neçarî bû...’

Mexdûrên ji rewşa van têgehên ya di karwanîyê de, bêhtir jin, zarok û ziman bûn; taliya talî ew jî dibûn hemî civak. Em ê li ser

têgehane bifikirin, paşxaneya qelem û hişê entelektuelî û nivîskariya me carek din ê bi bîra me bixe. Hûn jî bûne şahid, hê jî şahidî dikin ku qelemên me ên navdar û azadîxwaz jî di heman demê de çiqas ‘şermok’ in! Her wextî dil tiştêkî gotiye, dev tiştêkî din; ên hatî gotin jî bi şermokî hatine gotin an jî bi awayek îndîrekt. Me her wext xîtabî hewa û valahiyê kiriye!

Biwêja, “Şerma giran eyba mezin” hem sebeb e hem jî em dikarin heman biwêjê bo encamê jî bikarbinin.

### **Şerma giran, eyba mezin.**

Miletêk wisa ku sînorê zimanê wan bi qasî sînorê gundê wan bû. Ji berên nivîsê mehrûm mabûn. Lêgerîna alternatîf û çareyên ji bo berên erd û zevîyan bi adan bin jî di civaka me de wek çalakîyek bû, zor bû ku însan haydar bana. Hersal nexweşiyên negiran jî qismek dergûşên salê digirtin û dibirin bo axa sar. Di nav xwe de jî kurd xwedî “maqûl” û “kurmancan” bûn! Ên herî şermok “kurmanc” bûn. Alewî bûn. Fileh bûn...

Bi berên devkî û folklorîk cîhana hesta xwe berfireh dikirin, xwedî dikirin, ji bo zêmaran newayên baş çêdikirin lê hiş li hemberî hest her têkçûyî bû. Kurdê ku li hemberî saziyên toreyî û dewletê “şermok” bû, “efendî” bû, hêjayê eferimê bûn, di têkiliyên di nav xwe de, ên bi malbatê re, wekî “pîm” bûn, îhtimala teqînê her kêlik bû. Ji ber wî halê depresîf, şîzofrenîk, nexweş tiştên herî piçûk dikirin destpêka şer û mêr dikuştin! Heke were formûlekirin, şermokî maqûlî bû, bêdengî û bêîtirazî efendîti bû, êş qedêr bû!

Ji ber sebebên wisa ye, ku pirî kurd, rewşenbîr, entelektuel û nivîskar jî di nav de, bi awayek naxwazin peyva rabirduyê, têgeha dîrokê bibihîzin! Ya dihate/tê xwestin jî ev e! Însan wextê ketibe halek wisa êdî têkiliya wê/î û ziman, çand, dîrokê bûye têkiliyeke berbad! Hew di rewşekê de, rabirduya me bi bîra me dihate xistin ew jî wextê gefan bû; “Bila vegehin li rabirduya xwe binihêrin!” Wan rast digot, me nediwêrî, tije êş û elem e! Li vir, di edebîyatê de, em vereşin jî, êş li ser dilê me bibe kêr jî me divê em li rabirduyê vegehin. Çiyê me yê “saf” hene bi can û bi ruh bikin. Mîsal, “Ey avê av” saf e! Eşqa Derwêş û Edûlê saf e...

Çima behsa halê trawmatîk dikim? Ji bo sernav û naveroka vê nivîsê ev şert e? Helbet; di cîhana edebî a me de hûn ê pêrgî gelek encaman werin ku ava wê ji wan warên trawmatîk de de diherike!

Di cîhana edebî de jî em halê şermokî bes dibînin. Takekesî û azadiya qelemê arîşeyên herî sotîner in. Barê di warê edebî de ji

warê sîyasî girantir û zortir e; sîyaset li hemberî derve têdikoşe, edebîyat hem bi “derve” re hem jî bi “hundur” re mijûl e.

Peyva şerm, hê di piçûkaniyê de, li her ciyî, li dibistanê derdiket pêşberî insan. Teqriben deh salî bûm. Me lîsk dilîst. Keçîkek hate cem me. Dêya wê, pekand ser wê:

“Keçê çi îşê te heye li cem wan, ew mêr in, şerma giran. “

Halê bûka cîranê me hîç nayê ji bîr kirin; laçik her li ber dev û pozê wê bû! Nikarî vekira, ew jî eyb û şerm bû.

Şerm, halê şermokî, ji bo zimanê me jî rewşek xedar bû. Li bajaran kurd bi zimanê xwe nedixavîn. Şerm dikirin. Gerek xwe bidana qebûl kirin. Zimanek ku êdî zilamên diçûn leşkerî û bajaran jê fedî dikirin. Hukmê şermê li zarok, dayik û ziman dibûn. Taliya talî ew dibûn hemî civak.

## **Feodalî**

Kurd bi vê têgehê ne biyan in; hê jî tê bihistin û ji alî “elît” ên gewre ve, bi awayek çavgiştî, arîşe çî be jî wekî çareserî tê gotin ku heya arîşeya feodalî hel nebe ne mimkun e çareserî hebe!

Ew têgeh ne weke pergaleke sîyasî, wek rewşeke şermê û recimîkirinê ji devê wan der tê;” li rojhilat feodalîzm heye, ew feodal in”...

Çi ecêb bû, ji alî talana çandî û folklorîk ve tu sînor nedinasîn, ji stranan bigirin heya berên folklorîk ên din giş ji wê “civaka feodal”, ji “rojhilat” dihatin talan kirin. Îronîk e, ji Kurdî biwêj tevî Tirkî bûne piştî wextan kurd bixwe jî wan biwêjan weke biwêjên Tirkî dihesibînin di zimanê xwe de cî nadinê! Ev jo bo navdêran jî wisa ye...

Ev di destpêkê de bi awayek bi tevdîr hatiye kirin, Kurdî hatiye qedexekirin. Karê “berhevkarîyê” hatiye kirin. Giş li Tirkî hatine wergerandin. Helbet têkiliyên zimanan muhîm in. Ziman hev xwedî dikin. Lê a qewimiye ne ji têkiliyan bû, zimanek dihate tepiskirin. Ew kesên digotin “li rojhilat feodalî heye, kurd feodal in, pêdivî bi perwerdehiyê heye” tu car behsa ziman nedikirin!

Wan kera xwe li cem ewropa û dunyayê di siyê de girê dabûn; “Em laîk in, me civaka Osmanî serobino kir, hedefa me ewropa ye” digotin! Ewropa jî ji bo têkiliyên navxweyî ên wan çavê xwe digirtin.

Li vir, wext hatiye em behsa hukmê şermê yê ji ewropayê de bi ser kurdan de dihat jî bikin. Gelek berhemên ji alî mîsyoineran ve hatî nivîsîn divê ji nû ve werin xwendin, analîzkirin û şîrove kirin. Mîsyoner bêhtir ji bo hedef û mebestên sîyasî li cografayê bûn û

bi awayek normal, hukmê vegotin û rabêjyên sîyasî ên wan wextan li ser wan hebû û wan jî berhemên xwe di bin bandora wan atmosferan de dinivîsîn. Ji ber ku di dema modern de kurd bindest bûn û dîroka xwe nenivîsîn, ji alî aborî ve ne bi gef in, ne jî bi hukum in, herûher ew “berhem” bi bandor man.

## Encam

Têgehên “Hurcahil” û “Hurgeneral” bi bîr bînin. Di civaka kurd de, têgeha hurcahil û di ya tirk de têgeha hurgeneral heye.

Hurcahil û hur general. Heqîqeten jî di civaka me de cahil hur bûn, dîn hur bûn bi tenê, wekî din, zarok, jin û ziman jî di nav de tu azadî tune bû! Di civaka tirk de general hur bûn! Ji alî civakî ve hukmê wan li civaka wan jî hebû lê ji bo kurdan ew hem ji alî civakî hem jî alî neteweyî ve bi hukum bûn.

Peyva “jiyîn” ê ku ji bo Kurmancî xwedî çîrokeke bi wate ye; asîmîlevanên vî zimanî jî bi awayek diheyirîn, diheyirin bê çawa Kurmancî jiya, têk neçû! Çîroka jiya Kurmancî çîrokeke bi seyr e, ew qas jî ji bo kurdek ciyê şanazyêye; pirî caran hin kurd rexne li xwe û li rabirduya xwe digirin bê ji bo çi ketibûn halek perîşan. Însan bi çavekî dîtir binihêre, însan dikare bêje, bi tevî ew qas mercên xirab, parastina Kurmancî bi tenê diyardeyeke muhîm e.

Vêca em kurd hatine ciyek wisa, em dibêjin laîkbûn bi tenê ne bes e, demokratîkbûyîn jî muhîm e. Di edebîyatê de jî em ê edebîyata dunyayê muhîm bibînin. Em şerm nakin. Di jiyanê modern de rexne heye. Takekes heye.

Mala matê ew mal e em her ketinê. Ji lew çîrok her ew çîrokên di mala matê de bûn! Di ziman, çand û edebîyatê de ev wisa bû. Sîyasetê jî bi awayek, ew mal kiribû “mekanek têkoşînê”, heya ciyekî mafdar bû jî. Lê ji ciyekî bi şûn ve edebîyat jî çîrokên mala matê bêhtir ji alî şiklî ve gerek bi lêgerîn be. Ew mal hêdî hêdî dibe maleke fantastîk, hinakî. Belkî wê zimanê me bi berên edebî re, edebîyateke dunyayê re, bi wê malê re rûbirûbe û xwe ji xelekên şermê rizgar bike.

Di dewsa zimanê me bibe newayên pepûkê ê li her cî û dunyayê bibe çûçika çolê û bi çiveçiv be. Min li Stembolê, di Fûara Mishefan de (2014) gotibû, cografyayek bêhizûr, tarîxek bêhizûr û welatek bêhizûr heye. Gelo me ji bêhizûriyê karibû çi biafiranda. Kafka jibêhizûriyê edebîyateke muhteşem afirand. Dîsa di hevpeyivînekê de (www. bianet. org 29. 11. 2014) bersiveke min ya wisa hebû:

*“Têkiliya bêhizûrî û edebîyatê bes nehat gengêşîn. Tê hêvîkirin*

*ku bêhizûriya civakî weke lêgerînên takekesî ên edebî cî bidin xwe. Lê edebîyata me ji bo, ji înkare re "na" bêje, ji bo xwe îspat bike "êşê" lê kir. Ev normal bû. Lê ji ciyekê bi şûn ve ev bû halek dubareyî û edebîyatê bir mala zêmaran. Ji edebîyata modern tê hêvîkirin ku li hemberî zimanê êşê bi îtiraz be û zimanê edebî pêk bîne. Bi jiyane bi sêwirin re karibe tiştinan bi bîra takekes bixe."*

Mala matê maleke bêhizûr bû. Em ê pirsra xwe dubare bikin, gelo em ê karibin ji wê mala bêhizûr çî bisêwirînin...

## **ORYANTALÎZM Û FELEK, TEMSÎLIYET Û METNÊN SAF**

Di vê nivîsê de bi tevî hin problem û diyardeyan em ê balê bidin ser meseleya oryantalezim, temsîliyete û azadiya metnê. Gotinên Edward Saîd ên di derbarê temsîliyeta metnê de, bi tevî rewşa hin nivîsên derbarê edebiyata kurd de ên ansîklopedîkî, bi awayek, bûn sedem ev nivîs bête nivîsîn.

“Metn ji temsîla tiştêkî din bêhtir bi tenê xwe ye, ev bête gotin rastir e.” Em ê di “xwe” bûna metnê de azadiya metnên bi Kur-dî bixin navendê ku di edebiyata kurd de diyardeyeke muhîm e. Edward Saîd, behsa “agahiyên saf” kiriye. Metnên ku em dixwazin balê vekîşînin ser wan, ê ‘metnên saf’ bin! Ew metin ji bo me hew weke destpêk an jî bibin destpêkeke baş, nediyarkirî gellek muhîm in li hêlekê kelûpel in li alî din, ger heya wexta me hatibin ew xwedî azadiyekê ne.

Dem hatiye ku em ji temsîliyeta nivîskar (belkî ne hewlên temsîliyete ne, xwesteka tatmînbûnê, deşarjbûnê ye bi gelemperî), ji temsîliyeta edebiyatê wêdetir azadiya metnan bigengêşin; ji azadiya metnan jî ê metnên saf werin bîra me.

Ji xalekê wêdetir ê ev mesele, di çand û edebiyata kurd de, ê alternatîfek bi nav bike, rê, coho û nefesên nû vebike, bide edebiyatê.

Di serî de em ê temsîliyeta edebiyatekê, wekî dirûşme, qalib û xwestekekê têngihijîn; ji temsîliyeta edebiyatê azadiya metnan têngihijîn.

Ji bo metnên edebiyata kurd, heta metnên erdnîgariya me destpêkek wisa ê di serî de me ji elîmîn, tehekûm, xem û neçariyên me bike, azadî bide pênuşa me. (Van salên dawî, di edebiyata tirk de, metnên Mewlana û metnên derbarê Şems Î Tebrîzî de eleqeyek mezin dibînin. Herwiha em dikarin eleqeya li hember berhemên Mihemed Uzun de jî ji hêlekê ve bi vê ve girê bidin ku hin berhemên wî jî xwe ji metnên saf, metnên azad didan der. Metnên Mewlana, metnên derbarê Evdalê Zeynikê de, mijara di Hawara Dicleyê de tiştên ‘saf’ in, metnên azad in)

Têkoşîna ji bo temsîliyete, xwesteka temsîliyete, temsîliyeta heyî bi awayek bi problem in; bi piranî ji bo temsîliyeta civakê, temsîliyeteke dîrokî, temsîliyeta nivîskaran e; bi siyasetê re, li dû îspata hebûnê bûye. (Kesên hay ji edebiyata kurd hene, baş dizanin ku ji

nîvê sedsala hivdehemîn vir ve ev rewş domdar e. )

Rewşa tirsnaq a ziman û edebiyatê, di pêvajoya em behs dikin de, bûye sedem, bi daxwaza îspata hebûnê re azadiya metnê baş neyê dîtin.

Civak û edebiyat çiqas hevudu bi bîr bînin, nêzî hev bin, azadiya takekes û azadiya metnekê jî ew qas hevudu bi bîr tînin nêzî hev in.

Tiştêkî ji hukmê xwe û ji hukmê tiştêkî din, ji hukmê tiştan kirin, belkî ev nêziktêdayîn nefesê bide me, qalib, nêziktêdayîn û elimînan hilweşîne. Di çanda qurbanîyê de her kêlikê ihtimal e, tiştêkî bibe qurbana tiştêkî din; di edebiyata li dû statuyê ye, metn bûne qurban.

Esasgirtina azadiya metnê, gera li metnên azad, ji binavkirin, stûrî û temsîliyetan wêdetir ê me bibe analîz, şîroveyan watedartir. Li vir ji derî azadiya di nav xwe de (ev li dû analîz û şîroveyan dikare were fam kirin) di klasîkan de bi awayek azadiyek heye lewre ew azadî di heman demê de dibe sedem ew metn temsîliyetê jî bikin; Melayê Bateyî, Feqiyê Teyran, Ehmedê Xanî, Evdalê Zeynikê... Wekî nîşeyekê em destnîşan bikin axaftina Evdal a bi quling re, axaftina Feqî a bi teyran re di edebiyatê de hem red e, hem tercîhek e, hem jî serîhildana takekes e ku tîmayên muhteşem in. Ev bes in da em halê wan û metnên wan wekî metnên saf, azad bi nav bikin. Metna saf-azad a nivîskî ku metna pêşî ye helbet helbesta Boraboz e.

Têkiliyên metnên bi Kurdî çiqas aloz in, metn ew qas jî ne azad in. Li vir, bi tevî gelek sedemên heyî, em ê hewl bidin behsa hin sedem heta hukman bikin.

Piştî problemên edebiyata kurd, em ê balê bikişînin bê di nav edebiyata kurd de, edebiyat, civak û nivîskar çawa bûne sedem hin metn azad nebin, tîk biçin. Heger ev nebûya, ihtimal bû, metnên azad bi awayek tiştên dihate hêvîkirin bida bidestxistin; metnek azad bi tenê jî, ihtimal bû/e li dinyayê ziman, edebiyat û çanda kurd bida gengêşîn.

Derpêş û pêşniyarên di vê nivîsê de, heger Memê Alan mînak were dayîn (ku metnek azad e), ê ciyê xwe bibînin? Ev nivîs jî hewl dide vê rastiyê bi bîr bixê; ku kurdan wîzeyê xwe, keda xwe, bi rik, li vê metnê bigirtana, li her devera dinyayê, derfet bidana metnê ê çiqas nêziktêdayîn hilweşiyana?

Hişmendiya heyî azadiyê pir dide pêş, li dû temsîliyetê ye lê her li benda rojekê ye! Ê ew roj were, azadî xwe bide der, nivîskarên gewre derên, temsîliyeta çand û edebiyatê bête kirin. Ev wekî destpêk



tê hesibandîn. Edward Saïd bi destpêkê re girîngî li niyet û azînê jî digire. Îtiraza me, li vir, li hember azînê ye; em ê edebiyateke me hebûye, bêjin, demeke dirêj wekî demên wenda bihesibînin an em ê bi dû azadiya metnan bikevin? Li gorî min, derbirîna metnên azad ên bê zeman, gere muhîm bête dîtin.

Ji demekê bi şûn de metn û edebiyata kurd dikeve nav qeyranan em ê hin sedeman rê bidin, ji bindestiyê û zevt û zorê madetir pêdivî bi hukmê oryantâlîzmê heye ji bo edebiyata kurd rewşek awarte ye. Bi oryantâlîzmê re jî em ê behsa çavên oryantâlîst ên dûr, çavên oryantâlîst ên nêz û behsa çavên hundur ên girêdayî bikin.

Çavên oryantâlîst ên dûr: Em ê serî li mînakekê bidin, hem balkêş e hem jî di meseleya oryantâlîzmê de ji bo kurdan hişmendiyan dide der:

“Di romana Scott a bi navê The Talisman de (1825) Sir Kenneth, li çolên Felestînê li ciyekê, bi Sarazenekî ku bi teba serê xwe digere, pevdîçin ku kes nikare zora kesî bibe. Piştî Xaçî û dijminê xwe (ku dû re ew dijmin Selahadîn e ku qîlafet guhertiye) dest bi axaftinê dikin, Xaçî kefş dike ku dijminê wî ne kesekî ew qas xirab e. Dîsa jî şîroveya wî wisa ye:

‘Nîjada we a xafil ji şeytên î gemaî, bêyî alîkarî bistîne, vê xaka hatî pîrozkirin a Felestînê, li hember leşkerên Yazdan ên dilpola, ji şeytanê ku hûn nikarin biparêzin de hatibe... difikirîm. Gotina min ne ji bo te ye Sarazen, bi gelemperî ji bo gelê te û dînê te ye. Tişt a bi min xerîb tê ne ew e ku hûn ji zurriyeta şeytên in, ecêb dibînim ku hûn pê îftixar dibin. ’95

Lewre Sarazen bi rastî, Sarazen ji ber ku secera nîjada wî digihije Îblîs, Şeytanê Misilman îftixar dike. Scott, ji alî îlahiyatê ve ku Ewropiyên di sedsala nozdemînde nedikarî bikirana (lêbelê li vir dikarin bikin) bi Xiristiyaniyekî re êrîş dibe ser Misilmanekî ku sehneyê dixê halê sehneyeke çaxa navîn. Lêbelê li vir, bi rastî tişt a bi seyr ne zanîna dîrokî a lawaz e; tişt a herî bi seyr, heqaretên Xirîstiyaniyê bi awayek dilsar, bi gotina, qesta min ne tu yî, re her ku sivik dike jî gelêkî bi giştî jî bi gelemperî, bi ezameta piçûkkirinê re mehkûm dike.

Çi heye Scot ne pisporê Îslamê ye. (Lê H. A. R Gibb pisporê Îslamê ye ku pesnê romana Scott dide, li gorî wî, romana Scott derbarê Îslam û Selahadîn de xwedî têgihîştinên kûr e) Scott rola lehengê mumînan dide Îblîs ev jî bêberpirsiyarî ye.” (Edward W. Said, Şarkiyatçilik, Weşanen Metis, rp. 111-112)

Em dikarin gelek encam ji vir bi dest bixin; wekî xwendevan jî

dizandin, Xaçî û Selahaddîn li ser xaka Felestînê şerê dijwar kiribûn. Scott, her ku navê kurdan hil nede jî, xîtabî Selahaddîn û nîjada wî dike ku Selahaddîn bi nîjada xwe kurd e. Scott, kurdan wekî ji zuriyetta şeytên, hesibandî ye. Heger wekî Edward Saîd îda dike qesta Scott bi tenê misilman bûna ê bi taybetî behsa nîjada Sara-zen nekiriba.

Saîd, Scot bi nezaniyê tawanbar kiriye ji ber bêagahbûnê ku Scott Îblîs wekî lehengê Misilmanan derbiriye. Lê Scott Îblîs wekî lehengê kurdan daye der. Bi ihtimalek mezin Scott hay ji êzdatiyê hebûye. Edward Saîd an bêagahî bûye an jî wî jî nexwestiye nîjada Selahaddîn û qewmê Selahaddîn bi nav bike! Di vir de mesele heye, heger ku Edward Saîd zanibûye, heger ku dizanî, ger behsa van rastiyan bikira ê di meseleya oryantaliizmê de neçar bima da bi qasî Felestîn û Misrê behsa Selahaddîn û qewmê wî jî bikira!

Encameke din jî ev e; Ew Selahaddîn ê ku tu car kurdbûna xwe jî bo xwe nekiribû xem, xwiya ye bi lehengbûna xwe nefret xistiye dilê gelean ku ew kes gelê wî piçûk bibînin.

Wekî tezekê mijareke muhîm e bê çî bandora kurdbûna Selahaddîn li nêziktêdayîna rojavayiyên lêkolîner û pispor hebûye?

Bi qasî dîtinên hin mîsyonerên ku li erdnîgariya kurdan bûne mêvan, li gorî berjewendiyên xwe ên rojane, bêyî lêkolînên kûr bikin, derheqê kurdan de baş û nebaş nivîs lêkirine; Layard, di kitêba xwe de, (Ninovanin Kalintilari, Weşanen Avesta) li gorî jiyana rojane û eleqeya dîtiye nivîs lêkirine; li malbatekî bûye mêvan hurmet lê hatiye girtin reng û naveroka nivîsa wî guheriye, di heman wextî de ku pêrgî kurdên rêbir hatiye jahr ji nivîsa wî bariye. Kesên ku bi nav lêkolînan ketine jî hebûne. Nebûna çavkaniyên nivîskî gelek zehmetiyan derxistiye pêş wan. Lêkolînên hatine kirin kêma û ne berfireh in. Em nikarin behs bikin bê baş hay ji kurdan hebûne. Hin dîtinên subjektîf, ên pozbilind ên mîsyoneran ger em bihêlin li dera ha, kesên wekî Roger Lescot, bi xebata berhevkirina Memê Alan re berek nivîskî hiştiye. Tiştên muhîm li vir ev e; Lescot bi tevî ew qas keda xwe ji hin derfet û agahiyan bêpar maye, ev jî bûye sedem derbarê destanê de encamên rast bi dest nexe.

Di pêşgotina xwe de Lescot, ji alî çavkanî û bingehe ve destanê daye ber lêpîrsînan.

Piştî hin ihtimal û îdayan Lescot wisa gotiye:

“Eşîretên kurdan, bi giştî wek du êlên mezin ji hev tê veqetandin: Milî û Zilî (an jî Silîvî). Yanê êlên Botan Silîvî. Dibe ku Memê Alan di

destpêkê de Silîvî bû? Hêjaye ku ev pirs bê kirin, lê belê mixabin ne mumkin e bersiva wê bê dayîn, ji ber ku îro êdî em maneya van her du peyvan (Mil û Zil) nizanin.” (Memê Alan, Weşanên Avesta, 1997)

Wateya her du peyvan jî tê zanîn. Mil: pî, Mil: hêl, alî. Zil: Awayê nêriyê kinkorê ê hişk bûyî. Wekî pêşgir wateya bilindbûnê dide der.

Ev weke mînakeke hêsa û li ber çav diçespîne ku lêkolîner ji derfetan bêparbûne, carna tespîten ne li rê hatine kirin.

Edward Saîd, oryantîzmê, wekî dîroka wendayiyên şexsî û parçebûna neteweyî destnîşan kiriye. Bi tevî rewş û halê kurdan, ji hukmê çavên nêz ên oryantî, wendayiyên şexsên kurd û parçebûna neteweyî ketiye halekî trajîk.

Çavên oryantîst ên nêz:

Ji çavên oryantîst ên ereb mînakeke balkêş di van deman de hatiye jiyîn. Rojnameya Rudaw (03. 07. 2012) bi du kurdên li Ewropa dijîn re hevpeyvîn kiriye. Behsa gazin û rexneyên ji wan ciwanan yekî hatiye kirin:

“Ciwan jî axaftinekê tîne bîra xwe derbarê nijadperestiya opozisyona erebî de, ku opozîsyonerê navdar Heysem el-Maleh di civînekê de li Stenbolê gotiye. Wî henekên xwe bi Kurdan kiribû, ji ber ku dawa mafên xwe ên netewî dikin, el-Maleh gotibû “Li ba Kurdan tenê şerwalek û du dîlan hene”. Ciwan wiha pêde diçe: “Eger ev opozîsyonerê ku qaşo parastina mafên mirovan dike wisa diaxive, ma tu yê ji opozîsyonerê din çî hêvî bikî?”

Ew kesê Erebiyê ku îro ro îda dike li Sûrî dîktatorî heye (helbet heye), têdikoşe ku Sûrî bibe welatekî azad, xuya ye bi zînetê xwe ne azad e. Hin rojavayî û çavên oryantîst ên dûr bi çî çavî li wan nihêrîne, dinihêrin, ew jî vedigerin, bi heman çavî li gel û çandên bindest dinihêrin! Na, a ku ew dikin bêtartin e lewre di nêrinên hin oryantîstan de piçûkdîtin hebe jî înkâr tune, tiştê wî kesî kiriye hem înkâr e hem jî piçûkdîtin e.

Di dema Osmaniyan de înkara hişk ne mijara gotinê ye. Em nikarin behsa çand û edebiyateke di karwanîyê de a bi rêkûpêk bikin. Rewşa împaratoriye, nasnameya olî, halê edebiyatê kiriye halekî, ne mir ne jî! Dîsa jî li ber ‘çavên nêz’ kurd ‘ên din’ bûne.

Osmaniyan wextê berê xwe dan rojava, fikrên îtihadîyan hêdî hêdî înkariyê daye der.

“Di rêveberiya Îttihad-Terakkî de, fikra tirkîtiyê a fermî, wekî di qadên jiyane ên din de, derheqê giravurên kurd de jî xwe daye der...”

Ji mînakên herî tîpîk jê yek “Fata Reş” e ku di şerê Osmanî-Rûs de lehenga jin a meşhûr bûye. Di lîteraturên welatên ewropî ên wekî Elman, Fransa, Avusturya, Îngîlîstan, Swêd de, “Şahbanûya Kurd”, “Lehenga Kurdistanê”, “Fata Reş a Kurdistanî” Amazona Kurd”, di lîteratura Osmanî de, “Cengawera Kurd, Mucahîda Kurd, Şahbanûya Kurd” wekî bi rengdêran wanî derbas bûye; di lîteratura kurd de ku wekî “Fata Reş” hatî bibîranîn, lêbelê piştî îttihadê, ji nişka ve wekî “ Fata Reş lehenga turk” hatiye bilêvkirin. (Mehmet Bayrak, belgeyên kurdolojiyê)

Ew pêvajoyê û şertên wan deman muhîm in; piştî şerê Osmanî û Rûs bi sedhezaran kurd têne koçberkirin. Di kovara Jîn hejmara sêyem de pirsek tê kirin:” Li wîlayetên Wan, Bedlîs û Erzeromê çi ma?” Di kovarê de hatiye destnîşankirin ku ji hersê bajarên 418. 504 kes hatine koçberkirin bajarên rojava ên tirkîyê. Di kovarê de behsa halê koçberan ê perîşan hatiye kirin. Di heman hejmara kovarê de kesekî bi navê “Bir Kurd Genci” di nameya xwe de gazin kirine ku kurdên bajarî xwe li ziman, kurdbûnê nakin xwedî:

“ Li van deveran, li nav bajarokan, li çarşî û bazarê, di axaftinê de, gotinê de bi tevî Kurdî têne bikaranîn, ehlê qesebeyan luzimî pê dibînin da xwe ji kurdbûnê dûr bigirin. Ji ber ku gundî pêrgî heqaretê tîn, mehkûmê zulmê ne, ji qedrê bêpar in, kurdên bajarî bi teredud in ku xwe li navê kurdbûnê bigirin.”

Bi tevî hewlên edebî, hin hêviyên ku ji şer têne kirin (kurdan hêvîkirine da piştî şerê rizgariyê ê ew jî bibûna xwedî maf), piştî komar têne avakirin, sozên ji bo kurdan hatî dayîn bi cî nayên, kurd hay ji halê xwe çêdibin, bi îtiraz dibin. Kurdî bi tevî parastina nîrxan wekî talûke têne dîtin, êdî derfetên jiyîna ziman û edebiyatê bi yekcarî têne tunekirin. Înkareke hişk xwe dide der. Temsîliyeta edebiyatê li dera ha, rê li ber metnan têne birîn.

Hewl û gavên wekî Hawarê ji azadiya metnê bêhtir li dû temsîliyeta çand, ziman û edebiyatê ye, îtirazek e, serhildanek e.

Hawar li hêlekê li dû vejînê ye li alî din hewl dide ziman û edebiyatê modernîze bike. Li Kafkas di heman demê de folklor çavkaniya herî xurt e, bi folklorê re meş didome; rewşa rûsya a siyasî û îdeolojiya wan jî, bi navê civak û gelparêzîyê edebiyat bêhtir bi hêmanên folklorîk re têne kirin. Ew ji temsîliyeta bêhtir li dû vejandinê ne lewre li wir înkare ne mijara gotinê ye. Lê wekî azîna azadiya metnê çiqas li pêş e gere bête gengêşîn; însan çiqas karibûne ji derî pergalê bifikirin û biafirînin?

Li vir wekî xaleke girîng gerek nêzîktêdayînên li folklorê were

şîrovekirin, li ku çavkanî ye, li ku wekî ala hebûnê hatiye bikaranîn?

Bi tevî folklorê, lîteratura klasîk jî kirine sîper, ji ber rewşa xwe, her tim têkiliyeke dilînî xwe daye der lê mixabin em nikarin di de-meke dirêj de behsa bi dehan analîz û nirxandinan bikin ku derbarê folklor û lîteratura klasîk de hatibe kirin, niyeta me ne ew e em bêhurmetî li hin lêkolînerên hêja bikin, tiştê dibêjim di qesta li dû metnên azad de der dibim. Heger em serî li têgehên Saîd bidin, bi piranî, “sofftiyek dilînî” xwe daye der. “feraseta şîroveyên rasyo-nalîst” (Edward Saîd vê esas girtiye) kêma e.

Heya niha jî têkiliyên hin kesan, folklor û klasîkan hinekî wisa ye.

Halê çavên hundur ên girêdayî:

Tu kes bi destê xwe çavê xwe girê nade lê heger em li qonax û rastiyan heyî binihêrin em ê karibin bi awayek, ji ber sedemên cuda, behsa çavên girêdayî bikin. Ew an nivîskarên bi Tirkî dinivîsandin ew in, an siyasetmedar in, an jî di bîst- sî salên dawî de hin kesên bi Kurdî dinivîsandin, dinivîsin in ew in.

Em ê bi bîr bixin kesê jana Kurdî û halê kurdan gelek daye dilan jê yek Seyda Cîgerxwîn e ku di helbesta xwe de ji bo temsîliyeta kurd û Kurdî her deng bilind kiriye. Ev rê dide hewlên temsîliyetê û îdeolojî bi awayek nêzî hev in. Di nav helbestên mamoste de helbestên saf-azad jî hen in ku însan dikare bisenîfîne ku ji helbestên wî ên din cuda ne. Ew helbestên wî li kîjan zimanî bêne wergerandin jî ê halê saf azad bidin der. Ev ne rexne û darizandin e, rastiyeke e berên edebî ên li dû temsîliyetê an dibin malê neteweyekê an jî dibin malê îdeolojiyan. Li dinyayê ev her hebûye û ê hebe.

Li vir, bêhtir ji bo Bakur em ê salên heftê bi bîr binin. Di wan salan de xebatên edebî ên bi Kurdî bi qasî serê misqalê ne.

Siyasetê ûtopya daye pêş her kesî, însan hew mane li benda rojekê, ê ew roj bihata, rewşên azad xwe bida der, edebiyata azad bihata kirin; çepgirên vî welatî bi awayek gelek kesan qanîh kiriye, ka bila sosyalîzm were ê her tişt hel bibe!

Sosyalîzm nehat, bi ser de jî bi donzdê îlonê re, zevt ji înkare wêdetir dibe, tê xwestin her tişt binax bibe.

Salên heftê û mantelîteya wî çaxî muhîm e lewre bi awayek, edebiyata sirgûnê tê binavkirin, ji kesên di wan salan de koçkirine xwe dide der. Ew kes an bi dû temsîliyetê ketine, an bi xebatên folklorîk re, bi têkiliyeke dilînî re, bi dû vejandinê ketine an jî wekî gava Hawarê bi dû modernîzekirinê ketine. Bi tevî ked û afirandinên hêja

(mînak Kovara Kurmancî, xebatên derbarê ziman de) temsîliyet ji bo kesên li Ewropa jî bûye xem. Balkêş e ku ji alî wan ve metnek saf-azad li wan deveran nehatiye nasandin (ji nasandinê mebest gelek azî nû awa ne)

Temsîliyet tore bû. Bi tevî vê hukmê çavên oryantalist ên li ser wan jî bûye gedîgek, hûn ê di nivîs, berhem an jî hevpeyivînên hin nivîskaran de bes pêrgî derbirînên wisa werin:

“Edebiyata dinyayê tiştekî din e... Ez edebiyata dinyayê dikim... Eşq sînoran nas nake...Edebiyata ez dikim cuda ye...” Behsa nelirê-bûna van derbirînan nakim lê di gotinan de xemek hebû, hewlek hebû, têkoşînek hebû ku bixwazin hin nêziktêdayînan, zînetan biguherînin.

Kesên ji welatê xwe dûr, ji ziman û çavkaniyên xwe dûr, bi tevî hewlên xwe jî modernîzekirina ku hêvî kirine bi dest nexistine; di wan şertan de, ji axa xwe dûr helbet ê hêviya çirûskan ji wan nedihat kirin. Pirsra ku, gelo kîjan nivîskarê kurd hîni zimanekî Ewropî bûye, bi nivîsên xwe, analîzên derbarê metnên kurd de kiriye? Min hay jê nîn e. (Behsa agahiyên ansîklopedîkî nakim)

Ji alî edebiyata nivîskî ve tecrube û ceriban xwe li wir daye der. Lê em nikarin li wir jî hewlên ji bo metnên azad bibînin, belê behsa edebiyata dinyayê hatiye kirin, behsa azadiya nivîskar hatiye kirin lê bi awayê ku hatiye hêvîkirin nêziktêdayînan xwe nedaye der. Xwestine ku edebiyat ji bin hukmê siyasî û îdeolîjîyan derê lê di pratîkê de, ew jî ketine xefîka xwestekên temsîliyetan, bi awayek, belkî bêyî hemdê xwe, wekî “ez” ê ne nivîskar, bi nav siyasîetê ketine. (Proust behsa du ‘ez’an kiriye, ez a însan, normal wekî her kesî û ‘ez’ a afirîner). Ji ber rewşa kurdan wan fikrên xwe gotin, daxuyanî dan (Mihemed Uzun, Şivan Perwer hwd. ) kurdan jî ji ber halê wan ‘ez’ a wan a afirîner kirin qurbana sekna wan û daxuyaniyên wan! Di vî rewşa nebaş de gelo em ê karibin behsa pariya xeletiya wan jî bikin an na, ev jî meseleyek din e. (Halê bi polemîk, daxuyaniyên wan, îtirazên dihatin kirin, meseleya tawankirina populîstbûnê... li derî mijara me ne)

Mihemed Uzun, bêhtir xwe li vejandinê girti ye. Di hawara Dicle cildê yekem de wî gotiye, min xwest denga bigihînim we. Dengê jîbîrbûyîyan. Uzun bi dû ketiye hefizeya civakê nû bike. Bi wî awayî nasnameyeke edebî, temsîliyeteke edebî bête bi dest xistin. Deşîfre tune, neql heye. Bi tevî pir behs dikir bê takekes çiqas muhîm e jî heya romana wî a dawî em di berhemên wî de wê rastiya takekesî baş nabînin. Bi tevî vê em hinekî berhemên wî, ne bi temamî be jî, ji

ber mijara wan dikarin wekî metnên saf bi nav bikin.

Bêyî em gotinên wî analîz bikin me divê em dengê wî yê xîtabî wîjdanê kurdan dikir jî bi bîr bixin, wî ji kurdan re digot, me jî zulm û zor li 'ên din' kiriye. Ev dengê bi bandor bû ku dibû sedem mexdûr jî karibin pirsan ji xwe bikin.

Bila metnên wan ên edebî bi tevî mafê xwe bimînin li ciyê xwe, lewre mebest ne nivîskarî û berhemên wan e, ev mijareke di ye, lê em neçar in balê vekişînin ser hin rastiyan. Hukmê çavên der ew qas bandor li wan kiriye (bila bi gelemperî neyê dîtin) wan her hewl daye bêjin, binihêrin em jî dikarin wekî dinyayê edebiyatê bikin, edebiyata me a li sirgûnê naşibe edebiyata li welatê me! Heta di salên nodî de, hinan ji wan kesên li welêt dinivîsandin wekî nivîskar nedidîtin!

Hewlên îspat û temsîliyetê mixabin nehiştiye li sirgûnê jî metnên azad bêne dîtin. Ji bo pirsgerêka kurd, li Abantê di civînekê de Burkay bi dû ketiye îspat bike da ziman û edebiyateke kurd heye. Lewre bi xwe re ferheng û berhem birine civînê. Kesên tirk hewla wî, hem ecêb dîtine hem jî li xwe girtine, hinan ji wan, ma hewce ye tu îspat bikî, me hay ji ziman û edebiyata kurd heye, gotine. (Orhan Miroglu, rojnameya Taraf, 05. 07. 2012)

Ev çima muhîm e? Burkay hem siyasetmedarî dike hem jî helbestvan e. Ew salên dûvdîrêj li Swêd maye. Di bin hişê wî de, temsîliyet û îspat hê jî wekî tiştên herî cidî ne! Xuya ye, sirgûnî bûye sedem (bi tevî derfetên teknolojiyê jî!) ew ji her tiştî dûr bimîne, wekî biyaniyekî be.

Li sirgûnê nostaljî, carna halê melankolîk ê bi edebiyatê re problem derxistine. Ev hal li welêt jî bûye bela serê nivîskariyê heya wextekê.

Heger, temsîliyeta şexsî û edebî, îdeolijîk nebûya xem û armanc, azadiya metnê esas bihata girtin û nêzîktêdayîn li metnan bûya ê problem û hin ecêbiyan xwe neda der. Ji ber ku dawîya dawî metn û halê azadiya metnê esas e. Nivîskar bi xwe jî pirî caran bi navê temsîliyetê tecawizî azadiya metnê dike.

Li vir em ê nîfşê nodî bi bîr binin. Ew nîfş, ji ber rewşa siyasî jî, ji xwe bawer xuya dike ji alî hukmê çavên derve ve; bi awayek diruşmeyî, ji her tiştî re, na, dibêje. Ji ber adetên demê, jakobenîst tevdiqere. Problem di heman nîfşê de jî serdest e, meseleya temsîliyetê. Dîsa tê ji bîrkirin ku temsîliyet, fermî ye, li dû temsliyetê ê otorîte xwe bide der. Halbukî metn û azadiya metnê tişteki rewşa ye.

Lê nifşê Nodî jî an bi awayek bi dû îspatê ketiye, bi siyasetê an jî li kêleka siyasetê meşiya ye, an jî têkiliyeke dilînî bi folklorê re li dar xistiye. Heya salên du hezarî jî bi gelemperî rewş hinekî wanî bû. Nivîskarê vê nivîsê jî, di sala du hezar û yekî de kumê xwe daniye ber xwe!

Li dû salên du hezarî meseleya hebûnê, cî dide gengêşiyên cuda, û hê jî bi awayek dom dike. Deng bi gelek kesan ket ku problem ci-dîtir e. Kesên xwe li nirxandinê girtin, ên bi dû azadiya metnên xwe ketin, ên dest avêtin metnên klasîk ku azadiya wan bi bîra me bixin.

Hêdî hêdî deşifrasyon û pirsên bi wate xwe dan der. Mixabin, hê jî hin kes an derdor dev ji nexweşiya îspata temsîliyê nakin; bi navê temsîliyeta edebiyata kurd an wekî kom, heval derdor an jî şexsan didin der ku ew temsîlkar in. Ev çî wext, bi çî awayî lewitî nifşê nodî, gere were gengêşin.

Ev neheqiyê mezî e li edebiyatê tê kirin. Bi ser de jî kom an jî derdor ji fikir û nêziktêdayinan xwe nedane der; li ser têkiliyên şexsî, hevaltî an jî berjewendiyên xwe dane der.

Me behsa taybetiya nifşê nodî kiribû ku ji xwe bawer bû. Ev muhîm bû, ev bû sedem gelek nêziktêdayîn hilweşin û metn bi awayek nefesê hilgirin. Wergera ku ji zimanên din hate kirin, xebatên derbarê ziman de, amadekirina ferhengan, rik û gengêşiyên cuda, bêhtir heya wextekê di helbestê de, helbestên bi azadiya xwe, reng wergirtin û gelek tiştên din gerek bête bîr xistin. Vî nifşî heya wextekê, bêyî kompleks, hem hurmet li edebiyata sirgûnî girt, hem jî li kelepur û xebatên rabirduyê.

Mixabin piştî wextekê gelek kesan xatirê çavên nêz muhîm dît û xwe neçar dît, tiştinan bêje an jî hewl da xwe bide begemkirin.

Wekî xaleke muhîm, çerçawa di civakê de, di jiyane de kurdan têgeha "felekê" bikardianî, di çand û edebiyatê de jî, têgeh neyê bikaranîn jî, ji nêziktêdayîn û hişmendiyên em fam dikin ku gelek kesan di her wextî de, gazin ji 'felekê' kirine; axî kîşandin e, xwe neçar îs kirine, xwe dane çêr û dijûnan, di heman demê de her hewl dane xwe ji xezeba felekê rizgar bikin, xwe bidin îspat kirin, temsîliyê bi dest bixin.

*"Seyrê wê ke çawan felekê çî kirye bi zumrea kurdziman,"* Helbestvan Kurdi 1809-1849

Heya niha û hê jî, di berhem û pexşanan de em pêrgî trajediya ku 'felekê' kiriye tîn



(Ji bo çand û wêjeyê) Pîrsek: Gelo çi wextê qeweta ‘felekê’ li Boraboz, Melayê Cizîrî, Evdalê Zeynikê... bû? Tu car. Dîtin û afirandina metnên saf-azad kuştina ‘felekê’ ye!

Wekî nişeyekê, ger di serî de nivîsevanî û edebiyata kurd bes bi dû biketa bê ‘felek’ çi ye, çima li me wisa dike, heya niha meyê navê felekê ji bîr bikira belkî navên dî li rewşê bikira lewre têgeha felekê hinekî jî neçarî û halê demên jiyana arkaîk bi bîra me tîne. Derbirîna felekê, hewlên temsîliyetê, ji mercên heyî, dibe sedem ku em carna lawaziyên xwe, nexweşiyên xwe, kêmaniyên xwe ji bîr bikin ev jî rê dide rebeniyê, dubarebûnê. Dîtina metnên azad, hewldana metnên azad ê me ji xemekê bike ew jî ev e; gelo edebiyata ku em dikin dişibe edebiyata dinyayê, gelo ez ê werim begemkirin...

Çavên oryantalist ên dûr, çavên oryantalist ên nêz, çavên hundur ên girêdayî bi tevî rastiyên din ên girgîn ruh didin ‘felekê’! Felek wekî bêşensî, qedera bi karesat jî dihat têgihiştin lê edebiyat, nivîs niare wate li van nêzikahiyan bigire, wekî sedem jî nabîne.

### **Rewşa metnên Kurdî**

Bi metnê re em neçar in halê ziman jî bifikirin. Heya dema modern ji bo metnê problema ziman nîn e. Di demên modern de metn bi awayek bê nefes dimîne lewre ziman di hemî waran de nayê bikaranîn, tê qedexekirin. Zimanê ku li gorî tevn û honaka xwe ji berên edebî re dikaribû bibûya taqet di heman demê de ji bo hin tevn û honakan, ji ber halê xwe ê birîndar, sînor datanî/datîne. Kurmancî bes bû da Hawara Dîcleyê bihata nivîsîn lê honaka romaneke Kurdî derbarê kîmya, psîkiyatî an jî tendirustiyê de bûya/ba ê nivîskar karibûya binivîsiya an binivîsîne, helbet, na. Martin Van Bruînessen, zimanê Kurdî hê modernîze nebûye, gotibû, hêvî dikim di vê wateyê de gotibe. Uzun ceribên xwe bi Tirkî û swêdî nivîsandin e! Çi wextî hemî nivîsên tîorîk, ceribî bi Kurdî werin fikirîn û nivîsîn, ziman di her warê zanîne de were bikaranîn ê birîn li ziman rihet be.

Piştî klasîkan metnên Kurdî bi travma ne. Bi qeyran in. Di qeyranan de kêm be jî hin metnan azadiya xwe esas girtine. Di çîrokê de mînaka herî muhîm, Eyloyê Pîr e. Ji bo metna azad em ê mînak bidin. Di romanê de, Jana Gel, ji alî bikaranîna ziman û şeweyê ve bi dû azadiya xwe ketiye.

Sigmund Freud, karberiya (îşlev) xewnan têrkirin û bicîanîna xwestekan e, gotiye. Dîsa gotiye, xewn, bi termên kêma, aşkerekirin û servekirina raz’an e.

“Xewn a di wateya ferhengî de, em, metna xewnê, xewn û tiş-

ta li paş xewnê ku em lêdigerin em ê, fikrên dizî ên xewnê bêjin.” (Freud, konferansên derbarê psîkanalîzê de, konferansa yekem)

Ne bi wateya nêzî ûtopoyayê heger em bi wateya nêzî wateya ferhengî têgeha xewnê hildin dest, metnên Kurdî, ên li dû klasîkan, bi piranî bişibînin xewnan; wekî têrkirin û bicîanîna xwestekan terîf bikin. Dîsa gotinên Freud ê ji me re bibin referans, û em ê heman tiştî ji bo metnên Kurdî bêjin ku ew bi gelemperî bi dû ketine raz’an serve bikin. Di metnan de fikrên dizî mişt in.

Metnên ji ûtopoyayê dûr, ji xeyal û peroşên dewlemend bes xwedî nebûne her ‘xewn’ an bi bîr tînin, xewn in. Ji afirînerî, xeyal, honak û şîrovevî wêdetir rastiyekekê dide der. Takekes ji afirînerî, honandinê bêhtir dimîne li benda xewnan. Gelek kes ji xwe re xewnan dibînin an jî dimînin li benda xewnekê.

Nebûna dibistanan, zimanê ku ji perwerdeyê, ji dîsîplînên din, ji felsefeyê bêpar helbet takekes dike halekî wisa; di metnan de hest bi bandor e lê vehesîn û raman sayakî ne. Ji ber ku bi tîrs nêzîkahî li şeweya mît û çirçîrokan tê kirin, ji mercên hatî gotin, şewe û zimanê modern jî bi cî nebûye, li navberê, halekî tevlihev tê jiyîn.

Carl Gustav Jung:” Vehesînên me hebûna tiştêkî, raman xeber dide me bê ew tişt çi ye, hest jî kifş dike bê ew obje xwedî çi nîrxê ye.”

Bi tevî tîkiliya lawaz a bi objeyan re, di metnên Kurdî de, ji ber ku raman bes xeber nade, hest jî ji kifşkirina nîrxê bêhtir, nîrxên hatî kifşkirin dubare dike.

Tîkiliya bi objeyan re xalek muhîm e ku di honandin û hilberîna metnan de em kêmaniya vê rewşê di metnan de dibînin. Objeyê, di metnan de wekî rasteqiniyekê cî didin xwe bivênevê ber li metnê teng dikin. Bi vê re girêdayî figûr jî bêreng, bêruh, kêr û bêkar dimînin. Ger tîkiliyek xurt a hunerî bi objeyan re hebûya dê obje û figûran zimanekî din ê xweser di metnan de biafiranda ev jî ê bibûya sedem metn, ji bin bandora otorîteya karekteran (a rast em hê nikarin bes behsa karekteran jî bikin, leheng an jî insanên di nav jiyandê de, bi heman halê xwe di berheman de dijîn)

Jean Baudrillard: “Livbaziya hunerî ew tişt e objeyê vediguherîne objeyek hunerî.” Ji vê armancê bêhtir, xwestek û elimîn, tîkiliya lawaz a bi objeyan re dibin sedem obje di metnan de veneguherin.

Di metnê Kurdî de obje jî bi awayek dikevin xizmeta xwestekên temsîliyetê. Temsîliyet ji ber ku ji xwestekan jê yek e, metn pirî caran dibin qurbana xwestekên din jî. Di hin berhemên nivîskarên nav

dane de jî carna însan pêrgî peyamên ecêb tê, di metnê de halê xwestekên nivîskar beloq in. Carna jê jî metnê kiriye qurbana egoya xwe. Li vir meseleya deşîfrekirinê û egoyê an jî derbirîna xwestekan tiştên cuda ne.

“Proust behs dike ku, bi saya hişyariyên rojê re, feraseta me rabirduyê dikare bîne, dibêje. Bi bêhn, tehm, deng, rêbaza objeyan re, em li rabirduya xwe vedigerin, zemanê borî ji nû ve dijin, gotiye Proust.” (Ercan Anar)

Di metnên Kurdî de ev kêma e. Mihemed Uzun, bi deng re, vî tiştî kiriye. Lê metnên wanî ên wekî Proust behs kiriye kêma in.

Em li vir çavdêriyên Berques bi bir bînin: “ [Îslam] şexsiyeta cîhana wan ketûm tê xuya kirin. Di serê kesên diçin wan deveran de îmajê “şkeft” an jî “labîrentê” xwe dide der. Li hember derve, derî li xwe dadide. Xwe ji bersivdayînê dike, di nav sir, razên xweş ên tehdîtkar de wenda bûye, brîndar û însan ji rê dertîne... Hin jê dikevin kemîna mecazê...” (Kovara dogubati, adar, 2007)

Rastî û nerastbûn, niyeta van fikran ne mijara me ye. Heger em metnên Kurdî bifikirin ê giringiya hin tespîtên Berques ê xwe bide der, ew jî ev e ku di metnên Kurdî de em halê birîndarî, sir, ketina kemîna mecazê dibînin.

Di heman kovarê de, di nivîsa Enver Abdulmelik de, tespîtên Louis Massignon hatine pêşkêşkirin:

“ Xebatên ji alî wan ve tînin kirin ên şênber bi gelemperî di nav cîhana sembolan de a ku nayê tîgihîştin de wenda dibe.” Ev tespît jî dikare problemeke din a metnên Kurdî derbibe.

Encam:

Dîtina metnê, azadiya metnê di edebiyata kurd de bi porblem-bûye, bi problem e. Hukmê civakê, ê nivîskar, ê siyasetê, hukmê oryantâlîzmê, hewlên temsîliyetê, zevt û zora li ser ziman... Her asteng bûne li hember azadiya metnê.

Foucault, behsa “azadbûna cudahiyê” kiriye. Metn cudati ye. Azadiya metnê di vê wateyê de jî muhîm e.

Heger em di edebiyata kurd de behsa humanîzmê bikin, wekî destpêk gere em li dû azadiya metnên mezopotamyayî bin. Ferqa di navbera merhemet û humanîzmayê de xêzeke girîng e. Di merhemetê de serî misdan, teslîmbûn heye. Humanîzm di heman demê de tikuzbûna tîkiliyan e.

Said:

“Humanîzm, karwaniya takekes û vehesîna kirdeyî dixê navendê, ne fikrên qalibî û otorîteya hatî tescîlikirî.”

Îro rodi qada entelektuelî de, wekî vehesînên kirdeyî, giringiya ziman de îtiraz û hawar xwe didin der. Evdila Pêşew yek ji wna e, ku gotibû, êdî ziman her tişt e.

Fred Halliday di gotara xwe a bi navê “oryantalîzm ve eleştir-menleri”de, li ser sê babetên gelemperî ên di lêkolînên metnên rojava de sekiniye, ziman, dîn û guherîna dîrokî. Ji alî dîn ve kurd hem wekî babetek hesas zêde têkel nabin hem jî ji lêkolînan dûr sekini-ne, dîn an jî dînan ji bo xwe nekirine problem. Derbarê guherînên dîrokî de materyal nîn in. Ev jî bûye sedem, bêhtir aniha, kurd xwe li ziman bigirin, ziman û rewşa ziman derfet dide kurdan da karibin gotinên xwe bêjin. Azadiya ziman ji bo azadiya metnê şert e.

Li vir, bi tevî çand, ziman, edebiyatê bi gelemperî tore jî tevlî, em karibin bi qasî “na” bêjin, karibin “erê” jî bêjin. “Na” ya me îtiraz be “herêkirin” dîtina kêmaniyan, li xwe mukirhatin e.

Ismail Beşikçi, civaka kurd civakeke riziyayî ye, gotibû. Em nikarin ji bo metnan heman tiştî bêjin, metnên ku “neriziyane”, ên saf û heya roja me hatine weke zemînekê ne.

Halê riziyayî bi tevî gelek hêlan di edebiyatê de jî rastiyeke be lê ji bo metnan rewş cuda ye; metnên neriziyayî, azad henin. Me behsa klasîkan kiribû. Wekî mekan, metnên li Silêmanî xwe dane der hêjayî lêkolînê ne bê çî metnên neriziyayî, saf-azad hene.

Di civakeke riziyayî de, halê metnên azad! Ev derbirin, bi tevahî ê karibe bibe kurtebirîna vê nivîsê û pirsarmanca nivîsîna vê nivîsê. Bi vê re em ê teşe bidin îtirazên xwe. “Destpêk, niyet, azîn” (Edward Saîd) me li ser vê rewşê gere bi tevger be.

Derbarê formê de jî me divê em hin tiştan bêjin.

Jean Baudrillard: “Form tu car behsa heqîqetên dinyayê nake; form lîske e.”

Takekesê azad, ê bêxem dikare formên cuda biceribîne. Form jî bi qasî têma û naverokê, rexne û dijberiyekê dixwaze.

Kesên bindest, ne azad, li ser nîrxê, “dirustiya” hatiye elimîn her tiştê xwe binav kiriye. Lîsk jî bo kesên wanî rîsk e! Ji ber ku benê pê ve, benê bi rûn e! Di formê de jî ceribîn, tê wateya îtirazekê.

Di helbesta Kurdî de, em ê îstisnayekî bi bîr binin; Ehmedê Hu-

seyñî xelean şikandiye, ji alî lîskê ve gelek tişt serobino kirine. Lîska wî, ji alî formê ve, bêhtir bi ziman re ye; ji bo formên nû li ber ziman vebike, bêxem bi ziman dilîze, li nav çavên peyvandide, wan gêj dike, ziman neçar dihêle da derkeve derî wateya xwe, teşeyên nû bide xwe. Kesên ku helbestên wî dixwînin, ji alî ziman ve bi ser rêwitiyek nû dikevin, li ser pira ziman, a ku dişibe pira siratê xwe hîs dikin lê ê xema wan tunebe lewre bihuşt û dojeha li benda xwendevan hunerî ne.

Em ê çîrokên H. Kovan Baqî jî, ji alî lîskê û formê ve wekî gaveke muhîm bibînin. Ew jî ji alî formê û peyvê ve, hewl dide her tiştî ji halê bûkanî bike, laçika li ber devê û pozê bûkê bide hêlekê da karibe bi xezûrê xwe û bi mêran re biaxive.

Halê rîzyayî, tore, elimînên me, gera li çareyan, erizeyên me, nexweşiyên me, gavên me... Hewlên temsîliyetê, trajediya ku metnên me dijîn... Giş me tînin ber xalekê. Em gotinê Julia Kristeva bi bîr binin: "Heb an gotin", êdî, veguheriya meseleya hebûn û nebûnê." Em vê li rewşa me bigirin, gera li hebê û temsîliyetê an metnê, gera li azadiya di metnê de? Di vê cîhana sanal de, bi tevî ew qas probleman, gava destpêkê ji bo me muhîm e. Destpêka ku dixwazim vebêjim destpêka ji bo takekes e.

Em, ' ruhê xwe nefroşin şeytên' (Jean Baudrillard ji bo hukmê xirabiyê wekî ku însanan rihê xwe firotibe şeytên derdibe) lê ji bo destpêkê, ji bo azadiya metnê me divê em di rihê xwe de 'pariyê şeytaniyê' bihêlin.

"Vebêja moderniyê, bi halê xwe ê herî saxlem, xwe dispêre fikra azadî û xweseriyê." (Peter Wagner)

Xweseriyê metnê û azadiya metnê, ê bibe sedem ziman, metnê û edebiyata me zûtir modernîze bibe.

Ji derî mijarê, wekî anekdotekê dixwazim bîranîneke xwe vebêjim. Beriya çendekî ez û du dostên wêjevan, li devê bahrê, li ser kevîran rûniştibûn, di nav sohbetêke edebîde bûn. Dengê jinikekê bi ser me ket:

-Hûn dewrîmcî ne?!

Me, bi halê metelmayî li jinikê nihêrî. Jinika bi neviya xwe re li hember me rawestiya bû, sedema pîrsa xwe vegot:

-Lawê min jî wekî we ye, beşa felsefeyê qedand, bêkar e. Xwezî lawê min ji Xwedê bawer bikira.

Hevalekî min, bi navê me hersêyan, bersiv da:

-Em jî wekî lawê te ne!

Ez minminîm ku îtiraz bikim. Jinikê, li bahr û asoyê nihêrî, got, ka li vê pergale binihêrin, ev bêxwedî dibe? Pirsî.

Ev tablo muhîm e, sohbeta me ne îdeolojîk bû, ji ber ku em bi zimanê xwe ê zikmakî diaxivîn jînikê ew pirs ji me kir. Bi awayek ev dihat wê wateyê ku kesên bi Kurdî şîroveyên xwe dikirin, di çavên jînikê de Xwedênenas bûn!

Jinik bi awayek di nav neçariyekê de bû; wê ji Xwedê bawer dikir, ji zimanê xwe jî hez dikir lê têkiliya wê a bi rewşenbîrên civaka xwe re bi problem bû, nehatibû çareserkin.

Ger em, rewşa jînikê, halê rewşenbîrtiya me û metnê bifikirin, metn ji rewşenbîran bêhtir nêzî halê jînikê ye, baweriya jînikê û azadiya metnê tên heman wateyê. Rewşenbîr jî ji bo xema temsîliyê û îdealên îdeolijîk ên mezin, guh nadin xemên jînikê û halê metnê.

Heger di edebiyatê de em ji çarçoveya 'kurdûnê' derên, bi gelmperî Mezopotamyayê bi bir binin ku kurd di heman demê de ji şaristaniyên Anatoliyê jî bi tesîr mane, bi tevî edebiyata Faris, Tirk, Rûs, Ereb bi kurtasî di roja me de edebiyata dinyayê, em xwe li muhîmbûna metnên saf-azad bigirin ê di nivîsê de jî têkiliyên demokratîk, humanîst xwe bidin der ev ji bo jîyanê, ji bo takekes destpêka pirsên nû, nêziktêdayînen nû ye.

Kuştina felekê, metnên saf-azad! Tirsê felekê ji zanîngehan e! Metnên saf-azad jî bi zînetê şagirtên li zanîngehan re aj didin. Hêvî dikim da nivîsa me bibe sedem xwendevanên beşa edebiyatê derbarê metnên saf-azad de, derbarê edebiyata kurd a ku ji gelek hêlan ve hê bi moriya şîn re di xewnê de ye (ji alî analîz û nêziktêdayînen cuda ve) bi dilopên xwêdana xwe re şiyar bikin...

Tiştê bibe sedem ev nivîs, bi awayê xwe ê kêr, me bide fikirandin, ger

karibe bide fikirîn ê dîsa bi saya van gotinên Edward W. Saîd be:

"Destpêk bi tenê ne cureyek livbaziyan e, di heman wextê de halekî ruh, awayek xebatê, tewrek, zanînek e...Ji bo her nivîskarî destpêk, ji bo tiştêkî ku bi xala hîlbûnê a hatî tespîtkin ve girêdayî bi rê ketin e...destpêk bi tenê azîne na afirîne, di heman demê de, xwe dibe azîna xwe, lewre xwedî niyetekê ye. Bi kurtî, destpêk hilberîn e, afirandina cudahiyan e..."

## **Jêder:**

- Kovara Doğubatı, oryantalizm, Tartışma metinleri, adar, 2007  
Başlangıçlar, niyet ve yöntem, Edward said, weşanen metis, 2009  
Şarkiyatçılık, Edward Saîd, metis, 2010  
Psikanaliz üzerine konferanslar, Sigmund Freud, weşanen alter, 2010  
Kovara Dogubatı, hejmar 25  
Çagdaş Fransız Edebiyatı Eleştiri Seçkisi, weşanen wezareta çandê.  
Sanat komplosu, Jean Baudrillard, îletîşîm  
Şeytana satılan ruh, Jean Baudrillard, îletîşîm  
Modernliğin sosyolojisi, Peter Wagner, doruk  
Ruhun Yeni Hastalıkları, Julia Kristeva  
Antolojiya Edebiyata Kurdî, Mehmed Uzun  
Antolijiya Çîrokên Kurdî, Fîrat Cewerî.  
Kürtlerin örf ve adetleri, Mella Mahmûdê Beyazidî, Weşanen Pêrî  
Evdalê Zeynikê, Ehmed Aras  
Heciyê Cindî, Jiyan û Kar, Weşanen Lîs

# KARNAVALÊN LEYLÎ Û ŞEVBUHÊRKÊN NIVÎSKÎ

## Destpêk:

Ez ê hewl bidim nivîseke ‘bi kêfa xwe’ binivîsînim! Heke nîyeta we û xwendineke ‘bi kêfa xwe’ tune wê ev nivîs we aciz bike; hêvya pergalekê nekin. Nivîs ne nivîseke kêfê ye, nivîs bi kêf hate nivîsîn!

## 1. Kovar, karnavalên leylî û atolye

### Kovar

Beriya wextekê di têlefônê de piştî pirsîna hal û xatir kurtedîya-logek di navbera min û hêja Suleyman Çevîk de derbas bû, wî got; “Ger tu nivîsekê bo kovarê bi rê bikî ez ê kêfxweş bim, nivîs têra xwe têne lê em dixwazin di kovarê de qelemên rengîn hebin.”

Derbirîna, “qelemên rengîn” bila ciyê xwe bigre...

Ji salên nodî de ji kesên gelek nivîs dan kovaran jê yek ez bûm. Heya salên du hezarî nivîs û helbest bêhtir berên hestiyariyê bûn û min ew ji Rewşen û berdewamiya Rewşenê re bi rê dikirin. Pey re ji kovarên din re jî... Ne Nûbiharê ji min nivîs xwestibû ne jî min bi rê kiribû. Ji bo Nûdemê jî tiştek wisa qewimî bû, heya demên dawî min hewl dabû ez bi rê bikim ew jî Nûdemê dawî li weşana xwe anibû.

Hema bêjin rewşek jixweber bû çimkî di weşandina nivîsên di kovaran de ez bi tercîhên îdeolojîk tevnegeriyam. Hê jî wisa ye. Bi gotina Suleyman mesela “qelemên rengîn” hem nirxek e hem jî ji bo teheyûla jiyaneke hedefek e, ew hedef ji bo min jî muhîm e. Jiyaneke rengîn. Kovar bi taybetiyên xwe ên wisa gelek nirxdar in.

Di welatên azad welew jiyane normal de zanîngeh, saziyên sîvîl û hwd henin. Ew ji bo jiyane dibin reng û deng, pê re jî normal e ku kovarên wan ên edebî jî li ser seknên îdeolojîk, nêziktêdayîn û ekolî bi şikil bibin.

Helbet dawiya dawî kovarên bi Kurdî jî bi awayek bi nêziktêdayîn weşana xwe didomînin lê pê re sekneke demokratîk, weşaneke rengîn, gengêşiyên cuda, qenebe qismî be jî rê bidin, ê valahiyên di warên dîsîplînen din de jî dabigirin. Kovarên bi Kurdî, bi awayek, şevbuhêrkeke çanda nivîskî ye jî.

Her bi îtiraz bûm ku kovarên bi Kurdî bi tenê wek platformên qelemên nû werin dîtin; min her bi wî çav û hewesî lê dinihêrî ku kovar



ji bo ziman û edebîyata me bibin atolye. Wextê îmanên teknolojik pêş de çûn kêfek hate min, ê kurdan qada sanal ji alî erka atolyeyê ve bikarbianiya, mixabin, bû sebab tiralî xwe bide der, hin qelemên hêja, dikarin derheq edebîyat û zimanê Kurdî de gelek hilberînan bikin niha gotina xwe 'li ava sanal' dinivîsinin. Wisa dixuye ku dîsa rewşa atolyeyî dîsa bimîne li ser milê kovaran.

Heke kovarên bi Kurdî, bi qelemên rengîn, ji bo me bibin şevbuhêrkên çanda nivîskî em ê karibin gavên fesîh û xweştir biavêjin. Lê ku Kovar wek platformên "kesên ciwan û tor", wek bîrdoziyên teng werin hîskirin gelek warên edebî û çandî wê bimînin di valahiyê de.

Bi awayek wê mirov bikevin nava lêgerînan, di vê serdema sanal de her kes fikrên xwe, pirsên xwe li "ava sanal" binivîsîne.

Kovareke bi Kurdî wek weşanek zanîngehekê ye ji alî rengînbûna xwe ve. Afirandina nirxan (nirxên nivîsê û ên derheq jiyandê de) de rola kovaran pir zêde ye.

### **Atolye û nirx:**

Kovar ji bo çand û edebîyata Kurdî di heman demê de atolye ne. Ew atolye dibin sebab nirx û taybetî derkevin meydana. Taybetiyên miletan henin; helbet ew taybetî, ne ji ber taybetiyên nijadî lê ji mercên cografîk, mîtolojîk, çandinî, hilberînî, bawerî, olî pêk tên. Baş e, Qey gelek muhîm e ku meriv taybetî an nirxan tespît bike? Ma miletek nikare ji taybetiyên hemî miletan nêzikahî, nirx û taybetiyên herî baş bibijêre, li gorî bijareyan perspektîfek bide pêş xwe?

Helbet xweş xuya dike lê em li neteweyan dinihêrin, bi nîyet û destpêkê bi rihetî tiştên wisa naqewimîn. Tewr, nirx, nêziktêdayîn bi rihetî nikarin cî biguherînin lê veguherîna tewran mimkun e ji bo vê jî me divê em civakê xwe binasin.

Baş e, em pirsê xwe bikin, ger em bi çavê royê lê binihêrin ji nav kod û şifreyên kulturî em ê çî taybetiya kurdan bi dest bixin?

Çi di çanda devkî çî jî çanda nivîskî binihêrin hûnê bibînin kurd peyvekê wek alê li ba dikin; "şevbuhêrk"! Ku em dikarin bêjin ew karnavalên leyîlî ên çanda Kurdî bûn.

Di şevbuhêrkan de çî diqewimîn? Şahî diqewimîn, lîsk, vegotina çîrçîrok û destanan... Bûyerên tarîxî dihatin şîrovekirin. Meseleyên rojane, dunyayî dihatin şîrovekirin, gengêşîn... Bi kurtî şevbuhêrk dîwan bûn, rûniştinên bi dîsîplîn bûn, karnavalên leyîlî bûn. Ew giş dibûn sebab di cîhana zihnî ya tekekesên kurd de rastiyeke derê

meydanê...

Evliya Çelebi di gernameya xwe de tespîtek gelek hêja nivîsiye; Kurd Qur'anê jiber nakin, şrove dikin. Mihteşem e, ne wisa? Ev tê wê mehnê ku jiberî, qalib, dogma di çandê de zêde ne bi hukum bûne. Bi tevî ev karek muhîm yê lêkolînerî yê civaknasiyê yeji (bê ev nêziktêdayîn xwe dispêrin çi paşxaneyan)em dikarin hin çarçoveyên hatine detsnîşankirin bi bir bixin; hukmê cografya û şaristaniyan. Folklorek gelek dewlemend. Baweriyên wek bawerî û kulturên berfireh...

Piştî qismek mezin ji Kurdan dibin misilman jî Kurd nêzikahiya xwe ya şroveyi, nêzikahiyên xwe ên hebîner û xweşbîn berdewam dikin, ne bi tirsê lê bi şrove û bi baweriyek ji dil têkilî bi baweriyê re datînin. Henekên li mizgeft û li medreseyan meşhûr in. Kurdan tu carî di perwerdehiya dîn de tirsê dernexistine pêş. Ev muhîm e.

Pirî caran em kurd bi awayek hestiyar gazin ji xwe û ji pêşengên xwe dikin ku pêşengên me tucar berjewendiyên neteweyî dernexistine pêş yan berjewendiyên dînî yan jî ên îdeolojîk di ser her tiştî re girtine. Gelo bi rastî ev bi tenê tercîhên rêber û pêşengan ên şexsî bûne? Baş e, heke ew gel ji nêzikahiyên wisa re ne amade bin, rêber û pêşeng bi tena serê xwe dikarin qerarên wisa bigrin û bi rihetî têxin meriyetê?

Problema ku em bigengêşin helbet ne tiştên wisa ne. Ev rê didin taybetiyek kurdan ew e gelek felsefîk an jî nêzî felsefeyê ne. Ev di heman demê de di jiyana wan de cidiyetekê, heta nêziktêdayînen bi israr, sert jî dide der! Edebîyat belkî karibe bi reng, deng û jiyana xwe rengên din, tewrên cuda jî tevî jiyana me bike.

## **2. Bi dîmen mihteşem, bi jiyana xwe varoş û ji alî ziman ve ciyek jicurdekê**

Doho li Fûara Mishefan a Îzmîrê bûm. Ji wir derketim, çûm Keleha Qedîfeyê. Li wir, mi nanê tenûrê kirî. Komek kesên kurd tame dilîstin. Ji wir bi rê ketim, bi meş hatim. Li Kafe "Na"yê rûniştim. Mi li deftera xwe ev nîşe lê kirin:

"Bi dîmen mihteşem, bi jiyana xwe varoş, ji alî ziman ve curdekê... Li van deveran kuncî di bazarê de li ser dikana dibe "küncü", ziman wek nivîsên diwaran di devê ciwanan de, 'sapine qeder' dibe hevokên eşqê yên ji du zimanan pêkhatî û ecêb...

Li dû nîşeyan, ji ku tê hişê min nizamim, derbirîneke kurdan tê bîra min, digotin, nan û ava te xwar, vexwar bila ji te ra bin, tu ji me ra qala wir bike... Ez li deftera xwe hevokên wisa lêdikim; 'Divê em ji

kurdên bi qelem re bêjin, bila sîyaseta te ji te ra be, tu ji me ra qala ziman, çîrok û jiyanan bike...”

### **3. Ên pišta wan diêşiya**

Li gundan wextê hosta dîwar lê dikir, an jî avahî çêdikir hin kesên bêy kar, dihatin, rê li ber hosta dixistin, şîretan dikirin... Hosta merivên xwe dinasî, heke axaftin ne pêşniyar ba, şîret û rêliberxistin ba, li ciyekî hosta ji wan re digot, ca xêra dê û bavê xwe destê xwe biavê em wî kevirê mezin bînin, nîyeta wan tunebû ew destê xwe gemarî bikin, xwe aciz bikin, digotin, qe nepirse, ev çend roj in, pišta min keteye ber min!

### **4. Nîyet**

Li gundekî, du êl li hev bi rik in. Êvarekê rûniştine. Li hev dikevin rikê bê ka du nigên beqê hene an çar nig. Bi hev nakin aliyek dibêje didu alyê din dibêje çar!

ji yekî dipirsin. Ê pirs jê tê kirin dizane wê av heya ku biçe lewre ew bersivek wisa dide:

“Wexta beq xwe diavêje avê çar nigê wê hene, wexta çind dide du nigê wê hene!”

Ez dibêjim qey ‘nîyet’ mifteya gelek tiştan e; heke meriv beriya dijberî û nakokiyan, fikran, gotinan li nîyetê bifikire, nîyetê şîrove bike, nîyetê texmîn bike meriv dikare çareserîya herî xweş pêşkêş bike. Vêca ev bû bîst û sê sal min nîyeta xwe esas digirt li ser nîyeta xwe min nivîs didan kovaran, kovar ji bo mirovan dihate çî mehneyê ne muhîm bû, ji bo min kovarên bi Kurdî çî mehneya xwe hebû muhîm bû. Helbet dîsa jî carna êş dida min; ew nîyeta min dibû sebeb hin kes me “mezin”, “kesek” giran” nebînin! Di mejiyê wan de “vehesîn û hêmayek” qelema min ya teysok çênebe lê ez hê jî bi ya xwe me...

### **5. Kula Helebê û heqên kitimkiri**

Dibêjin dengê defê ji dûr ve xweş tê...

Carna derdên vê cografyayê bi taybetî derdên me kurdan nahêle em wî dengê derewîn yê xweş jî bibihîzin! Çiye mesele? Helbet heq tene kitimkiriin...

Her merivek ji derî sekna xwe ya ramiyarî bi nêziktêdayînên xwe ên şexsî di jiyana xwe de bi mehne dibin. Hûn dixwazin heqê qûl bêjin û dixwazin mafê mirovan bêjin, bi gotineke din meriv çî be, kî be jî heger heqê însan nexwaribe meriv dibe delala/delalê însanan.

Ji alî jiyana dinyadar ve ev nirxeke mirovahiyê ya herî muhîm e. Ji alî dîn ve jî Xwedê gotye ez dikarim ji heqê xwe bibihurim lê ez nikarim ji heqê qûlê xwe bibihurim.

Li vê cografyayê ev bi tenê bibe nirxeke di merîyetê de bes e ku gelek gelek mesele hel bibin. Di nav jiyaneke hewqas trajîk de min xwest ez van hevokên hestiyar jî lêbikim.

Em her ji bo xwe 'heq' dixwazin, ji bo mafê takekes û ên din hincetên me hene... Ev Kula Helebê çî wext ket nava vê cografyayê nizamim...

## AVAKIRINA KURMANCÎ

Wisa xuya ye têtîliya Kurmancî û nivîsê têtîliyeke gelek bi arîşe ye; di pêvajoya modernîzasyonê de, di dewsa ev pêvajo, arîşeyên wê werin gengêşîn, pêvajo dibe sedem tabloyên anormal û îronî biqewimin.

Divê em li xwe mukir werin ew “zimanê şîrîn û xweş” zimanê folklorê bû, zimanê çanda devkî bû. Heman ziman di çanda nivîskî de bihemdê xwe şax navêje ev jî dibe sedem ziman tehl be!

Ji tabloyên anormal ya herî berbiçav bi gotina Sami Tan, pîrbûna “pisporan” e! Ne tenê di qada ziman de, di her qadî de, kurd, di dewsa ku kar an jî meselê esas bigirin, valahiyê wekî keys dihesibînin û hewl didin “xwe derxin meydanê”!

Ji ber ku di avakirina zimanekî de rola edebîyatê gelek muhîm e, ji derî nîşeyan, ez ê îroniya ku di qada nivîskariyê de tê jiyîn bi bîr bixim. Pirs; gelo îro ro di Kurmancî de zimanê edebî çawa tê avakirin? Çi tercîh hene? Qenebe piştî salên nodî nêziktêdayîn û tercîh çi bûn?

Heke ne bi awayek rêkûpêk be jî, di salên nodî de, hewl û nêziktêdayînên kes û saziyan ji bo Kurmancî gelek muhîm bû; ji ber ku çavkanî tunebûn an jî kêmbûn, takekes ji xwe de, ji derhişê xwe û jiyana xwe de bi rê diket da karibe ziman bi gewde bike. Ev dihat wê mehnê ku takekes ji Kurmancî de dest pê dikir.

Aliyê zanistî û rêzimanî de arîşe hebûna jî ji alî biruhbûn û tehm û çêjê ve rastiyeke hebû. Bi pêvajoyê re rewşa avakirina ziman diket rojevê. Ev di berên edebî de, dibû rastî. Wisa ku edebîyata li sirgûnê bi gotineke rasttir, kesên li sirgûnê bi nav û deng bûn, bi zimanên din difikirîn, edebîyata xwe saz dikirin, ji vê rewşê re, gotin, avakirina kurdiya modern!

Xwendevanên ku, bi zimanên din ne biyan bûn, tehm jê girtibûn prîmeke meizn dna wî zimanê modern! Roja ku em lê dijîn, hêdî hêdî, rastiya erjeng û zimanê tehl xwe dide der; tê dîtî ku ew zimanê modern hê jî têra xwe nehatiye ava kirin;

»Zimanê edebî yê ku qaşo modern e, texlîda halê avabûyî yê zimanên din e; ew rêya ne rast ku em dikarin wekî sendrom bi nav bikin her ku diçe xisarê dide Kurmancî nahêle Kurmancî bihemdê xwe têtîlî bi zimanên din re deyne, ji derfetên zimanên din

feyde bigire!

- »Qelemên herî nas ên vî zimanî li xwe mukir hatin ku Kurmancî têra wan nake.
- »Tirkan zimanê xwe bi awayek afirandin, mixabin ev ji bo Kurmancî jî mînak tê girtin. Talûkeyek mezin e. Halbukî Kurmancî gere were avakirin. Di navbera avakirin û afirandinê de ferqek mezin heye.
- »(Ji ber ku ne warê min e û ez nikarim xwe li îdayan bigirim, arîşeyên rêzimanî li dera ha dihêlim) Di avakirinê de, em dikarin halê nexweşekî bînin ber çavên xwe; yek ji bo nexweş doktor lazim in û doktor derman bi qerar”doz” didin nexweş. Ango derman bi qasî bi kêr e ew qas jî bi xisar e. A dîtir, ji bo nexweş moral pir muhîm e. Heke nexweşê me ziman be, ji bo moralê edebîyat di dewrê de ye. Gerek di dewrê de be. Heke, em lê bifikirin helbet em ê qebûl bikin ku têgihîştina mîzahî a civak û takekesan çî bi awayê stûr çî jî bi xewtên tenik ji hev cuda ye. Baş e, di çanda nivîskî de, xetên mîzahî gelek tenik bûne, ev rastiyek elê dîsa jî her ziman bi naverok û teşeyê xwe derbirînên mîzahî saz dike.
- »Di civakên paşdemayî de, ên ezîyet kişandine, ên bîndest de, takekes, bi xema xwe ye. Ew li dû “pirpirik” (apolet) an e. Gavên pêş ên kesên wisa gavên bi ked û baş in lê ku piştî “nav dide” arîşe dertên; ew êdî, xwe wekî meqamê herêkirinê dibîne, di dest de mohr heye, dibe mamhoste, entelektuelî ne xema wî ye. Halbukî, Umberto Eco dibêje, entelektuel krîzan dertîne ne ew kes e çareser bike. Bi bawer im di avakirina Kurmancî û di sazkirina edebîyatê de riya herî xweş ev e ku em bidin pêş xwe ango destnîşankiirn, rêdayîn, bi gotina Eco derxistina krîzan. Helbet heman Eco bi bîra me dixê ku divê entelektuel dest biavêje hina rîşeyan jî.
- »Ku bala we lê be entelektuelên Kurmancî ji bo meselên siyasî ên zimên, ji bo statûyê krîzan dernaynin; jê gelek, li ciyên xwe rûniştî, di dest de mohr, bi klîşeyên herî beredayî, dersê didin! Mixabin, ziman dikin, kirine alaveke propagandaya rojane.
- »Li vir, em ê karibin rola xwendevan wekî hêzeke hev kêşeyî bi bîr bixin; ê xwendevan karibe avakirinê bi bîra nivîskêr bixe. Nivîskar, dawîya dawî îhtimal e ku ziman ji bo xwe esas negire, berjewendiyên qelema xwe esas bigire, bi zimanên din metna xwe bisêwîre, lê bike da ku karibe xîtabî “tehma heyî ya derhişê xwendevan bike”. An jî, bi zimanên din berhemên xwe lê bike. (Di edebîyata dunyayê de mînakên wisa ne kêr in; ni-

vîskar ne bi zimanekî, bi gelek zimanan berheman lê dîkin. Di Kurdî de, mesele ew e Kurdî bes nayê dîtin lewre zimanên din dikevin dewrê, ev gere li ber çav were girtin. Em li bendê bûn ku berhem bi Kurdî werin nivîsîn û li zimanên din werin wergerandin da ku Kurdî di nav zimanên din de ciyê xwe xweş bike. Wekî adet bû û nivîskarên herî bi navûdegn ên vî zimanî jî xwe re kiribûn adet (berhem bi Tirkî dihatin sêwirîn û lêkirin bi peyvên bi Kurdî dihatin nivîsîn) mixabin îro moda ye! A erjeng ew e ku bi navê rexnegiriyê gelek 'reben' jî prîm didin hewlên wisa! Em dikarin bêjin ku Kurmancî li benda xwendevanên xwe ye. Xwendevana/ê Kurmancî li bendê ye, ew kes e ku bi destê xwe berhema xwe, nivîskarê xwe kifş dike.

»Rewşên trajîk têne jiyîn; hûn dibinîn, ciwanek nivîsek xweş lêdike, bi aqil û feraseta xwe balê dikişîne. Piştî wetekî ew ciwan diçe yekî din tê meydanê; êdî bi mohr e! Li vir divê em karibin, pariya hin nivîskar û helbestvanan jî bînin ziman; ya jî bo berjewendiyên weşanxaneyan an jî ji ber têkiliyên şexsî û dostanî bi fotinên fişalî, destê xwe li piştê wan ciwanan dixin, piştî wextekê jî dibin şahdiê têkçûyîna wan kesan!

»Qewimînên wisa bêeleqe xuya bikin jî di karwanîyê de eleqeya xwe bi ziman re bi avakirina ziman re heye lewre dîyardeyên wisa bi bandor in.

## AVAKIRIN Û AFIRANDIN

15 ê Gulanê de, li Nisêbîn û Mêrdînê tevlî gotûbêjan bûm. Ji ber ku 15 ê mehê roja zimanê Kurdî bû pêşî min derbarê ziman de fikrên xwe anîn zimên:

Ji me re digotin, ev e, hûn bi zimanê xwe diaxivin, nexwe êdî hûn çî dixwazin. Dû re, gotin, hîndekariya bi zimên ne mesele ye lê nabe Kurdî bibe zimanê perwerdeyê! Bi wî awayî dixwestin ziman li ber çavê me piçûk bikin. Mesela ziman meseleyeke tevlîhev, dûr û kûr û mezin e. Em vê destnîşan bikin.

Piştî avakirina komarê rêveberiya komarê beriya xwe red kir. Tesîra afirandina “jiyan û zîneteke nû” li zimanê Tirkî jî kir; her bi dû ketin ji nû ve biafirînin. Nirxandina encamên wê nêziktêdayînê ne mijara me ye lê me divê em pirsekê ji xwe bikin, gelo em ê Kurmancî biafirînin an ava bikin? An jî, gelo heya kîjan radeyê emê Kurmancî ava bikin, ji kîjan radeyê pê ve em ê biafirînin?

Kurmancî di pêvajoya modernîzasyonê de ye. Em mecbûr in hin terman biafirînin lê ji derî afirandina terman me divê em Kurmancî ava bikin.

\*\*\*

Em dibêjin zimanê me zimanekî dewlemend e. Ji bo çanda devkî û berên folklorîk ev rast e lê heke em behsa jiyana modern bikin, behsa çanda nivîskî bikin kêmaniyên zimanê me zêde ne. Mîsal, di romanekê de divê karakter bikeve laboratûwarê, li wir mijûl be, jiyaneke bike, hûn karakter heya ber deriyê laboratûwarê dibin, dû re jê re dibêjin vegere nexwe term di zimanê me de nîn in.

Coş û romantîzma zê de ya di derbarê ziman de ne baş e.

\*\*\*

Wextekê mirovan bi etîketa sîyasetê çî binivîsanda maqûl dihat dîtîn. Bi gotineke din hûn sîyasetmedar bana an jî kesek di saziyan de bana an jî naveroka nivîsa we bi heman rengî ba ev bes bû da nivîs were qebûlkin.

Îro heman tişt bi etîketa zanîngehê tê kirin; heke hûn xwendekarek bin an jî akademîsyen bin ev bes e da tiştê tê nivîsîn were qebûlkin. Metirsî heye ku carna etîket bibin hetîketî.

Destnîşan bikim, piştî Kurdî kete zanîngehê gelek ked hate



dayîn, tê dayîn. Xebatên bi rê û rêbaz her diçin zêdetir dibin. Ev nayê wê mehnê ku her tiştê tê kirin maqûl were dîtin.

Helbet heya zimanê me û zanist bi hev nas bin wê gelek wext pêwîst be lê em mecbûr in rastiyan bi bîra hev bixin, ev şert e.

\*\*\*

Cografya dêw, paşa, key'an e... 'Mohr' yek ji rastiyan wê cografyayê ye ku piştî yek radihêje mohrê êdî mesele diqede. Ev rastiya gemarî dilewite nirxandin û tespîten derbarê berhemên me de.

Ev dibe sebab ku xwendevaniyek ecêb di Kurmancî de peyde bibe; xwendevan berhemê îdealîze dike, li benda pîrozweriyan e. Carna (ji ber tunebûna edîtoriyek baş) dikare berhemê bike qurba na çend xeletiyên rêzimanî, ez nivîskar im, ne xema min e bê çend xeletiyên rêzimanî hene!

Îro hin nivîskarên edebîyata Tirkî bi şêwirmenda re dinivîsin. Piştî qediya bi edîtoriyek birêkûpêk berhem diedile.

Ji ber ku îro ziman meseleyek muhîm ya di rojevê de ye bi gelemperî xwendevaniya edebîyata me krîterên rêzimanîyê li berhemê digirin.

Ez weke xwendevan piştî berhemekê dixwînim ger li ciyekê berhem bibe sebab ez bikenim, xeyal bikim, tabloyek cuda an jî paragrafek balkêş pêşkêşî min bike dibêjim mala nivîskêr ava be.

\*\*\*

Nîşeyek rojane ku eleqa wê bi gotûbêjan re nîn e:

Di Tirkî de peyva "ama" di Kurdî de, "lê" wekî jehriyê ne; şêweyê bi jehr dikin, nîyeta jehrî rê didin. Ew zînet dikare dadê jî jehrî bike ji ber ku nîyetek bihesab e.

Heke hûn modern bin, we exlaqê zanîne qebûl kiribe, hûnê jixwe bawer bin. Di şêweya xwe de sade û analîzker bin.

\*\*\*

Behsa pêvajoya çareseriyê tê kirin. Kesên rewşenbîr, entelektuel di pêvajoyên wisa de bi însan re, bi trawma û azadiya însan re mijûl in ji lew ew beş nikarin kesî xilas bikin lê dikarin gelek tiştan rê bidin, destnîşan bikin. Di romana xwe ya dawî de (Hurcahil) min xwest balê bikişînim ser rastiya zarokek ku bavê wê cerdevan bûye.

\*\*\*

Xwendevanek min ku niha endama meclîsa Şaredariya Mêrdînê ye tevî gotûbêja mi bû. Pêşniyarek min hebû, heke şaredariyê ciyek dîrokî wekî mala nivîskaran sazkira. Her sal, ji çend welatan nivîskarek vexwenda û nivîskêr di nav deh rojan de derbarê Mêrdînê de nivîsekê welew ku çîrokekê lêkîra û hersal biba mishef wê çî baş bûya.

\*\*\*

Min ji bo xwendekara xwe xwest mishefê îmze bikim. Kêliyên wisa hene ku em nivîskar jî dixitimîn ji ber ku hûn dixwazin gelek tiştan lêbikin û hûn nikarin lêbikin. Halbukî gerek min hestên xwe ên bo xwendekara xwe bida hêlekê û bi hevokekê meselê biqedanda.

Rewşa wê wextê ya li Mêrdînê ku her xwendekar bi trawma bû, gundên wan hatibûn wêrankirin an jî ji kirinên şer hatibûn li Mêrdînê bi cî bûbûn li ber çavên min candar dibû. Xwendekara min got, bise, ez tiştêkî bêjim belkî tu bi rihetî karibî îmze bikî:

“Min ji dibistanê hez nedikir, min nedixwest ez werim dibistanê. Rojekê te bi Kurdî bang li mamosteyek esilkurd kir te gotê, wê wextê bêhna min hatibû ber min.

Mi li mishefa wê ev lê kir ku mi her hewl daye da ez li cem mexdûran bim. Ew diyalog û rawestîn bû sebeb hevalên xwendekara mi vê henekê bikin:” Mamoste mishefek din dinivîse.” Belê, kêlî hene ku jiyaneke bi bîra me tînin û em bi heyecan dibin, em dixwazin mishefekê lêkin.

Çi tiştêkî biseyr ne; di salên nodî de peyvek bi Kurdî ji bo zarokê bûye sebebê ku ji alî aîdiyetê ve xwe baş his bike.

## JI FÛARA MISHEFAN A AMEDÊ BER BI FÛARA MEZOPOTAMYAYÊ VE

Beriya nivîsê ez ê ji nivîseke xwe ya ku di [www.diyarname.com](http://www.diyarname.com) ê de hatibû weşandin de jêgirtinekê bikim ku bi ya min ji bo meseleya têkiliyan muhîm e:

*“Li vê cografyayê her tişt “mezin bûye”, her tişt “mezin” e, her qirarê mezin digirin, her gav ji bo mezinan tê avêtin. Ev di şeweyê de jî bi bandor e. Mîsal, em naxwazin fikir û hestên xwe ên hezkirinê, ên kêfxweşiyê derbibin ji lewre îhtimal e ku ev wekî şelafî jî were hesêbkirin! Em diavêjin dilê xwe, nexwe em ê ji mêraniyê de bikevin, karîzma biçê bi avê de. Halbûkî têkiliyek xweş û bi şewe di heman demê de pêşî li şelafiyê jî digire. Ji ber ku kubarî û texdîr dibin mijar kes nikare kevir biavêje kesî! Ev û gelek rastiyên wisa bi karên hunerî û edebî re ciyê xwe dibînin. Huner û edebiyat berevajî bi tiştên “piçûk” re eleqedar in, şeweyek xwe hene. Kesa/ê bi hunerê bi karakter bûbe bi rihetî dikare li xwe mikur were, lêborîn bixwaze, hezkirina xwe bi serbestî li rû mirov der bibe”*

Baş e, em dikarin li mijara xwe vegerin. Di sala 2014 an de li Fûara Mishefan ya Îzmîrê ez û Azad Zal em derbarê weşandina mishefan de diaxivîn. Kêlikekê Azad got, wê di sala 2015 yan de TUYAP li Amedê fûarê li dar nexe. Min gotê, ku kurd bixwazin ew ê bi destê xwe fûara xwe li dar bixin. Azad, dibe, çima nebe, got. Li gorî hewesên me wê ji parçeyên din jî weşanxane tevlibana.

Çi veşêrim, tu hêviya min tunebû, wê wekî gelek pêşniyar û sohbetên me kurdan ê bi avê de biçûya! Bi wê halê hêvîşkestî mabûm ku heya roja ku hay jê çêbûm ku wê fûar bihata lidarxistin; belê Azad Zal li pêşniyarê xwedî derketibû, ew, sazî û kesên wek wî qîmetê dabûn pêşniyarê bi qasî wan şaredariyê jî qedir li pêşniyarê girtibû.

Kêfxweşiyek mezin bû. Na, behsa tatmîna egoyê nakim, ji alî rêveberiyê ve, mantelîteyê ve gav muhîm bû; em li ku bin jî çi fikir û pêşniyarên me hebin bi awayek têne nixandî, ya muhîm ev bû, ev vehesîn bû. Heke ev weke nêzîktêdayîn û rêgez bikeve merîyetê wê rengê rexneyên di Kurdî de jî biguhere; rexneyên me bêhtir yan hêrs û xeyd in an jî bêyî pêşniyar û alternatîf in, bi gotineke din ji avakirinê bêhtir hilweşîner in.

Ku fikir û pêşniyarên di sohbet û nivîsan de li ber çav bêne girtin

bi awayek tevlîbûneke modern, yeke demokratîk diqewime.

Vêca hêviya me ew e ku di demên pêş de ew fûar weke şikil û naverok berfirehtir be, bibe Fûara Mishefan Ya Mezopotamyayê.

\*Carê, bi henek, min ji dostên xwe re gotibû, xwezî navê welatê me Mezopotamya ba. Helbet rastiyeke di wê hewesê de hebû ku ew rastî gelek diyardeyan vedihewîne. Em kurd wextê dibêjin Mezopotamya em aliyê teng, pênaseya cografîk der nabin, berevajî, qesta me jê reng û şaristanî ne, bawerî ne... Ji lew heke nav weke Fûara Mishefan A Mezopotamya be ji alî zînetî û hêviyên demokratîk ve ê bi mehnêtir be.

## EDEBÎYAT, AZADÎ Û SERXWEBÛN

Serxwebûn û azadî di şikilgirtina fikrî ya kurdan de du îfadeyan didin der, serxwebûn wekî dewletbûn azadî jî rêveberiyên cuda û hin nêzikahiyên felsefîk der dibe.

Dewleteke çawa? Azadî an jî şiklên rêveberiyê ên çawa? Her pirsên wisa hêja ne ku ji alî siyasî ve werin gengêşîn, têne gengêşîn jî. Li vir rewşek taybet heye; bi awayek dinya jî îro li cografya kurdan bûye realîteyek, ev jî tê wê mehnê ku ji alî rêveberî jî her gava kurd diavêjin dinyayê jî eleqedar dike. Ev qonax û dema ku wê ji bo sed salî bibe deriyek bi her awayî muhîm e.

Dewletbûna Başûr di serî de ji bo statuya kurdan ya li dinyayê gavek hêja û muhîm e. Bi qasî wê divê em hurmet li nêzikahiyên din ên rêveberiyê bigirin. Dibêjin dinya êdî piçûk e, vêca herêmên cografîk piçûktir in û welat bûne wekî bajarekî, bajar bûne wekî gundek, gund bûne wekî malbatek. Di şertên wisa de bi qasî arîşeyên we arîşeyên cîranên we jî muhîm in, hûn pê aciz dibin. A ku dewletên serdestî li kurdan dikin fehm nakin jî hinek ev e; ango heya arîşeyên neteweyî ên kurdan, arîşeyên olî, mezhebî, arîşeyên baweriyên hel nebin cografya ji bo me dibe êş û elem. Ji alî felsefîk ve jî ev muhîm e, hûn her rêveberiyê çiqas bi şiklê neteweyî, olî, îdeolojîk difikirin rêyek xwestekê din jî ferz e; sîwana karibe gişan, kêmezêde, vehewîne demokrasî ye. Li Rojhilata Navîn ew şens bi destê me neket belkî ji ber wê ye hukmê tore û adetên rêveberiyê ew qas li ser me zêde ye!

Wekî wêjevan em dikarin deng li siyasîmedaran bikin çî dewlet be çî şiklên din ên rêveberiyê bin divê bi heq û hiqûq be, demokrasî hebe, gendelî, îltîmas û zordarî tunebe. Gere ehmîyet li nixên neteweyî ên Kurdî were girtin. Qedir li nixên kulturî were girtin.

Di mesela “serxwebûn û azadiyê de” jî sekna me li ser demokrasî, azadî û nixên geş ên mirovahiyê bi şikil be wê mehneyek xwe hebe. Heke gotina me, qelema me ji bo berjewendiyên şexsî û manewî bibe alîgir û xwe li diruşmeyan bigire arîşeya mezin ev e.

Gotinên xwe bêhtir di wê çarçovê de derdibim ku bi gelemperî mebest jê kesên xwedî qelem in, nivîskar in. Diruşmeyên me, manîpûleyên me, peyam û qîreqîrên me, deşarj û qurnaziyên me wê tu carî nikaribin metn û berhema me bi ast bikin an jî ji astê daxînin! Em ji alî fikrî nêzî çî bin jî ji meselên siyasî bêhtir arîşeyên

me ên kulturî, edebî, hunerî hene ku incax nivîskar, rewşenbîr dikarin ked bidin bigengêşin. Rojev, geşedanên siyasî her wext ji bo nivîskariya me jî bûne rojev!

Çi azadîxwazî be çi jî serxwebûnparêzî be bi ya min ji alî proje, dîzayn, afirandina fikrî ve bi gelemperî em nivîskar bi awayek hê jî di mala matê de ne.

Baş e, meriv dikare têbigihîje, zarok her tim ji bo xwe bi hevalên xwe bide qebûlkirin, bi fîşalî diaxive, xwe bi xeyalî bi cî dike; bavê wê/wî yekî wisa ye ku dişibe qehremanên destanî, çiyê wan hebe ji ên herkesî biqedirtir in... Heke meriv ferq bike meriv di heyama zaroktiyê de ne ev pêşdeketin e, meriv haydar be ku ciyê meriv kîjan ast e ev ferqkirineke mezin e... Rebenî ew e meriv bibe heyrana/ê xwe û fikrên xwe û fantazyên meriv derbarê 'navdariya' meriv de bin!

Carna meriv difikire, gelo em xwe bi awayek fantastîk bi cî dikin? Di jiyana bajarî de li her deverî neynik hene halbukî, neynik tunebin jî camekan hene!

Wêneyek Helebçeyê, Şengal, Kobanî, bedenên daliqandî, bedenên tazî... Roja ku yek ji me berhemekê lêke û dinya ji berhemê haydar be ew roj em ê deynê xwe yê nivîskariyê bidin... Em bi dû ketine li bazarên siyasî çerçîtiya qelema xwe dikin! Ne serxwebûnparêzî ne jî azadîxwazî bi "bazarê" nabe!

Çima wan karesetan bi bîr tînim? Ji bo nivîskarên ji alî îdeolojîk an jî neteweyî ve gelek bi îdîane ji bo îdîayên wan bi bîr tînim. (Helbet nivîskarî ne tenê trajedî û êşên civakî, neteweyî ye jî, wesleyek ji jiyana takekesek jî dikare bibe rûmeta edebiyatekê...)

Tê fehmkirin, heya radeyekê normal e jî, di edebiyatê de, di îfedeyan de em hukmê coşa neteweyî dibînin lê îhtimal e bi tenê coş be wê me bi nav gerînekekê bixe!

Heke hûn ji sibê heya êvarê behsa edebiyata dinyayê bikin, çarçove û mercên wê belî ne. Heke hûn ji sibê heya êvarê bi kurd û kurdistanîyê re eleqeder bin şert û şûrt belî ne. Heke hûn edebiyata partiyê bikin şert û şûrt belî ne... Gelo em bi "şexsê xwe" re eleqedar in an em bi edebiyat, nivîskarî welew rewşenbîriyê re eleqedar in?

Baş e, gelo bira bira rewşa me ewqas berbad e? Helbet na, nivîskarî edebiyat bi awayek şîlo be jî diherikin. Kovar zêde dibin, ciwan bi pirs in... Keda hatiye, tê dayîn ne hindik e. Gelek berhemên berhevkarîyê hene ku incax bi saya dewletan dikarin werên pê lê kesan

bi serê xwe ew kar kirin. Li qada ziman binihêrin, ciwan û kesên dilsoz bi rik, bi ked û sebrê her deverî ji bo Kurdî kirine dibistan... Di pêşerojê de ger lêkolîn li ser portreyên wisa werin kirin wê bê dîtîna bê çî xebatên hêja hatine pê... Di demeke wisa kurt de, bêyî dewlet, bêyî derfetên mezin helbest, çîrok, romanên bi Kurmancî ji alî kesan ve têne xwendin... Xasma kar û barên derbarê klasîkan de hatine/tên kirin hêjayê pesin û hurmetê ne... Mesele aliyê romantîk be meriv dikare lîsteyê dirêj bike, em vê heq jî dikin lê wekî me li jor got, heçî coş e bila ji me dûr bimîne!

## FILORTÊN EDEBÎ Û ŞÎROVE

Şîrove bingeh û deriyê rexne û rexnegiriyê ye. Ger edeba edebiyatê bi derfetên şîroveyê re bi cih bibin wê çaxê rê û rêçikên zanîstî baştir xwe didin der. Ev jî rê li zanista rexneyê vedike. Heya niha hin kesan hewl didan da hêza şîroveyê bi cih bikin. Ev demeke gelek kes di her warî de xwe li şîroveyê digirin. A, gava piştî vê hewlên saziya rexneyê ye. Ev jî heceyan û coşê dide me bi navê edebiyata me.

Ev di heman demê de serobinokirina hişmendiya kevnare, têgihîştina teng, elimînên sayakî û berteng e. Bi şîroveyê re alternatîf xwe didin der. Piştî şîroveyê lêgerîn jî xwe dide der. Tiştê ku nehatibe şîrovekirin û neyê şîrovekirin dikeve qalibekî dogmatîk. Dogmatîzm bi tenê ne ji bo desthilatiyan e, carna em bi xwe di nêzîktêdayîn, hişmendî, bîr û baweriyên xwe de xelean xêz dikin, warên qedexê ava dikin! Xisara vê tewrê ev e ku hêla me ya rewşenbîrî lawaz dihêle.

Ger şîrove hebin sing û dil berfireh dibin, hezkirina kûr xwe dide der. Wexta em bê şîrove bin wê tewr û elimînên me ên berteng me dîl bigirin. Wexta em şîrove bikin emê bibînin ku da ji bilî me jî însan hene, afirandin hene, dinyayek heye. Wê çaxê emê bi kêfxweşî ji behredarî û afirîneriya her kesî sûd werbigirin.

Li vî welatî em di heman demê de xwendevanê wêjeya Tirkî ne. Ger em bala xwe bidinê piştî şîroveyên bi salan gavên girîng hatine avêtin. Tiştek din jî heye ew bi dilrehetî filortên edebî dikin; ev dibê sedem ku ew piştgirî bidin hev, pêşî li hev vebikin. Ez behsa rexneyê nakim lewre melzemeyê rexnegir deq e. Ne nivîskar û helbestvan e.

Filorta edebî tiştek din e; hûn hest û dilfirehiya xwe ji 'bo ên' din estetîze dikin bi vî awayî ji bo wî/wê dibin hêz û qewet. Filortên edebî jî bêhtir an di danasîna berheman de an jî bi riya derbirîna bîranînan xwe dide der, na ev ne ew tişt e da hûn tiştên ne rast bibêjin hew hûn hêlên kesên din ên serkeftî esas digirin ji ber ku hûn rexnegirî nakin hûn hinek bi halê vehewîner tevdigerin. Ev gelek baş e; bi vî awayî berî her kesî derdorên nivîskaran di xîtab û şeweyên xwe de derbirîneke şerbetî bi dest dixin. Gere em ji bîr nekin ku şêwe û têkiliya toreya nivîskaran a di nav hev de çî be şeweya xwendevan û nivîskaran jî hinek wanî ye!



Em bi hesret in ku di nivîsevaniya Kurdî û Kurmancî de filortên edebî bibînin; ji bo edebiyatekê mînakek û deh mînak ne bes in, gere êdî bibe toreyek. Gelo nivîskar û helbestvan jî ne însan in, dilek wan jî nîn e, wexta ew çend gotinên xweş bibihîze wê çî be, bila kes xem nexwe tu tişt nabe, bi wan gotinên xweş ne cih li kesan fireh dibe ne jî teng dibe. Dîrok û xwendevan deq û berhem layiqî çî cihî bin wê li wî cihî bi cih bikin.

Helbet ji bo gotinên xweş gere hîseke kûr bi we re hebe. Dilek we yê romantîk û humanîst hebe. Hûn ji xwe bi bawer bin. Ha, ez behsa hewlên otorîteyî nakim, ev jî tiştêk din e, hûn kirasê otorîteyê li xwe kin û behsa berhem û kesan bikin ev jî mijarek din e, ez bêhtir behsa gotinên xwe ji dil didin der, ên kêliyan dikim. Mînaka nivîskî a babeta me hestên Ehmed Huseynî ên di der barê Janya Rênas de bû. Dîsa min di gelek nivîsên Berken Bereh de ev tişt hîs kiriye. Rîk û banga Kawa Nemir a li Kejo Bajar û Rodî mînak e. Nivîsa Helîm Yûsiv a di der barê Menaf Osman de nivîseke wanî ye. Banga Salihê Kevirbirî a li S. Dilpolo bangeke wanî ye. Di van demên dawî de dengê Arjen ê ji bo Osman Mihemed heman tişt e. Nivîsa Jan Dost û nêziktêdayîna Dawid Rêbiwar a di der barê helbestên Arjen de heman tişt in... Ev gişt ne rexne ne û xwe li ser rêgezên rexnegiriyê xwe nedane der, gişt filort in û hêviya me ev e da ev tişt bêhtir bi cih bibe.

Edebiyata bêşîrove û bêfilort hinek dişibe siyaseta bêsosyolojî, berteng dimîne, di nav qaliban de dimîne, ji modernîzmê bêhtir xwî û xisletên kevnare ên teng bandor li dil û şeweyan dikin.

## PERDE

Hûn jî wekî mi, gelek caran gotina, “Ziman çiqas şîrîn e” dibihîzin ne? Hûn jî, bi îhtimaleke mezin, bi awayekî, mîna mi bextewar in; lê ji sedî sed, her kes ji mi bêhtir bextewar e; ji ber ku, pîrî caran, hinek peyv dibin zebanî, dibin gûzan li ser rihê mi, dibin gurê har bi canê mi dikevin; hişk in, sar in, bêhna kufikê bi ser wan ketiye. Belkî neçariya zimanan a herî xedar ev rewş e; tu ziman nikare bêyî wan peyvyan bijî jî (qenebe aniha)!

Belê belê sedem em însan in; me ew peyv bi nav kirin, bi kir-yarên xwe, bi xezeba xwe, bi destê xwe... ! Jê yek jî peyva ‘perde’ ye. Ev peyv çiqas tiştên genî, sergirtî, nuxamtî, dek û dolab, fen û fût, niyeta xerab, pîlanên veşarî hene bi bîr tîne. Berhemek çiqas bedew be jî wexta peyvên wanî vedihewîne (ji neçarî, bêyî wan jî berhem nayê nivisîn) hewrek tarî li ser peroşên min peyda dike.

Belkî ji aliyê meraqê ve fêde digihîne însan lê reş e. Ev rastî di şanoyê de xwe baş dide der; wexta perde dikeve navbera temaşevan û lîstikvanan hişê mirov bi texmîn û şiroveyan dikeve nav meraqê. Pê re jî tebatî nakeve temaşevanan, bêhn li wan teng dibe. Ew kêliya bi raz helecanê jî bi dil dixê. Ji ber vê jî pîrî caran perde li xweşia însanan jî diçe!

Perdeya herî reş di navbera însan û feleka xayîn de ye. Di navbera devê însan û dilê însan de ye. Di navbera desthilatî û însanan de ye. Di navbera gotinê û rastiya jiyânê de ye. Aniha ji ber perdeya di navbera xwe û însan de surîşt bi hawar û zarîn e.

Di wêjeyê de jî ev rastî xwe dide der; pîranî ev di hêmayan de xwe dide der; wexta bi peyvê zêde tê lîstin, xemleke teyîsok xwe dide der perde dikeve navbera xwendevan û berhemê. Dîsa metirsiyên rojane ên nivîskar pîrî caran dibin sedem ku gelek kes hiş û dilê xwendevên bi awayek xapînok mist bidin! Mixabiniyek e kesên perde di dest de di jiyânê de êşa herî kûr dikişînin; bê hay kesên wanî perde dikişînin navbera jiyânê û dilê xwe jî! Ew, piştî demekê êdî her gotineke xwe wekî ayetekê dihesibînin û li ser textikê yezdaniyê ji xwe re li peyambaran digerin. Her ku di destpêkê de ji bo hilweşandina textikan bi ser rê dikevin jî di astekê de textik dibe perdeyek û çav û dilê wan radipêçe. Her ku ew bi pirsan dest pê dikin jî piştî demekê êdî ji pirsan direvin, ditirsin! Li vir gere bê dest-nîşan kirin kesên bi qasî asîman dilfireh wanî nekirine, çiqas perde li ber çavên wan ketiye perde çirandine, ew çiqas mezin bûne wan

dilê xwe û nefsa xwe ew qas piçûk kirine.

Wexta peyva perde û textik bi bîra min tê peyva jeng bi min şîrîn dibe; bila jeng li textikan bide! Ne wanî be wê tu pêşketin pêk neyên. Hûn pirî caran ecêbmayî dimînin ji ber ku textik bi xwe re 'bêqisûrtiyê'jî tîne êdî dewsa rexneyê de an jî xebatên analîtîk de, rastiyên wekî ez begem dikim an jî begem nakim xwe didin der.

Me divê ji bo bi xelet neyê fam kirin em bi bîr bixin ku hêmayên wekî miftene ne perde ne. Hêmayên wanî her tim deriyên vedikin. Derî li deriyê vedike û bi vî awayî tu deriyê dadayî nahêle. Ma ne deriyên dadayî jî dawiya dawî perde ne.

## DI DESTANA MEMÊ ALAN DE BI DILAN TÊ SOND KIRIN

Sî û çar sal beriya niha bû; berfa pêşî ketibû. Êvareke ker û lal. Bavê min kîloyek pûrteqal anî bûn. Mi pûrteqala ku pariya mi ketibû xist paşila xwe û serî da riya mala dapîra ku ji me re çîrok vedigotin. Em pênc zarok bûn. Destek mi li ser pûrteqala di paşila mi de bû destê dî jî di kerika guhde guhdarê çîroka Memê Alan bûm. Tişta ku hiç ji bîra min neçû ev e ku di ronahiya lampyê de min buhuştek didît ku Mem û Zîn tê de du çivîkên çolê bûn, di araviya sobeyê de jî Beko û Mîr bi hawar bûn. Dil li min dikeliya. Di şeva wê şevê de hevalên mi, dapîr her diçû li ber çavên mi şêrîn dibûn. Ji hêlek ve jî axîn bi ser axîne de diherikî ji dil de. Kêliyêkê destê min yê li ser pûrteqalê bala dapîrê vekişand. Li ser pîrsa wê, mi pûrteqal derxist û da dest wê. Kevçîka çay girt û pûrteqal kir pênc par. Li me belav kir. “De bixwin Memên min, hêvî dikim ji Rebê xwe ku deşt, çiya, newal, av û gelfî li ber we bibin deng û pêlên hezkirinê...”Heya bîst-saliya mi jî û hê jî wexta li siruştê bi tenê dimînim her tişt bi mi dibe dengê hezkirinê.

Ji bo her kurdê ku Memê Alan guhdarî kiriye, ev dastan pira di navbera wan û huner, wêje, felsefe, estetîk û ûtopoyê de ye. Memê Alan di serê her kesekî de bi dehan berhemên mîna xwe afirandiyê lê mixabin hew di dilan û di hişan de sergirtî maye.

Piştî ku min xwest ez derbarê vê dastanê de xwe bigihînim xebatên heyî mi di motora lêgerînê ya elektronîkî ‘Google’ de Memê Alan nivîsî û ez mam li bendê. Encam xemgînî û diltengî! Yekî kurd bernavkê Memê Alan li xwe kiriye bêyî vê tu agahî û nivîs derbarê vê dastanê de nîn in bi Kurdî heya bi Tirkî!

Memê Alan û Mem û Zîn du berhemên ku kurd bi her hawî xwe tê de dibînin, xem jan, hêvî û xeyalên xwe pê re diherikînin. Jêderka Mem û Zîn dastana Memê Alan e. Ehmedê Xanî bi nivîskî cara yekem çirayê pêxisti ye. “Schiller, melzemeyê William Tell, Shakespeare jî melzemeyê Kral Lear li ber dest, amade dîtin. Lê dû re mohra jîrekiya xwe li van berheman dan. Û van lîstikan niha wekî berhemên wan tene dîtin. “ (Julius KROHN-Kaarle KROHN)Belê Ehmedê Xanî ku ji alî Celadet Bedirxan ve wekî pêxember hatiye dîtin jî wekî Schiller û Shakespeare mohra xwe li berhemeke li ber dest daye. Lê ji ber hin sedeman û cûdatiyan berhemên me bi tevî hêlên hevpar ji hev cûda ne jî. Her du berhem mîna du çavkaniyên

di zinaran de derbûyî ne. Wextê însan basa berhemekê dike bi gelemperî berhema dî jî cî dide xwe lê dîsa jî hewlên me ev in ku em ya di derbarê Memê Alan de careke ji caran bi bîr binin.

Hin xal hene me divê em bi bîr binin, ne wanî be rastiya dastanê xwe nade der. Wekî gel dîsa ji sedemên dîrokî em ne xwedî xeyalên kûr û dûr in. Hêza me ya ramanî refleksi ye. Bi hevokên herî kin em diaxivin. Jiyana me bi du peyvan re diherike, 'erê' û 'na'. Hingiya em bi zimanê xwe biyan mane pirî caran em, bi zimanê bedenê, xwe der dikin. Ji tama estetîkê em dûr ketine. Di berhemên niviskî ên roja îro de hêla herî lawaz ev e. A herî bi êş jî ev e em hê jî vê pirsê jî xwe nakin; çî an jî kîjan berhem ji wêjeya me ya modern re bûye bingeh? Me çavên xwe li dîrokê girtine. Ev jî rê dide texlîdê. Helbet wêjeyekê modern. Lê ne texlîd. Me hay jê heye ku bingeha wêjeya Ewropa berhemên Homeros in. Bi bawerim me hew xwe li temayek di dastana Memê Alan bigirta heya niha di wêjeya modern de dê berhemên giranbiha bihatana afirandin. Mînak di dastanê de temayek jî jê ev e ku însan wextê kûr û ji dil hez dike dibe însan, însanek jî însanên bi per û bask.

Memê Alan ji alî ûtopoyayêve pir balkêş e; wekî Roger Lescot jî gotiye di dastanê de bajarek xeyalî hatiye afirandin. Ev wek destpêkek xwe dide der; di vê destpêkê de jiyaneke nû tê hêvîkirin. Di ûtopoyayê de havênê jiyane evîn e. Cara pêşîn em di vê dastanê de pêrgî ûtopoyayek ev qas berfireh û bi bandor dibin.

Piştî van derbirînan em dikarin çend deriyê dastanê li xwe ve bikin. Dastan honakî ne. Ji alî honakê ve berhem xwedî taybetiyek e; bi simbolên evsaneyî vegotin xwe beredide nav jiyana rojane û rasteqîn. Hilberîna xeyalî berhemê û vegotîna bedewtirîn kiriye.

Ziman nazdar e, şîrîn e, hêza xeyalê û coş di her hevokê de bi ser rûyê ruh dikeve. Ziman zimanê bengîtiyê ye. Ziman deriyê ruh li me vedike. Ev vegotina helbestî bi her rista xwe dişibe guliyên dara bi bar û bi ber. Bi ziman û şayesan dastan li nik berhemên Homeros cî dide xwe. Kûrahiya felsefîk, teqla di bin baskên peyvan de bi ser ziman dikeve, peyam û afirîneriya hunerî dastanê li asteke bilind bi cî dike. Çend mînak ji şayes, form û metaforên dastanê :

'Mem runiştibû li ser textê çarling, mîna rojê ko nuh hiltê li çiyana e/ji hesinê birûskê çêkirine ji bo dev û diranan e/xew dijminê mirovan e û şev keliha mêran e/serê mêrê çê daîm mij û dûman e/çirka çirka serê qeleman e/gî xortên sivik in di guhên wan de guharên zêrîn in/were, guh bide me, mekeve ber bayê xewneke şevan e/min nedî ko kes birîne rîman bi ava gula da kewan e/ditirsim ji gola

xwîniyan e/bejin ziravo mîna şiva bê kelemo/emrê çûyî venagere li xwediyan e/tu hildayî ser darê û di bin te da dikin bibirin guliyan e/ez tî mame di navbera du çeman e/rûne, di cihê xwe da giran be mîna kevirê koşan e'

Ev evîn, roj bi roj bi ser dilan de heliya ye, mîna benîştê li ser kokê daran e. Di vê evsaneyê de her tişt mîna hebê tizbiyan tê gotin. Ev evîneke wisa ye bahr bi Bozê Rewan bi hawara her du dildaran ve çûye. Perî, tav, heyv û stêr bi xweziya bedewiya her du evîndaran bûye.

Mem, ew kes e, "Mîna rojê ku nuh hiltê li çiyar e. "Bejinzirav e mîna şiva bê kelem. Kesek hişk e, karekerek dijwar e heya dibe evîndarê Zîn. Li dû evîndariyê ew êdî av e. Di çardeh saliya xwe de arê evînê bi dilê wî dikeve. Di şexsiyeta Mem de pevçûneke bê-hempa tê jiyîn. Mem î destpêkê û yê dawiyê ne yek e, bi berdewamî şexsiyet veguheriye. Ev guherîn bi hezkirinê û bi nasîna Zîn re pêktê. Beko, Hesen û şexsiyetên weke Stî li ser nixên civakî şax dane. wekî Mem, Çeko û Mîr di nav guherîn û veguherînekê de ne. Ev taybetî angoyê guherîna di şexsiyetan de taybetiya berhemên modern ya herî girîng e.

Zîn, xwediya xewna şevan, ne cin e, ne perî ye, esil beşer û însan e. Heya pozê kaxezê wekî îşareta miriyan tê şewitandin ew çira Mem e.

Hesen di vê dastanê de ji bo ku Mîr li Mem û Zîn neyê xezebê bi destê lawê xwe digire û diavêje nav êgir daku Mîr neçe Mem û Zîn li nik hevudu nebîne. "Mîna nîşana rûmetê ye. "Hesen.

Dawiya hesreta xewna şevê; mirin! Destê her du evîndaran piştî dimirin di xakê de dibin henase. Û Beko heye. Wextê ji bo bêbex-tiyê tê kuştin dilopek ji xwîna wî di navbera destê her du dildaran de wekî strî şîn tê. Ango ewantî li vê evînê hatiye çandin.

Di vê dastanê de tê gotin,

\*Serê mêrê çê daîm mij û dûman e

\*Fedî ne karê mêran e

\*Riya çetin riya mêra û egîtane

Dîsa di vê evsaneyê de bi hesreta dilan tê sond kirin. Ji peyva herî kuvî heya bi gotina herî tîr û tûj her tişt dihele û ji gerdeniya jiyane re dibe moriyên şîn.

"Dido hene, yek qîz e, yek xort e,

Bi çelengiyê kesek nagihê wan e  
Yek kurê Mîrê Mixribiyan e  
Ew mîr padîşahê kurdan e,  
Ya din, bavê wê waliyê bajarê Cizîra Botan e  
Keça Mîr Zengîn, Zîn Zêdan e. “

Mem û Zîn, di heman cîwar û erdnîgariyê de şîrê pêşîn yê evîn û evîndariyê ye. Çîroka gul û striyan e. Dengê bi ser me dixê, bila evîn bi ber bayê xewna şevan nekeve...

Bi navê Grîfon ajalek mîtolojîk hebûye. Tê gotin Mîttaniyan berê zayînê bi du hezaran ev ajal anîne Mezopotamyayê. Ev ajal bi bask bûye. Bi serî çivîk bûye û bi gewde şêr... Rastiya însanên vê erdnîgariyê ev rastî bi xwe bûye... Mem, Zîn serî ne, ango çivîk in, Hesên, Stî gewde ne, ango şêr in di dastanê de...

## PIRÊN ŞKESTÎ Û ÎZOLASYONA GEW

*“Guhdarên ezîz, Yerîvan xeber dide... Lê lê daykê...”* Xwendevanên ezîz, çendî car e destpê dikim nivîsê lê bikim lê ew cîhana zarokatî, cîhana welatên dûr, dengên dûr, xemên kûr li ser dilê min dibe lehiya biharê; zivistana ker û lal bû, asîman çiksayî, berfa sipî nedihîşt tarî bi ser çiyayan de dakeve. Nexweşiya sorikê rojê çend zarok dikuşt. Her kes guhdarê radyoyê bû. Piştî kilam guhdarî dikiirin ji devê mezinên me ev gotin derdîçûn: *“Lanet bê li dunyayê, me çi xêr ji xwe dît...”* Ew deng ji ku de dihat, ew însan li ku bûn, welatê wan jî gelo bi qasî welatên di çîrokan de ji me dûr bû...Pirs bi ser pirsê de dihat.

Ez wexta vê nivîsê lê dikim çi qas bextewar im ew qas jî dixwazim fesîh bifikirim. Bextewar im lewre ev e ez ji nivîsên wan kesan wan, dengê wan, xemên wan, hêviyên wan, êş û kulên wan hîn dibim; derbarê wan de nivîs lêdikim... Ku diltenikî reng bide nivîsek wanî dibe ku ne li cî be lê ev rastiyeke e, lewre min xwest beriya her tiştî a di dil de, halê aniha tê de me bi we re par ve bikim.

Wexta lijneya kovarê wek babet, *“Bandora Ereb Şemo a li ser nifşên nû”* bi rê kir tu tiştî di hişê min de xwe neda der; ji nifşên nû mebest çi bû, gelo mebest jê wêjeya Bakur bû? Mebest çi be jî emê nifşê nû ê Bakur li ber çav bigirin.

Gelo çi bandora Erebê Şemo li ser nifşên nû heye? Wê ev nivîs rasterast nebe bersiva vê pirsê; dê ev pirs bibe sedem da em bi gelemperî bandora toreyê, bandora keda rabirdûyê a li ser nifşê nû bifikirin. Ji bo em pêvajoya bandorê an jî nebûna bandorê fam bikin me divê em hinekî dêhn û bala xwe bidin awayê pêkhatina wêjeya nivîskî a Kurmancî.

Wek tê zanîn sê awayên herîkîna wêjeya Kurmancî hene. Ger em her sê awayan nebînin emê nikaribin wêjeya Kurmancî û meseleya bandorê baş têbigihjin; ger ev her sê rastî bête gengêşin ji derî babeta me wê sedemên hin pirsgerêkan jî xwe bide der.

»1. Herîkîna normal; bi awayek ji awayên normal (şertên derveyî ne tê de) bi hemd herîkî ye; her ku carna pir şikestîbin jî em meşyanekê dibînin. Ehmedê Xanî xwe li keda beriya xwe girtiye, bi nixandina toreyê riyek herî berfireh û nû li riyên beriya xwe zêde kiriye. Bi dû re kesên dî, Hawar, Cîgerxwîn...



»2. Awa û pêvajoya pêkhatina wêjeya Kurmancî a li Kafkasyayê ye ku em dikarin bibêjin di bin îzolasyoneke reş de mûmên xwe pêxistine. Bi jiyana bi xwe re birine, bi ziman, çanda bi xwe re birine, bi cîhana bi xwe re birine di zikê welatan de welatên piçûk afirandine. Wan xwe afirandiye. Ji ber mercên kambax ew nikaribûne li ser riya beriya xwe bimeşin. Ew derfet di dest wan de tunebûye wêjeya xwe a rabirduyê a nivîskî bikin bingeh.\*

*“Haya kurdên Ermenîstanê bi gîştî û ya ronakbîrên wan, ku nû rabûn, gihîştin ji wê edebîyata Kurdî qet nîbû, ya ku sedsalên navîn û nû li Kurdîstanê çê bûbû. Belkî wana navê ên weke Ahmedê Xanî û Meleyê Cizîrî jî nebihîstibûn, îdî li kîderê ma zanîna ser naveroka berhemên wan.*

*Ji ber vê yekê jî edebîyeta Kurdî, li Ermenîstanê, weke ya millî li cîkî vala, xik û xalîbingeh girt. Ew bi vê fikirê edebîyeteke bi temamî, xwerû ya nû bû.”*

3. Ji bo pêkhatina pêvajoya wêjeya Kurmancî a li Ewropa û li welêt em dikarin basa îzolasyona gewr bikin. Her ku gelek cûdahiyên dî hebin jî di navbera van pêkhatinan de (a li welat, a li Ewropa), ji alî mantelîteya afirandinê û nêziktêdayîna li keda rabirduyê u toreyê ve di herdu şibakeyan de jî em heman tiştî dibînin; ked û wêjeya rabirduyê bêhtir ji bo wan bûye moral, ji ajîteyê wêdetir neçû ye. Ev qeyranek e. Bingeha heyî û derfetên rabirduyê ji xwe re nekirine xem. Her tim xwestine bi xwe bibin bingeh\*\* (Hin kesan wexta jiyana gundê xwe nivîsîne bi awayek derfetên ziman bikaranîne, bandora zargotinê xwe daye der lê ev ne wek nêziktêdayîn xwe daye der. Tiştê em dibêjin ev e ku gere di berhemên modern de ziman bi emî awayan bijiya, vejîya, rê li xwe û derbirînê vebikira) Ev jî bûye sedem pêşî li afirîneriyê bête girtin; xem ne afirînerî bûye bi piranî “peyamek” esas bûye; xwestine peyamek bidin ” ê dî “da ew jî edebîyatê dikin, berhemên diafirînin. Hiç nebe di destpêkan de ev wanî bûye. Sedemên vê derûniyê gelek in û gelek jê jî ji kesan xwe nadin der. Lê rastiyeke bû/e. Li Bakur nîfşê nû jî bi awayek xwe bi xwe îzole kir; ev ji bandora wêjeya Kurmancî a Ewropa, ji leza bidestxistina wêjeya modern, ji bergeha întelektuelî a kêmbêr û ji negengêşiyê xwe dida der. Xwe dida der dibêjim lewre ew mantelîteyên neyînî em dikarin bibêjin edî nema. Dîsa ji ber ku xwendevan tunebûn kes di nav rehawetêkê de bûn. Nivîskar û berhem xwe bi xwe bûn; ne xwendevan ne jî cîhana wêjeyê a derve di nav meseleyê de bû!

Jê re dem diviya. Piştî panzdeh salan îro ro nîfşê nû di nav qey-

raneke edebî de ye û ev qeyran pozîtîf e; li derfetan digere, li xwe û kêmaniyên xwe mukir tê. Xwedî armancên dûr û kûr in, bi rik in. Ji gotinên ên dî ên sayakî bêhtir dixwaze bi xwe gotinanan bibêje, vebêje. Hewlên lêkolînerî xwe didin der. Welhasil rastî hate dîtin ku bi meqseda 'peyamê' bi tenê meş bêimkan e. Êdî xemeke wan a hunerî û edebî heye. Ji bo vê jî li bingehên wêjeya xwe, li derfetên derbirînan digerin. \*\*\*Ev lêgerîn jî di berhemana de bi awayek dibe riyên berfireh. Ger li van sê çar salên dawî bête nihêrîn ji gotaran bigire heya berhemana asteke edebî xwe dide der. Nifşê nû xwedîtî li xwe û li bingehên wêjeyê dike.

Ka em dîsa gotinên Wezîrê Eşo bi bîr binin: "Eynî nivîskarên kurd ên salên 30 î idî yê berê nîbûn. Ewana xwe bi xwe perwerde dikirin, xwegihandin guhêrî bûn, Kurdiya xwe xurt kiribûn û bi ser da jî bûbûn pisporên edebiyata bedew. Ewana şûna helbestên betreng, ên weke siloganan, ên tamsarkî, şûna çîrok, novêlên wek gotaran basît, ne xwezayî, dest bi nivîsandina helbest, destan û romanên bi naveroka Kurdî, bi ruhê Kurdî dagirtî yê bi zimanê gorî fikirandina xwerû Kurdî kirin û berhemên hêja, vê carê bi sêwiya hunerî û bedewîya bilind danexwendevanên xwe. "Ev rasti xwe dubare dike.

Ger em li babetê bizîvirîn em dikarin bibêjin bi tenê ne bandora Ereba Şemo bi gelemperî nifşê nû ji derfetên rabirduyê bêpar ma, xwe bêpar hişt. Îro ro bi gavên herî fesih ber bi vê rastiye ve dimeşin; bi dû ketine bi her hawî rabirduyê, derfetên rabirduyê têbigihijin. Ev jî ji her hêlî ve tê kirin; di helbestê de bingehên çandî xwe didin der, kovar di nav lêkolînên berfireh de ne, weşanxane hewl didin bi dehan kilasîkan biweşînin, dîsa weşanxane hewl didin berhemên wekî çîrokên hezar û şevekê bi Kurmancî werbigerin...

Ez dê pîrsek herî berfireh li vir bi cî bikim; ji bilî bandora kesên bi navudeng, ji bilî bandora zargotin û derfetên derbirîne ên bi Kurdî gelo çi bandora çand û keda Mezopotamya li ser wêjeya kurd heye? Gelo, aniha, li dunyayê kîjan wêje hewl dide careke dîn rê bide wan çavkaniyan? Gotineke têra xwe bi bar e, rast e, lê ger em şibakeyê ev qas berfireh li ber xwe vebikin wê çaxê emê karibin dengêkî, renekî, riyekê li wêjeya cîhanê zêde bikin. Belkî jî heya niha dosyeya sereke ya bihata gengêşin gere a bi navê "Mîrateya Çandên Mezopotamya" bûya. Em hê di destpêkê de ne.

\*(Ger em bi çavekî dî binihêrin belkî ev weke encam şensek e; lewre ew neçar mane folklorê xwe bikin bingeh. Di serî de Ereba Şemo bi tevahî wêjeya Kafkasya a salên sîyî folklorê, jiyana folklorîkê e. Ji bo

têkiliyek di navbera we û Erebê Şemo de pêk bê, we divê hun bi derfetên folklorê xwe ne biyan bin. Mixabin bîyanîbûneke mezin heye. )  
1. Wezîrê Eşo, çend dîtin li ser edebiyeta Kurdî li Ermenîstanê, kitêbxaneya Kurdî.

\*\*Li vir pêwîstî pê heye têkiliya tore û modernîzmê jî neyê ji bîr kirin. Hiç nebe wêjeya rabirduyê a Kurmancî bi çi çavî li toreyê nihêriye gere bête gengêşîn. Lê bi tevî hemî sedeman jî nîfşê nû jî heya niha bi gelemperî nêzîktêdayîna xwe a li toreyê zelal nekiriye; heta, bi navê modernîzmê toreyê red dikir û bi vî awayî di hewlên avakirina wêjeyeke modern de pirsgirêkan xwe da der. Ger nîfşê nû toreyê bigengêşiya, têbigîştî, rexne li toreyê bigirta wê bîngeheke rexnegiriyê jî xwe bida der, dîsa wê hewlên avakirina berhemên modern jî bêhtir biserbiketa.

\*\*\*Di wê pêvajoyê de, wexta kesan xwe bi awayek îzole kir bêhtir ji derfetên derbirînê bêpar man. A rast carna ev bi qestî dihat kirin lewre xwendevan bi mantiqê Kurmancî û derbirîna Kurmancî biyan bû. Ku nivîsek bi mantiqê Tirkî bihata nivîsîn bêhtir li xweşiya xwendevan diçû! Sedemeke dî jî ev bû ku nivîskar bi dû derfetên derbirînê nediketin. Ev jî sedemek bû têkiliyek di navbera wan û toreyê de, berhemên rabirduyê ve pêknedihat.

Rastiya ha rastiya gelek berhemên bi Kurmancî ne; helbet ne mimkun bû da derbirîna Kurmancî mohra xwe li berheman bida lê pîrî berheman bi Kurmancî nedihat fikirîn, bi zimanên biyan dihat fikirîn û li Kurmancî dihat wergerandin. Mesela ev teksta vegotini an jî agahdar bî Kurmancî bihata fikirîn wê bi vî awayî nehatiba nivîsîn. Ev mînakek bû ji ber ku sedemên gelek pîroblemên derbirînê bi vî rastiyê ve girêdayî bû me bijart. Rastiya me hemîyan e bi awayek. Nîşe: Wexta ez ji bo babetê bi dû materyalan ketim, ji nû ve mi nivîsên derbarê wêjeya Kafkasyayê de xwend hin tişt û nîşeyan xwe di dil û hiş de da der. Ev nîşe bi mijara me ve ne girêdayî ne û îhtimal e di nav nivîsên dî ên dosyayê de cî bigirin. Bi awayek kurt ezê lê bikim.

Beriya vê ezê basa filmekê bikim. Leheng kurdek an jî kurdên êzdî ne. Di nav êş û xwînê de tîrî sirgûn kirin. Diçin welatekî. Li wî welatî jî dikevin şer. Dimirin. Zarokên wan di sêwîxaneyan de mezin dibin. Ew zarokên di sêwîxaneyan de mezin dibin destpê dikin deriyek li wêjeya xwe vedikin. "Bavê Miletan"! Bi tevî hemî însanetiya xwe, wan jî sirgûnê careke dî sirgûn kiriye, şandiye Sîbîryayê! Bi rik, ev kesên bi xeyal li ser piyan mane. Piştî mirina "Bavê Miletan"! Ew

dîsa bi ser riya wêjeya xwe ketine. Ev şîrîd ji şîrîdên filmek nekîşandiyê.

»1. Karapetê Xaço gotiyê (Ji hevpeyîvîna bi Mehmet Aktaş re):

»“Em pêrgî hev dihatin, ez dibirim xwaringehê. Ji herkesî re digot, hevalê min Karapet ji welat hatiye. Wexta hatiye jî hemî dengên welatê min kiriye bêrîka xwe û aniyê. Ereba her tim ji min dixwest ez Derwêşê Evdî bibêjim. “

»2. Bavê Nazê di sala 1972 an de hevpeyîvînekê pê re kiriye. Ji hevpeyîvînê: Bavê Nazê: Qewetîya we ji bo nivîkarên nûhatî çiyê?

»Erebê Şemo: Xwendin, dîsa xwendin û ez careke din dubare dikim xwendin.

»3. Ji nivîseke Temûrê Xelîl:

Nivîskarê kurd yê mezin Ereba Şemo gava guh dida sazbandiya Xelîlê Evdîle û Şamilê Beko, digot:

“Gava Xelîlê Evdîle li meyê dixê, mar li kêleka te ra derbaz bin, li te naxin. Lê gava Şamilê Beko li fiqê dixê, hetanî dûpişk jî direqîsin.

Gelo hewceyê gotinê ye bê wexta însan ji hin berhem û keda beriya xwe bi dûr bikeve xwe ji çiyê dike, ji çiyê bêpar dimîne. Û bi derbirînên kurdên Kafkasya, nişê nû westa xwe hilda. Gul vedidin. Em dê rengên heya ber perê asîman bibinin...

## KONFERANSA NIVÎSKARAN A LI ÎZMÎRÊ

Di 21 û 22 yê tîrmeha 2001'ê de li Îzmîrê bi navê "Konferansa Nivîskaran" konferansek hatibû lidarxistin. Nivîseke Azad Zal bû sebeb ez agahiyekê lê bikim. Li dû agahiyê mi wekî notekê destnîşan kir ku derbarê wê konferansê de divê nirxandin bêne kirin. Cemil Oguz got, "Ew konferans muhîm bû, xwezî te nivîsekê lêbikira." Ev nivîs jî bi vî awayî hat ber destê we.

Belê, hin gav û qewimîn ji bo edebiyatê muhîm in; mafê xwendevan û nivîskarên pêşerojê heye ku derbarê wan qewimînan de bibin xwedî agahî.

Piştî konferansê mi nîşe lêkiribûn. Di vê nivîsê de ez ê wan nîşeyan jî lê bikim. Yek ji wan nîşeyan ev e:

"Du roj, bi awayek demî, li me buhurîn lê bi bawer im bi naverok û gava xwe dê gelek salan bi bandor be. Ev gav, di encama civînê de, wekî gaveke dîrokî hate derkirin; nivîskarên kurd li hev civiyan, hev nas kirin, kul û birînên xwe derkirin, rewş dan ber bê, peyamên xwe gihandin hev û saziyan. Careke din li rastiya xwe, rewşa çand û hunera xwe bi awayek bi rêkûpêk, kûr bûn."

Bersiva pirsek bi vî awayî şert e; Ji bo çi konferansek wisa?

Ne bi awayek fermî be jî, li Navenda Çanda Mezopotamya (NÇM) şaxa Îzmîrê bi helbestvana hêja Ayten Çaçan û kedkar û mamosteyê Kurmancî Loqman Ehmed re ez jî di Lijneya Kovara Rewşen -Jiyana Rewşen a şaxê de dixebitîm. Der barê problemên nivîskariyê de, qeyranên ku li kovarê diqewimîn dibûn sebeb em bi gengêşin. Her nivîskar bi awayek ji rewşa heyî bi gazin bû.

Ji nîşeyan yeka din:

"Berî civînê di sohbetan de der bû ku gelek alozî, bêagahî, bêtêkilî, rexneyên ne li rê, rexneyên di cî de... di serê kesan de hene. Civîn bû sedema hêviyek gelek xurt."

Rojekê mi pêşniyar li Ayten û Loqman kir ku em hemî nivîskaran li Îzmîrê, li NÇM'ê bînin ba hev. Ayten û Loqman li pêşniyarê xwedî derketin. Pirsar, gelo wê sazî qebûl bike, xem dixist dilê me. Loqman bi awayek ji xwe bawer got, "Wê rêveberî qebûl bike."

Rêveberiyê qebûl kiribû. Em li ser naveroka civînê û vexwendnameyê fikirîn. Problemên sereke jê yek bêtêkiliya nivîskaran, tu-

nebûna organîzasyonek nivîskaran bû, ya din jî rewşa kovarê bû. Di vexwendnameyê de jî ew problem bi tevî hin armancên din hatin lêkirin. Bi keda Ayten û Loqman hemî nivîskarên ku hatin li malên nas û dostan bûn mêvan. *(Pêşniyar ya mi be jî, bi çavên serê xwe bûm şahidê ked û heyecana Ayten Çaçan û Loqman Ehmed ji lewre rûmet a wan e. Herwiha me divê em bi bîr bînin Azadiya Welat bi heman heyecanê qedir li konferansê girt, civînê wekî manşet bi xwendevanên xwe re par ve kir. )*

Ji ber ku yek bi yek navê beşdarên bi bîra mi nayê ez ê serî li agahiyên rojnameyê bidim ku navê 38 kesan di rojnamê de hatibûn nivîsîn. Lê mirov dikare bêje li dor 40 kesî beşdar bûbûn.

Li NÇM'ê gotina kek Berken a wekî, "Cara pêşî ye ku ez xwe wekî nivîskarekî hîs dikim" em dilxweş kirin. Qîmeta gava ku hatibû avêtin dîda der ku Berken Bereh ne wê rojê, di Kovara Tîrêjê de dest bi nivîsînê kiribû lê cara pêşî bû hîsek wisa dijiya. Wî rastiyeke der dibir lewre bi awayek dostane di sohbetên edebî de me gelek an jî xwe dipirsî, ji hev dipirsî; bira bira em nivîskar in?

Ji bo dîwanê Ayten Çaçan, Berken Bereh û Osman Ozcelik hatin bijartin. Li dû destpêka axaftina Osman Ozçelik, Loqman Ehmed dest pê kir ku wî, piştî bixêrhatinê, sebebên civînê par ve kirin. Wekî kesên axaftvan Arjen Arî, Cîhan Roj, Îrfan Amîda, Kawa Nemir, Rênas Jiyar... axivîn.

Ji nîşeyên piştî konferansê jê yeka din:

*"Hin nivîskaran ji rexne û pêşniyaran bêhtir giringiya çand û ziman dan pêş. Hinan jê têgeh derxistin pêş. Hinan kovar û sazî kirin navend. Dîsa hin kes li ser rewşa têkiliyên zarava û wêjeya Çar Parçeyan rawestiyar. Dîsa pîrsgirêkên perwerdehî, weşangerî, têkiliyên siyasî û wêjeyê, rewşa nivîskaran, têkiliyên nivîskar û saziyan, nivîskar û civakê, nivîskar û siyasî, berpirsiyariyên nivîskar jî di nav axaftinan de hate derkirin. Dîsa hin kesên ku di saziyan de berî niha xebitîbûn têkiliyên di saziyan de rexne kirin. Bi taybetî û bi tundî hate rexnekirin kesên di saziyan de bi zîmanê xwe nadiaxivîn.*

*Ne di civînê de be jî hin rexneyên wan kesan jî hatin rexnekirin bê çima di wexta wextê de rexneyên xwe dernekirine, piştî ji saziyê vedîqetin dest bi rexneyan tê kirin."*

Arjen Arî, wekî di vexwendnameyê de hatibû destnîşan kirin, banga avakirina yekîtiyê kir. Pêşniyarek din a Arjen Arî hebû divê em wê pêşniyarê bi bîr bînin. Arjen Arî got, wext hatiye ku em kovarekê derînin ku ne di bin baskê saziyê de be, serbixwe be. Bi tevî

Arjen Arî gelek kes difikirîn ji sebebên xitimînê jê yek ew e sazi hikumdarên kovarê ne lewre karê kovargeriyê pêş ve naçe.

Di encama civînê de ew pêşniyar nehat qebûl kirin; hate gotin ku bila dîsa Jiyana Rewşen were weşandin lê hewl bête dayîn kovar bi rêk û pêk û bi naverokeke têrtije derê. Banga avakirina yekîtiyekê, bi awayê Arjen gotî, bi yekdengî hate herê kirin.

Di civînê de ez kurt axivîm: "Di salên nodî de, bi awayek tesadîf mi di kovarekê de ev gotin xwendin, 'divê însan xwe bike şerbet û bide vexwarin'. Ew gotin dê heta mirinê ji bîra mi neçe... Belê li vir em li ser gelek tiştan axivîn û sekinîn lê ka jana çar parçeyan?"

Wextê mi pirsra dawî kir kesekî bi tevgerên serî gotinên mi herê dîkirin, mi li wî kesî nihêrî, Meşal Temo bû, mi wêneyên wî di qada înternetê de dîtibûn. Mi dil kir li dû civînê wî binasim, pê re sohbet bikim.

Di wê navberê de daketim qata jêr. Rêberek ji xebatkarek saziyê re, giş karmend in, li cil û bergên wan binihêre, zor e ku karibin encam bi dest bixin, got. Ez keniyam, bi awayek hêvî şkestî çûm jor. Belê saziyê fikir erê kiribû lê dû re, poşmaniyekê xwe dabû der, heta ji ber ku bi destê wan çalakî nehatibû lidarxistin poşmaniyek jî hebû.

Wexta çûm jor, mi Meşal Temo li wir nedît.

Di dawiya civînê de Arjen Arî, Berken Bereh, Cîhan Roj, Îrfan Amîda, Salihê Kevirbirî wekî lijne, (Mustafa Borak jî wekî temsîlkarê saziyê) hatin bijartin ku dê xebata yekîtiyê bimeşandina her wiha bo ji nû ve derxistina Jiyana Rewşen têkilî bihata sazîkirin.

Piştî wextekê ez û Mustafa Borak ji Îzmîrê, Berken Bereh jî ji Semsûrê em çûn Stenbolê. Bi berpirsîyarê saziyê re, Kawa Nemir, Salihê Kevirbirî jî tevî civînê bûn. Di civînê de em haydar bûn sazi xwe ji wê xebatê bi dûr digire.

Min Berken Bereh me nixandinek kurt kir; rastiyên saziyê hene, ew jî tercîha wan e, em hatin vir, qet nebe me dît ku dawî li karê lijneyê hat!

Li vir însan mafdar in ku pirsekê bikin; baş e, sazi sist tevgeriya an jî li gorî polîtîkaya xwe tevgeriya lê lijne ji bo çi serbixwe tevnegeriya an jî wek di konferansê de hatibû pêşniyar kirin çima ji bo çareyek din tevnegeriya?

Wekî me got qerarek konferansê bû ku gere Jiyana Rewşen bihata derxistin. A din jî ji alî bîr û boçûnên ramyarî ve kesên beş-

dar bi piranî an alî sîyasî ve an jî ji alî hest ve nêzî sazîyê bû. Ji alî ramyarî ve em nikarin bes behsa pirdengiyê bikin an jî gavê wek gaveke neteweyî bi nav bikin. Wê wextê û beriya wê wextê nêzik-têdayînek hebû (îro wek xeletî bête dîtin jî rastiyeke wê qonaxê bû) ger însan bibana şahidê hin kêmanî û xeletiyên jî, bi navê qonaxan û hesasiyetên sîyasî ên qonaxan, însanan çavên xwe digirtin. Li gorî mi, sedemek din jî hebû ku bi hêza rewşenbîrî, entelektuelî a kesane ve girêdayî bû, em nikarin ji bo wê wextê behsa hêzeke wisa bikin karîba serbixwe tevgeriya û bimeşiya; li hêlekê êşên dihatin jiyîn em zevt dikirin, ev jî dibû sedem da çav her li şop û riyên sîyasetê bin; selmandina vê ne zor e, nivîskar bi xwe jî ji edebiyatê bêhtir di sohbetan de sîyasetê û pêşveçûnan digengêşin. (Belkî ji ber wê rewşê bû Rênas di axaftina xwe de balê da ser têgehane û pêşniyarker ku derbarê têgehane de bête fikirin) Di wê aloziya di rih û hiş de li hêlekê jî hişê me em aciz dikirin ji bo çî me serê xwe bi karê xwe re nedîşand. Ev tespîta dawî wek tespîteke şexsî bête dîtin jî ez weke rastiyeke derdibim pirêzeya nivîskariya Kurmancî ya heya wê wextê wisa bû. Li dîasporayê jî heman tişt bi awayekê diqewimî.

Axaftinên di civînê de, têkiliya sîyasetê û edebiyatê, meselên din mijar in ji bo nivîsêna cuda. Piştî jî Stenbolê vegehiyam, derbarê xwe û nivîskariya xwe de, têkiliya xwe û sîyasetê de carekê din fikirim, mi ê qerarekê bida, qerara mi wiha bû; "Ji vir bi şûn de bi tenê edebiyat!"

Hin nîşeyên din:

"Ji ber ku rojev negihîştibû destê çend kesane ev hate rexnekirin. Dîsa li jineya organîzeyê bi awayekê xweser li benda hemî şaxên Jiyana Rewşen bû lê hin ji wan hevalan ji ber ku vexwendname neçûbû ji wan re tevî civînê nebûn...

Lijneyê ji alî vexwendinê ve nivîskar nejmartibûn lê bi awayekê ji ber ku ji xalên rojevê jê yekê Jiyana Rewşen bû, bêhtir kesên nivîsêna wan di kovarê de hatibûn weşandin hatin vexwendin. Ji alî rengînbûnê û temsîliyeta hemî kovar û weşanan ve em nikarin behsa pirdengiyê bikin. Bi tevî vê jî gerekê bê destnîşankirin ku bi awayekê serbest rexne hatin kirin....

Piştî civînê biryar hat wergirtin ku di demê pêş de civînekê he bi naverokê bê li darxistin. Bi bawerim di wê civînê de wê rexne û kêmaniyên di vî warê de li ber çavê bêne girtin....

Kesên wekî Feqî Huseyîn, Samî Berbang, Hesen Zinar, Zana Farqînî tevî civînê nebûn. Ku di civîna pêş de tevî civînê bin wê he watedartir be, an jî li ser xalê biryarêna civînê dîtin û nêrinên xwe



ji xwendevanan re eşkere bikin wê hê rê li gelek tiştan vebike; van kesan bi gelemperî hemî kesên nikaribûn tevî civînê bin dîtinên xwe par ve bikin wê kûrahî bide biryar û nêrînan.

Civînê moralek xurt da nivîskaran. Ji bo gelek kesan ji hêla derûnî ve bû selmandinek ku ew nivîskar e lewre ji ber hin sedeman gelek kes nebûne xwedî berhem. Wekî xêzek zirav ezê nîşeyek jî qeyd bikim; nivîskarek bi eslê xwe kurd bi berhemên xwe tirk jî di civînê de bû. Ew li hember biryara wekî ku divê nivîskarên li Bakur bi rêk û pêk bixebitin derket.

Tiştêk din jî derket holê ku divê em berhemên nivîskar nekin qurbana gotin û hin tewrên nivîskar lê herkes bi taybetî civak xwedî maf e ku nivîskar rexne bike, jê hêviyan bike...

Civîn bû sedem ku ezê hê demek dirêj li ser gelek hêlên xwe, têtikiyên xwe û berhemên xwe bisekinim. Dîsa dilsozî û dilgermiya hemî kesan hêvî û moral da me ku wê di warê çand û wêjeyêde jî gavên bedew bêne avêtin. Bes em ji bîr ve nekin ku em hê jî di destpêkê de ne, gerek êşên destpêkê me zîvêr nekin.

Derket holê ku her kes li ser kovarê xwedî maf e û divê her kes xwedî lê derê, hem rexneyên xwe lê bigire hem jî keda xwe tevî bike. Herçiqas hin xeletiyên kitekîti bi aîdê rêvebir û lijnayan be jî wekî di civînê de hate gotin ev kêmanî ji rastiya nivîskaran û civakê jî dertê.

Her çiqas wênesaz, sînemager û şanoger hebûn jî kes ji wan derneket û pirsgirêk û pêşniyarên van waran dernekir. Ev jî kêmaniyek bû. Ji ber ku civînên wanî rîya çareseriyê ya herî kin e.”

Agahiyek: Piştî wextekê bi ser saziyê ve tê girtin û dest datînin ser vîdyo û dîmenên civînê. Belgeyên derbarê civînê de dibin.

## ŞEROYÊ BIRO, KANDISKY Û FOUCAULT

Tiştêkî tê û pêşkarî jiyana merivan dibe, gotinên Wassily Kandinsky tê bîra merivan ku gotiye, “berhema hunerî, bi awayek bi raz û jênayêfehmkirin ji hunermend xwe dide der, jiyana xwe û heyîbûna xwe ji hunermend digire.” Tam jî halek wisa bi serê mi de tê ku Dengê Şeroyê Biro, nêrînên Foucault û dîtina Kandisky bûne şorbe! Em rojekê li zaviyê bûn, bi werîs, sap girê da, li zeviyê nihêrî, îsal jî çû, heya salek din Xwedê mezin e, got, ez li qodaxa erebê siwar bûm, wî kilamekê got, cara pêşî bû mi dengê bavê xwe yê bi şewat dibihîst û ti carek din mi nedî ku ewî kilam got... Bi tenê kilamekê gotibû... Bi salan bû ez bi dû wê kilamê ketibûm ku çî newabû hewqas bandor li dilê zarokekî pênc-şeş salî kiribû... Mi ne navê kilamê dizanî ne jî peyv û gotinek dihat bîra mi... Îro, wextê mi guhdariya Şeroyê Biro kir, mi dî heman newa hat û li ser kezeba mi rûnişt, kilam kilama “kekê min” e... De wextê mi guhdariya Şeroyê Biro dikir mi nêrînên Foucault ên derheq pîrsa weke “Edebîyat çî ye” dixwend! Li hêlekê halê konsantre ê xwendina nivîsê û li ciyekî jî nişka ve ew halê bi hestiyar ê ji guhdarîkirina kilamê; ne Foucault ma li meydanê ne jî edebîyata modern û dema me! Beriya salan mi gotibû, du dilê me hene yek jê mîna çûçîka çolê nazik, dilê din jî weke kevir hişk e. Mi di edebîyatê de her hewl da ez bibim xwedî dilekî ku ew dil jî dilê dema me bûya û bi edebîyata dunyayê re her lê da. Ev têkoşîneke bê eman e, ev di heman demê de nakokî û belaya, rastiya herî mezin a qelesa me ye; edebîyata me bi kêlî, bi şikeste û sanciyên wisa re, pîrî caran, serobino dibe. Modernîzma em nikarin bijîn an jî di jiyana me de nîn e (dilşewatî û jiyana rabirduyê dest xistiye stuyê me, arîşeyên derheq êş û bindestiyê de... ) em hewl didin edebîyata wê bikin! Bi tevî rastiyên wisa jî, di romanê de, mi hewl da ji wê “pira siratê” (pêvajoya derbasbûna qada edebîyata modern hinek jî dişibe pira siratê ku gunehên merivan bi awayek qeîde, nêzîkahî û hişmendiyên “jiyana ne modern” in) derbas bibim, xwe ji sir û şîrîna hiya retorîkê, xwe ji xefikên lîrîzmê û îdeolojîk bikim. Û heqîqeten “êş” lehiyek e, bagerek e meriv bi ber bikeve, ne belî ye bê çî bîne serê merivan. Vêca di vî zemanê de meriv kurdek bi qelem be, ew talûke erjengtir e çimkî “êş” bi qasî alyê xwe yê efsûnbaz û sotîner li hêlekê jî xwireka qeleman e! Ev e, ketime halek wisa ku li hêlekê Şeroyê Biro û kezebeke bi şewat, li alî din dunyayek dîtir ya tevîhev û modern û kêliyek ji xwendinê... Ger dirêj bikim ji halê şorbeyî pê ve bawer nakim tiştêkî xwe bide der, dîsa jî hêja ye gotineke Foucault bi bîr bixim, di pey re rabim û

bigerim çimkî kêliya ku hiş û aqil dikeve bi bandora hest û diltenikiyê tu saxî û selametî namîne ji bo qelemê! Foucault wisa gotiye;” roja tiştêk em dikarin navê weke *“hecma kitêvê”* lê bikin hat û ciyê retorîkê girt wê rojê edebiyatê dest pê kir”Ne Şeroyê Biro, ne Foucault, ne Kandisky û ne jî *“emrê çûyî”* aniha, ber bi *“zemanek”* dîtir ve, ber bi meşê ve, meş rê û dunyayek dîtir e...

## ÇEND PARVEKIRINÊN DI MEDYA CIVAKÎ DE

1.

Du salên têrtije ên ciwaniya emrê mi bi te re ne; çîrokên sirê, rengê keviran, bêhna giyayê li welatê du lingên pirekê, newaya ji dengê Dîcleyê ku her şev ji bo mi dibû lorîk û ez diçûm xewnên şevên ker û lal..... Tu dengê ji kezeba min î... Qelem dibêje wê av bibe şeltek û Heskîfê biparêze... Çi deng in, dibêjin ji xeybaneyan de bi zarîn û zîvîn in... Xwêdan bi ser mi dikeve; westê dest dixin stuyê çîrokên jiyana merivan û wan difetisînin, xwîn ji kezeba merivan diherike... Wê morî nikaribin bimeşin... Nifir ne karê nivîskaran e, herçî çêr û dijûn in tûrikê mi qelişî ye mi hay jê nîn e!

2.

Gotineke bi Kurdî heye, “ Xwedê derdan dide însanan. “ Li vir “însan” heqîqeten ên bi wîjdan, bi hesasîyet, bi dil û mejiyê xwe ên “însan” in ew in têne derbirîn; mirovên wisa jî an bi sebrê, an bi hêza dil û mejiyê xwe (zanist -aqlê modern) an jî bi “derdê xwe” re hewl didin heyder bin... Kaos, bêstiqrarî, çûyînûhatin welhasilî kelam bêhizûrî bêhtir dibe pariya qeleman... Heke ne ji “hêviyê” be qelem di gellek dem û kêliyan de dikevin halên wisa ku Xwedê wî derdî nede ti kesî. Nivîskarî, bi awayek, derdê xwe weke “bêhizûrî” bi nav dike... Meriv li xwe mukir tên ku di hin kêliyan de “nivîskarî” dişibe halê zarokan, bi xeyd e, bi hêrs e, diltenik e, bi bendewarî û bi merhemet e; hin nivîskar wî halê zarokane venaşêr in hin jê jî ti car wî halê xwe dernabin, çî be jî ti qelemên edebîyata honakî nikare ji wan hal û kêliyan xwe biparêze a ku qelem dike ku rista lîskeke be, teksta lîska me di dilê me de ye, em di dilê xwe de lîska xwe dilîzin a muhîm ew e ku em karibin lîskê li ser sehneyên zemên bilîzin ku ew jî bêy aqil û bêy “însan»îbûnê nabe.

3.

Mirov, li derekeciyan, ti car nabe dareke şîn a bi rehên gumreh û bi mêwe; li derekeciyan, meriv dibe kerengper û ba cî û warê merivan kifş dike, ên li refê xwe digerin û tevlî refê xwe dibin ew jî mîna qulinga Evdalê Zeynikê per û bask lê dişkên! Biyanîbûn” jî mîna zîmanê me yê zikmakî zarokên di çîrçîrokên de ên xistibûn sandoqan û ew avêtibûn bahrê bi bîra mi tînin!

4.

Sekna edebî a li gorî tifaqên desthilatîyan an jî zemînên sîyasî ên rojane û populer biguhere, ew sekin ji bo edebîyata merivan dibe mîna hebek jehrî ku ew heb li şerbetê xistine; piştî wextekê ew zemînên sîyasî jî “rastîya we” li ber çavên xwe dibînin û roj tê êdî tu zemîn namîne ji bo “vebêjên we” ji lewre ciyê edebîyatê edebîyat e, ciyê edebîyatê mexdûr in, vebêjên nivîskariyê ew vebêjin “bi xwe bibin zemîn

## 5.

Dê û bav diaxivîn, “tu zarok bû” ji lewre gerek tu bêdengbûya... mamoste diaxivî ji ber ku te fehm nedikir tu bêdeng bû... ew bêdengî weke “efendîbûna te” dihat hesabandin û dibû “eferim” û li te vedigeriya..... zimanê te her bi qasî jiyana rojane bû... te bi tenê li çîrçîrokan guhdarî dikir, çîrçîrokan xeyal dianîn ji te re, lê ew mişt bi qalib bûn ji lewre tu ji qaliban hez dikî, ji gotinên rojane re amade yî... Tu her li bendê yî, di vê dewrê de jî, form li ser wê qalibê bin ku, “bavo çû çarşiyê ji mi re sêv û pûrteqal anîn... çîroka me çû qulê dîwaranTuyê bêjî bindestî, belê bêje, em pev re bêjin, bindestî “zimanê seqet” e, dibêjin, bindestî “gotina nêr” û zimanê bêycîwar e, dibêjin bindestî - bêdengiya ziman e” lê ya li te tê ew e ku tu zincîra xeybane bişkinî çimkî halê xwendevaniya te an jî nivîsevaniya te dişibe halê zarokek li keviyê bahrekê; demsal havîn e, tav wisa ye qey mejiyê merivan diçelqe (!), ji dilê te tê tu xwe li avê bixî, tirs nahêle, tu ditirsî ku tuyê bifetisî, li bendê yî yek were te bêavêje nav avê û tu tirs xwe birevînî, her tişt li ser kêlîkekê ye, her tişt li benda qerakê ye, her tişt bi pîrsekê ve xwe ji qalik dike, her tişt bi pîrsekê re “terk-î xwe dibe”, ziman û edebîyata modern li pêşberî te bahr e lê tu di halê wî zarokê de yî... Qemîş nakim bêjim terk-î xwe bibe” lê tu nemîne li benda kesî, guh li New Romanhalêqemîşkirinê” neke, xwe biavêje bahra ziman û edebîyatê, te li qeraxê çeman, li ber kanî û delavan lîskên xwe lîstin, xwe li gol û bahran bigire... Ditirsim ku ne bahr lê ew tirs te bikuje, ji bo wê, vegere, bi zimanê;xwe re carek din bibe zarok, bibe ciwan, xwe hînî aşperiyê bike, li ber tava havînê bi wayek azad di bahrê de bi deng û şeng be... Bi vî halî, tu xwe li avê naxî, li bendê yî yek bi satil an jî şûşeyê avê ji bahrê bikişîne li canûcesedê; te bike... Ax ezîzeyam, ax ezîzê çî bi jan e ku meriv li keviya bahra edebîyat û nivîsê bikeve wî halî... Xewna nivîsê penzeher e ji bo zincîrên xeybane, were em xwe li ava bahrê bixin her yek ji me dengê, her yek ji me xeyal û welatek, wê nivîs li me bibe perûbask... wisa nesekine li ber delav û cohoyan êş dikeve canê mi, hubra qelemê diçelqe, ên li keviyên delav û cohoyan ji te reçîrokên bahrê dibêjin, ên navê bahrê dikin qêrîn û nahêlin tu xwe

li ava bahrê bixî li wan vegere û bêje, “ev

## FEZAYÊN PIÇÛK Û XALÎÇEYÊN NÛ ÊN ROMANÊ

“Mekan ji bo nivîskaran, vediguherin fezayên piçûk ên xeyalî û bi wateyan barkirî. Ev fezayên piçûk dibin dîmenên remzî ên ku daliqên nivîskaran bi tevger dikin.”

David Stephen Calone

Heya ji destê mi hat, mi hewl da ez hin romanên xwe weke bajaran bi xalîçeyên çîrokên mirovan ên bi şiverê, hin romanên xwe jî wek bajarên xalîçeyên wan nehatî xwendin, ên bi rê û dirb lê bikim; bi wî awayî ê hinek xwendevan hew weke rêwî tê re derbasbûna, hin xwendevan jî bibûna rêwiyên wan xalîçeyên bi kod û şîfre... Heya niha çi nivîs, dîtî û rexneyên bo romanên mi hatin derbirîn bo qelem û romanên mi an bûn navê rengê xalîçeyên xwendinê ên bi tercîha xwendevaniyê an jî bûn “çîrokên meşa xwendevaniya li ser wan rê û dirban”, ev jî bo nivîskariya mi, bi gotina herî kurt, xalîçeyên nû ên romana min in...

Rastiyên me ên tehl hene mixabin; mekan bajarên weke Bedlîsê bin, ji alî texeyûl û xeyalkirina rabirduya bajarên qedîm ên weke Bedlîsê arîşe têne pê, têkilî qut dibin, ev normal e çimkî li dibistanan, alyê kulturî, mîmarî, ilmî yê wextên qedîm nehatine dîtî. Ya din jî vehesîn û texeyûla însanan bêhtir li ser bajarên roja me ne, çî îroniyek yeman; halê hin bajarên yê pêncsed sal beriya niha ji halê roja me pêşdetir bûye! Ji lewre xalîçeya bajarekî wisa, an jî xalîçeyên hunerî, edebî ên bajarek wek bajarê Bedlîsê ji alî texeyûl û xeyalê vemuhîm e.

Meriv dikare behsa nasnameyên ji vehesînan, behsa nasnameyên hatî sêwirîn û nasnameyên eslî ên bajarên bikin. Nasnameyên eslî, nasnameyên kulturî, hunerî, şaristanî ne. Bajarên ku di hunerê de, di edebîyatê de bûne xwedî nasname di dema modern de bûne bajarên her însanê li rû dunyayê; me Dublîn nedîtiye lê bi saya Joyce wek ku em çûbûn Dublînê, Dublin bûye bajarê me jî!

Nasnameyên bajarên di heman demê de têtikiliyên mirovahiyê jî didin der; mîrateyên hunerî, ilmî, kulturî dibin sebeb têtikiliyên dema me jî ji hêlekê ve bi reng bibin. Her berhem, her mîrate û mayînde li coxrafya xwe bimehne ye, çîroka mayînde, mîrate û coxrafyayê çîrokeke balkêş e.

Bi taybetî, di Mala Baz de, rasteqîniyek dîrokî; ew rasteqînî ê bibûya parçên sêwirînê ji bo rasteqîniyên din werin ber çav. Dest-

neke ji bo rasteqîniyên dîrokî ên neteweyî em dibirin rasteqîniyan û warên xweşraz, bi kod û şifreyên wê destanê re, bi çîrokên li ser edebîyata roja me hatî sêwirîn re bîrxistina “goristanên bîra bajar-mîrekiyekê... “ xalîçeyêke parsû û çîrçîrokên bi hewes ên li ser rêya warê çîrokên Hezar û Şevkê... Mi dikarî ji çîrçîrok an jî parsûyek romanê bi tenê romanekê lêbikira; ez Kurdek im û gelek melzemeyên karibûn xîtabî meraqên li agahî û sehneyên egzotîk bikirana hebûn li cem mi û mi romanên derheq Êzidiyan de dihatin nivîsîn dixwendin bê çawa detayên ji baweriyê dixistin navenda romanên xwe û keç û jinên Êzidî dîsa diman bi çîrokên xwe ên erjeng!”

Hê di zarokaniya xwe de me dest pê dikir me bi şemala çirayê sond dixwar, guneh bû ku me av li êgir bikira, di destan, çîrçîrok û çîrokan de ‘xofa naletê’ her li ser me bû ku ew nalet, exlebe, ji zilm, zor, ewantî û bêbextiyê de bi ser merivan de dibarî... Kesên xwîn-şîrîn reng û dengê jiyane bûn. Bêgunehî delalî û xwînşîrîni bû. Û destan, kilam, çîrçîrok weke ‘şerbeta trajediyên’ bûn,

Şerbet, çi tehl bûya çi jî tîrş, çi şîrînbûya çi jî jahî mi dikir ku di romanê de bibûna şerbet...

Wekî nişe dikarim bêjim, ji kêf û hewesên mi jê yek jî ew e ku piştî derçûn an jî weşandina romanên mi, xwe dûr bigirim, bibim xwendevanekî romanên xwe. Lêkirin û derbirînen wisa ji wî halê mi yê xwendevaniyê ne, ne wisa be, meriv romana xwe dinivîse, îcab nake meriv, nasnav, pênase û derbirînan bo romana xwe lê bike, an jî vebêje..... Aniha jî wek xwendevan ez û eza nivîskarî li hev bi fikir û bi tevger in, bi pîrs û bi bersiv in.....



## EDEBÎYATA KURMANCÎ A KOM Û LÎSTEYAN

Di salên nodî de coş û hestiyarî hebû ji lewre di medyayê de ji berheman bêhtir nav dihatin nîşandayîn ku meriv dikare jê fehm bike çimkî piştî qedexe û nefesekê, hewla îspatkirinê hebû ku mirovan dixwest bêjin, binihêrin, edebîyateke me ya çawa heye, ev bertekiyek bû di heman demê de, di medyayê de, hin kes û derdorên tirk her digotin, zimanê Kurdî nîn e, ka edebîyata wan, ka berhemên wî zimanî... Li bakur Kurdan jî xwe neçar didît ku bersivan bidin, bertekiyarî rê bidin!

Li pey salên du hezarî qelemên Kurmancî li bakur zêde bûn, eleqeyek xweş hate pê, bi çalakiyên edebî re edebîyat xweş kete rojevê. Lê dîsa jî heman adet hebû; piştî çalakiyan, di medyayê de lîste dihatin weşandin! Wextê li zanîngehan xebatên Kurdolojiyê dest pê kir, xebat hinekî berfireh bûn lê di çarçoveya ilmî û edebî de wan bêhtir dest havêt klasîkan hê jî ew xebat, pir kêmbin jî, berdewam in û ew xebat belkî li ser zemîneke dîtir were gengêşin wê baştir be (di wê qonaxê de jî hin nêzikahiyên şaş ên li ziman û edebîyatê qewimîn/diqewimi). Her ku hin kesan hewl da li ser rêgezên ilmî edebîyata nêz ya dema modern lêbikolin, bigengêşin jî pêdivî pê nedîtin derkevin derî lîsteyan û berheman esas bigirin, hin berhemên hatin nirxandin jî bi hukmê ezber û qebûlan hatin nirxandin. Bi tevî keda hatî dayîn hurmetê heq dike, me bi çavên serê xwe dît ku mirovên baş bi Kurmancî nizanin (mebest jê mehne û naverokên ziman in weke rastiyekê helbet têkiliya we û edebîyatekê bi asta têkiliya we û zimanê wê edebîyatê re eleqedar e) li ser romana Kurdî berhem weşandin! Hêjayê pirsê ye, meriv dikare li çu sebeban bifikire;

1. Yên di qada medyayê de (her ku meriv nîyeteke xweş bibîne an jî wisa bihesibîne jî) baş bi Kurmancî nizanibûn.

2. Lîste dibûn/dibin sebebê coşê

3. Ên ku navê wan di lîsteyan de bûn jî ji rewşê nedigazirîn û nedixwestin talûkeya ku xwe ji coş, kom û lîsteyan bide der bibînin!

4. Wextê hûn navên “meşhûran” di nivîsên xwe de bi kar bînin (lîste di heman demê de kom an jî komên meşhûran tê qebûl kirin) ev dibe sebebê vehesîneke wisa ku hûn jî bi kê û bi çu re eleqedar in! Seknên wisa bûn sebab ku hin ciwanên dest bi rexnegiriyê kirin (ku hin jê gelek jî in, hêviyê didin edebîyata me)hew xwe li berhemên

kesên di lîsteyan de bigirin, “meşhûrên qebûlan” esas bigirin.

5. Ne bi temamî lê kesin ku di medyayê de têne nasîn û dicoşin wê rewşê weke “text” dibînin û ne bi qalibên desthilatdariyan bin jî li ser navê edebîyatê ji bo vehesînan tespîtan dikin. Helbet meriv nikare wê rastiyê paşguh bike ku di çarçoveyên edebî de, li ser esasên edebî jî navin di edebîyatan de têne bi bîr anîn ku gelek normal e, balê didim wê rewşê ku lîste û çoş dibin sebeb mirov ji afirîneriya edebî jî bibin ku wê rojekê gelek kes “trawmayên kom û lîsteyan” bijîn! Taybetiyên edebîyata kom û lîsteyan ew e ku xweş hîni manîpûleyan bûne, bi nivîskî nagengêşin çimkî hay ji xwe û sekna xwe hene, halê bi heyranî mijar e, romanên dinivîse, şair e, qelem e, rexnegir e li hêlekê edebîyata modern ya rojava di deve xwe de dike benîşt li alî din tu rê, rêgez û zagonên nivîsevaniya rojava bi kar nayne... çî ecêb e ku analîzekê li ser edebîyata Kurmancî nake, nivîsekê nanivîse, lê xweş dizane çî bifiroşe girse û medyayê! Modern e lê li ser maseyan her tiştî vedibêje... Çî kom û lîste hene giş dibin sebebê pîrsgirêkan, çî kom û lîsteyên ji meylên sîyasî bin, çî jî kom û lîsteyên ji têkiliyên bi weşanxaneyan re bin, çî jî ên ji hemwelatî, hevaltiyê bin, yek ji wan jî ne li ser rêya rast in... (Xwendin çalakiya herî delal û hêja ye ji bo vî zimanî, nirxandin jî wisa mebest jê gavên li ser mextedan hatî sêwirîn em rexne li wan gavan bigirin) Kesê ku ne di nav lîste an jî komekê de be wey li halê wî kesî; heger hûn wisa bin, li ser maseyan derheq edebîyata we de mohra xwe lê bixin û ciwan û hezkiriyên edebîyatê jî pîrsekê ji xwe nekin, nebêjin, gelo tiştê tê gotin rast e yan na! Mirovên wisa di eslê xwe de kûr li meseleyan nanihêrin, ji ber ku bê hay her bi “text” re meşhûr in nikarin berhemên xweş ên edebî jî biafirînin wisa ku bawerî bi wan re namîne bê kesek Kurd dikare di çarçoveya edebîyata modern de romaneke hêja binivîse! (Edebîyata îdeolojîk yan jî edebîyata partîyan li ser rastiyên xwe ne ku ew derî vê gengêşiyê ne ew derdor belkî baştir edebîyata dikin bigengêşin) Mesele ne ew e meriv reşbîn bin, ne ew e meriv bi xewyd bin lê ku meriv li ber çavên xwe bibîne ku rê ne tu rê ye û meriv negengêşe, li çareyan negere dibe şaşiyek mezin. Helbet meriv dizane çî wextî be jî dawî li şaşiyên tê lê em di wê demê de ne ku “hişên çêbûwar»mijar in. Di dewsa kom û lîsteyan de heger “nêzikahiyên edebî” bibin sebebê platforman helbet wê baş be. Îtiraz ne gazinek awayek rexneyê ne, di esasê xwe de “tenêtî” rexneya herî mezin ya li civak û jiyane ye, “tenêtî” îtirazek e, ez jî lê difikirim tenêtî rexneya herî emzin e, çareya herî xweş ya ji bo edebîyatê ye... Heger meriv bi çaveke din lê binihêre ew gotinên derheq ziman û edebîyata me de dafik bûn, bi wî awayî dihat xwestin meriv li ser şaşiyên wan bigengêşin,

rewş şêlû be; çimkî heger hûn li ser rabêjên şaş bigengêşin ev tê wê mehnê hûn li ser şaşyan digengêşin. Di dewsa wê de me rewşa modernîzebûna zimanê xwe û rastiyan xwe, berhemên edebîyata xwe têxista navendê û em lê bi gengêşyan wê bifeydetirbûya, belê nivîs û nêzikahiyên wisa hebûn lê ez behsa “gêjgerînek” ên di med-yayê de û qîreqîrên li hemberî girseyan dikim!

Mi dî û ez bûm şahid ku qelema merivan nebe qelema tu kom û têtikiliyan teng, hewl bide bibe qelema edebîyata dunyayê ya heta niha hatî kirin, wêjevanî çî xweş e, lewre “her kes strana xwe dibê-je”, “her kes çîroka xwe diji” ji lewre TENÊTÎ JÎ STRANEK E...

# ÇEND HEVPEYÎVÎN

## **Xwendevanên Kurdî Di Heman Demê De Xwendevanên Edebîyata Tirkî Ne**

Faysal Ceylan

Me bi Cihan Roj re sohbet kir ku helbest, çîrok û gotarên wî di gellek rojname, kovar û malperan de hatine weşandin. Di sala 2002 yan de berhema xwe a pêşî Ratîkayê pêşkêşî zewqa estetîkî a xwendevanan kiribû.

**Bi pirseke derheq mereqa xwe a zêde de dest pê bikim. Tu û bi gelemperî di edebîyatvanên Kurdî navên xwe ên fermî vedişêrin, bi bernavkan berhemên xwe diweşînin. Sebaba rasteqiniyeke wisa çi ye?**

Di esasê xwe de, di hin gengêşiyên teng de, ev weke rexne tê derbirîn. Hin kes weke hewla xweveşartinê a nivîskaran dibînin û rexne lê digirin ku em nikairn vê weke rexneyeke li cî bibînin. Îsmail Beşikçi jî ew mijar an destnîşan kir, nêzikahiya wî bêhtir erênî bû û li ser rexneyeke avaker hatibû sazkirin; wî pêşniya kir ku ger nivîskar navên xwe ên fermî bi kar bînin ê xwendevan wan nas bikin, di navbera nivîskar û xwendevanan de têkilî xurttir be. Edebîyat naşibe warên din, a ku mijar e berhem e, ku berhema bo xwendevan hatî pêşkêşkiirn ger baş be xwendevan li nivîskarê wê digere û dinase. Di roja îro de rewşeke wisa nîn e; xwendevan, nivîskaran bi bernavkên wan dinase, pirî nivîskaran jî di çalakiyên edebî de bi xwendevanên xwe re tê ba hev. Belê, dibe ku ji ber atmosfera wextekê belkî bandora xweveşartinê hebûye. Belkî dibêjim ev hinekî jî meseleyeke şexsî ye, kirdeyî ye. Ji derî wê, aliyek meselê ê romantîk jî heye; dawîya dawî derheq nivîskariyê de di dilê we de hewesek, perpitînek mijar e. Ê, navekî we yê kêfê dide we, bi edebîyatê re lihevhatî hebe wê xweş be. Li gorî hinekan jî, belkî, redkiirna navê fermî şert e. Ew rewş bi tenê di edebîyata Kurdî de nîn e. A rast ew ne meseleye were rojevê. Di edebîyata Kurdî de, di a Tirkî de, di Edebîyata Dunyayê de gellek mirov hene em bi navê wan ê fermî nizanin ku gellek berhemên hêja afirandine. Derdek Cîgerxwîn ê xweveşartinê tunebûye lê ewî navê xwe ê fermî bi kar neaniye.

**Qasî ku em haydar in web i helbestê deriyê dunya edebî vekir. Pey re çîrok, helbest, çîrok û herî dawî web i romanê rêwitiya xwe berdewam kir. Û aniha romana te a duyem di rêde ye. Çûn û hati-**

## **na din av cûreyên edebî de, dikarî behsa wê bikî?**

Bo mirovên coxrafya met ê gotin ku her yek jê helbestvanek e, ew derbirîna rastiyeke ye. Em, ji ber ku pîrî pîrsgirêkan çareser nakin bi tevî êşê li hev zêde dikin. Di emrê xwe ê piçûk de pîrsan dipîrsin û bin av lêgerînan dikevin. Ji sêwirîna bêhtir, tiştên me dane serhev vegotina wan bom e dibe karê pêşî. Carna cûreyek edebî têr nake. An jî hûn naxwazin ku besî we be!

Bi zena mi bandora lêgerîna jî egerek e. Biherhal ciyê ku lê sekinîm û dikarim bi dilê xwe bêhna xwe bidim û bistînim roman e.

## **Geşedana edebîyata Kurdî û merheleya ku lê ye, tu çawa dibînî?**

Di edebîyatekê de, lêgerîn, bendewarî, rexneyên xwendevanan, pîrsên wan delîl û desîseyên derheq geşedanên edebî de, merheleya ku ew edebîyat lê pêşkêşî me dike. Xwendevan ne li benda roman û çîrokên ku bi zimanê rojane ê teng hatî nivîsîn e. Xwendevanên ku bi qasî pîrsa, 'Çi hatiye nivîsîn?' pîrsa, "Çawa hatiye nivîsîn?" dikin mijara rapîrsînê, muhîm dibînin roj bi roj zêde dibin. Xwendevanên Kurdî di heman demê de xwendevanên edebîyata Tirkî ne ji lewre bi edebîyatê ne biyan in.

Dîsa têkiliya edebîyata Kurdî û edebîyata dunyayê û rewşa wê, referans û pîrsgirêkên wergerê têne gengêşin. Edebîyata me aniha li pey têkiliyên derveyî xwe ye li alî din li pey e ku têkiliyên navxweyî safî bike, ben û girkan vebike.

Bo çanda hunerî û pêşveçûna afirineriyê rola rexneya estetîkî-hunerî zêde ye. Bê şik ev, bo pêşveçûn û geşedana çanda hunerî a kurdan jî egere û nirxek muhîm e.

## **Tu dikarî rewş û asta rexneya hunerî estetîkî a di edebîyata Kurdî de kifş bikî?**

Di çanda devkî de hez û kêfxweşiya hunerî estetîkî bes heye. Di klasîkên pêşî de metirsiya hunerî-estetîkî hebûye. Helbestên Meleyê Cizîrî bo meselê mînakên hêja ne.

Çi wextê ku ziman û edebîyatê bo jîyanê cîwar nedîtine, ziman hatiye qedexekirin rol, karberî û mîsyona huner û edebîyatê guherî ye. Di edebîyata nivîskî de heya wextekê peyama esas hatiye girtin. Pey re em dibînin ku hewl hebûne bîra civakî weredestnîşankirin û bi awayek edebî bîra civakî were deşîfrekirin. Herî dawî û di roja me de hewl ew in ku takekes were deşîfrekirin. Ew jî dibe sebeb nêzikahiyek ji metirsiyên edebî were pê.

## **Bi mehneyek gelemperî çî giringiya hunerê, bi taybetî çî rola edebîyatê bo çanda hunerî a kurdan heye?**

Bi tenê ne ji bo çanda hunerî, bi jiyaan Kurdan jî gellek muhîm e. Heya demeke nêz (û hê jî gellek kurd) piştî çîlsaliya xwe diket halek wisa ku dima li benda mirinê. Ku mirin di temeneke wisa teze de were bîranîn jê re sebebên mezin divê. Ji sebebên jê yek jî ew e ku kurd bi çanda nivîskî re, bi çanda hunerî re bes ne hevnas bûne. Taybetiya hune rû edebîyatê ew e ku merivan bi hêvî dikin, jiyanê bi mehne dikin, jiyanên ji derî jiyaan heyî disêwirin, bi bir dixin. Adorno gotiye, "Huner warek wisa ye ku dikare ûtopya mirov, hêviya mirov, peroşên mirov veşêre."

Ger hûn dûrî edebîyat û hunerê bin ê peroşên we ên kêliyan û ên rojane zêde bin, ku hûn bi edebîyat û hunerê veneşêrin meriv nikare behsa bengîtiyê bike, baş e, incax meriv dikare behsa wan takekesan bike ku nikarin bibin pêgirên tiştêkî, xeyal û peroş her li wan dimirin.

### **Gîtara Bê Tel romana we a pêşî ye. Çima Gîtara Bê Têl?**

Bi tevî hin karekteran mi hewl da ez jiyanekê deşîfe bikim. Hewl ew bû carek din, ferqa "giranbûn-sivikbûn", "sertbûn-nermbûn"ê bi bir bixim. Bi vê mehneya xwe, vegotina eşqa du mirovên mexdûr li mekaneke weke Mêrdîn. Eşqa wan dişibiya gîtarekê lê gîtareke bêy têl. Lêgerîna li a sivik, hewla rizgaribûna ji a giran. Serobinokirina şewaz û zimanê ku em xwe dinav de dibînin, deşîrekirin, hevnasîna şewazên cuda, carek din bîranîna çêjê, bîrxistina hin mekanan ku ew heza estetîkî pêşkêşî me dikin. Mi hêvî kir ku xwendevan esmên, bêhnan, rengên ol û çandên cuda bi bir bînin.

## Me bi Cîhan Roj re “perde” da alî

- A. Vahap Omuzlar

Romana Cîhan Roj Perde îsal ji nav weşanên NA derket. Di têlefônê de li pey bo coxrafya û bi taybetî Mêrdîn, go, ”Mêrdîn ne ew bajar e ji çend mizgeft, dêr, ’nahît’, eywanên bi ’rewak’ pêk tê; çîroka her koşê û askor û deriyê heye, ji ber wê pêdivî bi honandineke bi hasas a weke zêrker û jinên qenewîçe çêdikin heye ku meriv Mêrdînê, Mêrdîniyan, dewlemendiya zimanên gelan, nîrxên bêy naverok hatine hiştin, ciyê vala ên keviran weredagirtin, naveroka nîrxan were dagirtin.” Û pêde çû, ji bo em pêşkêşî kêfa gelên Mêrdînî bikin, me hêviya hevpeyivînekê jê kir. Ku, wî go, hema dest bi pirsan bike, metelmayîniya mi li dera ha, mi pîrsa pêşî pêşkêşî wî kir:

**Sala par bi Meşa Moriyân, îsal jî bi Perdeyê kesên ku bi me-req bin, coxrafya me, bi taybetî Mêrdînê, sikakên Mêrdînê... Perdê bikim xala tevgerê û bipîrsim, hewla hînbûna, hûn çima daketin wan sikakan, hûn l’îçî digeriyan; bi kurtî, çawa heta Perdeyê hatî, em dixwazin wextê te Perde hêdîka da alîkî, tu bû şahidê çî; jî kerema xwe:**

Cîhan Roj: Gîtara Bê Têl romana mi a pêşî bû. Mekanê romanê navenda Mêrdîn bû. Navenda Mêrdîn bi sikak û kafeyên xwedî fînalê PERDEde bûn mekan.

Mêrdîn welatê nivîskariya min e. Beriya sikakan li wî bajarî li xwe geriyabûm; ew lêgerîn bû sebeb ez heya çanda nivîskî, heya edebîyatê biçim. Her lê difikirîm ku Kevir, çûçika çolê û a ku veşarî ye şîfreyên bajêr û dunya dilê mi bûn.

Wextê mi ji Mêrdînê bar kir, bi salan, weke çavê sêyem, her fikirîm û mi hewl da ez ji Mêrdînê tiştêkî fehm bikim Gîtara Bê Têl hate pê. Karekterêkî romanê Şadiyê doktor e. Weke tîpek rewşenbîrê saf, hewl dide bi mîmariya bajêr, bi reng, bêhn û sivikahiyan dunya di dilê xwe de deşîfre bike.

Ger em li pîrsa te veşerin, bîrxistina a heyî ne fikrek şaş e; nişê ew nişene ku em giş pê dizanin; belê mîmarîyek mihteşem a bajêr heye lê bi zimanê xwe yê zikmakî bi çanda nivîskî û bi edebîyatê re hevnas nebûne, di gellek qadan de hukmê toreyê heye, hewesên oryantalist ê gellek kesan tîne cî û peroshên wan xwedî dike, weke bajarek xwedî çanda dewlemend tê nasandin, ew bajar e ku bi bawerî û sirên xwe di nivîsên danasînê de cî digire.

Li vê xalê edebîyat îtirazek e; meriv dikare behsa dewlemendiya wan çandan bike ku modernîze nebûne, edebîyat û çanda nivîskî

nenasîne? Daketina sikakan, destpêka lêgerînan, ji bo mi ew dever e. Gerek merhemet û yasayên devkî cî bidin hiqûqê, vegotinên devkî û sir cî bihêlin bo metnên nivîskî. Heger kevri û zimanên bajarekî ên bi sir hebin bila ew bibin deng, bibin hêma û derkevin derî sinorên wî bajarî. Çanda nivîskî jiyanan disêwirîne, tîne pê, bi wê jiyane bajêr û her tiştî ji nû ve candar dike, bi ruh dike, wextê navlêdike di heman demê de îtiraz û dijberayan jî tîne zimên.

Edebîyata mi a heya niha, kevir, çûçika çolê, ên veşarî, perde-evîn, deşifrekirin metafor, tîma û alegoriyên wê edebîyatê bûn.

Adet û hezar kul û êşên jiyane em bi dilekî kevirî kiribûn, dîsa dilekî narîn ye demên kevnare tîne bîra merivan ku ew jî çûçika çolê ye. Li coxfayya me eşq karê lehengan bûye. Bi jiyana modern re deşifrekirin, kişandina perdeyan, ên ji rêzê, ên nayên dîtin, ên ku nayê xwestin da werin dîtin, û din av wî halê jirêzê de sêwirîna jiyane şîn tîne, lêgerîn, destpêk ji bom in hinekî jî ew e.

Vegotineke bi îtiraz, a ku kare bêje, na, hewl bide ku mirov ferq bikin lê ber bi otorîtebûyîne ve meçe, heweseke wisa pê re tunebe karibe bi bîr bixe ku berhemên otorîteyên pişt dane zemîna adetan di eslê xwe de mîna çewalê kayê ne.

Bi klîşeya tê zanîn em bêjin, hêvî ye a ku ez dikim... Li coxfayya me kevir jî derî kevirên mîmariya mihteşem jiyane, serbûnê, hukumdariyê tîne bîra mi. Di roja me de kevir li ciyê xwe sist dibin; hêviya mi ew e ku wextê sist dibin her kevir bibe ax û gul û kulîlk lê pelg vedin. Xweşbîniyeke mezin e, dizanim lêher hêviyek, her sikak paragrafên metnek kêma e, gerek wisa be.

Rabêjin mi ên derheq Mêrdîn de her kêma man; mi romana Gîtarê Bê Têl ji nû ve nivîsî, nivîsîn berdewam e, wextê biçê ber destê xwendevanan kî dizane belkî Mêrdîn dengêkî nû bigihîne mi. Bi tenê ne weke bajêr, weke mekan pêroş û hêviyên mi ên derbarê Mêrdîn de hene, Mêrdîneke nû lê a ku naşibe "Bajarm Nû". Di avadaniya nû de, bajarê ku bi tehma xwe bi qasî tehma ava sûsê li ser zimanan dimîne, kevirên wê ên modern bi qasî kevirên mîmariya kevn sivik û di çêja mishefêkê de. Bajarê ku bi qasî bêhna qhwê radihêje û merivan dibe. Heger ku behsa bajarên ku bi huner û edebîyatê re lihevhatî were kirin Mêrdîn yek ji wanbajaran e ku udi derbekê de tê hişê merivan.

-Di salên weke "Sendroma 1993" an tê pênasekirin de, rêwitiyeke bi helbest û çîrok a ziman û edebîyata Kurdî ku li gorî hin nivîskaran rêwitiyeke ber bi çiyayê Kaf bû, salên bêyeman, ên bi şewatên û sotîner, bagerên bêy hêl ku li hev zêde kiribûn û bi ber-



tekiyên mafdar di Meşa Moriyân de, bêrikirinên li hemberî dildarê, pelgên ku hewqas di ciyên kûr de li ba dibin, pey re ku bi peyvên berbayî ketine di helbest û romanên de hatine pê;

“ Ez im, Esmâ! Mi soz daye Miralî, ez ê tu car evînê li xwe nekim derd û kul; mi îro pelek avêt hewayê. Pel, ber bi asîman ve firiya. Nizanim, wê pel li hewa bibe çî, wê çî bêje ji mi re!... ”

Bi wê finalê dikarî hestên xwe, ji bo gelên Mêrdînî û bo dunyayê, ji coxrafyay ku dîsa germ dibe, bi xemgîniya bîrxistina bi dubareyî parve bikî?

Cîhan Roj: Ew sendrom ku sebeb hin însan berê xwe bidin ziman û edebîyatê, ên dinivîsîn ku wextê hin qeyran çareser dikirin, di edebîyatê de pêrgî qeyranên kûrtir dihatin, ew rêwitiyek bû. Em xwe bi xwe, bi keviran re (Miralî her bi keviran re diaxivî di Meşa Moriyân de), bi avê re, bi çivîkan re axivîne. Ew encam bûn. Di jûna modern de ew hal bi tenêtiya takekes bi mehne dibe û qeyranek e. Ew rewş û qeyran bi lêgerînan re divê me bibe merheleya duyem; axaftina bi her kesî re, bi ên din re. Huner û edebîyat wextê qeyranan çareser dike, kûrtir dike di bo takekes rê dide dewlemendiya herî mezin.

Ger em wê rastiyê binin bîra xwe ku li coxrafya me guherîn zor in eleqeya takekes a bo huner û edebîyatê tê fehmkirin. Guherîna saziyan zor e û dereng tê pê, ji bo bileztir be, divê rûmet li alavên dibin sebeb da ku takekesî muhîm were dîtin biqîmet bin.

Di dilê me de şîlobûn û xirecira fikrî, liserhevûn, halê jengî, tevî-hevî, ajdayîn, bêyserûberbûn û hukmê qaliban hebû. Xilasiya ji wê ezabê, safîbûn û zelalî, mehnelêgirtina ên di dilê me de û mehneya jiyânê, toreyê weke şev be, ên modern weke roj bin, qebûlkiirneke wisa, edebîyat nefes e bo qebûlkiirina gellek rastiyân.

Qeyran carna dibin sebebê afirîneriyên edebî, nihêrinên cuda didin ber merivan; mirov mehneyên cuda li siberojê, li nivîs û li yarê digire. Keşîfkirin û şîrovekiirna ji nû ve tê pê. Biwêjeke bi Kurdî jiyânê dike heft beş û her beşekê weke gulekê dihesibîne. Li dunyaya me jiyaneke wisa hebe; hebe tunebe peroşeke wisa a edebîyatê heye.....Weke jiyânê bajar jî ne ewqas mehsûm in; nêzikahiya me a li jiyânê û ji bajêr bi aqlêselîm be xweş e. Di romana Gîtara Bê Têl de mîn dît ku hestên mi çî bi çî ez xistime xefikan. Merhemeta belesev îhtimal e ku bibe sebebê korbûna ji hestiyariyê.

Me behsa zimanê keviran kir, mihteşemiya wan derbir, lê divê em derheq rastiyekê de li xwe mukir werin; em giş, bêyî di ferqê de

bin, bûne dilên remz û zimanê remzan, ew ziman e ku nêzî termînolojiya sêhrbaziyê ye ku baş jê nayê fehmkirin, mîstîk e.

Dîmen bi tena serê xwe têr nake, divê em lê veegrin û pirsan derheq rastiyên li paş dîmenan de bikin. Bajêr û tiştên mîstîk di derba pêşî de peroşên amade pêşkêş dike, ew ne bes in, divê takekes xwe bi xwe peroşan saz bike, ji bo vê jî edebîyat û huner derfetan dide. Şayesandinên mîtî, fantezî û fişaliyên çîrçirokî weke takekes em her bêtebat hiştine; em bi serpêhatiyên hinan û bi eşqên lehengan re mijûl bûne. Li coxrafya me a ku toreya vegotinê a çanda devkî tê de tije û kûr etakekes ne bêçare û bêy melzeme ye. Aliyek me divê her kêr nemîne.

Ji bo Mêrdîn tê gotin, “Bi şevê gerdanî ye, bi rojê goristan e.” Heke bi şevê gerdanî be bo çi bi rojê goristan be? Ema (figura di Meşa Moriyana de) bi îtiraz e ku eşq dawiyê dibe derd, ew heman demê de îtirazek e ku eşq dibe goristan.

**-Te derkir ku tu Gîtara Bê Têl ji nû ve dinivîsî, nivîsîna wê berdewam e, tuyê romanên din jî ji nû ve binivîsî?**

Cihan Roj: Gîtara Bê Têl bi mi her kêr ma, her ku dinivîsinim kêr dimîne! Her ku dixwînim weke ku ji mekan, ji karakteran deng werin guhên mi, qey dest diavêjin pêşîra mi! Belkî di nivîsîna pêşî de, têkiliya mi û mekan têra xwe ne azad bûye, ji ber wê ye. Çapa duyem wê cuda be, berfirehtir be roman.

**-Di romana Perde de jirasteqînî û sêwirînê destpêkirinek heye ku weke figûreke jin, Virginia Woolf dertê pêşberî xwendevên, dikeve navberê, ji bo edebîyata roja me ev çi ciyê xwe heye?**

Cihan Roj: Ceribîneke “sêwirîna serber” e (ust kurmaca). Weke tê zanîn di wê teknîkê de, ji bo têkiliya di navbera rasteqînî û sêwirînê de were rapirsîn, bikeve rewşeke biarîşe, bi zanabûn û bi pergala bal tê kişandin ku vegotin sêwirînek e. Destêwerdanên nivîskêr vedihewîne, nivîskar jî tê de dibe karakter.

Di romanê de tê derkiirn bê ji bo çi ji Woolfê jêgirtin hene. Weke figur nivîskar, belkî jî nivîskar wextê ji dûr ve li Gultenê dinihêre, li wê difikire, di dilê xwe de bi xwezî ye ku Gulden bişibiya Woolfê! Weke Woolfê bi îtiraz ba.

Piştî pêvajoya nivîsinê jêgirtin lê hatin zêdekirin. Ev vê jî nişan dide; “gul û şûrên” weke Woolfê (ji bom in Woolf gul û şûr e) dikarin pencên tîrêja xwe beredin ser her metnê, ser her jiyanê. Yek ji esasên sêwirînê jî ew e. Belkî jî di sêwirînê de Woolfdeng li Gultenê dike, “Ez li vir im, weke jinekê, bi ruhê xwe re, bi sekn û nêzikahiya

xwe a derheq jiyane re.” Ango edebiyat li her deevra dunyayê ye, din ava her kêliyê de heye. Haya Gultenê ji Woolfê heye? Bersiv bila bimîne li ser xwendevanên romanê.

Bi tevî hewqas tûrist têne Mêrdînê, her roj hawarên berz dibin, îtirazên ku têne zimên te bi romanên xwe re hêlek îtirazan derkiriye, 'mala te ava'. Bi destûra te be, hinek din Perdeyê em bidin alî, ji hewşên piçûk ên hêlekanî, ji lbarayan ji eywanekê deng bi xwe bixin ku bêyî ji a din derê, em di hed û tehma wê de bihêlin, ji zimanê te yê ku bedewiyan dihewîne weke werger jêgirtinekê bikin û bêjin bi hêviya romanên dîtir bo te...

“Em, bi zimanê xwe, li xeyalên xwe digerin. Em, bi xeyalên xwe li zimanê xwe digerin.

Em, bi ziman û xeyalên xwe, li jiyaneke digerin; belkî rengê -zimanê ku di devê me de reşbûyî- biguhere...”

Ayyeştne fi efkerek ıl- hurre, şükren lek ye Roj...

(Bi ramanên xwe ên azad te kêf da me, sipasî bot e Roj)

## **Hevpeyvîn Bi Helbestvan Cîhan Roj re.**

Berken Bereh

Di meha reşemî ya 2002 de Weşanxaneya Sî bi navê “RATÎKA” pirtûkek helbestvan Cîhan Roj gihand ber destê xwendevanan. Me jî xwest li ser “Ratîka”û helbesta Kurdî bi Cîhan Roj re hevpeyvînek çêbikin.

### **Bi gor ku mi şopandiye we ewil bi şanênavê jêhat Gimgim dest bi nivîsandinê kir gelo çima we navê xwe guhêrand?**

Rojekê em li Mêrdîn li sendîkayê runiştibûn. Jîr Dilovan bi daktîloyê tiştin dinivîsîn. Bi pirsê min re, “Ez bi Kurdî helbest dinivîsîn. “ got. Rê bi wê bersivê re li mi vebû. Piştî sohbetê mi ji wî re du pêkenî vegotin. Bi rik bi ser mi de hat da ku ez bernavkek jê re bibêjim da ku bi şanênava bernavkê mi bişîne ji rojnameya, “Welat” re. Ez Gimgimî me. Weke tinaz û henek mi jî “Jêhat Gimgim” got. Dû re tinaz li mi bû bar; mi dest bi nivîsandinê kir. Di çîrokek mi de Mazhar Gûnbat, bernavkê, “Cîhan Roj” bi kar anîbû. Weke xatir mi jî bernavkê Cîhan Roj bikaranî.

### **Ji bilî helbestê we çîrok û gotar jî nivîsî. Dîsa romanek ku nehatiye weşandin. Hê jî wani ye?**

Belê. Bi bawer im heya demekê jî dê wanî be; piştî ku hejmara xwendevanan berbi hezaran ve zêde bibe, wê çaxê em ê jî rê bêhtir li xwe kifş bikin.

### **Bi dîtina mi 9 sal demek duvdîrêj e ji bo nivîskarek lê çima pirtûka we hevqas dereng ma?**

Weke her tiştî ji bo helbestê jî stewbûn pêwîst e. Dibe ku ji bo nivîskarek kurd neh sal ne tişteke be jî; zêdebûna demê ne ewqas girîng e, sal çawa li me derbas bûn, ev pirs girîng e.

### **Wêjeya devkî çi bandor li we kir?**

Wextê nivîskarek dest bi nivîsandinê dike hêz ji bingehekê digire, an xwendevanek baş e, an bi hesta xwe beled e, an bi hêza çavdêriyan... Mi bi berhevkirina çîrokên gelêrî dest binivîsandinê kir. Dîsa berhevkirina pêkeniyan. Tiştê ez herî pê beled wêjeya me ya devkî bû/ye. Strana “Hesenîko” ku bi Îngîlîzîbûya an jî ew evîn li wir bihata jiyinê weke Romeo u Juliet niha li ser devan bûya.

### **Cihê helbestê di wêjeya bakur bi gor we di çi astê de ye û hûn helbesta xwe li ku dera wê dibînin?**

Êdî bûye fikreke hevpar ku dê helbest pêşî li warên di jî vebike.

Ku helbestvanek negihîştibe şêweyek taybet nikare helbesta xwe bi cî jî bike. Di berhema duyemîn de hê asnatir însan dikare bersiv bide vê pirsê.

### **Mi li derekî xwendibû ku digot hê helbesta bakur deng û rengek ji xwe re peyda nekiriyê hûn çî difikirin?**

Di nixandinan de, ji ber çanda ku em di bin bandora wê de mane, reş û sipî bandora xwe li nêrînan dike. Tiştên hatine gotin rast in lê tê de kêmanî jî hene. Di nixandinê de ji bo me pîvan çî ne? Li gorî mi filmek çerçawa dikare rû li sînemaya welatek sipî bike bi wî awayî romanek an jî helbestek jî dikare rû li wêjeya gelekî sipî bike. Carna helbestek pirtûkek an jî helbestvan li dilan şîrîn dike. Nebûna reng û deng ne bi tenê bi helbestvanan ve girêdayî ye; li paş helbestvanan girseyek xwendevanan ya mezin, desthilatdarî jî nîn in. Heya gel helbestvanek nehewîne wê çawa wêjeyên dî û gelên dî jî basa wî/ê helbestvanî bikin? Bi gelemperî nêziktêdayînek bi rîş li Rojhilata navîn li hember wêje û hunerê heye. Kurd hê bi hê çand û hunerê weke hêz difikirin. Ez bi dilek asan dikarim bibêjim ku îro hin helbestên li bakûr tên nivîsîn helbest in û weke xwendevan ez wan di ciyek gelek kûr û hêja de bi cî dikim.

### **Li derveyî welat, gellek wêjevanên me hene û heta çend sal berê jî ji bo wêjeya xwe digotin “wêjeya penaberiyê” gelo hûn vê gotinê çawa dinixînin û wêjeya wan di çî astê de dibîni?**

Gotina, “wêjeya penaberiyê” derbirîneke li cî ye. Ji bo astê berhem pîvanek e. Ka çend berhem (bi awayek jimarî jî ) derçûn? Taybetiyek me kurdan e; heya niha her kesî destê xwe xist bin deh keviran. Dîsa ji alî kedê ve tiralîyek bi me re heye. Ew xwedî derfetbûn ku bi dehan berhemana li Kurdî wergerandana. Dîsa ji alî ramyariya wêjeyê ve bi dehan berhem bafirandina. Rastiya wan heye. Lê gelek kes naxwaze rastiya xwe bibîne; çîrok tê nivîsandin lê tê de kesayetî û nêziktêdayînen, hîs û tevgerên beriya bi bîst salan. Polemîkek teng gelek salan rê li wan birî. Gelek kesan bi navê sîyasetê rê li xwe guhert. Ku wêje tewrek be helbet wê ew tewr ji mantelîteyek ve dapale lê rastiyeke jî heye zimanê sîyaset û hunerê ne yek e. Hinan bi navê hunerê rê li xwe teng kir, rastiya xwe û gelê xwe da aliyek, hinan jê jî wêje û huner weke hêz nepejirand. Taybetî hene ji bo nivîsandinê, an riya derbirîna êş û kulan e, an riya têkoşinê ye, an derfetên mezin bi dest însan dixê, an însan nav û deng dide, an jî berpîrsiyari ye. Dawiya dawî derbirîn e. Ku tiştên ku însan bikaribe derbike bi însan re tunebe wê însan çiqas afirîner be...

Wêjeya penaberiyê jî parçeyek ji wêjeya me ye û tê de tecrube-

yek berfireh heye me divê wek kilasîkan em carek dî li ser berhem û rastiyan wêjeya li penaberiyê jî bifikirin.

### **Qedexebûyîya zimanê mader gelo çawa bandor li we kir?**

Zinarê herî asê û mezin e li pêş me. Li vir weke sedemek bingehîn me divê em bi bîr bînin ku nebûna desthilatdariyê jî dest û hiş li me sist kiriye. Bê desthilatdarî derfet nade gel ku gel jî bi her hawî li nivîskar xwedî derbikeve; Kawa Nemir carê digot ku nivîskarên me ji sedî heştê karmend in! Ji bo me tiştek gelek girîng e ku rastiya gelek tiştan li ber çavan radixe. Ev ji çi tê? Yek bi aboriyê ve girêdayî ye ya dî jî ev e ku gelek kesan ji me nivîskarî weke karek bingehîn li xwe germ nekiriye, hê jî em bi stuxwarî nêzî berhemên xwe dibin, “ku çîrok be, ku helbest be...!” Hêzên konevan jî xwedî li nivîskaran dernayên. Bi bawer im ji vir şûn de wê her kes xwedî li nivîskaran derên. Wê nivîskar jî bi xwe beledbin ku ew nivîskar in û li karên xwe ên bingehîn bizivîrin. Hê jî carna weşanxane pere ji hin kesan dixwazin ji boneya dosyayan biweşînin?!

### **Gellek kurd bi zimanê Tirkî dinivîsînin. Tu ji bo vê helwestê dixwazî çi bibêjî?**

Niha ew kes dikarin ji vir şûn de ji nû ve fêrî Kurdî bibin û bi Kurdî binivîsînin, ku bikaribin jî ma dikarin jê sudeyek nav û dengî û diravî bi destbixin? Na! Nivîsîna wan ne xem e lê wextê dinivîsînin divê hundirê nîrx û dastanan, qewimînan vala nekin. Ziman û hêmaya di peyv û hevokan de veşarî girîng e. Gelek kes naverokê diruxînin. Gere hin tiştan ji nivîskarên kurd re bihêlin.

### **Di afirandina berhemên xwe de gelo tu di bandora tu kesî de mayî, ango tu dikarî helbestvanên ku te şopandine û dişopîni?**

Mayakowskî. Ez li Mêrdînê bûm. Mi heya wê çaxê helbestên Mayakowskî nexwendibûn. Di şahiyekê de mi helbesteke xwe wergerand Zazakî, da hevaleke Dêrsimî da ku li şahiya li Qoserê bixwîne. Piştî wergerandinê wê hevalê ji mi pirsî bê ka mi helbestên Mayakowskî xwendine an na. Heya wê çaxê mi nexwendibûn. Piştî du salan pirtûkek Mayakowskî ku li Kurdî hatibû wergerandin mi xwend. Weke pirs mabû di serê mi de bê ka çima wê hevalê helbesta mi şibandibû helbesta Mayakowskî. Ahmet Aras bi derbirîneke xwe rewş zelal kir. Aras digot stranên Üris bi kêşe ne û naverok û deng tê de tîr in. Mayakowskî jê sûd wergirti ye û Nazim Hikmet jî xwe li Mayakowskî girti ye. Aras digot stranên bi Kurdî jî ji vê hêlê ve dişibin stranên Üris. Ango sedemeke çandinî heye ku Mayakowskî bêhtir bandor li me bike. Dîsa helbestên Oktavio Paz jî bê kêfxweşiyek mezin dixwînim. Ji vana bêhtir di salên dawî de dastana Memê

Alan ji bo mi çavkaniya herî bi bandor e.

**Di helbestên we de nav û xemlên dîrokî pirr in, navê pirtûkê jî yek ji van e, sedema vê helwestê dikarî ji me re bibê jî?**

Dîrok ne takekes e. Rastiya takekes di wir de jî veşari ye. Di vî warî de bi sedan pirs di serê kurdan de dilivin. Dîsa ew nav û xeml xav in bi qasî xaviya xwe hêmayî ne jî.

**We du peyv û hevokek yek Zazakî û yek Soranî bikar aniye mebista we ji van çi ye?**

Herdu peyv bi min bi qasî du helbestan watedar in û rastiyeke bi bîr dixin, weke rexneyekê mi li xwe girt. Ku mi bi qasî ku bikaribim binivîsînim dê mi bi herdu zaravayan jî helbest binivîsînim.

**Di helbestên we de mijar cur bi cur û sînor tune ye ango carna me dibin Qazakistanê carna Başûr... lê leheng her kurd in te xwestiye çi bibêjî?**

Xwedî hewlan im ku jiyane bi tevahî têbigihjim. Êşa herî mezin sînor in. Weke Jan Dost jî di bernameyekê de digot sînorên di hiş de girîng in. Ku eniya çand û hunerê sînorên di hişê xwe de hilweşînin wê çaxê wê gelek pirsgirêk çareser bibin. Emê wê çaxê him xwe û rastiya xwe him jî cîhanê û wêjeya cîhanê têbigihjin.

**Bi ya we pirsgirêkên helbesta bakûr çi nin?**

Kêmanî heya tunebûna xwendevanan. Xwendevanên heyî jî bi piranî nivîskar û helbestvan in. Tiraliya helbestvanan! Nebûna nêziktêdayînek rexneyî. Nebûna gengêşiyar. Mantelîteya civakê.

**Weşangeriya kurdan mîna bizina kulek dimeşe bi ya we ev bandorek çawa li ser nivîskar dike? Ji bo çareseriyê divê çi bê kirin?**

Ku bizin kulek be bi dermankirinê îhtimala çareseriyê heye; gelek sedem hene. Hin sedemên hatin gotin sedemên li paşmayîna weşangeriyê ne jî. Niha derdora nivîskariya kurd welê dihesibîne ku tu nivîskar niha li welêt nîn in? Em ji bo çi vê rastiye li rû hev nadin! Bê baweriyek heye! Weşanxaneyên heyî jî ji xwe re nekirin xem ku bi saya weşandinê rê li hin kesan vebikin. Heya carna di weşandinê de, ne berhem bi xwe, nav û bandora têkiliyên şexsî û dostanî xwe dide der! Bazarek jî heye...

**Di helbestên we ên herikbar de bêhtirîn peyvên serhedê bal dikişîne we ev vegotin û bikaranîn çima pejirand?**

Ez ne dever û devokparêz im. Lê di her dever, zarava û devokê

de peyv û têgihên wisa dagirtî, hêmayî, hunandî, xam, nazenîn hene û li benda pêûsê ne însan li hember wan dimîne di şermê de. Ji boneya çavekê, însan nikare çavên dî kor bike.

Ji niha ve zor spas bo agahdariyên we.

Ez jî sipasiya we dikim ku we derfet da me daku em xem û kêfxweşiyên xwe bi xwendevanan re parve bikin.



## **'Her hunermend, nivîskar divê berheman li ser Heskîfê biafirîne'**

Cemil Oğuz

Nivîskar Cihan Roj ku di heman demê de nivîskarê malpera me ye herî dawî romana xwe bi navê "Meşa Moriyân" derxist. Romana ku ji Weşanên Evrenselê derket bû sedem ku em pêre hevpeyvînekê bikin. Me bi Roj re li ser romana wî 'Meşa Moriyân', Heskîfê ku jê re bûye mekan û hin meseleyên din axivîn.

### **Berî her tiştî te karakterê Mîralî çawa afirand? Te ji cihekî îlham girt, yan ji nav demê re derket hat?**

Heya destpêka nivîsîna romanê bîst û yeksal bûn Heskîf wekî mekanekê, jiyaneke dev ji mi bernedida. Destê wê li pêşira mi bûn. Mi her taloq dikir; mi dikudand da ez berhemeke herî hêja ku bi Heskîfê re li hev bike lê bikim. Dawî ez li xwe mukir hatim ku di dilê xwe û hişê xwe de Heskîfê îdealîze dikim. Heger ku hûn tişteki îdealîze bikin hûnê nikaribin lê bikin, jê berhemeke edebî derînin. Di nav wan salên dirêj de gelek karakter, bûyer û honakan xwe li mi da der. Ji nav wan melzeme û xeyalan Mîralî derket. Mixabin Heskîf di wexta xwe de çawa ciyek sereke û muhîm bûye niha ne wisa ye, di dema çanda bajarvaniyê de wekî gundekî maye lewre hin qewimîn karakteran koçî Heskîfê kirine, an jî wekî çanda bajarî (ev jî hêjayê gengêşiyê ye) Dîyarbekir hatiye hawara Heskîfê, ji alî honakê ve.

Di romanê de, jiyana ku hûn xeyal dîkin, diafirînin, tiştên diqewimin bi tevî mekan ji bo we dibin îlham, Ji îlhamê wêdetir rastiyên wisa, karakter bi rih û can dîkin, şikil didin karakter. Wekî nivîskar, însan jiyana an jî jiyaneke pê ne biyan e, ji nêz ve dinase wekî tercîh li rê dibîne. Bi qasî hewlên mi, bûyer û qewimînan, Heskîf jî (li gorî wê demê) ji bo xwe li karakteran digeriya (ji alî xeyal ve), hin karakter jî ji alî Heskîfê ve dihat bi bîr xistin, mîsal Elî. Elî bi awayekî ji alî Heskîfê ve hate bîrxistin lê Elî ji nû ve hate afirandin, bû tevîna gelek jiyana, çîrok û fanteziyan.

### **Tu çiqas ji Mîralî hez dikî? Di Meşa Moriyân de karakterê herî zêde tu jê hez dikî kîja ye?**

Carna hin xwî, tevgerên hin însanan Mîralî bi bîra mi tîne. Mîna ez dostekî xwe an nasekî xwe bi bîr bînim bi nav xeyalan dikevim. Wekî karakter bi mi karakterê herî balkêş Bişar e. Dîsa meşa Mîralî û a Semîre ku li Amedê bi kêf û henek digeriyan pîrî caran tê bîra mi.

## Heskîf Wekî Sîngeke Efsûnî Ye

### **Em vegerin ser mekana romanê: Çima te Heskîf wekî navenda romana xwe hîlbijart?**

Hin mekan bi şexsiyet û çîroka xwe balkêş in. Heskîf jî ciyek wisa ye. Ew wekî sîngeke efsûnî ye, wekî helbestekê ye, ku reng da dil, deng bi dilê we xist tu car nayê ji bîr kirin. Ez du salan mam li Heskîfê, du salên ku tu car dev ji pêşîra mi ber nedan.

Hezkiriyeyeke we li ber mirinê be û hûn bêçare, ji dûr ve lê binihêrin!...

Em dereng mane. Gerek koleksiyona hunerî – edebî ya di derbarê Heskîfê de hebûya/hebe. Ev bangê e; her hunermend, nivîskar berhema di derbarê Heskîfê de biafirîne, ku rojekê di bin avê de bimîne ew koleksiyon şexsiyet, bedewbûn û rihê Heskîfê bi nav jiyane bixe. Berî Meşa Moriyani jî Heskîf bûye mijar, wekî mekan di berheman de cî daye xwe lê ez behsa koleksiyonekê dikim.

### **Te kengê dest bi Meşa Moriyani kir û çîroka weşandina wê çawa çêbû? Te karî bi hêsanî biweşîni?**

Çîroka honakê û teşegirtina di hiş de ji zûde bû. Wekî destpêkirina nivîsînê di destpêka 2009 an de mi dest pê kir, payîza 2009'an ji bo weşandinê amade bû. Meseleya bi hêsanî hat weşandin an na, bila bimîne li dera ha; ji ber ku ê bersiv rê bidin polemîkan.

Di romanê de bavê Mîralî û bavê Esmâ du siyasetmedarên kurd lê wekî neyarên hev in. Herhal tu bi van rexneyê li siyaseta kurdan a berî sala 1980'yê dikî...

Berî mi, Mîralî bavê xwe daye ber rexneyan, heger em behsa rexneyê bikin, li vir rexne bi wate dibe; ev tê wê wateyê ku wekî nîfşê li dû bavê xwe, Mîralî azîn û qewimînan daye ber lêpîrsînan. Ez jî bi rexne me. Awayek bi problem e. Edebîyat, bi derengî be jî, mexdûriyetan, karesatan, êşan bi bîr dixê, xîtabî însan û wijdanê însan dike. Bi zimanê xwe, însan dawetî qiyas û mihasebê dike.

### **Ji bo karakteran hîlbijartina navan tiştêkî muhîm e. Hema bêje her roman ji nav zimanê xwe navan hildibijêre. 'Mîralî', 'Esmâ', 'Semîre'; çima ev nav?**

Di pexşanê de hûn ne dê ne, ne jî bav in, hûn nikarin ji ber xwe de navan li karakteran bikin. Bi tevî ziman, ji nav jî jiyana û cîhana romanê dertên. Bi awayek têkiliya navan û mekanan jî heye. Nav jî carna ji "navbûnê" dertên dibin sîmbol an jî şîfre. Navê "Semîre" melodîk e, wekî karakter Semîre navekî melodîk û karîbe xweş were

bilêvkirin heq kiribû. Ji melodîkbûnê wêdetir wateya navê Semîre (Samîra) bi jiyana wê re li hev dike, wateya wê ev e; hevala şevê, stêrka sibehê. Jiyana Semîre jî, ji wextekê heya wextek din tarîtiyê bi bîr tîne. Wexta di şikeftê de bi tenê ye ew hevala şevê ye. Dûre pêrgî Mîralî dibe û dibe evîndar, êdî ew stêrkek e.

Esmâ. Wekî karakter, bi sadebûna xwe û safîbûna xwe hin jinan bi bîr tîne ku carna ji bo jinên wisa digotin, mîna jinên dema sahabeyan.

“Mîr” û “Alî” du nav in ku hem desthilatîyê hem jî şûrê tûj bi bîr tînin. Mîralî ew nav li xwe nekiriye, bavê wî ew nav lê daniye. Bavê wî jî dawîya dawî ew kes e ku li dû desthilatdariyê bûye. Belkî tiştê me dilşad dike ew e ku Mîralî û navê xwe hîç li hev nakin. “Xanim” û qehpîktî jî ne belevê e!

### **Sembol û şîfreyên romanê**

**Sembol hene, ‘Deqa li binzîkê keçîkê’, ‘Kevirê biçûk ê bi sûra Amedê ve’ û hwd. Bi qasî mi fêhm kir, te xwestiye sembolan li romanê bikî. Di romanê de simbol çiqas girîng in?**

Carna vegotin û tevî nade we hûn hin tiştan lê bikin, heger hûn wan tiştan, çîrok, paşxane û rastiyan tevî vegotinê bikin ihtîmal e ku vegotin biquse, hûn tevî hilweşînin, metnê ji çarçoveya edebî derînin. Heger ku li cî be, hûn wekî şîfre bikarbînin ê ji bo xwendevan bibe avantajek, hûnê teklîfatî li xwendevan bikin da ew jî bi ser riyekê bikeve, bifikire, keda xwe tevî metnê bike.

**Mîralî, Alîta, Xanima qehpîk, Semîre, her kes qala gotinên bavê xwe dikin. Ev jî çandêkê tê, yan te zarokatiya xwe xistiye vê derê?**

“Mêr” û “bav” di romanê de bi awayek asteng in; bavê Semîre asteng e, bavê Mîralî her ku siyasetmedar e, li hember desthilatîyê têdikoşe lê dîsa jî li hember evîna Mîralî dibe kelem. Wekî çand her ku her kes jî “bav”îtiyê bi gazin be jî wekî însan-bav hêlek hestiyarî heye. Gelo qalkirin e an pîrsek zirav e ji bo xwendevan da karibe bavê xwe, ê ne desthilat, bi hin bîranîn û gotinên wî bi bîr bîne? Karakterên di romanê de bi awayek bi çanda “mê” re reng digirin û xwe li jiyaneke sivik digirin, belkî jî ji ber wê ye, her kes hêlên bavê xwe ên însanî û sivik bi bîr tînin. Ew gotinên ku ji alî bavê wan ve hatine gotin giş “mê” ne, desthilatîyê bi bîr naynin.

Peykerekê dibînin û dixwazin bidizin. Dizîna peykereke dîrokî pîrsgirêkek e, şikandina peykerê jî karesateke din e. A rast jî bo çanda gelekî ev her du jî tiştên ne baş in. Lê her du jî di romanê de diqewimin. Em vê çawa şirove bikin?

Peyker ji du hêlan ve bi qîmet e; yek jê ked û serboriya însan, dîroka mirovahiyê temsîl dike. Xwedî zimanekî ye. A din jî ji alî malê dinê ve 'pere' dike, li vir talan, dizî û tiştên ne li rê xwe didin der û diqewimin. Ew kêlî kêliyêk bi ezmûn e jî. Gelo kîjan însan heya çî radeyî dikare xwe zeft bike?

Heger ku xwediyê peyker hebûya jixwe ê ne di wî halî de bûya, ê peyker di muzeyekê de bûya, însanan li muzeyê lê temaşe bikira, helbet ger biketa romanê jî ê bi wî awayî biketa romanê. Çi hat dizîn, çî şikiya çî jî di bin avê de ma! Kesên ku divê xwedîtî li peykeran bikin jî pîrî caran bi destê xwe talan dikin. Li gelek deveran, bi mebesta goristanên filehan in û zêr û zîv tê de hene bermahî û ciyên dîrokî hatine vedan, hilweşandin an jî şikandin. Di romanê de Alîta wekî tewrekê peyker naşkîne, teslîmê ciyê wê dike. Ew, wextê davêje ji bo bide ber dilê Mîralî dibêje, peyker pere nake. Gelo ji ber ku pere nake davêje an jî bira bira xwedî tewrekê ye, em nizanin.

### **Çîroka keça Kurd a Cizîrî ku dibin Egeyê**

Di romanê de keçeke kurd ku tînin Egeyê heye. Çîrokek balkêş e. Mi ji vê hez kir. Ev çî ye? Çîrokek wisa ji ku tê? Tiştêk wisa bi rastî çêbûbû?

Piştî têkçûyîna Bedirxaniyan, hêzdarekî Osmanî keçikeye bi navê Keja Cizîra Botan, ku bi evîn e, dibe haremê da ji wî re eferim, bêjin, wî bi xelat bikin. Lewre keçik gelek bedew bûye. Li haremê, Keja Cizîra Botan ji ber evîna xwe nexweş dikeve, bedewî pê re namîne. Li gorî mantelîteyê, wê çaxê êdî kêrî kesî nayê bi wî halê xwe ê perîşan. Wê dibin herêma Egeyê, li ciyekê bi cî dikin ku li wir jinên pîr û ên nexweş ên haremê hatine bi cî kirin. Li wir, Keja Cizîra Botan û malbatek kurd ku bi sirgûnî hatine wir, hev û du dinasin. Keja Cizîra Botan ji wan bi yekî re dizewice. Bi ser rê dikevin. Ê biçin Cizîrê. Wextê tîn Heskîfê Keça Cizîra Botan gelek ji Heskîfê hez dike û li wir bi cî dibin. Naxwaze biçe Cizîrê, carek din pêrgî evîndarê xwe were.

Tiştêk wisa bi rastî çênebûye. Em çîrokên derbarê keç û jinên di haremê de dixwînin, temaşe dikin. Bi awayek çîrokên balkêş hatine jiyîn. Meseleya bi cî kirina li herêma Egeyê, carekê wekî gotegotên ji niştecihekî, bi ber guhê mi ketibû. Çiqas rast e nizamim, rast be ne rast be ne muhîm e, wekî honak û gotegot jî bi çîrok û serpêhatiyên jinên haremê re li hev dike.

**Beşeke romanê ku tu bibêjî, 'xwezî ne wisa, mi wisa binivîsand' heye?**

Ji alî vegotinê de ez çikûs bûm. Piştî nas û dostan pirtûk xwendin xweziya xwe der kirin, ger pirtûk li gorî naverokê berfirehtir bûya, ê xweştir ba gotin. Di vê romanê de wekî terzekê mi ceriband. Bandora helbestnivîsîn û çiroknûsiyê jî heye.

Ez dixwazim du pirsan jî derveyî romanê bikim. Ya pêşî: Her nivîskar bi gazinc e 'Pirtûk nayên firotin', weşanger jî wisa. Bi qasî mi dît derketina Meşa Moriyân jî hinek ji ber vê dereng ma. Bi ya te ev rast e û aliyê din ê meseleyê jî; ji bo zêdetir bêne firotin tiştên ku bêne kirin hene?

Belê rastiya gazinan heye lê ne ew qas. Problema belavkariyê heye. Meşa Moriyân ji Evrenselê derçû, ji ber ku problema belavkariyê nîn e tê dîtin û kirin.

Derbarê xwendinê de mi di Fûara Pirtûkan a Îzmîrê de gotibû, ger guneh hebe pariya mezin a, çîna navîn e. Ew beş bi pîranî li metropolan in, karmend in, mamoste ne, doktor in, parêzer in... Lê bi qasî Çiyayê Qaf ji xwendina bi Kurdî dûr in, bi edebiyata kurd biyan in, bawerî bi wan re nîn e ku nivîskarek kurd dikare romaneke xweş, çirokeke xweş, helbesteke xweş lê bike.

### **Rexneyên nîyetbaş û nîyetxirab**

Û pîrsa dawî jî li ser nivîskariya te: Hin nivîskarên kurd dibêjin 'Cihan Roj gelek dinivîse'. Bi awayê 'her dinivîse' de... Bi ya te zêde nivîsandin pîrsgirêk e? Û tu bi xwe difikirî ku zêde dinivîsî?

Heger ku xema wan kesan bira bira edebiyata Kurdî û nivîskariya Cihan Roj bûya ê carê "wan nivîsên pîr" bixwenda, binirxanda, mi qanih bikira ku pîrnivîsîn xisarê dide nivîskariya mi. Lê ez ji nîyetê bi şik im! Tiştên li cem xelkê bi qedr û qîmet e li cem me qebhet e; an problem di xelkê de heye an jî mantiqê me bi problem e.

Belê ez pir dinivîsînim. Hijdeh sal in dinivîsînim. Wexta gelek kes li ser maseyan tespîtan dikin, mohrê li nivîskarî û metnên bi Kurdî didin ez ked didim. Her roj ji şeş saetên kar ketibe hemî dema mayîn ji bo xwendin û nivîsînê ye. Ji alî cîhana nivîskarî ve ez bi tenê me, ev jî bû sedem ez û nivîs ji bo xwe jiyaneke ava bikin. Dûrbûna ji welat, tenêti êdî ji bo mi bûne avantaj.

Hêja ye em du pirsan ji wan kesan bikin; yek jê, gelo kîjan nivîsa Cihan Roj ne li rê û li cî bû? Heger ku dirust in, çima li hember edebiyatê bi berpirsiyarî tevnegeriyên û nedan ber rexneyan. (Gere nivîs li gorî dema nivîsîna xwe were nirxandin) A din jî ev e, gelo nivîsên Cihan Roj ji bo nivîs û berhemên çend kesan bûn sebeb, çavkanî, an jî xizmeta bertekiyên kir da rê bidin nivîsan.

Ez naxwazim mejiyê mi piçûk be û devê mi hînî belaşiyê bibe!  
Heya niha xwendevan kêr bûn. Îca hin kesan bi wî awayî dixwestin  
her nivîskarekî/ê bidin aliyekê û mîna bêjin, binihêre bi tenê ez  
heme!

Sebra nivîskaran bi kêmanî bi qasî sebra Nebî Eyûb e; ez dinivîsim,  
dem derman e. Rexneyên ku ji bo mi dibin referans û ez gelek qedir lê digirim  
hene. Derdê mi ne ez im, metn in, gere derdê her kesî jî metn bin. Metn jî ne  
winda dibin, ne jî dimirin.

## HEW CEDARIYA EDEBÎYATA KURDÎ BI MANÎFESTOYAN NÎN E

BEDRÎ ADANIR

Helbestvan û romanûsê kurd Cîhan Roj dibêje, " Edebîyata Kurdî edebîyata di derheqê coxrafya Kurdî, coxrafya ziman û jiyana ziman de ye."

"Dîrokeke bêhizûr, coxrafyayek bêhizûr û welatekî bêhizûr... Dêya Gilgamêş li yezdanê rojê zivîriye, jê pirsî ye, te ji bo çi ruhekî bêhizûr da lawê mi? Gilgamêş yê ku bêhizûr serî dabû rêya lêgerînê. Kafkayê bêhizûr edebîyateke mihteşem pêşkêşî dunyayê kir. Me ji bêhizûriyê edebîyateke çawa afirand, pirs ev e û watedar e."

Me bi romanûs û helbestvanê kurd Cîhan Roj re li ser edebîyata Kurdî; têkiliya coxrafya kurd û edebîyata Kurdî, romana Kurdî, derheq Mêrdîn de, ku dibêje, 'baajrê nivîskariya mi e' û xebatên wî de sohbet kir.

**Em ji bêhizûriyê dest pê bikin. Li gorî te, di navbera edebîyata Kurdî de û bêhizûriyê de têkiliyeke çawa heye? Bêhizûrî, li kudera çîroka nivîskariya we ye?**

Wisa lê difikirim ku têkiliya 'bêhizûrî'yê û edebîyê bes nehat gengêşîn. Tê hêvikiirn ku bêhizûriyên civakî di edebîyatê de weke lêgerînên takekes cî bide xwe. Lêbelê di têkoşîna xweîsbatkirin û îtiraza li hemberî înkare de 'êşê' honand. Normal bû li piştî ciyekî, rewşê xwe dubare dikir û heya "zêmaran" bir. A ku ji edebîyata modern tê hêvîkirin ew e weke îtiraza li hemberî zimanê êşê afirandina 'zimanê edebî' ye, bi jiyandê hatî sêwirîn re tişt bi bîra takekes tê xistin.

Êş dibe sebeb edebîyat were afîşekirin. Heya derekê berhemên hatî afîşekirin bi bandor bûn. Li pey xwendevanan rexne û îtirazên xwe anîz zimên, ku dixwazin edebîyatê weke edebîyat bibînin, lêgerîn û hêlberiyên cuda hatin dîtin. Ew lêgerîn dibe ku derfetan bide zimanê me ku ew zimanê xwe ê derheq bêhizûriyê de bîne pê.

Li coxrafyayek ku hewqas bêhizûr e, bi kaos e û êş lê têne jiyîn, edebîyat li pey lêgerînên zorzêde, ê bi şiklî û alyê naverokê ve tê hêvîkirin kur ê bide xwe. Di edebîyata me de em hê şahidî ji gengêşiyên li ser xalên wisa re nakin çimkî bi berdewamî weke qadên

dîtir sîyasetê bo edebîyatê jî derfet pêşkêş kirine. Tam li vê xalê edebîyata me dest pê kir, bêhizûriya xwe hîs kir, têdikoşe ku li ser piyan bimîne.

Bawerî bi gengêşiyên wisa tînim. Jixwe edebîyateke dunyayê heye. Îcab nake ku meriv derkeve kifşkirina dunyayeke nû. Dunya û coxrafya me bendewar in ku edebîyateke derheq coxrafayê de, di derheq coxrafya ziman û jiyaan zimên de ye.

Bi rojane her behsa diyardeyên “pirengî” “pirzimanî” “pirçandîtî”tê kirin. Divê takekesên çawa, karekterên çawa ên rasteqiniyên wisa hebin, an jî çawa bin? Pirsên wisa di eslê xwe de bihizûriya edebîyatê a xwesarî xwe ye.

### **Weke her tê gotin, bi rastî hewqas kelûpelên Kurdistanê hene ku pêşkêşê edebîyatê bike?**

Çvakanîyê zêde û her ew coxrafya bûye ku bi devkî were axaftin. Kelûpelên ku baweriyê cuda pêşkêş dikin (bawerî, destan, evîn, hilweşîn...) bo honandina wan dibe ku sal têrî nekin. Kelûpelên folklorîk zêdene. Çavkanîyê klasîk jî bes hene. Rasteqiniyeke wisa ku bes nehatiye nivîsîn em behsa wê dikin. Çavkanî nehatine dahûrînî û nehatine nirxandin. Ku wisa lê were nihêrîn kelûpelên mihteşem dibe mijar. Wexta pirsên nû ye; gelo kelûpelên hevpar ên edebîyat Kurdî û edebîyata Farisî hene? Mînak; Vîs û Ramîn ji bo edebîyata Kurdî tê çî mehneyê?

Wextê em dibêjin kelûpel ger hûn bi tenê li gorî ciyê ku hûn li rawestiyayî têbigihjin rewş diguhere lêbelê coxrafyayek ku nû tê avakirin, takekes û jiyan mijar be, ger girîngî li demokrasîyê û li jiyanê demokratîk were girtin, divê kelûpel jî kûrahiyên cuda û ji xalên cuda werin bijartin. Bi tenê bi esasgirtina bajarên modern û takekes an jî li gorî hecedariyên xwesarî xwe kelûpel nayên destnîşankiirn û nabe ku bi wî hawî werin îdealîzekirin. Berevajî, hinek jî ji bandora nihêrînên oryantalist, kelûpelên niştecihî weke kelûpelên bêqîmet binnabe ku werin pêşkêşkirin. Gerek hewldan ew be ku kelûpel kelûpelên edebî bin.

### **Em hinek li ser bisekinin. Hewldan nîn in, an jî kêmin gelo?**

Kêmin in. Ger em edebîyata Tirkî a dewra komarê bes lêbikolin û analîzan bikin, em ê bibînin ku hin lêgerînên di edebîyat Kurdî de ên roja me çiqas belesev in. Li ser navê edebîyata dunyayê, li ser navê nûbûnê hin texlîd û zorlêkiirn hene. Helbet edebîyata dunyayê lê çawa? Heya ku hûn Feqiyê teyran bi edebîyat dunyayê nedin ansîn, axaftina Evdalê Zeynikê a bi qulingê re şîrove nekin hûn ni-



karin têkilî bi edebîyata dunyayê re deynin. Binihêrin, şîrovekirina Evdal bi tenê hewla derîvekirinê ye. Ew dibe evîndarê kesek Ermen, tabûyan hildiweşîne, ew baweriya bi hezkirin û evînê ye. Bi qulingê re diaxive, ew îtirzek e, redkirin e. Ew zimanê xwe ê giran yê dunya xwe a êşê dikare bi zimanê zarokekê re li hev bîne. Di serî de dengbêjiya Sumelî Memed Paşa, ji bo azadiya xwe red kiriye.

Hûn nikarin bi tenê bi mehneya peyvan a ferhengî edebîyatekê biafirînin. Tehm û dunyaya her zimanî heye. Di dewra komarê de di Tirkî de jî dewrekê hewesên wisa ne mijar bûn? Em bi aqûbeta li ser îdealên “Tirkiya kakilî” peyv hatine afirandin û bi wan peyvan hewl dane edebîyatê bikin, aqûbeta wê kifş e.

### **Dikarî behsa wê pêvajoyê bikî ku Cîhan Roj kiriye wêjevan? Xisûsên ku edebîyata we xwedî kiirne hene? Çi ne ew?**

Mercên zivistana sert, dengbêjî û çîrçîrok, mercên jiyane ên giran hîsên me xurtkirin. Di zarokaniyê de ji ber ku me bi bersiva hin pirsan nezaî me bi kevir, bi esmên, bi tîrêj, bi goristana kesên pîrûzwer, bi xwe re bi daran re em diaxivîn. Li dibistanê heza ku ji dersa matematîgê me digirt, di eslê xwe de dersa ahagiyên civakî ku ji çîrçîrokan madetir ne tiştêkî bû ji ber me biz iman nedizani têkçûyîna di wê dersê de û bandorên wê ên hilweşîner. Deriyên cîhaan zimanê me her l ime girtibûn. Bi taybetî gerek wê bêjim. Çimkî tehma eşqa me a pêşî me nikarî wwê tehma di dilê xwe de, di hişê xwede bi zimanê xwe derbibira. Bifikirin, hûn bi herfên navê evîna xwe akrostîşekê dinivîsînin, bifikirin bê wextê meriv ji tiştên wisa bêpar dimîne valahiyên çawa têne pê. Xeyalên me, xewnên me b ime re nediman. Weke di çîrçîrokên me de derî ne yek bûn, pîr bûn û giş hesinî bûn, mifteyên wan jî an di hûrê şêr de bûn an jî li mekanên dêwan veşarî bûn, an jî ew avêtibûn robarên peroşî. Di zarokaniyê de mi her ev dibihîst, 'bixwînin û xwe ji vê dogehê xilas bikin!' Di sohbetan de bi dilbijîni û bi xirûr behsa doktor, mamoste, parêzer, dozger û kesên bûbûn karmend dikirin. Mi her mereq dikir bê ew kî ne, jiyaneke çawa dijîn. Di her pênc romanên kum in heya niha nivîsîne di wan romanên de bi awayek mi “kesên xwe xilas kirine” nivîsîn. Mi hewl da ku alyê din ê madalyonê bînim ber çavên xwendevanan. Helbet bêyî ku “coxrafayek bêhizûr” ji bîr bikim!

### **Di serpêhatiya edebîyata te de, tiştên derheq kurd û Kurdistanê de ên bi te bi seyr bin an jî ên bandorên kûr l ite kiribin hene?**

Bi seyr e an na, nizamim lê di salên nodî de mi derûnî û zemîna avadaniya ruhê ew kesan mereq dikir bê wextê di destê wan de sator hebû, ji alî paş ve nêzikahî li miorvan dikirin û mirov dikuştin.

Awayê kuştina wan, kîndariya hewqas mezin, sebebên nefretê û detayên weke wan, ez lê difikirim ku ez ê çawa karibim di edebîyatê de bihonim. Ev e, wextê dibêjim, gerek têkiliya bi kelûpelan re were gengêşîn qesta mi tiştên wisa ye. Di romana Perde de, karakterekî li ser esasên têkiliyên wisa hatibû afirandin.

Mi ji merhemeta hin nivîskarên a bi zanebûnê hiç fehm nekir û bi mi bi seyr hat. Lêbelê divê têkiliya me a bi zimên re demokratîk be, ne wisa, heger kuz iman candar be, wext hat mere karibe hêrsa xwe bîne, mere karibe li hemberî ziman têbikoşe. Ew halê bi parastinê li hemberî Kurmancî di eslê xwe de bêhtir Kurmancî lawaz dihêle.

### **Tu dikarî derheq karakterê di romana Pede de bikî?**

Kesekî wisa ye k udi mercên şer de weke takekesekî normal bi tevger e, mirov jê hez dikin, di romanê de cîhana tarî takekesekî sîyasî heye. Pirsgirêkên ruhî ên kûr dijî çimkî ji mêraniyê de ketiye, jiyana wî a cinsî nîn e. Karakter encamên trawmayeke ku ji terîqetêke marjînal hatiye pê dijî. Jina ku bi hezkirî ew pê re zewiciye li wîbî şik in ku ewî jinikê kuştaye.

### **Wextê meriv dibêje romana Kurdî Mehmed Uzun tê aqilê merivan. Dixwazim hinekî ji vê hêlê ve bipirsim: Bi kurtî tuyê roman Kurdî çawa binirxî?**

Ku meriv dibêje roman Kurdî, yek ji ên pêşî tê hişê merivan jî Mehmed Uzun e, ger wisa were gotin ê rastir be. Ne wisa be, bi hawayê din, ji bo roman Kurdî sînora tê kişandin. Heger em li ser wê qebûlê nêzikahî lê bikin emê temenê roana Kurdî weke temeneke kurt, dunya romana Kurdî jî weke dunyayek bi tenê ji hêla nivîskarêkî ve hatî afirandin bi dunyayek wisa bi sînora dikin. Mixabin ji berk u wisa ye, xwendevan îhtimal lê nagirin bê kurd dikarin romanên lê bikin, çimkî li gorî wan Mehmed Uzun ne li jiyane ye û Mehmed Uzunek din jî hê derneketiye! Li ku ye weke rewşa hêtimbûnê tê dîtin, bi zena mi ev jî ji bo edebiyata Kurdî ne ew tişt e ku were qebûlkin.

Ku em li rewşa romanê vegehin, ji hewla qeydkirinê, parastinê, neqilkinê ji rewşê û merheleyên wisa hêdî hêdî derbasî merheleyên dîtir dibe. Romanên derheq takekesan de êdî dertên. Kurdî her ku diçe kêmaniyên xwe temam dike, ew jî dibe sebeb roman dewlemendtir bin. Ji derî kurdbûnê, bîrxistina rastiyeke bi sûd e; coxrafya me a ku dêw û lehengan nav dayê di heman demê de gellek jî rengîn e. Dibe ku romana me bo demokrasîyê, bo jiyane bibe sebebê irsên nû, bibe wesîle bo pirsên nû. Sebîr û temkîn muhîm in. Ne hewceyê manifestoyan e.

## **Ev rexne ye? “Ne hewceyê manifestoyan e.” Bu bir eleştiri mi? Dikarî hinekî pê de biçî?”**

Divê bi awayek cidî were rexnekirin; bi nivîsên ansîklopedîkî ên ji dubareyan pêkhatî tu nikarî rewşa modern a edebîyatekê li ber çavan rabixî. Bi tenê bi rewşa akademîk an jî besbûna edebî rê nade ku meriv derheq edebîyata zimanekî de gotin bêje, gerek têr neke. Ketiye halekî wisa, ên k udi derheq edebîyata Kurdî de nivîsên ansîklopedîkî dinivîsinin wekî ehlên edebîyata Kurdî têne dîtin.

Edebîyata me bûye edebîyata lîsteyan! Bi dubarekirina heman lîsteyan em zen dikin kum e ji edebîyatekê têra xwe fehm kiriye, me ew dahûrandiye û em wê pêşkêş dikin. Bi rastî hewcedariya edebîyata me bi nirxandin û rexnekirinê heye hem jî jo hêla ehlên wê ve. Ez hêvîdar im ku qelemên wisa ên bi rûmet bêhtir kedê bidin edebîyata me.

Bi nirxandineke hewla danasînî, bi danberhevdayîna edebîyata Kurdî û a Tirkî, Erebî, Firansî nabe, ev aliqîneke şaş e. Tiştên wisa bi saya wergerê incax cî digirin. Hûn edebîyata Kurdî dinirxînin, rexne lê digirin. Bi seyr e, bi edebîyatê re ziman hema tê hiş, rewşa zimên û sînorên zimên in. Di dewsa ku em arîşeyên zimanê xwe ê k udi pêvajoya modernîzasyonê de ye bigengêşin çareseriyên pêşkêş bikin, em dibêjin, roman me gihaştîye standardên romana dunyayê û pê re em ji nav meselê derdikevin, ev wisa nabe!

### **Aniha xebata ku li ber destê te be heye?**

Belê, dîsa oman... Lê dipê m ku heya Berfanbarê biqede. Hêvîdar im ku sala 2015 an bi romanekê pêşwazî bikim. Navê wê par ve bikim; “HURCAHIL”

## SIYABEND Û XECÊ

1

Her destan, efsane û çîrçîrok têne sêwirîn, çî ji aqlê şîrîg be çî ji ji pariya takekes û şexsan bin ew bi kod û şîfreyan re, bi xeyal, hêvî û xweziyan re têne sêwirîn. Ji alî sêwirînê ve, destana Siyabend û Xecê destaneke balkêş e.

Siyabend bi pey felekê ketibû ku “şerê felekê” bike, ev ji alî her Kurdî ve tê fehm kirin û sebeb diyar in ku bê ew difikirin felekê çî aniye serê wan û çî neaniye serê wan lê gelo çima Siyabend ji Silîva bi rê ketibû û heya Bedlîsê hatibû?

Ev ne tesadif e; ew awa sêwirîn dikare bibe bingeh ji bo gelek pirsan; mîsal meriv dikare li gorî aqlê xwe bêje ew ber bi rojhilat ve meşiya ye ku roj lê hil tê, belê, gelek fikrên din jî dikarin werin hişê merivan lê hevdişîna Siyabend û Qedêgêtran hemî texmînan didin hêlekê û me ber bi birîneke neteweyî ve dibin çimkî di destanê de Qedêgêtran “aqil” temsîl dike, Siyabend jî ‘kesê çavên seriyên lê tarî, hestiyar û evîndar’ temsîl dike...

Em bi bîr bînin ku Farqîn bi awayek dewletê û Merwaniyan bi bîra me tîne, Bedlîs jî Mîrekiyek xweş organîzekirî ya ji alî kulturî ve rengîn û kûr e; nivîsevanî, huner, ilim gelek li pêş bûne.

Qedêgêtran hukum û desthilatiya Siyabend qebûl dike, dibe bi-rayê piçûk lê ji Siyabend hêviya wî ew e ku xwe li ya aqil bigire, ew pişt bidin hev da ku bi rihetî karibin şerê felekê bikin.

Siyabend û Xecê dibin evîndarê hev, Siyabend diçe Elcewazê lê dexesî û şik dikeve dilê wî, ew bi Qedêgêtran bawer nabe, dibêje, lê ku ez ê biçim Elcewazê û Qedêgêtran Xecê ji xwe rebibe, ew şik dil û aqil bi Siyabend re nahêle, radibe destê Qedêgêtran girê dide. Qedêgêtranê ku êdî dawiya xwe û Siyabend dibîne, bi neçarî li hemberî “felekê” dest datîne!

Belê, Siyabendê Silîvî û Qedêgêtranê Bedlîsê xwe li şerê felekê girtine lê “felek” eşqekê dertîne pêşiya Siyabendê hêtîm yê ku hezkirin nedîtiye, yê ku hînî hezkirinê nebûye, ji ber ku Siyabend li hemberî hezkirinê, eşqê têk diçe li hemberî felekê jî têk diçe! Destan me dibe ser wê fikrê ku ên nizanibin, ên nikaribin bi “aqilane” hez bikin ew ê li hemberî “felekê” têk biçin!

Destan, bi awayek, bi bîra merivan dixwe ku di hezkirinê de beledî

şert e.

Silîva û Bedlîs weke dewlet-mîrekî ne, ên hewl dane şerê felekê bikin jî Silîvî û Bedlîsî ne, lê Xecê? Belê malbavanê Xecê ne kesên mîrekiyan in, ew Koçer- eşîr in ku di destanê de ew tu hurmet li hezkirin û eşqê nagirin, hêriş dibin ser hezkirina Siyabend û Xecê.

Ev, bi awayek, me dibe dewra mîrekî û dewletan ku pergala eşîriyê arîşe bûye. Li hêlekê “felek” (qeder) tê rojevê li alî din jî eşîriya bi navê lêzimtiyê hewl dide dest deyne ser Xecê û tu hurmet li hezkirinê nayê girtin, yek ji sebebê têkçûyîna eşqê û şerê felekê jî nêzikahiyên eşîrî ên malbavanên Xecê ne. Qedêgêtranê çanda mîrekî bajariyê temsîl dike û Siyabendê hêtîm yê li ber destê ap û amojînê mezin bûye, bi pey dikeve qedera xwe biguhere ku ew “bêkes-bindestekî” Silîvî ye!

Heya niha, exlebe, destan ji ber têkçûyîna eşqê hew weke “şîneke bo eşqê” hatiye rojevê.

Gelek bextewar û kêfxweş im ku mi destanê, bi awayek, kir parçeyek sêwirîna romana Mala Baz, bi wî awayî, di şevên ker û lal de pirsên ku mi ji destanê dikirin, pirsên ku mi derheq dîrokê de ji xewn û xeyalên xwe dikirin ew pirs bûn sebeb ku ez bi çavek din, bi hişek dîtir li destanê binihêrim. Çi kêfxweş im ku ew pirs bûn sebeb ew destan di dil û mejiyê mi de ciyê xwe yê mihteşem bigire ku wê rojekê Kurd vê destanê di asta Memê Alan (Mem û Zîn) de bibînin ku her du destan ji gelek hêlan ve hêjayê berawirdkirinê ne.

## 2

Ji bo meriv bi hemd karibe xwe bigihîne edebîyata dunyayê, ji bo meriv karibe bi vî zimanî edebîyateke modern biafirîne, ew kod û xalîçeyên kulturî şert e ku yek bi yek were lêkolîn û were analîz kirin. Destanên Girekiyan bingeh in ji bo edebîyata modern ya Ewropayê, ma îcab dike ku meriv van rastiyan bi bîr bixe!

Ji alî nêzikahiyê ve ez haydarî xwe me û edebîyata dunyayê ji bo mi armanc û rêya nêz û dûr e lê meseleya ziman, meseleya afirîneriya bi vî zimanî rastiyeke din e; ji bo ev ziman bi ruh û bi can be şert e ku were deşîfre kirin, şert e ku rehê wî ên di nav ber û berhemên mêj de werin dîtin, şert e ku ev ziman bi zimanên din re bikeve têkiliyê û bi wî awayî, hêlên xwe ên rizyayî biterikîne...

Folklornasî warek gelek muhîm e ku ew kar jî karek profesyonelî ye, ya ku ez dikim şîrove, not û bertekiyên ji xwendinê ne ku ji hewla karê edebîyata sêwirînê têne pê, heger ev nişe û nivîs ji bo folklornasî û kesên bi dîroka edebîyatê re bibe melzeme.

Xala herî muhîm bo Destana Siyabend û Xecê ew balkêşiye ku Siyabend û Qedêgêtran, Gilgamêş û Enkidu tînin bîra merivan... Siyabend ji alî têma, mêranî û lêgerîna tiştêkî bêîmkan ve Gilgamêş, Qedêgêtran jî weke Enkiduye ji alî sêwirîn û tîkiliyan ve...

Belkî bi van çend gotinan ez hewl didim alyek gellek muhîm ê destanê bi bîr bixim da ku bibe mijara tez'an.

Wekî nîşeyekê:

Weke fanteziyên xwendina xwe, weke sêwirîn û qebûlên bo hin encaman hewl didim bi wêrekî tevbigerm û bibêjim, ev destan xalîçeya pergalên rêveberiyê, kodên sebeban ya jiyana Kurdan e. Destana eşq û trajediya yekitiya neteweyî ye ku bi van nîşeyan, bi hewla nivîsîna Mala Baz de mi nîyet kir ku ew destana mihteşem bi hêlên xwe ên wisa muhîm were rojevê. (Pirseke bo tarîxê jî bil ali cîyê xwe bimîne; gelo rêveberiyên pir, ên bi serê xwe welatekî bûn, jî alî sîyasî ve her weke sebebê tîkçûyînan tê dîtin ji alî ziman, kultur û rengan ve çi mehneya xwe hebû? Di Mala Baz de, ji alî sêwirîn û çîrokan meriv dikare wî halê azad ê bi ser xwe bine bîra xwe ku kitêv weke welatê çîrok, bûyer û sêwirîna hate dîtin ku belkî xwendevan hewesa yekitiyekê bikin!)

Her kes Siyabend û Xecê pîroz dibînin lê kes lê nafikire ku Siyabend kesek bi înad e, serhişk e, ew bûye sebebê kuştina xwe û tîkçûyîna evîna xwe bi gotineke din Siyabend sebebê serê xwe û eşqa xwe ye! Heger ew destan li ser esasên wisa neyê analîz kirin û dîtin û ji edebiyata modern re bi wî awayî nebe melzeme wê çi feydeya coş û qîreqîrê hebe! Di Mala Baz de parsûyek romanê jî Siyabend û Xecê bûn ku li ser esasên wisa, ên hestiyarî û neteweyî bûn melzeme lê wextê berhema merivan ji alî sosyolojîk, edebî û derûnî ve xwe li ser zeminên derî ezber, qebûl, qalib û diruşmeyan were sazîkirin pê re serê gelek kesan, ku bi piranî nivîskarên ji xwe razî, tevlihev dibe

## DARA HEJÎRÊ A LI DÎWÊR ŞÎNHATÎ

Carna cih û war, dîmen, siruşt ji bo jiyana însan jî dibin peyama, sembol, neynik û hêma. Li Mêrdînê, di hin dîwaran de darên hejîrê şîn hatine. Ji mêj ve wê dîmenê bandor li mi dikir; dawiya dawî ew bandor bû sedem ku çîroka mi a bi navê, “dîwar û dara hejîrê”\* xwe bide der.

Bi herhalî bandorek zêde li ser mi hiştiye lewre piştî nivîsîna çîrokê jî ew bandor bi awayekî didome. Mi xwest di der barê avadanî û teşewergirtina têkiliyên civakî de û têgihîştina jiyana bi edalet, bi hiqûq û demokratîk de çend tiştan lê bikim. Her ku mi xwest ez dest pê bikim ew dîmen dîsa hat ber çavê min. Piştî ew dîmen di dil û hişê min de çû û hat mi dev ji wan têgehên berda. Li gorî wê dîmenê, belkî jî, hewariyek sivik, piçûk û heya hûn bêjin însanî xwe da der: “Li Rojhilata Navîn, em hemû însan mafê xwe yê hemwelatîbûnê dixwazin”! Ew mafên li hin welatan însanan berî du sed û deh salan bi dest xistine!

Di nivîsarekî xwe de mi gotibû ne sosyalîzm û ne kapîtalîzm, wê çaxê wê çi be. Ez nizanîm wê çi be, ji bo mi zêde ne xem e jî! Xema mi a ku aniha li ser dil bûye kevir ew e ku her însan hinekî bi merhemet be, guh bide dengê mexdûran, xwe li însaniyetê bigire...

Li vê erdnîgariyê bêhtir kevirên mezin têne avêtin! Û wekî gotina pêşiyar, em dizanin bela kevirên mezin ne lêxistin e! Na, helbet her însan xwedî fikir, xewn û xeyalan e. Bila xeyalên her kesî bi her kesî xweş be... Lê, lê li Rojhilata Navîn însan nikarin bi qasî du çivîkan jî ji hev fam bikin an jî têkiliyeke dirust li dar bixin. Ev jî bi wîjdan, merhamet û bi rewşa azadbûna kesan ve girêdayî ye; her wext bi rastiye dizane lê dîlê/a metirsiyên di dil û hişê xwe de ye. Her rastiye dibêje dû re dibêje, “LÊ...” a, ji wê şûn de heft dike heştê helandî...

Wan (desthilatîyan) her wext ji me re tiştên mezin gotin, nehiştin em tiştên biçûk bifikirin a rast nehiştin em jiyane bifikirin, ji hev re, merheba, bêjin, dilşad bin. Tiştên mezin her wext xeman kir dilê me û em bi hev biyan bûn. Însan ketin halekî wisa, êdî, ên din, ji bo xwe talûke hesibandin.

Gere em bi rik jiyane û tiştên di jiyane de diqewimin ên herî însanî bifikirin û bizanibin riya ku me ber bi xeyalên me ve jî dibe ev rê ye. Bila tiştên mezin bimîne ji bo wan!

## ZIMANÊ KU DI NAVBERA SÎYASET Û ZANÎNGEHÊ DE DIHEJQE

Berî nivîsê çend nîşe:

- »1. Di bernama “Deriyê Din” de mi gotibû, heya du hezar û yekî, mi siyaset nedikir lê mi ji siyasetê hez dikir. Piştî du hezar û yekî mi siyaset hişt li cî û mi ji edebiyatê hez kir. Hê jî wisa ye; naxwazim edebiyatê bikim, dixwazim jê hez bikim!
- »2. Piştî du hezar û yekî ji siyasetê bêhtir têgeha ‘desthilatîyê’ ez mijûl kirim û heya ji destê mi tê li hemberî desthilatîyê bi îtiraz tevdigerim, hewesa xwe bi demokrasiyê tînim.
- »3. Di “Xirecira Artuklu”yê de, bi ya mi, siyaseta kurd bi lez, bi bertekiyek hişk û teng tevgeriya; xwezî, wê wextê, ji “recimkirinê” bêhtir hêvî ji kesên ku diçûn “Artuklu”yê bihatana kirin; heke bihata xwestin ku ji bo zanîngeheke azad têkoşîn were dayîn wê baştir ba.

Ev nivîs bi îdîa ye ku çawa siyaseta kurd, bi dezgehên xwe ên ragihandinê, peyamên xwe ên siyasî esas girtin û xisarê da zimên, îro roj “Enstîtuya Zimanên Ku Dijîn” jî bi hin kirinên xwe, bi rê û rêçikên ‘desthilatî’yê xisarê dide zimên.

Dîsa bi bîr dixim ku di xebat û pêşketinên edebî, kulturî de çawa sekna siyasî, rewşa siyasî wekî krîtereke derûnî, rastiyeke bû, îro hêdî hêdî “zanîngeh” jî, bi heman halî, vehesîneke wisa diafirîne, yan jî gelek jê bi heman hewesê tevdigerin. Li bal gelek xwendevanan, krîter “zanîngeh” e ; heke tiştêkî ji wir de xwe bide der ‘pîroz’ e, çawa, ji siyasetê de xwe bide der/bida der pîroz bû!

Helbet çi xwendevan çi jî dersdar bin em nikarin her kesî bi heman rengî bi nav bikin. Lê ji derve ve du tişt balê dikişînin, bi gotineke din, xwiyê siyasetê bi awayeke din li wir jî berdewam in, vêca bi gelemperî bi navê mixalefeta hundur ev tê kirin!

1. Ji karê ku tê kirin bêhtir peyamên ‘hebûnê’ esas têne girtin. Mîsal, siyaset çawa di bikaranîna ziman de bi “zimanê xwe” re mijûl bû, em di hin kirin û karên enstîtuyê de jî heman tiştî dibînin, referansek jê ferheng e ku ji alî Saziya Zimanê Tirkî ve hatiye amade kirin û tê de hatiye destnîşan kirin ên ku lêhûrbûne, di ber dest re derbas kirine, Prof. Dr. Kadri Yıldırım û Prof. Dr. Hamza Zulfikar in.

Xemên îdeolojîk ên siyaseteke teng li ser zimên dibin hukum,



esasê îtiraza me jî ev e, li ku bê kirin, kî bike, xeletî ye. Wextê ku mi digot, her kes bi hewes e da ferhenga xwe biafirîne\* mi behsa vî tiştî dikir. Ziman DIKIN qurbana termînolojiyan. Ya din jî dibe qurbana afirandinan, qurbana meylan!

Em li ferhengê vegerin, mînak:

“agahdan is. Bilgisayar.”

Gelek xwendevan belkî di nivîsên me de xeletiyên pêkenokî ên rastnivîsê jî bibînin. Ew xeletî dikarin werin sererastkirin lê hin xeletî hene ku di zimên de dibin birîn. Aliyê avakirin û felsefîk de mirov divê hasas be. Têgeha ‘kompîtor’ di Kurmancî de bi cî bûye. Ziman ew hebandiye. Vêca hûn, ‘agahdan’ bêjin helbet hinekî rexne li we bigirin ku hûn “ji xwe” pir razî ne!

“biraxwîn is. Kan kardeşi.”

Mînakên wisa pir in û bes in da em behsa ‘hewesa otorîtebûnê, desthilatîyê’ bikin. Gelo, “destbirak” ne bes e? Li vir, îhtimal e ku were gotin li filan deverî tê bikaranîn, ev wê hincet be.

Ji kerema xwe van têgehên, di hişê xwe de, di hevokan de, bikar bînin:

“çawahîni”, “cîguherî” “çelexwahr”, “dilbitepetep”

Niyeta mi ne ew niyet e ked û karên ku têne kirin piçûk bibînim, berevajî, her ked hurmetê heq dike.

Ji derî ziman, di nîrxandin û nêzîktêdayînên edebî de jî em dikarin, heman “jixwerazîbûnê” bibînin. Belkî me divê em rewşenbîr, nivîskar li ku bin, çî karî bikin ne muhîm e, lê ji alî teknîkî û nêzîktêdayînan ve qey em bi problem in!

Ji alî sekna li jiyane de toreyeke rewşenbîriya Kurdî bi gelemperî hebûye; her wext xwe spartîye, bi xwe nebûye spartek! Bi mihnet tevgeriya ye. Di nav siyasetê de çerçawa li hemberî siyasetê bi mihnetî mijar bû, mijar e, em dibînin li zanîngehê jî heman halê bimihnet heyê!

Li qisûrê nenihêrin, ku ne wisa bûya, heya niha qet nebe bi carekê be jî li hemberî navê, “Enstîtuya Zimanên Ku Dijîn” îtirazên bi çalak hebûna! Belê, ez jî difikirim ku li zanîngehê tiştên xweş jî têne kirin lê bi bîr dixim ku li her deverî zanîngeh ciyên îtiraz û hilberîne ne. Ciyên geşbûna fikran in.

Nîşe:

Têgeha dij-kolonyalizmê bûye wekî modayekê; rastiyeke e kurdan derdibe, ev rast e lê heke wekî moda were bikaranîn, dibe ku xisareke mezin jê derê; rastiyeke cografîk carna jê ên siyasî muhîmtir in; heke dewletbûna kurdan biba sebeb ku bi milyonan însan bibin qurban, heke biba sebeb ku ev cografya sed sal bi êşên hilweşînê re mijûl bin, divê mirov hinekî bifikirin. (Gere serdest jî ji vê metirsiyê û halê heyî palpiştî negirin, rehet tevnegerin)

Ez jî difikirim ku dewletbûn mafekî rewa ye kurdan e. Xwezî kurd û tirk, kurd û faris di nava amadehiyên wisa de bin ku gelan ji bo referandûmê amade bikin. Rojek were, li gorî tercîhên gelan, bêyî xwîn, mesele werin çareserkin, çî bi awayê pev re jiyînê, çî jî bi awayê cuda be.

Seknên modayî tu car nebûne çare. Li hemberî diruşma “biratiya gelan” bi mexsedên siyasî, îtiraz hene. Di dewsa ku xwestekên siyasî werin bi gewde kirin, wekî bertekî, biratiya gelan tê red kirin. Mafê me ye, ku em bêjin, “bijî wekheviya gelan”, an jî bijî, mafên însanî. Maf e ku em îtirazên xwe li hemberî siyaseta heyî der bibin lê, carna ji derî niyeta me, vehesîn pêktên ev jî ne baş e. Îronîk e, bi daxwaza demokrasiyê re, pîrî caran, jiyanekê demokratîk tê red kirin ji lew halê “bi hêrs” her li pêş e ne wsia be helbet kurdekî ku ew qas bîndest mabe naxwaze ji însanan nefret bike. Vebêjiya tundiyeke di hewîne jî bi qasî tundiya serûberî bi hukum e.

Wekî gotina dawî, mexdûriyeta ji desthilatiyê û halê ‘ên din’, daxwaza demokrasiyê qenebe muhîm in.

Ciyê ku demokrasî lê tunebe, ew Kurdistan be jî wê êş bide me. Ku cî hem Kurdistan be, hem jî demokrasî lê hebe, bi gelên din re jiyanekê dostane bijî xweştir e. Çepgirana wextekê ji kurdan re digotin, ka bila sosyalîzm were em ê derheqê mafê we ên kulturî de bifikirin. Wisa têdigihîjim ku hin kurd an jî derdor wisa difikirin, ka bila Kurdistan çêbe hîngê emê di derheqê demokrasiyê de bifikirin! Helbet, nêzîktêdayîna bi navê humanîzmeke ajîteyî, nebilêvkirina êşên giran ên ku kurd dijîn jî heman xeletî ye.

Bi vê nivîsê mi ji siyaseta hez kir yan ji kultur û edebiyatê? Bila ev pîrsa bi henek li dera ha be lê sekna bi mesafe xweş e, niyeta halek bi mesafe ya li hemberî desthilatiyan jî ne xewn e, tiştê ku însan dikare bi rihetî bike ev e.

Nîfşê Nodî, wê bi bîr bîne, di wan salan de, rexneya herî bi ser nivîsan diket ev bû; em qalibê “ez û ez”itîyê bişkinin!

Berî vê nivîsê lê bikim mi pîrseke saf ji xwe kir û bersiva wê jî

safiyane bû:

“Çima jiyana wisa ye?

- Qet, hema... Jixwe wisa ye.”

Niha dibêjim, jiyana wisa ye lewma bi mehne ye, xweştir jî dibe...

## NÎŞEYÊN DI DEFTERA MI DE

Wexta 'ên din' ên di nav me de bi bîra mi tê halekî xwe di canê min de der, halekî mîna halê taviyên bihara pêşî. Tiştê herî zor e da însan ji bo wan tiştêkê vebêje !Ji bo çi?Belkî ji ber jiyana wan, dîroka wan, êş, xem, hêviyên wan...Ew, elewî ne, ermen in, sûryanî ne, êzidîne... A herî girîng taybetiyek derbirîn û vegotina wan heye, axaftina wan peyvên sert û hişk venahewîne, her peyv û gotina wan bi şerbetê hatiye terbiye kirin. Gotin di vegotina wan de ne bi hîle ye. Reng û kûrahiya di dengê wan de efsûnî ye. Gotinên qure, gotinên mezin, gotinên bi hesêb, gotinên bi hezkirinê nehatine terbiyekirin, dengê ku ne şîrîn be, li deftera vegotina wan nayê lêkirin. Dara vegotina wan bê kurm e.

Helbet her kes dizane 'rewşa ên dinbûyîn' rengê xwe daye vegotina wan û ew êdî ji gelek alî û bi gelek tiştan naxwazin bikevin kilam û nivîsan!

Zor e da însan tiştan ji wan re bibêje û vebêje. Belkî jî beriya gotin û vegotinê gere em bes bikaribin guhdariya wan bikin. Çiqas bi hesret im çi peyvên nazenîn, ên sivik, ên servekirî, ên berşîr, peyvên bi dilê însan meyîyan e, peyvên hezkirinê ên bi ser ziman neketine, peyvên zelal, ên şîn, peyvên mîna kakilên gûzên Dêrsim yek bi yek di vê nivîsê de bi şîr û şekir bikim û beredim ruhê xwendevanan. Ev e, diltenikî mi bi bask dike. Aniha dilê min, mi, ber bi cîhan û asîmaneke mîstîk ve dibe. Lê ez dizanim, bê gotin di dilê wan de çiqas zelal û rasteqîn e, safî ye;beriya efsane, razberî û mîstîzm û gotinên dûvdirêj peyvek heye, hew peyvek, însan!A, her tişt bi peyva, însan, dest pê dike. Ma heya mirov nikaribe silav li însan bike, heya mirov nikaribe însan fam bike mirov dikare gotina xweş ji wan re vebêje!...

\*\*\*

Wexta pexşanan lê dikim heya ji mi tê ez ji karekteran bi dûr dikevin;ev dûrketin carna dibe ji wan dengên kûr û bi nalîn, bandor li mi dike lê ez dest dirêjî jiyana karekteran nakim. Ew jî ji ya xwe namînin, pê dikevin, hewl didin textikên nivîskar hilweşînin!

\*\*\*

Di rêwitiya nivîsînê de peyv di dest de ne kevir in, ne bi kufik in... Gelek jê bi çarçîkan ketine, ber bi xortaniyê ve rê didin xwe...Gelek jê azev in. Di edebîyata me de, ji bo peyvan em dikarin bêjin zindî ji miriyan ne kêmtir in êdî!

Lê di edebîyatê de wexta em ji bo însan li jiyaneke digerîn gere em ji bo ziman, ji bo peyvan jî li jiyaneke bigerîn. Jiyan peyvan ji a însan pirtir bi 'qeleman' ve girêdayî ye. Di destana Memê Alan de ev hêvî, xwestek bi gotinên wekî, "Çirke çirka serê qeleman e. ", "Qelema xwe diweşînim. "hatiye derbirîn.

Pênûs reng li me şîrîn dike, xewnek me jî ev e. Ev jî bi peyvê dibe.

\*\*\*

Ji bilî peyvên ketî, mirovê/a ketî, siruşt bêhnpeketî, şaristanîyên ketî rastîyên dema me ne. Ger em Adorno bi bîr bînin emê pirsê ji xwe bikin, gelo bira bira dunya ev qas xweş e, bira bira wexta em basa hezkirin û evîne dikin em ji dil in! Helîm Yûsiv, komara dînan, gotibû. Ev ne bes e, em dikarin basa dunya dînan bikin!

\*\*\*

Wexta dixwazim peyvan binexşînim, wate lê bar bikim di heman demê de hewl didim wîzeyek xwe bide der. Lê peyvên me hem ji alî wateya ferhengî ve, hem ji alî wateya civakî ve hem jî ji alî wateya bandorî ve bi pirsgirêk in. Ev dibe sedem carna hûn hin gotin û tewrên karakteran baskokî bikin.

\*\*\*

Ji hewlên mi jê yek jî ew e ku ez kesan bidim verişandin, ji kesan bêhtir, ziman, bidim verişandin. Bi hemî delaltiya wan re. Lewre ew însan in. Lewre, "wexta merû dibêje însan avê çem û kaniyan disekine. "Verişandin yek ji riyên çareseriyê ye ji bo jengê!...

\*\*\*

Demeke dirêj mi helbest ji bo xwe nenivîsî! Têkiliyek durû hebû di navbera mi û helbestê de heya wextekê; mi dixwest helbestê ji bo ziman bikim navgîn, ziman ne navgîn bû ji bo helbestê. Bi dilê hişk re xema bikaranîna ziman! Di wê qonaxê de Ratîka xwe da der. Li dû Ratîka alozî, gengêşiyên di nava dil de dom kirin. Nivîsîna helbestan jî berdewam bûn. Her ku diçû êdî helbestên bi xemên hunerî bandor li dilê mi ên hişk dikirin û dilê mi jî nerm dibû.

Di nav wan gengêşiyên navxweyî de mi çend caran der kir da ezê nema helbestan biweşînim. Halê mi û helbestê halê zewacek travmatîk bû ! Gelek helbest mabûn li ber dest. Mi îsal ew jî bi navê dosya, "Aqil Diçe Sewda Dimîne'da çapkirin. Hewcedariya mi jî bi azadbûnê hebû a helbestên mi jî! Carna binivîsînim jî ji bo xwe dinişînim. Piştî biryarek wanî helbest bêhtir azad in.

Di serî de Berken Bereh gelek hevalan ji mi re, dev ji helbestê bernede, gotin. Biryara mi ji hurmeta mi ya li hember helbestê ye. Dibe ku bête pirsîn, wexta ku we bes helbestên helbestî nedinivîsî we gelek helbest lêkirin lê îro ro hûn bi ser helbestê ketin hûn dev jê ber didin, bersiv wê ev be, belê, ji bo xatirê helbestê, ji bo azadiya helbestê, wekî mi got, ezê ji bo xwe lê bikim.

\*\*\*

“Gotina mê”biwêjek e; li Varto tê bikaranîn. Ji bo şeweyê tê bikaranîn. Di vegotinên mê de dilsozî, zimanêke şîrîn, jidilbûyîn, aramî, hêvî, ken, henek, hikariya peyvê, hilberîn heye. Belkî ku tiştê derbirîn, şeweya zargotina Kurdî binav bike ev biwêj e.

Gotinên mê bi peyvên dişibin pêsîran bi dê dibin.

\*\*\*

Ev welat, ji alî erdnîgarî, mayîndeyên şaristaniyan, kîşwerî, çandên cûrbecûr ve çî qas xweş be ew qas jî ji alî mantiqê rêveberiyê ve sosret e. Beriya wextekê, li navçeyek qaşo çanda demokrasiyê hinek bi pêş ketiye kesekî biryar dide da bibe namzetê berendamtiya belediyê. Bi navê kubariyê diçe cem serokê navçeyê yê partiyekê. (Di heman demê de nîyeta serokê navçeyê jî ji bo berendamtiyê heye. )Kes ji serokê navçeyê re dibêje:

“Li mi biborin, mi helal bikin, ez jî dixwazim bibim berendam. Bi hêvî me da hûn li xwe negirin. “

Serokê navçeyê, bi hêrs dikeve û xwe ranagire:

“Tu dê pişt stuyê xwe bixwirîni!Ev çar sal in ez serokatiyê dikim. Ji wê rojê de çî dawet li navçeyê çêbûne ez çûm. Heya niha mi sed û ponzdeh mîlyar pere daye zêr kiriye û wekî xelat biriye dawetan. Ev belaşî ji ku tê?... “

\*\*\*

Çiqas rast e ez nizanim, tê gotin ku li hin welatan mamosteyên bîst sal kar kiribin nikarin di dadgehan de şahidî bikin. Hişmendî ew e ku mamoste hingiya bi zarokan re dijîn dilê wan jî dibe mîna dilê zarokan.

Ev bû sedem da ez kesê bi edebiyatê re mijûl in bifikirim, bêhtir helbestvanan;gelo dilê wan jî ne dilê zarokane ye!Ewê karibin di dadgehan de şahidî bikin?Bersiva pirsê ne hewce ye lewre em dizanin wêjevan her wext şahidî ji dem û dewranan re kirine.

## REWŞEN Û RASTIYÊN NIFŞÊ NODÎ

Rewşen navê belgefilma Cemîl Oguz e ku li ser çîroka kovara Rewşenê xwe daye der. Li Îzmîrê, li Zanîngeha Egeyê di rojên belgefilman de gihaşt temaşevanan. Mi jî li belgefilmê temaşe kir.

Di wan saetan de em haydar bûn ku çalakiya xwendekarên kurd heye. Ji derî çar pênc xwendekarên kurd ku ew xwendekarên beşê ragihandinê bûn, temaşevanên din ne kurd bûn. Nêzî nod kesî bi mereq film temaşe kir. Wexta dawî li filmê hat dengê çepikan bi salonê ket. Ji bo derhênerê ew bertekî muhîm e.

Piştî temaşekirinê xweziyekê xwe li mi da der; xwezî belgefilmê Hawar, Riya Teze jî bihatana kişandin. Herwekî hin rêç û xetên wêjeyî kulturî ên din. Hukmê belgefilman ji pirtûkên lêkolînî bêhtir e.

Ked û xebata salekî berhemeke hêja afirandiye. Nirxandina belgefilman, filman ne karê min e, tiştên ku ez bêjim wekî temaşevanekî û kesekî ji nifşê nodî, ji nirxandinê madetir dîtînen şexsî ne, ne di çarçoveya teknîkî de ne. Ev belgefilm dibe sedem em gelek tiştan bifikirin, gelek nêziktêdayînan binirxînin. Bi tena serê xwe ev rastî bes e da belgefilm xebateke çiqas hêja û li cî ye.

Di belgefilmê de nivîseke ku sê çar caran hatiye redaktekirin û nîşeyên li kaxizê dîmeneke xweş û bi wate daye belgefilmê. Ew dîmen bi tena serê xwe dikare rewşa halên nivîskarî û kovargerîya Kurdî û zehmetiyên wê nîşan bide.

Weke kevanekê em destnîşan bikin ku nifşê nodî bi tenê ne derdora Rewşenê ye, derdora Nûbiharê jî din nav nifşê nodî de cî digire. Ka di wan salan de, ji der arîşeyên hevpar çî xisûsiyet û arîşeyên wê derdorê ên di nivîsevaniyê de hebûn ew jî hêjayê lêkolîn, nivîsîn û belgefilman e.

Paşxaneya Rewşenê a siyâsî, mercên ku bûne sedem kovar xwe bide der baş hatine derkirin. Di kitekitên belgefilmê de hatiye destnîşankirin ku Zahîr Kayan di rewşenê de bi Kurmancî nivîsên teorîya estetîkê lê dikir. Ev muhîm e. Kesekî wekî Mihemed Uzun bi tevî romanûsekî hêja dihat nasîn nivîsên xwe ên ceribî bi Kurmancî lê nedikirin. Her ku ew li xwe mukir nedihat ku ji ber zehmetiyan nîkare bi Kurmancî lê bike jî rastî ew bû; wexta rexne ji ber wê rastiye lê dihat girtin jî ew bi hêrs diket bi gotînen sayakî û qalibî kesên rexne lê digirtin dida ber tîran. (Zîmanê Mihemed Uzun ji alî xwendevanan ve xweş tê dîtin. Wekî zîmanê edebî problemên zîmanê wî nîn

e. Tiştê em behs dîkin rastiyek din e)

Ev xal muhîm e lewre hê jî gelek kes nîfşê nodî bi bikaranîna zimanê çêbûwar rexne dîkin. Li gorî mi yek ji taybetiyên nîfşê nodî ew e ku wan hewl da Kurmancî di her warî de cî bide xwe. Ji warên hemî dîsîplînan bêpar nemîne. Kesên ku hew di warê edebîyatê de ziman bikartînin bi awayek manîpûleyî vê rewşê nabînin naxwazin kes bibîne. Ezê li vir pirsekê arasteyî wan kesan bikim; baş e hûn edebîyata zimanekî dîkin nexwe kerem bikin, bila lehengekî we psîkolog be, sosyolog be, endazyarek be, felsefevanek be... Wê çaxê hûnê têgeh û derbirînên nû bikarneynin? Heger ku hûn bikarbînin ê zimanê we bibe zimanê çêbûwar?!

Çend xal hene ku wekî kêmaniyên belgefilmê balê dikişînin. Yek jê ew e ku behsa şaxên Rewşenê nehatiye kirin. Ji şaxan jê yek Şaxê Îzmîrê bû ku keda wan zêde ye. Rexneya din derbarê Konferansa Nivîskarên de ye. Her ku hin nivîskar tevî konferansê nebûbûn jî di belgefilmê de wêneyê wan nivîskarên cî daye xwe. Rola konferansê, keda hatî dayîn hatiye paşguhkirin!

Tespîteke balkêş di belgefilmê de ji alî Îrfan Amîda ve hatiye kirin. Îrfan gotiye: “Ez dibêjim edebîyata Kurdî ji salên nodî de dest pê dike.” Her ku tespîtek ne li cî be, li ser delîl û desîseyan xwe nede der jî hêja ye însan bigengêşe. Lewre tespîtên wisa filaş di edebîyata me de bûne wekî toreyekê. Bi bîr bînin, wextekê edebîyata sirgûnê a li Swêd vî tiştî kir; bi awayek xwestin her tiştî ji Swêd de bidin dest pê kirin, a xwe li ser her tiştî ferz kirin. Bi dû re Mihemed Uzun (dû re mebesta xwe der kir, ji a xwe de hinekî hat xarê) gelek tiştan ji xwe de da dest pê kirin.

Bi qasî dizanim Kawa Nemir, Cemîl Oguz (belkî hinên din jî) di heman fikrî de ne. Baş e, bîngeha tespîtê û referans çî ne? Li gorî hişmendiya navborî, bi nîfşê nodî re gelek nivîskar derketine meydana, kovar û weşan gihastine ber destê girseyan. Belê ew kes edebîyata beriya salên nodî xwe daye der bi qedr û qîmet dibînin, înkâr nakin lê dibêjin, me xwe nedigihand wan berheman. Ew berhem bela wela bûn...

Ev ne bes in, hûn nikarin bi van egeran destpêka edebîyata Kurdî ji salên nodî ve bidin dest pê kirin. Rast e gelek kesan xwe li edebîyatê girt. Baş e, heger em edebîyata li Kafkas bifikirin, em derdorê Riya Teze bifikirin ku ev nêzîktêdayîn şertek muhîm be wê çaxê gerek em edebîyata Kurdî ji Riya Teze de bidin dest pê kirin.

Gelo Rewşen bi qasî tê îda kirin digihaşt ber destê xwendevanan? Baş e, ku gihastibe kî dixwend? Ji derî nivîskarên kovarê û hin



kesên mereqdar kî ji dil û can dixwend? Ez şahid im hemî hejmarên dihatin Şaxê Îzmîr piranî jê li odeyekê hatibûn îstif kirin. Dawiya dawî rêveberiyê hemî kovaran li holê, bê pere pêşkêşî kesan kir. Bê pere bû lê dîsa jî kesên ku riya wan bi saziyê diket nedigirtin. Bila bi xelet neyê têgihîştin van tiştan ji qedr û qîmeta kovarê tişteki danaxin. Lê rastî wisa bû.

Nêziktêdayîna ku edebîyata Kurdî a nivîskî ya modern ji Hawarê de heta ji destpêka sedsala bîstan de nede dest pê kirin seqet e.

Dîsa tê gotin ku gelek nivîskar derketine. Baş e, ger wisa be ji bo çi bi dehan caran gelek kesan got ku nivîskar behemên hevudu naxwînin.

Baş e, heger ku bi qasî tê gotin, edebîyata Kurdî ya modern ji nîfşê nodî de dest pê dike emê çend pirsan bikin:

- »1. Gelo heya niha nîfşê me çend konferans, panel an jî semîner bi însiyatîfa xwe li dar xistin? Nebêjin, çi eleqeya wê bi tespîtê re heye; heger ku tespît rast be gerek xemên nîfşê nodî ên wisa hebûna. Ji bo karibin xwe der bibin, tiştên nû ên tevî edebîyatê kirine parve bikin.
- »2. Çend behem hatin analîz kirin, taybetiyên beheman derxistin holê?
- »3. Wekî hişmendî gelo bêhtir li ser navan rawestiyên an li ser metnan?
- »4. Bira bira çi wextî gelek ji kesên nîfşê nodî xwe wekî nivîskar, helbestvan hîs kirin?
- »5. Hêja ye ku qonaxa Hawarê, Riya Teze edebîyata li Swêd û nîfşê nodî ji her hêlî ve bête analîz kirin, rastiyên wan bête dîtin. Heger ku xebateke bi rêk û pêk a wiha nehatibe kirin em çawa bi rihetî dikarin edebîyata Kurdî ya modern ji salên nodî de didin dest pê kirin?

Gelek pirs û rastî hene ku tespîtê bêbingeh dihêlin.

Li gorî mi jî salên nodî, nîfşê nodî destpêkek e. Detspêkek muhîm e. Lê ne destpêka edebîyata modern e. Ezê çend taybetiyên nîfşê nodî destnîşan bikim:

- »1. Ji ber ku bi gelemperî xwendekar û mamoste ne tu têkiliya wan bi medreseyan re nîn e. (exlebe bo derdora Rewşenê dibêjim) (Belê di edebîyata li Swêd xwe da der jî hukmê medreseyan kême lê bi awayek têkiliya mantelîteyî li wir xwe daye der, ji alî

metnan ve)

- »2. Têkiliya nifşê nodî û klasîkan, toreyê di destpêkê de nîn e; ev bi zanatî nehat kirin, lewre wekî tê gotin kesî xwe nedigihand klasîkan. Ev jî dibû sedem însan ji xwe de hin tiştan bidin dest pê kirin. Dîsa edebîyata dinyayê ya modern esas dihat girtin. Dîsa di destpêkê de bi saya texlîdê însan bi pêş diketin. Heger ku rojekê lêkolînek bête kirin ê bê dîtin dê gelek helbest an jî çîrok bi aîdî nivîskar/helbestvanên xwe ne an hatine kopîkirin.
- »3. Belê nifşekî bi rik e, ew rik bû sedem ku di pêvajoyê de gelek tişt bi cî bibin, edebîyat bi xwe bibe xema sereke.
- »4. Ji ber ku mîrateya nivîskî li ber destê wan tunebû (mîrate hebû lê ne li ber destê wan bû) di heman demê de ew bûn xwedî ferhengekê jî. Ji salên du hezarî bi şûn de depa pirsan tê ku her kes pirsan ji xwe dike.
- »5. Nifşê nodî ew nifş e ku kesên ji salên nodî heya salên du hezarî dest avêtine pêûsê ew kes in. Bi ya mi piştî salên du hezarî her tişt diguhere, mercên normal dest pê dikin û êdî kesên dest diavêjin pêûsê bi hişmendiyek normal dest pê dikin. Ji salên nodî heya salên du hezarî bi gellempêrî edebîyata dihat kirin edebîyata binerd bû. Ev gerek neyê ji bîr kirin. Du nivîskar nikaribûn bihatana cem hev. Rewşen û nifşê nodî xwedî taybetiyên kûrtir in, lewre destpêkek e, lewre heya salên du hezarî em behsa wî nifşî dikin. Lê ku însan wekî destpêka edebîyata Kurdî ya modern der bibe “ezîtiyek takekesî û nifşî “xwe dide der ev jî li ked û mantelîteya nifşê nodî nayê.
- »6. Cara pêşî bû ku nivîskariya kurd ji derî edebîyatê bi mûzîka kurd ya modern re jî dijiya. Kesên wênesaz xwe dan der. Mînak fewzî Bîlge. Herwiha xebatên şanoyê jî ne kêmbûn. Ango bi tenê ne edebîyat, gelek beşên hunera modern xwe dida der. Lewre wexta em nifşê nodî dibêjin bi tenê gerek wêjevan neyên hişê me, wênesaz, şanoger, kesên bi mûzîkê re eleqedar jî ji heman nifşî ne.
- »7. Nifşê nodî ji alî şêwaz û teknîkê ve jî wekî atolyekê bû. Atolyeya ceriban.
- »8. Taybetiya vî nifşî a herî muhîm ew e ku berhemên kesan, pratîka kesan ji bo wan bixwe bûye dibistan. Ji ber mercan takekes tenê maye (gelek jê, ên di saziyan de dixebitîn ne wisa bûn) Di nav tenêtiya xwe de ketiye nav lêgerînan.

»9. Cara pêşî bû hinekî bi awayek sist be jî nivîskariya kurd deng û bang li siyaseta dikir da ku nêzikahiya xwe a li çand û wêneyê di ber çav re derbas bike, pirsan ji xwe bike.

Wekî gotina dawî dibêjim ku beriya her tiştî gerek em xwe ji mantelîteya jakobenîst bikin. Sedema herî mezin xwe ji vî mantelîteyê dide der. Di civaka kurd de her tişt ji jor de hatiye gotin. Mi di nivîsek xwe de behsa desthilatdariyê kiribû. Heger ku ji derî edebiyatê xemên me ên jiyaneke demokratîk hebin wekî nivîskar, nîfs, kes gerek em hewlên jakobenîst red bikin, bi awayek xwe (wekî desthilatî) li ser tiştan ferz nekin.

Wekî nîşeyekê beşekê ji nivîsa xwe a ku di sala 2008 an de, di bin sernavê, em ji edebiyata hebî re bêjin na, de di rojnameyê de hatibû weşandin carek din lê dikim. Ji ber ku eleqeya wê bi awayek bi vî nivîsê re heye:

“Di pêkhatina tevgerên edebî de bandora felsefeyê, rewşa civakê ya sosyalî û siyasî, xitimîn û xwestekên guherîn û veguherînên bingehîn bi bandor in. Ji van bandoran bandora felsefeyê û guherînên siyasî bandorên serekene. Em dikarin bibêjin ger di civakê de an jî li ciyekî bingehê felsefîk a xurt tunebe, li wî cihî an jî civakê guherînên bingehîn xwe nedabin der, civakan qalik li xwe neşikêrandibe zehmet e ku tevgerên edebî cî bidin xwe. Helbet em ê karibin carna basa xwestekan bikin, basa hin hewlên ku tevgeran bi bîr tînin bikin lê em ê nikaribin ji bo wan rêç, xet an jî merheleyan bibêjin ekol an jî tevgerên edebî.

Taybetiyeke din a ekol û tevgerên edebî ev e ku wan bandor li edebiyata cîhanê kirine. Ji derî van rastiyan cîyên ku ekol û tevgeran xwe lê dane xwedî bingehêke xurt a nivîs û nîqaşê ne.

Civakên ku ji felsefeyê, gengêşiyên, fikir û ramanan bêpar mane bêhtir neçar dimînin bişopînin! Civakên wanî jî bi gelemperî di bin zor û pêkutiyên de ne. Em nikarin basa warên azad ên gengêşiyên bikin.

Li civakên wanî pirî caran wekî takekes hin kes hin xwestekan der dibin. Hewlên fikrên nû xwe li wan didin der. Daxwaza’ riyeka din’ li civakê û edebiyatê dikin. Di edebiyatê de jî em dikarin behsa hin taybetiyên berhemên hin kesan bikin lê wekî ekol an jî tevgerên edebî em nikarin nav li wan bikin.

Di edebiyata Kurdî de jî gelek gavên hêja, xet, rêç an jî merheleyên bi rûmet hene. Ew gav, xet, rêç an jî merhele ji bo edebiyata Kurdî xwedî wate ne, hin jê jî wekî hewlên nû bingeh in. Lê em ni-

karin ji bo wan 'ekol' an jî 'tevgerên edebî'bibêjin..."

## DEŞİFREKIRINA ZIMAN Û TÊKILIYA BI OBJEYAN RE

Beriya niha mi di nivîsekê de di edebiyatê de pêdiviya deşîfrekirina takekes destnîşan kiribû. Wext hatiye em zimanê xwe jî deşîfre bikin; deşîfrasyona ji alî gramerê ve û analîzkirina wê bila bimîne bi aîdî zimanzanan.

Têkiliyên zimên ên bi zimanên din re, têkiliyên zimên ên bi berhemên devkî û nivîskî re, têkiliyên zimên ên navxweyî (devok û zarava), derfetên ziman, problemên ziman ên vegotinê, bergeha peyvan, bicihkirina têgehên, ji alî tehm û çêjê ve form û qalibên ziman... baş bête deşîfrekirin bi bawer im wê şîbakeyên nû li me vebin.

Ger em vegotinê bifikirin û ji alî vegotinê ve xwe li zimên bigirin em ê bêhtir di vegotinê de bi xwe beled bin, xwe li texlîdê negirin. Biwêjek bû sedem ku ez nivîsê lê bikim, “Mîna zerika hêkê nazik e.”\* Ger zimanekî ew qas bi bingeş û bi derfet be rojek zûtirîn gere ji her hêlî ve were deşîfrekirin.

Ger em zimanê Kurdî bifikirin em ê bibînin ku ji alî awayê vegotinê ve heya hûn bêjin bi derfet e û sivik e. Ger em edebiyata Kurdî bifikirin “sivikahî” hê ji bo me nebûye egera sereke. Belê di gelek berheman de xwe dîde der lê wekî taybetiyeke ziman ev nebûye hişmendî.

Bêhn, reng, deng... ev hêman giş bi sivikahiyê bi bandor dibin û ne guncav e ku hûn bi awayekî hişk an jî bêyî hest û bêyî derfetên ziman karibin vebêjin.

Li vir gere em bêjin her çiqas têgehên safî-zelalî û sivikbûnê pev re hebin jî ne heman tişt in. Berhemeke pir safî û zelal dikare bi xwendevan xweş bê ger berhem di heman demê de “sivik” be wê karibe bibe şerbet û xwe berde rehên xwendevaniyê ên xwendevan. Sivikbûna em behs dikin di heman demê de şîrînahiyê jî bi bir tîne. Ev rastiyeke e hew. Gelek hêl hene ku piştî deşîfrekirinê dê xwe bidin der.

Bandor û derfetên zimanekî însan hew dikare di edebiyatê de hay jê çêbe. Deşîfrekirin jî dîsa bi edebiyatê gengaz e. Li vir em têkiliya kurdan û objeyan, têkiliya edebiyata kurd û objeyan bi birînin bes e ku em gelek tiştan careke din bifikirin.

Jî ber mijûlbûna bi “êş”ê re û nebûna perwerdehiya bi Kurdî tê-

kiliya kurdan û objeyan lawaz maye ji lawazbûnê madetir em dikarin bêjin tune ye. Hûn li jiyana kurdan binihêrin, hûn li sohbetên kurdan binihêrin, hûn li berhemên nivîskî binihêrin û heta berhemên serkeftî jî ji alî objeyan ve bê têkilî ne, “tişt tişt in, hew!”

Ez ê li vir pêkeniyekê bêjim: Carê du zilam dimeşin, bêyî sohbet bikin dimeşin. Yek ji zilaman ji bo pêşî li sohbetê veke dest bi axaftinê dike: “Hukmê îlahî, te dîtiye yek li Amerîkayê qise dike tu hema li vir wî dibihîzî.” dibêje û dimîne li benda hevalê xwe da ew jî dest bi axaftinê bike û şîroveyan bike. Hevalê wî wiha dibêje: “Qey gere wanî ba lewma wanî ye.”!

Em çiqas ziman deşîfre bikin em ê ew qas bibin xwedî derfetên vegotinê, em ê bêhtir karibin têkilî bi objeyan re li dar bixin. Di heman demê de em çiqas karibin têkilî bi objeyan re li dar bixin em ê karibin pêşî li derfetên vegotinê vekin.

Ger babet ev rastî bin bivê nevē edebiyata bi tevn û bi honak dê bi bîra însan were. Wekî mekan sikakekê bifikirin, objeyên di sikakê de bifikirin ku tu car bala kesî nekişandiye. Edebiyat bi hêza xeyalê û bi têkiliya bi objeyan re, bi halê xwe yê tevnî û honakî bi îmkanên estetîkê dikare sikakê bi halekî wisa di dil û serê xwendevan de bi cih bike da xwendevan her wext mereqa wî sikakê bike.

Xeml, îmaj, şûştin, xwenûkirin, hilberîn, zayîn û mirin rastiyên zimên in jî. Ziman jî karekterek e, karekterê civakekê, civakan, şaristaniyan dem û dewranan. Pêşdariziyên zimên jî hene. Helbet hûn nikarin bi darê zorê hukum lê bikin, hûn nikarin bi tenê bi şûştin û bi îmajê jî meseleyê hel bikin. Ziman rê dide edebiyatê da ew bête deşîfrekirin lewre ziman di heman demê de malzemeyê edebiyatê ye. Wextê têkiliyeke wisa hebe edebiyat li hemberî ziman bi berpirsiyarî tevdigere, gere tevbigere.

\*Biwêjeke din a wekî, “Mîna zerika hêkê” heye, ew biwêj ji bo şibandin û derblêdana rengê zer tê bikaranîn.

## XWENDINA LÊVÊN EKOLOJIYÊ

Bi vî halî, bi vî hişî û bi vî çavî ku tu bimeşî, wext li te nêz e ku tu dîsa li ber avê rêzdar bimînî, roj li te bibe yezdan, tu ji ba û bahozan bitirsî ey mirovahî... !

Siruşt dê bû/ye;ji roja ku te xwest tu hukum li dê bikî, ji wê rojê de xwelî li serê xwe kir te;ji ber ku ew di dest te de dîl ma (lê sebra wê zêde ye ne ku ew dîl e) serkeftina te li serê te bû bela, tu serxweş mayî, te dest bi talanê kir, talana siruştê, talana ruhê însan...Tu har bû û bi goştê canê xwe ketî/yî...Tu wêranker î ey însanetî....

Dîsa wê wext bê keresiyên şikeftan ji qesrên bi heybet bi rûmet-tir be;ji niha de bêriya laqek nanî li qeraxên çeman tê kîrîn. Însan li hember hovitiya te bê çare mane. Bêhnêk hewa dê li însanan bibe hesret. Tirs bi ser te jî ketiye helbet, tu li geresitêrkan digerî, te hay ji tawanê xwe heye helbet lê zebaniyê di ruhê te de nahêle tu dev ji şer, talan û hovitiyê beredî...Tu bi nefret î, çavên te ji te têr nabin, dilê te ji te germ nabe....

Tu dêwek bi heftserî yî, ên mayî te morîka xewnê bi guhên wan ve kir. Te her tişta însanî wenda kir, te peyv kuştin, helbest kuştin, te evîn kuşt, tu har bûyî ey ruhê har... !

Tu nema dikarî êdî biaîfrînî, bi guhanên dîrokê ketîyî, tişt di dest te de nema, te ruh kuşt. Di sedsalekê de, te xencera serî bi jahr li dilê siruştê û li ruhê însan da. Di sedsalekê de te talana bi hezaran salan kir. Tu çi bi xişim î, tu çi bi nefret î, tu çi bi xezeb î, te çawa xwelî li serê xwe kir... !Peh! Peh! Peh!

Ji te wetir, bi hezaran salan tu bi siruştê re bi şer û pevçûn bûyî, na, rastî ne evbû ye;şer ji tirsê te destpêkiriye, tu bi tirs î, hê jî wanî ye, tu her ku bi tirsê dikevî dest bi talanê dikî. Dibî gurê har...

Tirsê herî mezin ku niha bi ser te ketiye ev e ku tu di tirsî kesên ku te morîka xewê bi guhên wan ve kiribû û siruşt li hember te bibin yek, tu ji yekitiya wan ditirsî. Li hêlek bêhnê neftê te dîn û har hiştî ye li hêla dî tu ji hilweşîna qesra heybeta xwe ditirsî. Li her deverî dilopên kesên morîk di guhan de dibe lehî. Tu ditirsî, ne mirina zarokan xema te ye, ne jî hawara dê û dayikan. Tu li deverêkê li ziman dibî dijmin li dereke dî li demokrasîyê. Ev ruhê har merîfeta te ye... !

Wê kêliyêk runîşkandina li bin darekê li te bibe hesret. Dê, şeweyê te wekî şeweya vê nivîsê be;bi hawar, bi gazî, bi lavatî...Dê

tu dîsa bi dû evseneyan bikevî, peyvên te mîstik bin...Wê helbest bi ser rûyê jiyânê bikeve, helbest, helbest...Hûr li te çiriyaye...

Tu bûyî hûtek, tu ji wêneyê xwe têr nabî. Tu bû sedem ku li hin ciyan nexweşxane, hepîsxane û kexane zêde bibin. Li hin ciyan te şûrê xoce xizir da dest hin zebaniyan, jiyân di felsefeya te de hew bi gotineke servekirî tête binavkirin, lîstik...

Tu pozbilind î, bi berad î, bi fexr î...Her êvar û sibehê te divê tu dengê serkeftina derew bibihîzî...Te ne kêliyêk hezkirinê divê ne jî stranek ji kûrahiya dil de...Helke helka newqa te dişibe ajalek hov ku ji nêçîra bi bez lep vala vegeyriya be...

Axîn hene li dû te, ka li ewrên ku ji xezeba te pêkhatî binihêre, ber bi qesra teve rê didin xwe, de bes êdî, de êdî li ya însanî xwêdan birijîne...Hindik maye ku dîsa ar biqîre, bibêje, yezdan ez im, însan li hember avê û afatan neçar bimînin...Ya rast, însan dîsa neçar mane, tu jî dişibî rastiya wan deman, mîna ar bi heybet mayî lê û lê ... av bi bin textikê te jî ketiye...



## ÇEND DÛRIKÊN KURMANCE YÊN DERRORA GIMGIMÊ

Cihê dûrikan: Gundê Înaq û Hecîbega Jêr

1. (Meta mi a delal, a dengxweş, hestiyar û bi lorîk Besê... Bi meta xwe re em li şaneşinê rûniştî ne (2014 havîn), ew dibêje ez lê dikim... )

2. Kurd qedrek mezin li dengbêjiyê digirin ji lewre dengbêjî hem wek huner, ji hukmê delaliyê, hem wek metn û qeydên bûyerên dîrokî muhîm in. Lê ku meriv li berên din ên çanda Kurdî dinihêre di wan beran de jî metn pirhêl in. Wisa ku mijar dûrikbin jî meriv bi qasî dengbêjiyê li dûrikan metel dimîne ku naverok, pirhêlbûn û alyê wan yê hunerî hewqas xurt in.

3. Di di vê dûrikê de rewşa kolonyal bi hukmek wisa tê derbirîn ku meriv diheyre:

“Merûyê bêxwedî

Axpîna nav gund e,

Her kes lê diçêre...”

Mesela çêrandinê çî wek rastiyek kolonyal çî jî wek arîşeyek tebaqên civakî di jiyana Kurdan de têgeheke muhîm e! Çêrîn hem bo rewşa zordarî û heqxwarinê tê bikaranîn hem jî îtiraz û qehrekê jî vedihewîne ku çêrîn ew têgeh e di jiyana ajalan de tê bikaranîn! Li vir xisûsiyeteke vegotina Kurdî dertê ku çiqas nerm û mehsûm xuya bike jî ji alî mehneyê ve kûr û bi derb e! Belkî ji alî sosyolojîk ve di heman demê de meriv li ser têgeha “sernerm”bûna Kurdan bifkire, lêbikole û şîrove bike!

4. “Keko qurban

Ez quling bûm

Narim çolê

Ez bûm ordega kor

Ketim binê golê

Mi dî ez ketim

Derê sawcî û qereqolê”

Heman mehsûmîyet, zelalî û bedewbûn di vê dûrikê de jî heye lê ku însan li jiyana Kurdan, li têtikiliyên Kurdan û hiqûqa serdestan ya di meriyetê de dinihêre, însan lê hay dibe bê ew dûrik çi qehreke bêeman e jî! Dûrik têtikiliya Kurdan û hiqûqê jî teşhîr dike. Meseleya “zêr” dizane çerçawa di meseleyên Kurd û gelên din de bi bandorbûye herwiha di meselên hiqûqî de jî “zêr” gelek arîşeyan hel kiriye! Lewre her kurdek dikare vê dûrikê xweş fehm bike bi dehan mînanan bide ku kesên bêhay û mehsûm di dozan de çawa hatine sûcdar kirin û ên bi “zêr” û bi “zor” çawa xwe jê xilas kirine.

5. “Ez çi gul im

Ne gulten im

Ta ji rihana boyaxsiz im”

Normal e ku kesên jiyana bejahiyê dijîn xwedî li surîştê dertên. Ta ji rihana boyaxsiz hunera modern îfade dike. Ya ku bala meriv dikişîne ev hawê derbirîna bitaqet e. Di edebîyata modern de jî taybetiyên sereke jê yek jî razberkirina zimên e. Li ser vî esasî jî Kurdî hewcedariyê lêkolînan e.

“Dilê hêlîna ser xencerê”

Li ser xencerê hêlîn! Ev taqeta zimên e. Ev xeyalek mihteşem yê berfireh e. Ev hêmayek muteşem e. Helbet derdê me ne ew e ku em bikevin parastineke teng ya çanda devkî û toreyê. Li vir mesele ew e ku di çanda me ya nivîskî de jî ber mercên heyî têtikiliya me û ziman gelek lawaz e. Heke ku têtikiliya me û ziman xurt be bi çand û hunera modern re wê hilberînek rengîntir û geştir derê meydanê.

6. “Xwezila dilê meta te

Qey deng nekira

Vê sibê min ê

Ji te ra defterekî vekira”

Her kurd bi halek wisa ye, naxwaze deng bike, naxwaze dest pê bike, naxwaze deriyê dilê xwe vebike...

Belê deftera her kesî heye, li vir şik û guman nîn e lê ku em wek defter li meselê binihêrin ew defter heqîqeten berên mihteşem in lê heger em wan defteran wek referans û çavkanî besî edebîyata modern bibînin ev xeletî ye. Çerçawa ku gelek kesan bi ajîteyên bi bîrxistinên klasîkên Kurdî re hewa û atmosferek afirandin û pey re her ketin nava halê dubareyî wisa îhtimal e nêzikahiyên şaş ên li çanda devkî me di çanda modern de têtik bibin!

Ji têtikiliyên nostalgîk bêhtir nêzikahiyên modern, ên ilmî şert in. Heke hûn hin dûrikan bixwînin weke helbest jî mihteşem in. Ev taqeta ziman û hêza xeyalê nebe sebeb ku destê me li berên hunerî ên modern sar be. Bî awayek çanda me ya devkî wek ava di golan d emayî ye, genî bûye. Destpêka me gerek ev rastî be. Mesele ziman be divê em ji wan golan d edest pê bikin. Taqet bi zimên bikeve da ku barê rastiyên modern hilbigire ku ew ziman di heman demê de îmkânên xwe alyê xwe yê hunerî gelek bi pêş ve birye, ev rengekî xurt yê Kurdî ye. Çi veşêrim ji vê hêlê ve ev ziman meriv serbilind dike! Ne wisa be kes ne li bendê ye ciwanek ku bi teknolojiyê re mezin bûbe rabe ji halê dilşewat û jiyana teng ya demên kevnare hez bike! Em ne bi navê pisporî profesyonelîyê, weke xwendevan, bo karibin zimanê xwe xweş û baş nas bikin gerek karibin bibin xwendevanek xweş yê tarîxa zimanê xwe. Pê re jî karibin bibin xwendevanek delal yê edebîyata dunyayê êdî ji wê pê de gavên me ên piçûk wê serbesttir bin ber bi edebîyata dunyayê ve.

7. "Dara nebirin

Dar dibin devî

Xwedê deviyar nahêle bê hêvî"

Wek gotina dawî, her ku mirov li heyatê bûye tu car xwe ji hêviyê nekiriye. Belkî ya ku di çanda devkî û ya nivîskî de her muhîm bûye hêvî ye.

DÛRIK

1.

Merûyê bêxwedî

Axpîna nav gund e,

Her kes lê diçêre...

2

Qelesa sora sosinî...

3.

Mi sond xwariye

Naçim çiya

Bala xwe bernadim çavkaniya

Emir ji wekaleta tirko hatiye

Dibêjin kurmanc herin çiya

Destê min şikestiye

Ji satilê

Koma bêriya

4.

Çûm bîngolê belekiya

Min berav rastkiriye

Bi guniya

Ezê vê sibê dişomê

Dilê rihet nabe

Çekê xal û xwarziya

5.

Qulîlek derbas bûye çûye

Çi silava li ser serîye

Min şandî oda mezin

Çar derî ye

Heta min xwe gihandî

Mektûva min çû

Destê xortê tûncik û temezî ye

6.

Çûm welatê hanê

Xerîbiyê

Berf barî ye

Li qama miyê

Ba'kî hatî ji alyê Wanê

Şewq û şemal daye Diyarbekir

Etegê Tetwanê

Ji xêra Xwedê ra

Mizgînkî bihata

Bigota

Qerara Kurda xweş danê

7. Keko qurban

Ez quling bûm

Narim çolê

Ez bûm ordega kor

Ketim binê golê

Mi dî ez ketim

Derê sawcî û qereqolê

8.

Wey bilbilo wey bilbilo

Tu nexwîne vê sivengê

Li baxçekê bê gulo

Xwedê rebî

Tucar tu miradê can û canika nekî bêdilo

9.

Kekê min sekinî

Li ser sergo ye

Qayîşa li piştê

Zo bi zo ye

Keko qurban

Min go hîv e

Te go ro ye

Berxêm çûye eskeriyê

Min qurbana bejna zirav

Bi tûncik û temelî ye

10.

Gul im gula li awakî

Gulam hêşînbûye li ser takî

Xwengê tu xwenga birakî

11

Min dil nedî bi dilcîya

Bizin nedî ye

Bi rengê mîya

Ez ê kesê negirim

Xên ji lawikê Hemîdiye

12.

Çi qulinga pelaza ye

Binê mala erd veda ye

Xwelî li serê xwenga bê bira ye

13.

Ez çi gul im

Ne gulden im

Ta ji rihana boyaxsiz im

Tirsam ji wî tirsê

Bikevim ber kotî

Mêrê heram

Berda birizim

14.

Dilê hêlîna ser xencerê

Berxêm tezbîyê dikşîne fena berê

Keko qurban dilê te nizam dilêm dîsa dilê berê

15.

Çi pismamo tilîfirî

Ji Helebê ka bikirî

Heta hato

Domam dayê

Qelin birî

Çi pismamo mixaneto  
Rêya bajêr li berketo  
Emniya qutya ne li rûyê  
Çiyo te li domamê  
Kir mineto

16.

Dar im dara di gelî da  
Bişkov daye di serî da  
Mirad xweş e di heftsalî da

17.

Çi paleko hal e hal e  
Hem diçine hem dinale  
Ji eybê xelkê neba  
Minê tirpana kekê xwe bida ser piya  
Heya mal e

18.

Înaq şewtê  
Bi şan û şîn e  
Vê sibê rakirine  
Xwêdanî ne

19.

Qolî Baba sûr e sûr e  
Toram qetya morî hûr e  
Keko qurban  
Bi destêm bigre  
Biavêje Vartoya jorîn  
Xalî te bibe xezûr e

20.

Çi zinaro şaq e şaq e

Min gul çinî  
Te kir baq e  
Qîzka kurmanc  
Lawkê reaya re pir lîyaq e  
21.

Xwezila dilê meta te  
Qey deng nekira  
Vê sibê minê  
Ji te ra defterekî vekira  
22.

Hawar delal  
Hawar delal  
Min da destê kekê xwe  
Tasa sipî ava delal  
23.

Mêrekî bi sed mêra ye  
Neku ta û tolazê ser xaniya ye  
24.

Dara nebirin  
Dar dibin devî  
Xwedê deviyar nahêle bê hêvî



## MALA BAZ, EDEBÎYATA LI BAKUR Û GOVENDA CINAN

Bo Mala Baz, kesên bi îdia, gotin, giran e! Dostên dilşewat gotin, belawela ye, heyfa xwe bi mi anîn! Dilsozên delal gotin, mamoste, ez berhema te dixwînim... Weşanxaneya mi bi kêfxweşî berhemên mi diweşîne! Welhasil, ên gotin ez dixwînim, bêdeng man! Weke berhemên dîtir, “berhemeke giran” diçe di tûrikan de dimîne!

Rojekê dilsozekî vê edebîyatê û dilsozên dîtir, ji bo bernamêyekê, di nava bîst û çar saetan de berhem xwend/xwendin, detay û pirsên herî balkêş ên di derheqê berhemê de sazkin...

Ew ji bo mi kêfxweşîyeke mezin bû çimkî delîl bû ku wextê pêşdarazî tunebin, dilxwazî û têkiliyeke durist bi berhemê re hebe çu xweşî û delalî têne pê...

Di romana “perde” de jî çîrokên wisa qewimîn, çû û hat çû û hat bi tevî gellek qîreqîr, “dafîk”, “aforoz” û “nefehmkirin û giran”bûnan dawiya dawî çend mirovên hêja rûniştin romanê nixandin, bawerim cara pêşî têkilî bi berhemên mi re datanîn û ti pêşdarazî bi wan re tunebû, çend gotinên xwe ên ji dil kirin...

Niyeta mi ne gazin in lê berpirsiyari ye ku meriv ji bo dîroka edebîyatê hin nişeyan lê bike.

Hûn û refên xwe, hûn û siyasetên xwe, hûn û pêşdarazî û nêzika-hiyên xwe ên wisa meşhûr ên edebî... Ez û mexdûriyetên vî welatî, vê coxrafyayê, ez û zimanê xwe (ne ku zimanê di devê we de bûye benîşt), ez û kevîrên bi ziman ên vî welatî... Li dunyayê edebîyateke têra xwe heye mirov li bendê ne bê em bi Kurdî bi jiyana Kurdî çu lêdikin, hewl didin çu tevî jiyana edebî a dunyayê bikin, wisa jî berhemên wisa bi we giran tînin; na, ne heyfa min e, heyfa min bi çu tî û bi çu nayê, ax xwezî meriv carna karibin destê xwe ji ser dilê xwe rabikin û çend gotinan bikin...

Bi tevî ava şîlo, gellek serêşyan jî ez ji we hez dikim çimkî mexdûriyeta we jî ne hindik e, sebeb belî ne, encam belî ne, bi tenê tengezar dibim ku çima di çareseriyê de rêyên cuda û ên nû nayên dîtîn bi gotineke din xwedubrekirin her ku diçe dibe sebebê arîşeyên mezin...

Em ji “Mala Baz” hatin vir, sala 1993 an de wextê mi dest bi nivîsînê kir ji serboriyên edebîyatvanên hêja, ji nivîsên mihtêşem ên

edebî kêm zêde mi texmîn dikir bê di edebîyateke wisa de çi tê pêşiya merivan ji lew re her carî û di her bêhtengiyê de mi rêyek nû dapêşiya xwe...

Ti sîyaset, ti ref, ti seknên teng û bi berjewendî ê nebin sebab ku ez xwe ji “edebîyata vî zimanî” bidim alî, rê û dirban li xwe wenda bikim!

Bi edebîyatê ez naxwazim “serê kesî wenda” bikim, hewl didim ziman, nivîs, edebîyat bibe sebab mirov hinekî balê bidin xweşiyê da ku “serê hev wenda nekin”! Cî ji dila teng dibe, birayên mi ên mexdûr, reben, ku bi qelemê re govenda cinan digerin, kêfxweşî ew e ku meriv karibe serê mirovan bilind bike ne ku xar bike, tune bihesibîne û bi wê derûniya malkambax hevudu reş bike, li ser maseyan mohra xwe li qelemên mirovan bixe...

Gotineke mi jî ji bo hin xaniman heye; ne kitêvên îdolojîk, ne gotinên pispore û zanayan ti kesî di rastiya jinan de, di ratsiya jinên Kurd de ez nekirim “demokrat”; di tava hîvê de wextê dayika min û jinên gundiye me ji bêriyê de dihatin û qise dikirin ji wê wextê de jiyana wan li ser dilê min û mejiyê mi rûnişt ji lewre Cîhan Roj wextê di edebîyatê de, di dehan çirokan de, di romanên de “jin” nivîsîn kêm zêde li xwe mukir bû... naxwazim li vir bi hin hevokan tesîr li kesî bikim lê hin paşperdeyên edebîyata merivan hene; bi tevî wêneyên Helebçeyê ên di ciwaniya min de bûbû sebab dunya li ser serê mi rûnê gellek wêne, çîrok hene ku bibin sebab wextê ez edebîyata xwe dikim hinek bi temkîn hinek fesîh tevbigirim weke gotina dawî û bi tevî hemî rastiyan nîyeta mi tune edebîyatê, edebîyata vî zimanî bikim qurbana ti tiştî...

Bila ev nivîs jî rojnivîska îro a facebookê be... Û wextê mi ev nivîs lê kir her “govenda cinan, halê daweta gur û rûvî” û fîgurên di wan govend û dawetan de li bîra mi bûn ne wisa be ji folklorên hêja bigire heya lêkolînerên gellek delal, qelemên bihemd ên edebî ne hindik in û ê ew ê bi awayekî rojekê bibin sebab da ev ziman û edebîyat jî bi ser rêya xwe bikevin...

Nîşe: Wêneyên li fûarê hatine girtin, hewl û sekna xwendevanan hêjayê hezkirin û hurmetê ye. Çi be jî bi çi awayî be jî herikînek heye ku hêjayê dilxweşiyê ye jî. Heger meriv li nivîsa li jor binihêre dibe ku ev gotin di valahiyê de xuya bikin berevajî, her kêlî û nerihetiyên di dilan de wextê dibin nivîs bi mehne dibin, însan dixwînin ew jî dibe sebab mirov li hin tiştan bifikire. Heger we heya vê hevokê xwendibe bi dostanî dibêjim vegere li derdora xwe binihêre û hevokeke nû a cuda bo roja xwe saz bike, hewqas basît, hewqas bi

xweşî û bi rihetî...

## ŞER PEYVAN GEMARÎ DIKE

Ev çawa çîrok e ku ji hezaran peyvan helbestek nayê pê. Çawa fotograf in ev fotograf; çîrokên wan dibin agir, hemî çîrok û helbestan dişewitînin...Çi deng e, çawa hawar e, zarok ditirsîn... Ji sibê heya êvarê merhemetek e ku serê xwe girti ye, here ku tu naçî!

Îro têgihîştîm bê feqîriya zor çî ye, bûme feqîrê peyvan; ger hûn bê peyv bin, di şer de feqîrê herî mezin hûn in... Ger ku peyvên we tunebin, hûn mane bêqedir û bêqîmet! Fotograf, deng û hewar, di şer de, peyvan digirin û dibin... Her dera hiş bêpeyv, xalî dimîne, di dil de peyv namînin...

Gelo ji vê xirabtir tiştekî din heye di jiyandê de; hûn nikarin ji bo peyvan bi ser rê û dirban bikevin... Di şer de, bexçê peyvan nîn e; helbest mat dimînin, çîrok fedîkar, roman hevokên xwe vedişêrin û naxwazin werin dîtin... Şer peyveke sar e; dêwên çîrçîrokan, agirê cehnemê, halê bimetirsî ê çûçîka çolê digire û tîne... Ku şer hebe, peyv dibin koçber... Bi tenê di demsala aşitiyê de, peyv bi bask dibin, ji bo çîrokên we, dangan tînin, reng didin helbestên we...

Û meriv hewl didin daku bêhêvî nemînin; peyv koç bikin jî, ji ber ku kevirên peyv veşartin e hene, hûn sebra xwe tînin, zarok hene li sikakan, dilê dayikan warê peyvan e, hûn dibêjin ji xwe re û hewl didin hevokan saz bikin...

“Çîroka her kesî heye”, bînav e-piranî jê- halbukî... Çerçawa çîrokên her kevirî bînav in... Û li kêleka lingên bi birîn peyveke ku bûye pêgîra kelaman, peyvek li erdê, çîrokekê dihêle li xakê, dibe fotografek, peyvekê dişîne bêzemanbûna kêliyê...

Peyvek, dimîne bo demsalekê, ku hevoka ji alî kilaman ve ji bo wê hatîştin bi bîr tîne;

“Hey azadî!”

Hûn xwe li wan dangan digirin ku bo birîna keviran bûne hubur û diherikin, bêpeyv... Çerçop, ba, hewr...Tiştek, tîştek bi we bigire û we ji wê çîroka bêpeyv, binalet û sar rizgar bike...Di kêlîkekê de hûn dixwazin tîk biçin; tîkçûyîna kesên şer nakin, agir bi canê merivan dixwe tîkçûyîna kesên ku bi nihêrîna zarokan dibin temaşevanên şerî, bêy xeyal dihêle, bi stûxwarî dişîne lîskan...

Em şahid in, jê haydar in em, lîska herî xweş e wextê meriv dibin çerçiyê peyvan, qîrîn, di wextê bêşer de, peyvên ku bo eşqê, bo

xeyalan û b azadiyê meriv li ser dezgehê radixe...

Şer cil û kincên peritî ên jiyane ye, ew nexweşî ye ku rengê soremor daye wechê zarokan û ew kevir e ku kesan dane ser dilê xwe... Peyv di destên helbestvan de dibin pîne, dixwaze şalekî bidirû... Peyv dengên di lîskan de ne, bes e ku rengê soremor biguhere... Û peyv dest in, destên ku nayên dîtin, radihêjin keviran da bo dilan bibin perûbask...

Û bêyî were pirsîn ma anîna hewiniyê têkçûyîn e, bi peyvên bêyî perûbask mane bêyî meriv li deriyê xwendevanan bide, wisa rawestîn...

Eman, bila her kes bibihîze!

Şer peyvan gemarî dike...

Ji bo têkçûyîna kesên şer nakin li peyvan tê gerîn, bêyî were zanîn bê kî zêmarên wê bi deng dike... Êşa têkçûyîna kesên şer nake mezin e... Çimkî ên sîvil wextê têk diçin ên fermî biserdikevin! Şer "fermî" ye, di her wexta zemên de...

# **AZADIYA XWENDEVANIYÊ ‘TIRSA TAXÊ’ Û MERCÊN REXNEYÊ**

1

We ji kitêvekê welew helbestekê, çîrokekê hez kir, yekî rabû ji we re got, “Nivîskara/ê wê wisa ye, awha ye, filan û bêvan, “

We ji dosyayekê hez kir, ji berhemekê hez kir, we qerar da hûnê wergerînin, yekî rabû ji we re got, ma êdî kes nema tu berhemên filankesî wergerîni, filan û bêvan...

Heger hûn bêjin, “ehmeq, gellek nivîskarên Ewropî hene bê jiyana wan çawa bûye lê ji bo navê wan av ji devê te diçe, tu radibî dibêjî, a muhîm berhem e, lê wextê mesele tê edebîyata Kurdî hûn çima berevajî tevdiagerin”, heger hûn karibin wê bêjin, hûn dostê edebîyatê ne, na ku hûn bêdeng bimînin vegezin pîrsekê ji xwe bikin û bêjin, gelo ez di xwendinên xwe de çiqas azad im, ez ji azadiya xwe hez dikim an na!

Bi dubareyî dibêjim, gellek feraset û qelemên vî zimanî hene jî in, hêja ne, lê li ber “pêkutiyên taxê” an jî li ber êrîşên ji qebûl, ezber û bi hewla reşkirinê nikarin xwe biparêzin, neçar dimînin “bêdeng” bimînin, di vê meselê de çendî serpêhatî û çîrok hatine jiyîn...

Kurd dibêjin, “Kesê bêkesan Xweda ye”, di edebîyatê de jî, “kesa bêkesan dîsa edebîyat e”, ev e payîz e, pel diweşin! Heger di mercên wisa de meriv karibe “tenêtiyê” bibijêre ew ne tenêtiyê ye, azadiyê ye.

2

Dixwazim hin nîşeyan lê bikim ku bo zemîn û mercên rexneyê muhîm in. Kesekî beriya çend rojan tevî rûpela mi bû. Pîrsekê bo helbesteke mi kir; “Kê hûna ye?». Mi li rûpela wî nihêrî. Helbestên ku tê de beş û hevokên hêja hebûn bala mi kişandin. Weke jêstekê, mi ji helbestên wî tablo ava kirin ku ew tablo jî hevokên wî bûn. Xwezî mi ji bîr nekira ku qad qada sanal e, ev yek, a din, divê mi ji bîr nekira ku gellek kes bi qasî zerika hêkê hasas in.

Piştî hêrsa wî daket, li pey meh û salan ê ewê ji a xwe gellek poşman be, heta feyde ji wê xebatê bigire... Kêliya hêrsbûnê de mejiyê merivan, tewrên merivan bê kontrol in, di wê kêliyê de Kurd her xirabiyê dikin, di kêliyên wisa de mêr kuştin e, pey re tene ser hemdê xwe û mehsûnî, neçarî û xeletiyên kirine dibin sebeb biêşin,

xwe merezarî bikin... Qenebe meriv karibe hinekî ray li xwe bike di kêliyên wisa de, bisebir e, pey re bi awayekî fesîh bifikire dîsa heger hebe meriv dikare gotina xwe bêje.

Mi nîyet kiribû bi wî terzê (bo balkêşiyê) min ê hin helbestên kesên cuda bikira mijar û min ê ji helbestên wan dîsa bi hevokên wan tablo welew helbestên nû ava bikirana, bi gotineke din, xebata/paqijiya ku wan nekiribû an jî ji bîr kiribûn min ê bikira! Ka, li ku ye kes wê îhtimalê lê bigirin ku mirovin nîyetbaş jî hene, dilsozên vê edebîyatê jî hene... Gerçî meriv têdigihije, di jiyane de kî rabûye hêrişî Kurdan kiriye, kurdan bi xwe jî her hêrişî hev kirine û hê jî berdewam e ji lewre di edebîyatê de jî her gotin weke hêriş tê dîtin, tê qebûl kirin... Di rewşên wisa de, helbet ne li benda rexneyê û rexnegiriyê bin, bi tenê (çi ji neçariyê û ji tirsê be çi jî weke tercihekê be) bes li benda şelafiyê û şelafgeran bin, mixabin! Di civakên totalîter de di her warî de rastiyeke e!

Vêca piştî hewqas salan nîyeta mi tune şelafiyê bikim, ew hêviya ku ji me tê kirin da ku em carna di derheqê edebîyatê de çend gotinan bikin, ez ê wê hêviyê bi cî neynim, çimkî karê edebîyata bi sêwirîn têra xwe ye ku ez pê re mijûl bim!

Helbet ê şewaza rexneyê jî were rojevê, belê ew jî rastiyeke e lê weke Mawlana gotî, 'a muhîm ne ew e bê we çi gotiye a muhîm ew e a/ê li hemberî we çi jê fehm dike', heger meriv li gorî gotina Mawlana tevbigere di vê sedsalê de, di edebîyata Kurdî de safîkirina hin meseleyan gellek zehmet e dîsa jî bila canê her kesî sax be, dîsa bêyî sebrê, bêyî hewldan û hêviyê tişteki ku bibe çare nîn e. Belê bo edebîyata neteweyekê şewaza romantîk bo klasîkan bo referans û daneheva edebîyatê, bo nifşê nû rastiyeke e, ez bi xwe jî nivîsên wisa dişopînim, bi kêfxweşî portre û berhemîn hêja dinasim lê ez bêhtir edebîyata modern exlebe a ku di dema me de dişopînim, dixwînim ji lewre jî di wî warî de an jî di wê çarçoveyê de wê heq û hedê didim xwe da ku hin gotinan bikim.

Heya mi nivîsê qedand mi çiqas gotin avêtin dera ha, mi çiqas xwe li sebrê û li hewîneriya edebîyatê girt, çi xweş e ku mi warê edebîyatê nasî, edebîyat derman e jî...

### 3

Gotin gotinê tîne, piştî mi beşa duyem nivîsî tişteki hate bîra min! Vêca meseleyeke din jî zelal bû; beriya çend salan min kesekî gellek delal nasî. Ew helbestvan bû. Min rabû helbesteke wî a gellek hêja lê bi arîşe bijart. Ez li ser wî helbestê xebitîm, ji hevokên wî û ji helbesta wî sê heb helbestên delal hatin pê. Navnîşana wî li cem

min tunebû. Bi rêya nasekî wî min ew xebat şand. Ne deng bi wî ket ne jî bi nasê wî! Vêca bi ihtimaleke mezin meriv dikare heman tiştî jî bo wî/wan jî bêje ku ew bi hêrs ketine!

Bi vê minasebetê bêjim, ez ne ji wan meşhûran im, bi qalib û gotinan, sabûnê biavêjim ber lingê kesan! Niyeta min tune bi durîşme, bi qaliban sira “meşhûrbûna xwe”di serê xwendevanên niyetbaş de ava bikim ku hewlên wisa rebenî ne... Vegerin û lêbikolin, ew kesên ku sabûn li ber an jî li bin lingên wan bûn peyderpey çawa têkçûn an jî ji afirîneriyê dûr man...

Di Kurdî de tê gotin, meriv kêrê li birînê bixe an jî bibe melhema devê birînê, lê xuya ye kes qayîl in meriv behsa “çîroka birînê bike” da ku hêsir, melankolî, êşa ku em dîl girtine were strandin, belê rastiyeke wisa tê jiyîn lê ew ne edebîyat e, ne edebîyata modern e, ji edebîyat modern gellek gellek dûr e, meriv nêzikahî, xwî û xisletên çanda devkî bike nivîs ew nabe edebîyat!

#### 4

Çima çendekî ye li dora helbestê diçim û tîm?Çimkî a ku ziman hêzdartir û delaltir dike helbest e, taqeta helbestekê taqeta wî zimanî ye, zimanê neteweyekê bi helbesta edebîyata wî neteweyî, heya radeyekê, tê terîfkin...

Gellek helbest mîna zarokên di nav tîl û devîyan de bin, xwîn jê diherikin! Pêşî zarokan/helbestan ji wî halî rizgar bikin pey re hewl bidin birînan derman bikin, sax bikin, bi tenê li cîyekî divê meriv hasas bin, li xwe mukir werin ku ji bo rewşên wisa meriv xwe weke doktor nebînin, a muhîm ew e ku meriv çareyan bibîne ku zarok nekevin wî halî ku ketin wî halî, gerek meriv dermanê doktoran bi kar bînin; doktor danehevên edebîyatê ne ku jê re dibêjin ‘edebîyata dunyayê’, derman jî bi hezaran kitêv in!

Em ziman û hunerê nekin qurbana hestên xwe ên kêliyan û her wiha divê meriv şiyar bin ku hestê merivan jî ji ber kêmaniyên zimên nemirin, bêqîmet nemînin...



## MEHMED UZUN: ÇIROKEKE DIRÊJ A NIVÎSKARIYÊ\*

### Beşa 1'em: Tarî mîna nivîsê nivîs mîna roniyê

Li ser piyan, li hev çûm û hatim; nivîsîna di derheqê Mehmed Uzun û di derheqê edebiyata wî de bi rîsk bû ku bi qerareke wisa re, ê mirov biçûna û li ber textê kişikê rawestiyana, sebab û niyeta mirovan ji wê çûyînê çiba jî gerek mirov secîh tevbigeriya çimkî yek ji lîstikvanê kişikê her Mehmed Uzun bû/e, ê li hemberî wî, bi îhtîmaleke mezin, reqîbek ezeli bû/e wexta mirov li taxa edebiyata kurdî li meydanê be! Wekî çareya ku di eslê xwe de neçarî ye, gerek mirov an bibe temaşevanê lîskê û bêdeng bimîne, an jî wekî alîgirekî tevbigere ku ew alîgirî an alîgiriya Mehmed Uzun e an jî alîgiriya reqîbên wî ye!

Qebûl dikim, ew lîsk bi feraseta Uzun a di warê dîplomasiyê de, bi cîdiyeta wî ya lênihêrîna li edebiyatê re, bi hewes û armancên wî re, bi rastiya nivîskariya wî re, mîna ku her hatibû sêwirîn! Mirov bi rihetî dikare bêje wekî hewla temsîla avakariya edebiyatekê, taqeta sêwirînên wî yên di wê qadê de, ji feraseta sêwirînên romanên wî serkeftitir e! Heger mirov pragmatîst be mirov ji rexneyê bêhtir dikare ji bo wê ferasetê li çepikan bide ku ew feraset, hewl û têkiliyên wî bûne sebab edebiyata romana kurdî di nav dewletan de were nasîn û gengêşîn. Bi gotina Îbrahîm Seydo Aydoğan, ew bûye sebab romana kurdî populer be.

Helbet ê karê min zorbûya, li hêlekê nivîskarekî ku bi gengêşî, bi hewl û nivîskariya xwe bûye sebabê pêşveçûnan, nivîskarekî wisa ye ku li hin dewletan têra xwe hatiye nasîn, di derbarê wî de gelek qebûl hene li alî din jî ew nivîskarekî edebiyata zimanê min e, ji bîst salî vir ve ye berhemên wî dixwînim, nivîsên wî dixwînim, nivîsên di derheqê wî de dixwînim û pirî caran bi hewl bûm bi bîr bixim, bêjim, heya romanûsiya Mehmed Uzun neyê gengêşîn, li bakur, di edebiyata kurmancî de ê gelek alî kêm bimînin.

Li alî din jî gengêşiyên di derheqê wî û edebiyata wî de, bi awayekî, mîna warekî bi mayîn e ku hin mayîn ên rastî bin hin jê jî ên qestî û xapînok in!

Me behsa lîsk û alîgiriya kir, wekî li jor hate bibîrxistin, li taxa Kurdî li derdora nivîskarên bi Tirkî dinivîsîn, belkî mirov bêje têkiliya wan a bi Kurdî re qels bû ew bi sekna xwe têne pêş mirovan, alîgirî

û reqîbiya siyasî tê pêş mirovan, polemîk û gengêşiyên ji qebûl, ezber û dubareyan ên derheq edebiyata wî de têne pêş, gengêşî û tespîtên li cî têne pêş, a herî zor ew e ku kesên ku navê wî her ji bo ranta navê xwe anîne rojevê û pê re jî kesên ku ji bo navê xwe dijberiya wî a sert a siyasî kirine tê pêş mirovan...

Wexta min hewl dida ez qerarê bidim romana wî “Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê” li hêlek hişê min bû (ku beşa sêyem a vê nivîsê ê di derbarê wê romanê de be) ku gelek nêzikahî û dîtînen Uzun ên sosyolojîk, tarîxî ên di derheqê kurdan de vedihewîne ku hin jê rast bin jî hin jê wekî nêrînen çavekî ji hundur ên kêr û bixelet in! Ew nêrînen wî dibin sebeb mirov bipirse bê gelo têra xwe ji bo romanên xwe û bo kurdan, jiyana wan lêkolîn kirine an na?

Min sernavê nivîsê bi saya navê wê romanê saz kir, peyva tariyê di romana wî de xirabiyê îfade dika ku ê di nivîsa min de “tarî” wekî şevbûya, şev jî wekî nivê jiyane bihata dîtîna ku bi alî başî û nebaşiyên xwe ê nivê jiyane ba, ew jiyane jî li gorî dîtîna û sekna kesan biguheriya.

Mîsal, bi awayekî hestiyarî, mirov dikare bêje, çi xeletî û kêmaniyên wî hebin jî gerek mirov biavêje bin lingê xwe çimkî Uzun kesekî wisa ye ku bi keda xwe, bi hewla xwe bûye sebebê gelek gavan... Ne nêzikahiyeye ji rêzê ye û rastiya gotînen wisa heye lê meseleyên edebî hene li meydana, li welatên dîtîr nivîskar û nîşan gav û edebiyata berî xwe dane ber lêpîrsîn, gengêşî û rexneyan wisa pêş de çûne ku carna mirovên wisa meşhûr dane ber rexneyan ku ji bo hinan mirov diheyire bi ferqekê wexta wan rexne li kesan girtine rexneya wan jî dibe sebeb mirov hurmet li kesên rexnelêhatî girtin bigire. Ew xal jî bo min gelek muhîm e ku ez ê di vê nivîsê de ji wê hêlê ve baldar bim, hewl bidim ê nivîsa min li hêlekê bibe sebeb da detay û taybetiyên qelema Uzun careke din, bi awayek fesîh werin bibîranîn li alî din jî rexne û dîtînen min ên di derheqê edebiyata wî de bibin sebeb da hin xal û taybetiyên edebiyata me werin bibîranîn...

Bi kurtî dibêjim, heke textê kişikê şert be û ji taqeta min derê an jî ez di hin xalan de neçar bimînim ku bi lîstikvan û temaşevanan re bibim mixatab ez ê hewl bidim textek piçûk ê kişikê di nav vê nivîsê de têxim bin çengê xwe, bimînim li benda xwendevanên dema me, heta caran ez ê bi kêfxweşî xwe bidim alî da ku xwendevan û edebiyata me û nivîskariya Uzun berhemên wî bilîzin...

A ku ez hêvî dikim û ez ê bi hewl bim, bi bîr bixim, em ê maf û azadiya xwe bikarbin, bi tercîh bin ji bo rê û rêbazên edebî ku em

dikarin bi deng bikin di edebiyata kurdî de ne şert e textê kişikê hebin; xelîçeyeke edebî a ji dena avî wê baştir be, bila çavên me her li xelîçeyên wisa bin, xelîçeyek ji berhem û nivîsan her hebe; wê bi her dilopê re tişt ji wê xelîçeyan biguherin û kesin fotografê xelîçeyê bikişînin û hilawêsin, kesin şîroveyên xwe ên di derheqê xelîçeyê de binivîsînin û her dubare bikin, kesin rahêjin çoyê xwe û xelîçeyê tevlîhev bikin... Xelîçeyeke ji reng û boyaxên edebî şikil-girtî...

Mehmed Uzun ku pê re coş, manîpûle, ajîstasyon, rastî têne bîra mirovan. Mehmed Uzun ê ku haydar bû “edebiyata dinyayê” çî ye, her hewl dida wê edebiyatê bike lê bi dehan salan ji warê zimanê xwe dûr û bi wê îdîayê bû ku wî, bi wî zimanê dîr mayî yê kêr, ê teng berhemên li ser rêya edebiyata dinyayê biafiranda! Êşên nakokî û rastiyên wisa bînin ber çavên xwe hûn ê texmîn bikin bê ji derî êşên milletê wî êşên edebiyata wî ne hindik bûne. Belkî, rewşa li Swêdê, derfet û îmkânên li wir, zemîna bi demokrasî, desteg û derfetên lêkolîn û xwendinê dibûn sebeb êşên wî kêmtir bin lê heke ji min were pirsîn bêşensî û astengiya herî mazin a li pêş nivîskariya wî ew bû ku ew bi dehan salan ji zimanê xwe dûr bû ku di romanên wî de ji arîşeyan jê yek ew e ku ji Kurdî bêhtir bi Tirkî hatine fikirîn wisa ku wî nivîsên xwe yên pexşanî-çeribî bi tirkî nivîsîn, wexta di hevpeyvînan de ji bo wê rewşê pirs jê dihatin kirin wî bersivên wisa didan ku mirov nikare bi wan bersivan çanîh bibe, rastî ew bû ku ew ji welatê xwe û ji zimanê xwe dûr bû, peyv û zimanê di bîra wî de têrî pexşan-çeriban nedikir!

“Lê rawest navê, ew divê zûtirîn wext bi cih bin. Ew nikarin tev-dîrê ji dest berdin...” (Ronî mîna evîne tarî mîna mirinê, rp. 38) Wekî ezberê, bêyî lêkolînên berfireh mirov nikaribe bêje wî romanên xwe, bi tirkî, pêşî di hişê xwe de nivîsîne, saz kirine, lê mirov dikare, bi rihetî, bêje, ji ber sebebên dûrbûna ji welatê zimên, tesîr û sazî-rîna zimên a “zimanê romanên wî” a bi tirkî ne hindik e!

Li derî mijarê be jî em dikarin bi bîr bixin belkî bidin berhev û bêjin, kesên li welêt nivîskarî dikirin ji derftên li dîasporayê, exlebe ji derfetên wekî ên li Swêd, bêpar bûn lê li warê zimên dijîyan, her geşedanên di zimên de ji bo wan dibû derfet. Li hêlekê Uzun û kesên wekî Uzun bi hewl û bi bîrxistinên xwe balê didan “edebiyata dinyayê”, ew dianîn rojevê, girîngiya edebiyatê dianîn rojevê, balê didan azadiya qelemê û kesên li welêt jî bi zindîbûn û zengînbûna zimanê xwe (ji rewşa heyî helbet arîşeyên modernîzebûna zimên li wir jî ne hindik bûn) derfetên zimên geştir dikirin ku edebiyata li Kafkasyayê jî li milê xwe gelek derfet pêşkêş dikirin bi tevî keda li

diasporayê a li gelek deveran, klasîk û mîrateya edebî... bi awayek hev temam dikirin. Ji bo warê romanê jî, piştî Erebê Şemo, Heciyê Cindî, Îbrahîm Ehmed, Uzun ew romanûs e ku şêwaza xwe bi dest xistibû, ferqa wî ew bû ew wekî avakarekî tevdigeriya, ka ji bo zimanê kurdî an jî romana kurdî avakarî tê çî mehneyê, heya ku rasiyên wê hene ew mijarên nivîsên dîtir in.

Mehmed Uzun ê ku sirgûnek siyasî bû, ji wê sirgûniya xwe her bi xeyala “welatekî piçûk” ê edebî bû. Ne rihet e ku mirov kumê xwe ê siyasî (ku siyaseta di salên heftê de a qada siyaseta kurdan de, hem jî wekî berpirsiyarekî kovareke siyasî) deyne hêlekê û xwe li edebiyatê bigire, karibe xwe biguherîne û takekesiyê derxe pêş. Têkoşîna wî ya li hemberî xwe balkêş e. Aliyek serkeftina wî ya herî muhîm e.

Ji zemîna dilê xwe ya helbestvanîyê, mirinê wekî sirgûnekê dibînim. Mehmed Uzun, ji welatê xwe wekî sirgûnekî siyasî dîr ketibû. Li welatê xwe, ew wekî sirgûniyekî edebî hate oxirkirin. Ji bo me edebiyatvanan wisa bû qenebe. Di wexta şer û pevçûnan de helbet me şahidî dikir ku di rabêjên siyasî de her alî û her kesî dixwest “Mehmed Uzun” ê ‘wî’ be, ê ‘wan’ be!

Ji bo pevgirêdana beşa duyem ku ew ê bi awayek berdewamî be, hin detayên dîtir ên edebiyata wî bin, rabêj û dîtînen wî bin, bîrxistin bin ku yek jê ew e û balkêş e ku dîtîna û nihêrinên Uzun ên berî meşhûrbûna wî û ên li dû meşhûrbûna wî, ên li roman û edebiyata kurdî, di hin xalên muhîm de, li hev nakin, berevajî hev in!

Aniha em ê serî li qalibeke ji folklorê bidin ku Uzun jî di romanên xwe de bikardianî:

‘Bila ev aniha bimîne li vir’... Ka em binihêrin bê wekî din qe çî bûbû çî nebûbû!

Nîşe: Sed Xwendevanî bang kirin, dibêjim sed xwendevanên kurdî, de hesab bikin... Li xwe mukir tîm ku heyecana bi min re ne hindik e, ne mihnet û hesabên piçûk dikim, hewl didim xîtabê dengê wan bikim her wiha bihestiyarî tevdigerim ku bila ji bo wan bibe moral da ew bêjin, her gav, her xebat û bang, bi awayek, digihîjin mexseda xwe, divê mirov serbest be, bê yî metirsî be...

Ka bo beşa duyem û a sêyem ez ê karibim bi çî taqet û bi berdewamiyek çawa werim pêşberî xwendevanan...

## Beşa 2'yem: Mehmed Uzun û Siya Qelemê

Ji bo dirêjbûna vê beşê, ketibûm nava wesweseyan. Kêlîkekê mi go, ji bo gellek rastiyên di derheqê gotin, sekn û tarîxa nivîskariya Uzun de, meriv pêşniyarekê bike bes e, ew jî ew e ku xwendevan karibin kitêva ji nivîsên Uzun hatî pê a bi navê “Hêz û Bedewiya Pênûsê” (Weşanên Nûdem, 1993) bixwînin, pey re jî pexşanên wî ên piştî salên nodî û du hezarî bi tevî hevpeyîvînan bi wî re hatine kirin, nivîs û analîzên bo romanûsiya wî bixwînin... Tevî bîrxistineke wisa, derfetê bide mi daku nivîsê kurttir bihêlim jî, pêdivî bi jêgirtin û bîrxistinê heye bo zelalbûna hin xalan.

Em ji nivîsên Uzun tê derdixin, beriya salên nodî, bi armanc û hêviyên xwe, Mehmed Uzunek heye, bi nihêrîn, fikir û nivîsên xwe ên di derheqê Kurdî û edebiyata Kurdî de, piştî salên nodî, bi gotineke din, di dema ‘hewlên îşakirina romana Kurdî’ de, Mehmed uzunek din heye! Bo hişyarkirina Îbrahîm Seydo Aydogan (ku wî gotibû ji berhemên Uzun bêhtir navê wî dihat gengêşin) li bîra me be, ez ê hin jêgirtin û bîrxistinên salên nodî û du hezarî bi bîr bixim, pey re bîrxistin û jêgirtinên beriya salên nodî lê bikim, belkî ji navê wî bêhtir, sekna wî a nivîskariyê, berhemên wî, pêvajoya nivîskariya wî were bala xwendevanan.

Weke nîşeyekê, em bi bîr bixin ku nivîskariya wî, romanûsiya wî bêhtir di Tirkî de dihat gengêşin ku wê wextê pirsên wisa ecêb jî hebûn li derdorê:

“Gelo Kurdî heye?”, “Gelo mimkun e ku bi Kurdî edebiyat were kirin?”, “Gelo romana Kurdî heye?”...

Em ji hin bersivên ku ji alî Uzun ve hatine dayîn dest pê bikin:

*“Wexta mi dest bi nivîsê kir, Kurdî ne ew ziman bû ku ji alî civakê ve were qebûl kirin, asta axaftina bi Kurdî ewqas bi sînora bû ku peyvên ku malbata mi pê diaxivîn li derdora 150-200 hebî bûn. Bi devokên cuda, mi hewl da zimanekî kurdî ê modern biafirnim.”*  
(Bersiva ku Uzun dabû ‘Afp’ yê)

Divê bi bîr bixim ku her jêgirtin an jî gotin û bersivên Uzun hêjayê şîrove, analîzan in û her yek jê hêjayê nivîsekê ye ji lewre ez ê li vir hewl bidim şîroveyên xwe ên di derbarê wan de, bi berfirehî lênekim, hem ji bo metirsiya di derbarê nivîsê de şert e bê nivîs dirêj nebe, nebe mîna gilok ku têra xwe ê ji beş û nexşên cuda were pê! Belkî bi wî awayî nivîs biba sebeb xwendevan li bîra xwe, li têkiliyên xwe û zimanê xwe, li gotnên hatî kirin bifikirin, bi awayekî zihnî tevî vê xebatê bibin.

Di hevpeyîvîna bi Fawaz Husên re hatî kirin (1999) Uzun wisa gotiye:

*“Meriv nikare bêje ku beriya min, li Tirkîyê, romana Kurdî hebû û hejmara kitêbên ku bi Kurdî hatibûn nivîsîn bi qasî tiliyên destekê bûn. Tradisyoneke Kurdî ya edebîyata modern û romanê tunebû. Herwiha zimanekî edebî yê modern li ber destan nîn bû.”*

Di kovara bi navê “E” de (sibat 2000) Uzun wisa dibêje:

*“Zimanê edebîyateke modern nîn e, dibistan nîn e, sazî nîn e, hêman û saziyên ragihandinê nîn in, cîhana wî a entelektuelî heya tu bêjî lawaz e û berteng e, wergerên wî nîn in, bazara wî nîn e...”*

*Bi yekcarî, ti fêdeya wî nîn e...*

*Nivîskarên wî ên heyî jî nikarin ji koloniyên xwe ên piçûk derbikevin. Û li Tirkîyê, hîç toreyê romana Kurdî nîn e. Di nav hewqas tunebûnan de mi tercîh kir bi Kurdî binivîsînim.”*

Di Rojnameya ‘Perşembe’ de bersiva wî bo Günay Aslan (2000) wisa ye:

*“Îdiya ku tê kirin da ku min xwe weke bavê romana Kurdî diyar kiriye îdiayek bi duquruşan e. Ne ew wexta min heye bo dîtînen wisa beredayî ne jî bi wê erzûyê me.”*

Û em ji kesin dîtir jêgirtinan bikin:

“Romaneke ku bi zimanê wan mirovan hatî nivîsîn tunebû. Aniha pêrgî romanên tînan ku bi zimanê wan hatiye nivîsîn û li wî (Uzun) xwedî derdikevin.” (Huseyin Elçî, Diyarbakir, 2000)

Bo nêzikahiyên nivîskarên biyanî, gotinên Anneli Jordahl balkêş in (Göteborgs Posten, 18 Eylöl 1994):

*“Weke nivîskarên Kurd ên dîtir Uzun jî di nivîskariya xwe de rewşeke ters a bi seyr dijî; welatê xwe ji dest da lê li derveyî welatê xwe zimanê xwe ê zikmakî qezenc kir... Di mijara, weşandîna edebîyata Kurdî de em li dunyayê yekemîn in lê, hejmara Kurdên ku li Siwêdê dijîn bîst hezar e. Bi qasî deh weşanxaneyên Kurdî ên li Siwêdê, ji hemî dunyayê bêhtir kitêvan diweşînin... Kurdî li cîwarê sirgûnê li ku ye ronansa xwe dijî...”*

Mehmed Uzun jî li Siwêdê bû, li Tirkîyê berhemên xwe nedîvîsîn ku wî her behsa “tunebûnan”kiriye! Li ser wê fikrê me ku di dewsa polemîk, manîpûle çoş û hin nêzikahiyên din de ger tîkiliya wî û berhemên wî bes bihata gengêşin ê ji bo zeman çêtirbûya. Ew rewş dibû sebeb ku wexta ew saxbû hestekê, hesta serkeftinê bijî,

belê heq jî kiribû lê di ser mirina wî re nêzî donzdeh sal wext derbas bû, di qada Kurdî de têkiliya bi berhemên wî re ne ew têkiliye ku, bi navê edebîyatê, meriv jê razî be, wisa ku yek ji nivîskarê ku ji nivîskariya wî razî û her behsa wî dikir Şeyhmus Diken e ku ew, her sal, di dîroka mirina Uzun de bi hawar, bi gazin û bi qêrîn e bê çima kes li hemberî Uzun û edebîyata wî bédeng in, belê, heqîqeten çima? Pirseke hêja ye...

Em du heb jêgirtinên din bikin ku wexta kitivên wî bi Kurdî û hema bi Tirkî dihatin weşandin dibûn mijara nîqaşan. Yek jê gotinên Muhsin Kızılkaya ne (16 îlon 2013 Rojnameya Star)

*"Edebîyata Kurdî edebîyateke sirgûnê ye. Li sirgûnê hatiye pê, pey re bi saya wergera li Tirkî vegeyriyaye welatê xwe. Navika Tirkî û Kurdî bi awayek ecêb bi hev ve ye. A ku edebîyata Kurdî, Kurdî li dunyayê vekir Tirkî ye. Ji Tirkî li zimanên dîtir hatiye wergerandin. Yek ji bavê avakariya romana Kurdî Mehmed Uzun e û a ku bû sebeb ew bibe Mehmed Uzun, ew e ku romanên wî li Tirkî hatin wergerandin. Ew di destpêka salên nodî de bi saya min bû..."*

Ya din jî fikrên Ismail Beşikçi ne ku bo gengêşiyên wê wextê muhîm in:

*"Ez di demeke kurt de bi wergerandina wan a Tirkî re biguman im. Ez nizanîm ev rast e, an na, bi şikûguman im"* Kovara W, hej. 13, 2007

Bo dîmeneke giştî em dikarin jêgirtinên ji destpêka salên nodî û beriya salên nodî bi bîr bixin ku derfetên xweş didin bo rêveçûn, bîr û baweriyên Uzun yên bo nivîskariya Kurdî û romanûsiya wî.

Ji gotinên Fîrat Cewerî (ji pêşgotina Hêz û Bedewiya Pênûsê):

*"Ne ku berî Mehmed Uzun bi Kurdî roman nehatine nivîsandin. Bele, hem berî wî, hem jî piştî wî romana Kurdî hatiye nivîsandin. Lê cihê Mehmed Uzun yê taybetî ew e, ku ew hem nivîskarekî berdewam e, hem jî romannivîskarekî hevdemî ye. Ew bi motîv û dîroka rewşenbîriya Kurdî, carna di bin tesîra ûslûb û stîla Carlos Fuentes de dimîne, carna jî mirov di romanên wî de şoperiyêd Faulkner rast te. Ew qîma xwe bi edebiyata basîd û rojane nayne, bi xurtî li dû qaîde û uslûben nûjen diğere. Ji ber ve yekê ye ku ew pir dixwîne."*

Di hevpeyîvîna Abdullah Keskîn a bi Uzun re hatî kirin (rojname Welat, 1992):

*"Zimane Kurdî xurt û dewlemend e. Eger ew ne zedeyî zimanen cîranan be, ne kemi wan e. Bi tenê em bikaribin û hewl bidin ku bi*

*zimane Kurdî bixwînîn û binivîsin. Bingeh û hîmen esasî yen zimane niviskî yê Kurdî tamam in. Giramera kurdî heye. Qayidên nivisîn û xwendina Kurdî hene. Celadet Alî Bedir-Xanê gorbehîşt ev hemû, bi xebateke behempa, ava kirine. Lê, hin kemani û qelsiyên zimanê niviskî hene. Ew jî dê bi xwendin û nivisîne, hedî hedî ji hole rabin. Em divê gelek bala xwe bidine ku zimanê Kurdî bikin zimane perwerî û xwendinê. Em divê kar û xebaten xwe yen civakî, siyasî, çandî, edebî û ronakbîrî bi Kurdî rêxinin. Her kesê ku dikare bi Kurdî binivîse, dive dest pê bike û binivîse. Di vî warî de, kurd divê kampanya vekin û pir bixebitin.”*

Mehmed Uzun, di Hêz û Bedewiya Pênûsê (Weşanên Nûdem, 1993)de derheq edebiyata Kurdî a nûjen de wisa gotiye:

*“Herçî edebiyata Kurdî ya nûjen e, ji ber perçebûna welêt, 1923, riyên zaravayên Kurmancî û Soranî ji hevûdu vediqetin. Zaravayê Kurmancî bêgav dimîne û nikare tevgeren geş yên edebî bine pê, -ji bilî tevgera Hawarê. Meriv dikare bibêje ku kovara Hawarê ku di gulana 1932-an de dest bi weşîna kir, di tarîxa nûjen ya edebiyata kurdî (ya ku bi kurmancî te nivisîn) de tevgera herî girîng e..... keda Osman Sebrî di nûkirin û vejandina ziman û edebiyata kurdî de pir e. Zimanê Osman Sebrî zimane Hawarê ye. Yanê zimanekî paqij, zelal. hêsan û edebî.”*

Ji heman kitêvê:

*“Eğer ez ne şaş bim, “Birîna Reş” kiteba yekemin bû ku piştî damezrandina zimane kurdî dihat Komara Tîrkiye, 1923, bi nivisîn û weşandin. Carina sinirine û rezina bi kurdî li derina diweşiyên. Lê mîna kitab, “Birîna Reş” bû ku bi zimane kurdî ronahî didît û çîhe xwe ye birûmet di tarîxa peşveçûna ziman û edebiyata kurdî de werdigirt.”*

Wî bo Îbrahîm Ehmed jî ev gotine di heman kitêvê de:

*“1. Ehmed di xebata xwe ya çandî û edebî de jî riya zehmettirîn daye ber xwe. Ew baş dizane ku edebiyata kurdî ya niviskî, bi qasî ya devkî, ne bi hez û quwet e. Ew dizane, di edebiyata niviskî de jî, pexşana kurdî, bi qasî şihîre, ne bi quwet e. Ew dizane, di pexşana kurdî de jî, şêweyên nûjen mîna roman, piyes, kurte-çîrok, bi qasî destan, efsane û çîrokan, ne bi quwet e. Loma wî nivisîn û afirîna roman û kurte-çîrokan kurdî daye ber xwe. Wî xwe ji destan, efsane, çîrok û sûren gelerî daye alî û şêweyên nû yên edebî ku di edebiyata kurdî de he baş nehatine ceribandîn, kiriye kare xwe. Wî kar û xebaten din en edebî biçûk nedîne, lê yên herî dijwar dane ber xwe. Romana Jana Gel mîsala ve yekê ye. Jana Gel romana yekemin e*



*ku bi zaravaye soranî (kurmançiya xware) hatiye nivîsîn. Bi vî aliye xwe, çapbûn û derketina wê, bûyereke tarîxî ye.”*

Bo romana xwe a bi navê “tu”, wê wextê wisa lêkiriye:

*“Min bere jî bi kurdî dinivîsî û nivîsaren min di kovar û roj namen kurdî de divêşyan. Lê nivîsîna romanekê karekî kûrtir, firehtir û dirêjtir bû. Hinge min dev ji nivîsîna romanê berda û dest bi xwendin û temrînen nivîsîna kurdî ya edebî kir. Demeke dirêj, min berhem, eser û weşanên kurdî ku diketin destê min, xwendin. Min ji wan not derdixistin, lîsta peyv, cimle, gotin, edet û ûsilen nivîsîn û fikirîna kurdî çedikirin. Min, ji bo xwe, name, gotar bi kurdî dinivîsin, bi rûpelan taswîrên edebî çedikirin... Bi dû vê xebatê re, ez dîsan li romane veşeriyam. Yanî romana TU, meriv dikare bibeje, berdevvama riyeke dirêj e, dilopeke nû ya kahniyeke kevn e.”*

Em hin jêgiritnên din bi bîr bixin hem bo nêzikahiyên wî ên li edebiyatê û hem jî bo beşa sêyem a vê nivîsê wê gellek muhîm bin.

Gotinên wî ên bo serpehatiya romana Siya Evîne:

*“Kitabxaneke dewlemend ya Memduh Selime Begê hebûye. Tê de ji rojname Kurdîstane bigire (ya ku sala 1898-an li Kahire vevêşiyabû) heta sala 1960-an her tiştê ku li ser kurd û Kurdistanê, çî jî aliyê kurdan, çî jî aliyê biyaniyan de weşiyaye, hebûye. Memduh Selim Beg ev kitabxana dewlemend jî, ji bo mesrefê, bi deh hezar lîrayên Suriye yê wê wextê derdixê firotine. Lê tu kesî deh hezar lîra nedîne û ew kitabxane ji windabûnê xelas nekiriye. Ma çî bi sere kitabxane tê? Ew winda dibe. Akademiya Kurdî Ya Bexdayê hin ansiklopedî û kitabên ilmî dibin Iraqê, çend kes jî hin tiştan werdigirin, dibin. Ji van pê ve, hemû tiştên maî ku li gora gotinan giranbihayîya wan bi malê dinê bûye, bikilo, di dikanan de hatine firotin û bi vî awayî kurdankitabxaneke din jî winda kirine... Min ev bûyer di romana xwe ya Siya Evîne de nenivîsî. Min nikaribû binivîsa. Pênusa bêruh, bêhiş, bêpejnelivîya ku vê bûyera kirêt li ser kaxiz salix bide.”*

Ji kitêva Hêz û Bedewiya Pênûsê, k u di wir de destnîşankiriye ew nivîs di sala 1983 an de di Berbang de hatiye weşandin:

*“Ronakbîren kurden Tûrkiye nikarin dan û standin û yekîtiyeke heja û jîndar di navbera bawerî, raman, norm û metoden nû û welat, gel û kultura xwe de ava bikin. Yan evvjî vvelat, gel û kultura xwe pir dûrketî ne, yan jî ji tişt, bavverî, raman û normen nû re pir girtî ne. Helbet ji herdu awiran jî tu havilekî dernaye.”*

Nivîskariya wî li hewla “tiştên nû” nivîskariyeke bi lêgerîn û bi armanc bû. Bi tevî her tiştî meriv dibîne ku ew armanc bûye sebeb

xeteke wî a edebî her were rojevê.

Ji alî forma nivîsîna romana "Tu"ve Uzun romana C. Fuentes a bi navê "Mirina Artemio Cruz"û nameyeke Ihsan Nûrî paşa bi bîr dixê ku ew name di Hawarê de hatiye weşandin. Di gellek roman û nivîsên wî de em heman hewl û seknê dibînin, edebîyata dunyayê û edebîyata neteweyî belkî sentezek ji herduyan... Ji alî coxrafî û şaristanîyê ve jî li berheman miqate bûye. Di sala 1993 an d edi Kovara Nûbiharê de wisa dibêje:

*"Ez di romanen xwe de, ji ber sebebên ku min li jore qal kirin, perçeyên jiyânên jibîrbûyî, eseren rizyayî, bûyeren bihurî, stran û destanên windabûyî bi kar tinim. Ez vvan jî direşînim nav romanen xwe. Di romanên min de ji rûpelen Zend-Avesta, Mishefa Reş, Quran, Hedîsen Pexember, şexa Senan, Mem û Zîn, Dîwana Melaye Cizîrî, Hawar, Ronahî, Riya Tezeperçenin hene."*

Kovara Berhem 1992, ku ew nivîs jî di Hêz û Bedewiya Pênûsê de cî digire:

*"Û ez dive bibejim ku ji romanen min pê ve jî romanen ku bi zaravayê kurmançî hatin nivîsîn hene. Meriv divê nemaze behsa sê romana bike;"Sivane Kurd" ya Erebe Semo, "Gundiike Dono" ya Mahmut Baksî û "Zeviyen Soro"ya Nuri Semdin."*

Bi min her balkêş e ku Uzun Hewariya Heciyê Cindî bi bîr neaniye û heya niha jî nivîseke wî a li ser Hewariyê mi nedîtîye ger hebe û mi ew nexwendibe kêmani a min e. Heger tunebe hêjayê mijara tez'ekê ye!

Weke kesekî bi romana Kurmançî re eleqeder, ji alî fikir, bîr û baweriyên li romanê re fikrên Uzun ên bo edebîyata dunyayê b imin balkêş hatin, ji alî zimanê romanê û Kurdî ve zimanê Heciyê Cindî her bi min balkêş hat. Heciyê Cindî ku ji alî îdeolojîk ve totalîter bû, bi pesin bû li hemberî îdeolojiya xwe, ji alî Kurdî ve derfet û rengên folklorê Kurdî di zimanê xwe de bikaraniye, ji alî edebî ve jî li welatê Tolstoy û Dostoyevskî dijiya. Mehmed Uzun ji alî fikra siyasî û sekna edebî ve li Swêdê dijiya û fikrên wî li ser demokrasîyê bi şikil dibûn lê zimanê wî (armanca afirandina zimanê xwe ê edebî rastiyek bû) bi qasî zimanê Cindî ne dewlemend e!

Ev gotinên wî jî hêjayê bîrxistinê ne (Kovara Nûbihar, 1993):

*"Eğer meriv behsa romanen kurdî bike, dive meriv behsa romanen Erebe Şemo, Eliy6 Evdirehman, İbrahim Ehmed, Rehîme Qazî, Husên Arif, Mihemed Mukri, Mahmut Baksî û Şahine Bekire Soreklî û h. vv. d. bike."*

Ji Kovara Berhem 1992:

*“Roman, di man’a fikrî de humanist, şoreşger û rexnegir e. Ew humanist e, ji ber ku her tişte ku bi insan û insanîyetê ve giredayî ye, ne dûrî romanê ye, her tişte romane ji bo insan û çeyiya insan e.”*

Bo dîroka Kurdan nêzikahiya wî di hişê wî de safî ye, weke me gotî, şîroveya wan gotinan jî bimîne. Pirsên werin pirsîn hene bo wan nihêrînan ku di romana Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê de jî ew fikrên wî dibin sebebê hin fikrên di derheqê jiyana kurdan de ku hêja ye dîrokzan analîz bikin ku ez weke xwendevanekî ji wan nêzikahiyên Uzun ên di derheqê tarîxa Kurdan de ên bi yek parsû ne qanîh im.

Ji heman kovarê:

*“Em qebûl bikin yan nekin, kurd bi hin wesfên xwenas in; ne bi bajarvaniyê, bi koçerî û gundiyê; ne bifelsefe û îlim, bi şer û xweparastinê; ne bi edebiyataxwe ya nivîskî, bi edebiyata xwe ya devkî, ne bi kitabxane û zanîngehen xwe, bi peşmerge û hêzên xweyan çekdar, ne bi dîşîplîna “kreavîtet”e, bi xurtî û meraniye... Ne hevuce ye ku meriv direj bike. Ev weşîf, yê civaten kevnare û girtî ne. Berî niha bi du şed-sê sedsalan, civaten peşketî jî, bi van wesfen xwe dihatinenasîn. Lê edî ne îro.”*

Ji ber ku bi rabêj, vehesîn û hin nêzikahiyên bigengêşî edebîyata wî hate nivîsîn, em, ji bo ku kevîr bi awayek rast, li ciyê xwe bîdîlin, bi hewl in çimkî di wî halê bi polemîk de ne çîroka romanûsiya kurmançî zelal e ne jî çîroka nivîskarî û romanûsiya Uzun zelal e; dişibe warê sîyaseta li rojhilat ku bi mij û moran e, li gorî her kesî diguhere, jî şertûbendên edebîyatê bêhtir li ser esasên dîtir têne binavkirin.

Heq didim xwendevanan ku wexta vê nivîsê dixwînin, hêviya şîkil û stîla nivîseke bi tez an jî gotareke ilmî, rexneya ilmî ji mi bikin. Ez ê ji parastinê bêhtir, weke terzekê bi bîr bixim ku nivîsên pexşanî her wekî xalîçeyekê disêwirînim, an jî hewl didim zemîneke xalîçeyî a nivîsê were pê ku her beşek, bi taybetiya xwe, bi kûrahiya xwe, welew tenikbûna xwe bibe parçeyek xalîçeyê. Bi bîr bixim û gellek tiştan bihêlim bo xwendevanan an jî xwendevên tevî pêvajoyê bikim. Ka ez nizamim em ê behsa qutbûnên di nivîsê de bikin an jî li gorî wê xalîçeyê hin gav û derbasbûnan weke meşa li xalîçeyê bifikirin kul i wê zemîne şîkil û ciyên sert, asê, welew bi taybetî hebin... Em ê niha bi gavên wis a re berdewam bikin.

Nasên Uzun, hevalên wî, derdora wî her behsa jîrebûna Uzun kirine. Ew di 23 saliya xwe de bûye berpîrsiyarê Kovara Rizgarî ku

ew kovareke sîyasî bû. Ew feraset muhîm e meriv bi bîr bixe ku di temenê xwe de ti carî ji biqerarî, ji armanc û xeyalên xwe tawîz nedaye.

Uzun, di romanûsiyê de, rewşenbîriya Kurd weke hefizeya neteweyî, weke trajediya neteweyî dîtiye, hewl daye rewşenbîrên Kurd bîne rojevê, tarîxa rewşenbîriya kurd bi awayek edebî binivîse. Ew jî pariya hestiyariya wî her dide nişandayîn.

Piştî beşa yekem a nivîsê, di medya civakî de, xwendevanekî (“Xerzî @Xerz11 “)

wisa lêkiribû:

Daha fazla

„Mirov dibê qey gava ev nivîs hate nivîsin, rihê Mehmed Uzun li ser serê @cihanroj1 bûye :) Kekê Cihan teqşîr kiriye :)”

Gotineke gellek balkêş bû çimkî ruhê Mehmed Uzun ê nivîskariyê her bi mi re bû!Bo balkişandinê, dikarim bêjim Memduh Selîm Beg bo Uzun çi îfade dikir, di warê rewşenbîrî, nivîskariyê de jiyana Uzun jî ji bo mi heman tiştî îfade dike; jiyana rewşenbîrî û nivîskariya beriya me balkêş e, trajîk e ku beşek ji tarîxa edebîyata me ye.

Di mesela teksîrkinê de ez weke @xerz11 nafikirim lê di her kêlîkekê de ji alî hestiyariyê ve rewşa trajîk a nivîskariya Kurdî, di kêlîkên nivîsînê de, hukum li mi dîkin. Weke delîl dikarim bêjim, di sala du hezar û çaran de, di Ek Gundemê de1 mi nivîsekê di derheqê zimanê Uzun de nivîsî bû ku rexneyeke balkêş bû bi a min, qeneb wê wextê mi hewl daye ez bêmihnet tevbigirim!Ez hê jî bi wê nêzikahiyê me ku karibim metna wî binasim, nivîskariya wî bi awayek hûr, kûr û dûr têbigihjim, analîz bikim û bibim sebebê pirsan, karibim metnên wî bi her awayî bi bîra xwe bixim!

Xeletiyek jî ew bû ji ber şert û mercên Kurdî, ji ber rewşa sîyasî a wê wextê, ji ber eleqeya dunyayê bo çand û kultura Kurdî, ji ber hewla Uzun û xebatên wî, helbet sekna wî û ji ber gellek sedemên dîtir coşek hebû, hestiyarî hebû, rewşeke biajîte hebû li bakur, bi rihetî meriv dikare bêje ew rewş dibû sebebê hin detay, xeletî û agahiyên meriv nikaribe piştrast bike. Helbet derdorên edebîyata Tirkî û a Swêdî jî nivîs lêdikirin, hevpeyîvîn dikirin ew jî, li hêlekê weke karek edebîba, li alî din jî weke hewleke destegê jî bû ku “mexdûriyeta” Kurdî yek ji sebeba sereke bû. Tiştêk din jî, derdorên edebî ên biyanî, tespît û gotinên ku ji alî Uzun û ji alî gellek kurdan ve dihatin kirin rast didîtin, an jî rast qebûl dikirin li ser wan qebûlan, analîzên xwe ên bo edebîyata Kurdî dinivîsîn...

Ew rewş weke mi di beşa yekem de destnîşankiribû li hêlekê rê dida hin ajîte û manîpûleyan, li alî din jî dibû sebab edebîyata Kurdî, romana Kurdî were gengêşîn were nasîn. Ku meriv her tiştî weke manîpûle bibîne ew jî neheqîyeke li kar û xebatên Uzun ên edebî ku ez dibêjim, êdî em ji hev bawer in ku ez nîyetên bi wî awayî jî red dikim.

Ev nivîs, bi awayek, hewla wan nêzikahtîyan e, meriv hewl bide, bigengêşe daku edebîyata Uzun ji hemî sekn û nêrînan bike, bêyî wan seknan, karibe berhemên wî têbigihije.

Dewrekê, kesên ku têkiliya wan bi Kurdî re qels bû, bo edebîyata Uzun nivîs lêdikirin, coşa bi wan re jî yek ji sebabê manîpûleyan bû. Çimkî meseleyeke bi polemîk e. Belkî rastiyên jiyane ne, kesên mîna min, di warê nixandînan û rexneyê de ne bi îdîa ne, bi tenê bi hewla çarçoveya edebî nêzikahtî li edebîyata wî dikin, peyderpey bibin sebebê pirsên nû ên weke destpêkeke nû!

Karê nivîskariya kurd, hê jî, di heman demê de, weke hêviyeke jê tê kirin, karekî entelektuelî-rewşenbîrîye jî. Di hin xalan de, di hin pêvajoyan de, ger hin diyarde, rastî, meyl neyên gengêşîn, gelek tişt tevlihev dibin, kultur û edebîyat, ji hewesên hin kes û derdoran wê xisarê bibîne, îda dikim ku niha dibîne jî!

Heke pirs neyên kirin ê rewş her xwe dubare bike. Belê, Uzun behsa edebîyata dunyayê dikir di derheq jiyane de fikrên lîberal derdibirin, azadiya takekesan dianî rojevê, ew pir muhîm bû bo nivîskariyê, hêja ye were pirsîn ew li hember metna xwe, li hember fîgurên çawa tevgeriya ye? Hefsar di destê wî de bûye. Di hevpeyîvîneke xwe de her gotibe ku peyamên şîftazî di romanên min de nîn in jî hin gotinên dîtir ên wî wan gotinan derdixin valahiyê2.

Wî her ku balê dabe takekesiyê, rexne li totalîteriyê girtibe jî di romanên wî de xîtabên totalîteriyê ne kêman in. Ew bi pey hefizeya civakî ketiye. Neqil kiriye û hewl daye vejîne.

Wî digot, ez hewl didim zimanekî edebî ê kurdî biafirînim, heger ku bigota, ez hewl didim zimanê xwe ê edebî biafirînim mesele tunebû, bi îdiayên wisa re dibû sebab ku kesên biyan lê bifikirin ku heya dema wî zimanekî edebî ê Kurdî nîn e!

Rojevên polîtîk, parçebûna hiş û karakterê şexsan, rastiyên zimên, rewşa jiyana Kurdan û gellek tiştên din di edebîyata Uzun de jî weke astengî bûn ku ew rewş dibûn sebab di karwaniya nivîsevaniyê de nakokî werin dîtin.

Uzun di hevpeyîvîneke xwe de (Kovar W, hej. 13, 2007) têkiliya

romanê û bajarvaniyê bi bîr dixê û pêde diçe:

*“Divê em di edebîyata xwe de bajar û bajarvaniyê derxînin pêş. Wan wisa taswîr bikin ku însanên me ji bajarên xwe hez bikin. Bi wan taswîr û saloxdanan tarîxa bajarên bizanibin û bizanibin li ser kîjan axê dijîn. Miorv bi vî awayî bikaribe hafizeyeke neteweyî ava bike. Tiştê ku jî ime hatiye dizîn, jî ime hatiye girtin”* Di heman kovarê de ew bo afirandina peyvan wisa dibêje:

*“Kurdî, ji bo Edebîyata Kurdî, zimanê ku heye ez pê dinivîsînim. Gellek heval ji ber xwe de gotinan ava dikin, çêdikin û bi wan peyvan dinivîsînin, bêyî wan jî kes jê fem nake. Miorv divê tiştên wiha neke.”*

Mesela çêkirina peyvan, gengêşiya wê rewşê li dera ha, meseleyeke din a sotîner heye di nivîsandinê de ger em herdu şîret û tespîtên Uzun bi bîr binin; ger hûn bajarên xwe binivîsînin, jiyana bajarî binivîsînin hûn ji bo romaneke dewlemedn û karibe jiyane teswîr bike pêdivî bi têgînên teknîkî ên dema modern hebûn, ger we xwe ji wna dûr bigirta hûn neçar bûn we sînorê romanê û vegotina xwe teng bikira an jî we ê di hişê xwe de bi saya Tirkî hin tişt saz bikira çimkî Kurdî ji ber qedexeyan û ji ber nebûna têkiliya zimên a bi qadên ilmî û zanistî re kêmanî hebûn.

Ev ji bo detayekê muhîm e ku gellek Kurdan her behsa bêxwedîbûna xwe kirine, bêdewletbûn û bêderfetbûn anîne rojevê, Uzun weke kesekî haydarî wê rewşê karibûye li xwe xwedî derbikeve, ew taqet, bawerî, hêz û wêrekiya medenî pê re hebûye, têkoşiyay ye, bi keda xwe bûye xwediyê qelema xwe...

Xalek heye divê hem bo romanûsiya Uzun hem jî bi gelemperî bo romanûsiya Kurdî li vir weke kevanekê were bîrxistin; di navbera hestiyariya neteweyî û îdayên bo edebîyata dunyayê de ketiye tengasiyan; di siya Evînê de karakterê xwe heya Agiriyê dibe, bêy şîrove, tablo û qewimînên li wir, karakter dadigere!

Kesekî mi destûr jê negirt digot, di meha Newrozê de, di romana Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê de, Uzun mirov birine Çiyayê Sîpanê! Bi tevî hin xeletiyên madî, meriv lê hay dibe k udi hin fikran de ew jî bi “qebûlan” re ketiye nav şîrove û destnîşankirinan.

### **Bi nîyeta gotina dawî a vê beşê:**

Uzun bi sekn, armanc û hewla xwe a ji alî nêzikahiya edebî ve qelemek hêja û balkêş e. Hewla têkiliya bi edebîyata dunyayê re, aliyek cuda a qelema wî dide nîşandayîn. Çi ji wî be, çi ji şert û mercan be, her ku rola avakariya zimanê modern ê edebîyata Kurdî

hatibe destnîşankirin jî em wê weke hêleke înaşakirinê dibînin, ji derî wan hewlan weke rastiyekê keda wî, weke kedekerê hêja dibînin.

Hewl daye, zimanê edebî ê romana xwe biafirîne lê mixabin dûrbûna wî a ji Kurmancî yek ji sebeba muhîm e ku nehiştiye zimanê romana wî dewlemend bibe, helbet zimanê çîrçîrokî, zimanê dengbêjî û destanan tehm û çêj dane romanên wî, ew bûne sebeb daku romanên wî di zimanên dîtir de balkêştir bin lê bi a min ger ew bi, wê hewl, îsrar û keda xwe li welatê xwe bûya ê meyê behsa zimanekî xurttir ê romana wî bikira.

Belkî em ew kes in ku bi berhemên wî ên edebî re tarîxa romanûsî û sîyasetmedariya wî, bi awayek ne bi detay û ne kûr, tarîxa wî a şexsî bi bîr dixin, nîfşên li dû me wê bêhtir û bi awayek îlmî ê “metn”ên wî binirxînin.

Ez her hasas bûm ku wê rastiyê ji bîr nekim ku hin gengêşiyên bi edebîyata Uzun re diqewimîn bo edebîyata Kurdî gengêşiyên nû bûn û spekulatîf bûn. Gelo ew gengêşî çiqas dibûn sebeb Uzun di romanûsiya xwe de gellek bi tevdir tevbigere, her tiştî zêde îdealîze bike û bi wî awayî bibe sebeb û bihêle zimanê wî serbest be.

Di wexta bi çalak a nivîskariya wî de rojevên polîtîk ên kurdan germ bûn. Nivîskariya wî bi qasî bûyereke edebî bû hewqas jî bûyereke sîyasî bû.

Diyardeyên wisa me dibin encaman ku ew rewş çiqas dibû sebeb populerbûn were pê hewqas dibû sebeb ku derdorên bixeyd, ên bêeleqe jî çêbibin. Gelo romanûsiya wî çiqas bandor li romanûsiya bakur kir? Teknîka wî a nivîsînê, seknên wî ên edebî di Kurdî de bes hatin gengêşin an na? Çima bi qasî k udi tirkîde edebîyata wî, romanûsiya wî hate gengêşin di Kurdî de eleqeyên wisa (gengêşiyên nivîskî) nehat dîtîn? Pirsên dîtir hebin helbet. Kî xwedî çî bersivê be ne tişteki wisa ye ku meriv karibe texmîn bike. Uzun, têgeha “deng” pir îfade dikir. Herwiha di romanên xwe de jî weke eleqeya bo pirçanditiyê li pey rengên cuda bû. Bo romana Kurdî jî ew dengê bû. Di romanûsiyê de, bi rengê xwe balkêş bû. Wexta van hevokan lê dikim, wêneyê wî li Kovara W ye kovar li ser sehpeyê ye û ez demên mirina wî bi bîr tînim ku, wê wextê, mirovên welatê wî, ew weke nîrxekî bo moralê jî didîtîn.

Bo gava nîrxandina romana wî Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê, ev gotinên wî deriyek xweş e:

“Vegotineke ku hatiye estetîzekirin, şewazeke rafînekirî, zimanekî rafînekirî, tîmayên ku hestên hiç naguherin ên mirovahiyê û

zêdekirina rengê li xelîçeya edebîyatê.” (Radyona Swêdê, Ser-mawez, 2004)

Pirseke wisa ji Uzun hatibû kirin (ne şaş bim Abdullah Keksîn ew pirs kiriye):

“Ku rexnegirên edebî ên edebîyata Kurdî ku dest pê bikin met-nên te binixînin, bi a te, bi kîjan xal dest bi gengêşiyê bikin, baştir e?”

“Avmuhîm analîzên edebî ên bo metnên min e. Ziman pir muhîm e. Bi tevî her tiştî jî dîrokeke edebîyata Kurdî heye. Ciyê edebîyata min a li wir. Û ciyê edebîyata min a di nav edebîyata dunyayê de.”

Ez ne rexnegir im. Helbet ê rexnegirên vê edebîyatê rojekê kari-bin daxwazên wî bînin çî. Lê rastiyek heye ew jî bi tevî xwendinên min, ev nivîs careke din bû sebeb ez gavek din nêzîkahî li metnên wî bikim. Wekî romanûsekî romana Kurdî, pirsan ji romanûsiya wî bikim û herwiha hewl bidim hin pirsên dîtir ji romanûsiya Kurdî û ji romanûsiya xwe bikim, ji derî wê, carek din li trajediyên nivîskarî û rewşenbîriya vî zimanî bifikirim ku gellek delîl, referans, danehev û çîrokên balkêş hene di wê tarîx û jiyane de...

1)

Hin gotinên birêz Mehmed Uzun sedema van gotinan e. Arman-ca bingehîn ji gotinên birêz Uzun bêtir destpêka gengêşiyek e. Gelo ji bo nivîsên ceribî kurmancî çiqas rê li însanan vedike? Kesekî wextê helbest lê bike, çîrok binivîse, roman binivîse hew çend das-tanan ji dil û can bixwîne, dengbêjan guhdarî bike ji alî şeweyê ve, rîtm û mûzîka peyvê ve, tîn û kubariya derbirînan ve derfetên mez-in bi dest dixê. Luqman Ehmed derbarê Memê Alan de lêkolînek kiribû, nêrînen xwe der dikir: “Ku hûn Memê Alan bixwînin dastan awayê vegotina xwe, rîtm û mûzîka xwe li we ferz dike. Hûn dibêjin qey pênûs ne ya we ye, mîna ku destan nivîsa we binivîse. “

Me got, gelo ji bo nivîsên ceribî çiqas derfet hene, li rê ye ku însan gotinên birêz Uzun bi bîr bîne ku wî gotibû, “Kêmanî ne ya ziman e ya însan e. “

Di hevpeyîvînekê de bersivên ku Mehmed Uzun dabûn li van gotinên wî nayên! Ji hevpeyîvîne:

Sennur Sezer:

-Birêz Mehmet Uzun, di Keskesora Ruh de navê wergêrek nabî-nim. We bi Tirkî nivîsî?



-Belê. Min bi Tirkî nivîsî.

-Bi qasî ku bi bîr tînim dê we romanên xwe bi Tirkî an jî Swêdî nenivîsanda. Ji bo ku hun li dû romanên bi van zimanan hatine nivîsîn nemînin. Ev pirtûkek ceribî ye?

-Bi temamî ne cerib e. Pirtûkek vegotinê ye. Pirtûkek vegotinê ya di navbera cerib, çîrok û romanê de. Ne roman e, ji ber ku ez romanên xwe bi tenê bi Kurmancî dinivîsînim. Lêbelê pexşanên xwe yên dî dem bi dem bi Tirkî û Swêdî dinivîsînim. Ev jî ji wan yek e. Beriya vê min Hawara Dîcleyê bi Kurmancî nivîsî. Ji wê romaneke bi kurmancî ya gelek berfireh pêk hat...Piştî wê romanê min xwe gelek westîyayî hîs kir. Wekî ziman mîna ku gencîneya min ya edebî a kurmancî vala be...Ji nû ve min bi kurmancî binivîsanda bi îhtimaleke mezin min dê xwe dubare bikira..." (Tîroj, hej. 13)

Gelek kes hene ruhên wan ji gelek çandan, derbirîna wan ji gelek zimanan xeml û teşe werdigire. Ev şanazî û bextewarî ye..... Lê çima roman bi Kurmancî, nivîsên ceribî bi zimanên dî? Gelo metirsiyek heye?An jî wekî me got, nivîsîna ceriban bi Kurmancî derfetên berfireh nade însên?Ger pirsgirêk ev be gere bête gotin. Bi bawerim çawa herkes dilsozê romanên birêz Uzun e, ger ceribek wî bi Kurmancî bihata weşandin dê ewqas fêde bigihanda ziman. Kesan derfetên derbirînen cûda bi dest bixista. Ger ne rewşa Kurmancî bûya dê gotinên birêz Uzun wekî tercîhek cî bida xwe. Wê çaxê jî pariya her kesî hurmet dima... (Cîhan Roj, Ek Gundem gulan, 2004)

2)

"Di romanê de têra xwe bersivên min hene ji bo dexes, ewanên ku li derdora min hîç kêmin nabin. Lehengê min Hemê ne ew kes e ku ji wan cudatir be; dexes, ewan, kîndar û xaîn..." (Bir Romanin Hatıra Defteri 143)"

Weke nîşe, ew gotin hem ji alî edebî ve hem jî ji alî jiyana wî a pouler ve balkêş in bê ew gengêşî li hêlekê çiqas bûne sebeb ew populer be hewqas jî bûne sebeb ew biêşe, biqehire, bi hêrs bikeve!

\*Ev nivîs ji bo banga "sed xwendevanî" ye, deng li nivîskaran kiribûn di derheqê berhemana de her yek jê nivîsekê lê bike... Nivîs weke du beş di 13-16. 2. 2019 an de di malpera diyarname yê de hatibû weşandin.

## **RÊZA DÎROKA NIVÎSÎNA NIVÎS Û HEVPEYÎVÎNAN**

- Edebîyata ku li demsala xwe a pêncemîn digere (Kovara Papirûs û Kovara Bîr, 2016)
- Bahol û sandoqa cihêzan (Tîroj, 2014)
- Wênesaziya bi qirşûnqelemê (2018)
- Ronahiya bi qasî serê misqalê (2018)
- Dengê vala (2018)
- Zimanê Yaşar Kemal, ferhenga Yaşar Kemal û ferhenga Yaşar Kemal a Kurdî (Nûbihar, 2018)
- Têkiliya hin peyvên Kurdî û Akadî (Nûbihar, 2018)
- Koleksiyon (Tîroj, 2014)
- Edebîyat hezkirin e, hezkirin jî hêzeke rexneyî ye (Tîroj, 2015)
- Mala matê (Tîroj, 2016)
- Oryantalîzm û felek, temsîliyet û metnên saf (Peyv, 2013)
- Karnavalên leylî û şevbuhêrkên nivîskî (Nûbihar, hej. 135)
- Avakirina Kurmancî
- Avakirin û afirandin
- Ji fûara mishefan a Amedê ber bi fûara Mezopotamyayê ve (Tîroj, 2015)
- Edebîyat, azadî û serxwebûn (Diyarname, 2016)
- Flortên edebî û şîrove (Diyarname, 2008)
- Perde (Diyarname, 2006)
- Di destana Memê Alan de bi dilan tê sond kirin (Kovara W, hej. 11)
- Pirên şkestî û îzolasyona gewr (Kovara W, 2007)
- Konferansa nivîskaran a li Îzmîrê (Kovara Dîwar, 2013)
- Şeroyê Biro, Kandisky û Foucault (2018)
- Çend parvekirinên di medya civakî de (2018)
- Fezayên piçûk û xalîçeyên nû ên romanê (2018)
- Edebîyata Kurmancî a kom û listeyan (2018)
- Xwendevanên Kurdî di heman demê de xwendevanên Edebîyata Tirkî ne (Gundem, 2011)

Me bi Cîhan Roj re perde da alî (Mardînlife, 2012)

Hevpeyîvîn bi Cîhan Roj re (Firatta Yasam, 2002)

Her hunermend, nivîskar divê li ser Heskîfê berhemana biafirîne  
(Diyarname, 2011)

Hewcedariya Edebîyata Kurdî bi manîfestoyan nîn e. (Îstanbul - BîA  
Haber Merkezi 29 Kasım 2014)

Destana Siyabend û Xecê destana eşqê û trajediya yekitiyê ye (2018)

Dara hejîrê a li dîwêr şînhatî (Diyarname, 2009)

Zimanê ku di navbera sîyaset û zanîngehê de dihejiqe (Diyarname, 2015)

Nîşeyên di deftera min de (Tîoj, hej. 36)

Rewşen û rastiya 'Nifşê Nodî' (Kovara Hinar, 2011)

Deşîfrekirina ziman û têkiliya bi objeyan re (Azadiya Welat, 2009)

Xwendina lêvên ekolojîyê (Gundem, Azadiya Welat, 2004)

Çend dûrikên derdora Gimgimê (Folklorî Kurdî, 2016)

Mala Baz, edebîyata li Bakur û govenda cinan (rûpela facebookê 30. 10.  
2018)

Şer peyvan gemarî dîke (Kovara Evrensel, hej. 29. 2016)

Azadiya xwendevaniyê 'Tirsa taxê' û mercên rexneyê. (malpera  
Diyarname, 7. 10. 2018)

Mehmed Uzun: Çîrokeke dirêj a nivîskariyê.

◀•▶

Metnên ku bi xwendinê re li hev zêde dibin,  
metnên ku bi guhdarîkirinê re, bi nihêrînê re, bi nirxandin,  
bi gengêşî û mitaleyan re li hev zêde dibin...  
Metna ku weke dilopeke ji bahrê veqetiyabe  
û bûbe xunav, carek din, carek dîtir...

◀•▶